

KT

Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanîsta Ziman û Kultura Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

DENGBÊJÎ DI PEYWENDA PATRONAJÊ DE

Zeki GÜRÜR

10711022

Şêwirmend

Doç. Alk. Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn-2014

JI BO RÊVEBIRIYA ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ

Ev xebat ji aliyê jûriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Kultura Kurdî de weku teza lîsansa bilind hatiye pejirandin.

(îmza)

Serok :

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmza)

Endam :

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmza)

Endam :

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmza)

Endam :

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmza)

Endam :

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku înzayên jorîn ên endamên hîdekariyê yên navborî ne.

Îmza

.....

Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav

Birêvebirê Enstîtûyê

(Mor)

NAVEROK	i
KURTE	ii
ÖZET	iv
SUMMARY	vi
PÊŞGOTIN	viii
KURTEBÊJE	xi
DESTPÊK	1
BEŞA YEKEM: DI DEMA OSMANIYAN DE PERGALA ÎDAREKIRINÊ Û	
SERBESTIYA MÎREKTIYÊN KURDAN	32
1.1. Pergala Îdarekirina Kurdistanê.....	32
1.2. Pêwendiyên Dewleta Osmanî û Mîrekiyên Kurdan.....	35
1.3. Xweserbûna/Otonomiya Mîrekiyên Kurdan.....	38
BEŞA DUYEM: WEKÎ HAMIYEKÎ MÎR Û AXA YÊN EDÎB Û DENG BÊJAN	42
2.1. Di Edebiyata Kurdî de Patronaj.....	42
2.2. Mîr Wekî Hamiyekî.....	48
2.3. Dengbêjê Axayê Xwe.....	70
2.4. Cîgehên Hîmayekirinê.....	78
2.4.1. Qesr û Qonax.....	79
2.4.2. Odeyên Giregiran (Şêx-Axa-Dewlemend).....	86
2.4.3. Radyoyên ku Bo Dengbêjan Bibûn Cihên Bêhnvedanê.....	89
2.4.4. Dezgeheke Dengbêjan: Mala Dengbêjan.....	96
ENCAM	106
ÇAVKANÎ	109

KURTE

DENGBÊJÎ DI PEYWENDA PATRONAJÊ DE

Di afirandin û îcrakirina performansên hunerî û edebî de rola “desthilatî”yê aşkera ye. Armanca vê xebatê jî li dor nimûneyên kultura kurdî ya devkî, vekolana rola “desthilatî”yê ye. Di vê xebatê de jî têkiliya desthilatî û hunerê, di peywenda dengbêjan û wan dezgehên ku hamîtiya wan kirine de hatiye nirxandin. Ji ber ku di çêbûn û geşedana kultura kurdî ya devkî de roleke sereke dilîzin, ev dezgeh li gorî tezahurên modernîzmê yê li ser civaka kurdan bi du awayî hatiye dabeşkirin: pêş-modern û modern. Her wisa di vê lêkolînê de, têkiliya patronaj û dengbêjan di 2 beşan de hatiye vekolandin.

Di destpêka vê xebatê de, ji ber ku dengbêjî parçeyek ji kultura devkî ya kurdî ye, ew di konteksta *hefizeya civakî, dîroka devkî û kultura devkî* de hatiye vekolandin û derbarê babetê de nimûneyên lîteraturê hatiye destnîşankirin. Di nav malûmatên kultura kurdî yê pêşîn de agahiyên derbarê dengbêjiyê û kultura devkî de hatine dayîn. Tesirên îcatkirina çapxaneyê û amûrên teknolojiyê yê li ser afirandina berhemên devkî û nivîskî, di nimûneyên civakên ku di heman qonaxê re derbas bûne, li dor kultura kurdî hatiye gengeşekirin. Şert û mercên sedsala XXan ên siyasî û civakî gelo tesireke çawa li ser afirandina berhemên kulturî û hunerî kirine, di vê beşê de hate gengeşekirin.

Di beşa yekem de, paşxaneya sîstemên îdarî yê Kurdistanê, têkiliyên mîrekiyên kurdan û dewleta osmaniyan hatiye pêkolekirin û bizavên hunerî û edebî yê di sîstema mîrekiyan de hatiye afirandin, di peywenda patronajê de hatiye gengeşekirin. Ji sedsala XVIan heta sedsala XXan, di gel dînamîkên ku tesira xwe li ser sîstemên îdarî yê Kurdistanê kirine û têkiliya hunerê, hatiye ravekirin û di berhemên huner û edebiyatê de, têkiliya hamî û hozan/edîban hatiye vekolandin. Di van nimûneyan de jî diyar bû ku, di navbera desthilatî û afirandina berhemên hunerî û edebî de têkiliyeke xurt heye. Di afirandina huner û edebiyatê de rola desthilatîyê di vê beşê de hatiye nirxandin.

Di beşa 2an de, ji sedsala XVIan heta sedsala XXan, veguherînên desthilatîyê di nimûneyên wekî mîr, şêx û axa de hatin nirxandin û tesira wan a li ser çalakîyên edebiyat û hunerê hate gengeşekirin. Her wisa kesên wisa yê ku behs li ser e, xwedî hêzeke aborî û siyasî ne û ji aliyê civakê ve wekî esilzade tî qebûl kirin. Lewma jî rol û delameta wan a di afirandina huner û edebiyatê de hate gengeşekirin. Piştî ku di sedsala XXan desthilatiya mîrekiyan tîk çû, nifûza şêxan li ser civakê zêde bû. Di dawiya sedsalê de jî edî desthilatî

berbelav bû û axayan hikmê xwe li ser civakê ferz kir. Ev guherîn li dor nimûneyên hunerê û nemaze jî stranên dengbêjiyê hate tehlîlkirin.

Dîsa di nav vê beşê de, aliyê huner û desthilatîyê, di peywenda mekanê de hate vekolandin û tesira wan a li ser naveroka hunerê di bin navê *cîgehên hîmayekirinê* de hate gengeşekirin. Her wisa di qesr û qonax, odayên girêgirên gundan, radyo û mala dengbêjan de sedemên çênebûna/qelsbûna sîstema patronajê digel paşxaneyê wê ya tarîxî û siyasî ve hate hêlengandin. Têkçûna desthilatîyê, di gelek aliyên de encamên neyînî li ser dengbêjan kir û veguherîneke cureyên stranên pêk anî û epîk tîk bir. Her wisa hin teşebîsên vejandina kultura dengbêjiyê di bin banê dezgehên de hate nîrxandin. Di sernavê *Mala Dengbêjan* de nimûneyeke dîwana dengbêjan hate tehlîlkirin û wekhevî û cudahiyan wê digel dengbêjiyê hate gengeşekirin.



ÖZET

Sanatsal ve edebi üretimler üzerindeki etkisi inkâr edilmeyecek ölçüde belirgin olan “iktidar”ın, Kürt sözlü sanatının gelişim çizgisi üzerindeki etkisinin araştırılması bu çalışmanın amaçlarından biridir. Bu çalışmada sanat ve iktidar ilişkisi, dengbêjler ve onları himaye eden yapılar üzerinden incelenmektedir. Kürt sözlü kültürünün oluşum ve gelişim süreçlerine etki etmeleri dolayısıyla bu yapıları modernliğin Kürt toplumuna tezahürleri bağlamında modern ve modern öncesi şeklinde ayırmak mümkün. Çalışmada, dengbêjlik ve patronaj ilişkisi, tarihsel ve güncel örneklerden hareketle 2 temel bölüm halinde incelenmiştir.

Çalışmanın giriş bölümünde, Kürt sözlü kültürünün bir parçası olan dengbêjlik sanatı; *kolektif bellek, sözlü tarih ve sözlü kültür* bağlamında incelenmiş olup, konu ile ilgili literatür taraması yapılmıştır. Kürt sözlü kültürü ile ilgili öncül yazılı materyaller taranmış olup, konu ile ilgili genel bilgiler aktarılmıştır. Matbaanın icat edilmesinin sözlü ve yazılı kültüre etkisi, dünyada benzer süreçlerden geçmiş örnekler üzerinden incelenmiş, böylece matbaanın ve teknolojik imkânların Kürt sözlü kültürüne etkisi tahlil edilmiştir. 20. yüzyıldan sonra Kürt toplumunun içine düştüğü siyasal ve toplumsal koşulların, kültürel ve sanatsal üretimlere etkisi, sebep ve sonuçlarıyla beraber değerlendirilmiştir.

Çalışmanın ilk bölümünde Kürdistan’daki idari sistemlerin tarihsel arka planı ve Kürt mirlikleriyle Osmanlı Devleti arasındaki ilişkiler incelenmiş, mirlikler etrafında ortaya çıkmış sanat ve edebiyat, patronaj bağlamında değerlendirilmiştir. 16. yüzyıldan 20. yüzyıla kadar, Kürdistan’daki idari sistemi şekillendiren dinamiklerle beraber, bu süreçte Kürt mirleri tarafından saraylarda himaye edilmiş ve bu yönüyle anlatıda ifadesini bulmuş örnekler ele alınmıştır. Bu örneklerden hareketle, sanat ve iktidarın birbirini besleyen, birbirine maddi ve psikolojik motivasyon kaynağı olduğu saptanmıştır. Bu bağlamda sanatsal ve kültürel üretimlerin içeriği ve kapsamıyla, siyasal ve iktisadi hegemonya arasındaki ilişki ortaya konulmuştur.

2. bölümde 16. yüzyıldan, 20. yüzyıla kadar Kürt toplumundaki iktidar dönüşümleri, mir, şeyh ve ağalar üzerinden ele alınmış, bu dönüşümün Kürt edebiyatı ve sanatı üzerindeki tezahürleri değerlendirilmiştir. Aynı zamanda bu karakterlerin toplumdaki seçkinlik vasıfları ve siyasi, iktisadi nüfuzları ile sanatsal ve edebi üretimlerdeki rolleri bu bölümde tartışılmıştır. 20. yüzyılın başına doğru siyasi ve iktisadi hegemonyası azalan Kürt mirlikleri, onlardan sonra toplum üzerinde nüfuz sahibi şeyhler ve yüzyılın sonuna doğru ortaya çıkan ağalar üzerinden, Kürt sanatı ve özelde dengbêjliğin anlatı içeriğinin analizi yapılmıştır.

Yine bu bölümde, sanat ve iktidar ilişkisinin mekânsal düzlemi, değişen siyasi, kültürel ve toplumsal dinamiklerin, kültürel ve sanatsal üretimlere etkisi *himaye mekânları* başlığında tartışılmıştır. Sanatın icrasında önemli himaye mekânları olarak karşımıza çıkan saraylar, köy odaları, radyolar ve dengbêjevlerinde, sistematik karşılığını bulmayan patronajın, tarihsel ve siyasi sebepleri değerlendirilmiştir. Kürdistan'daki iktidar değişimlerinin dengbêjler üzerindeki etkisi, anlatıya yansımış biçimi ve epik anlatı türünün ortadan kayboluşu şeklinde ifadesini bulan patronaj sisteminin, kendini yeniden üretme biçimi tartışılmıştır. Günümüzde bu kültürün yeniden üretimi ile ilgili *Mala Dengbêjan* başlığında, güncel bir *Dengbêjler Divanı* örneği ile klasik dengbêjlik arasında benzerlik ve farklılıklar tespit edilmeye çalışılmıştır.



SUMMARY

The aim of this study is to investigate the effect of power which has an undeniable impact on art and literature works. In this study, the relation between art and power has been analyzed on the context of dengbêjs and their supporters. Because they affect emergence and development of oral Kurdish culture, it is possible to categorize them as modern and pre-modern periods based on modernity's impact on Kurdish society. Relation of dengbêjî and patronage has been analyzed in two sections relatively structured by historical and contemporary examples.

In the Introduction, art of dengbêjî, as a part of oral Kurdish culture, has been examined in the framework of *collective memory*, *oral history* and *oral culture* within related literature review. The primary written resources of oral Kurdish culture have been searched and general knowledge about the subject has been provided. Effect of invention of printing on oral and written culture has been analyzed in comparison with similar processes around the world. By doing this, the study aims to investigate the role of printing and technological developments in oral Kurdish culture. The study also examines reasons and results of how cultural and art works have been affected by the socio-political conditions that the Kurdish society had after the 20th century.

In the first part of the study, the historical background of the administrative systems in Kurdistan and the relations between the Ottoman Empire and Kurdish emirates have been analyzed. The art and literature appeared around the emirates have been evaluated in the framework of patronage. The study also provides examples of dynamics shaping the administrative systems of Kurdistan between 16th century and 20th century and dengbêjs who were supported by the Kurdish emirs and hosted in the palaces. With these examples it is discussed that art and power support each other by supporting each other both psychologically and economically. Within that context, the relation between content and scope of production of art and cultural works and political and economic hegemony has been revealed.

In the second part, the transformation of power in Kurdish society from 16th century till 20th century has been analyzed regarding emirs, sheiks and landlords to investigate effect of the transformation on Kurdish literature and art. Meanwhile, excellence characteristics of those individuals in the society, their financial power and role in production of art and literature have also been discussed in this section. Kurdish art and narrative content of dengbêjî are analyzed firstly on the basis of the Kurdish emirates' political and economic hegemony that decreased at the beginning of the 20th century and than of the sheiks who have influence on the society and lastly of the landlords appearing at the end of the century.

Also in this section, the spatial relation between art and power, impact of changing political, cultural and social dynamics on cultural and artistic productions have been discussed under the title of *patronage settings*. Historical and political reasons of why patronage could not fulfill its demands in palaces, village rooms, radios and dengbêj houses which have become important settings for experiencing art are examined. Re-production of patronage system that has been affected by power shifts in Kurdistan on dengbêjs, forms of narration and disappearance of epic narration is also discussed in this part. Related to the contemporary production of this culture at Dengbêjs' Houses, the differences and similarities between contemporary example of Divan of Dengbêjs and traditional dengbêjî have been identified under the subtitle of *Mala Dengbêjan*.



Key Words: Kurd, Kurdish Oral Culture, Dengbêj, Patronage

PÊŞGOTIN

Di çêbûn û belavbûna kulturê de gelek faktor hene. Kultur bi tenê bermayiya rabirdûyekê nîn e, her wiha ji bo afirandina dahatûyê jî wekî embarekê ye. Di nav wê embarê de hin tradîsyonên keşfkirin, hin jî tîn îcatkîrin. Hunera dengbêjîyê, ji ber ku bi gotinê tê afirandin û aîdî gel e, ji aliyê lêkolînerên biyanî û rewşenbîrên kurdan ve wekî bingeha kultura kurdî tê qebûlkirin û aliyê wê yê romantîk temsîl dibe. Li gor wê nêrînê, kultura gel û nemaze jî dengbêjî, kultureke eslî ye, dest lê neketiye û lewma jî referansên arkaîk lê tê barkirin. Helbet di şîrovekirina kultura dengbêjîyê de sedemên gelek cuda hene. Dema ku mirov li xebatên derbarê dengbêjîyê de dinihêre, xuya ye ku ew xebatên pêşîn ên berhevkerinê ne. Lewma jî lêkolînên derbarê temayên berhemên dengbêjîyê de, analîzên performansa dengbêjan û sedemên ku di afirandina vê hunerê de esas in, hê jî kêmtir in.

Di hunera dengbêjîyê de gelek faktor hene ku, hem afirandina wê kulturê pêk anîn e, hem jî tesir li ser naverok û îcrakirê wê kulturê kirine. Me di vê xebatê de pêwistî pê dît da ku aliyê dengbêjan û wan kesên ku ji wan re hamîtî kirine derxin meydanê. Di hin berhemên dengbêjîyê de eleqeya dengbêjan û hamiyên wan, di hin stranên de aşkera dibin. Dengbêjan di stranên xwe de behsa wan kesan jî dikir û ev yek ji bo vê lêkolînê bû motîvasiyona herî mezin. Lê ji ber ku dengbêjî kultureke gel e û kultura gel di nezera sinifên arîstokrat de xwedî eleqeyeke mezin nîn e, hin kêşeyên esas di çarçoveya teze de rû didan. Helbet di lîteraturê de patronaja edebî û hunerî xwe disparte hêzeke siyasî û aborî ya patrîmonyal. Lê rewşa siyasî û aborî ya civaka kurdan jî vê kontekstê dîr bû û ev yek di warê lîteraturê de jî bû sedema hin kêşeyan.

Di destpêkê de, ji nû ve me pêwistî bi lîteratura kultura devkî, dîroka devkî û hefizeya civakî dît ku, cihê dengbêjîyê di nav wê formulasyonê de diyar bikin. Ji bo wê jî ew çavkaniyên sereke yê derbarê van mijaran de hatin kontrolkirin û agahiyên pêwendîdar di nav konteksta hunera dengbêjîyê de hatin nixandîn. Ji ber ku hunera dengbêjîyê mijareke populer e, derbarê wê de van salên dawîn hin lêkolîn hatine kirin û bi tîra xwe lîteraturek hatiye avakirin. Di afirandina berhemên dengbêjîyê de faktorên kultura devkî û dîroka devkî, taybetmendiyeke vê lîteraturê bi xwe ye. Zêdebûna îmkânên nivîsê, îcatkirina çapxaneyê û qonaxa avakirina nasnameya milî, tesireke esas li ser cudabûn û guherîna kultura devkî kir. Lewma jî di vê beşê de cihê dengbêjîyê ya di nav kultura devkî de hate kîşfkirin û sedemên ku bandora xwe li ser geşedana wê kirine hate hêlengandin.

Di beşa yekemîn de her çend bi awayekî sîstematîk nebe jî, ji ber ku hamîtî li dengbêjan kirine, me aliyê mîrektiyên kurdan a îdarî ji bo paşxaneyê tarîxî vekolandin. Ji ber ku

xebatên derbarê mîrektiyên kurdan de hem kêma in, hem jî bi nêrîneke “ji derve” tîn nirxandin, hin problemên metodolojîk rû didin. Her wisa, di warê îdarî de encamên dînamîkên navxwe û derve, rewşa pozîsyona mîrektiyên diyar kiriye û ew yek tesira xwe li ser eleqeya wan a huner û edebiyatê jî kiriye. Ji bilî wê, îro arşîvên mîrektiyên kurdan ne berdest in, lewma jî mirov nizane ka rewşa wan a îdarî, çawa di çavkaniyên wan de hatiye îfade kirin. Têkiliyên wan ên navxwe yê bi mîrektiyên din re bi çî awayî bûye, pêwendiyên dewleta osmaniyan û safewiyan, di nezera wan de û li gor polîtîkayên wan li ser çî esasî hatiye meşandin, em nizanin. Li gor lîteraturê heyî û qismek jî mirov dikare wê lîteraturê wekî “ji derve” binirxîne, ev rewş hindî pêkan bû hate vekolandin, aliyê wê yê bi problem jî hate destnîşankirin.

Di beşa duyemîn de û mirov dikare wê wekî beşa esas jî bi nav bike, paşxaneyê têgeha patronajê û tezahurên wê yê li ser edebiyatê û hunerê hate gengeşekirin. Di vê beşê de nemaze rola mîran û axayan, di geşepêdana kultura dengbêjiyê de, li dor nimûneyên stranan hate vekolandin. Ji bilî kultura dengbêjiyê, hin nimûneyên edebiyata klasîk jî, ji bo paşxaneyê patronajê û hate nirxandin. Di vê beşê de jî hin problemên sereke hebûn ku di warê metodolojîyê de dibûn sedema arîşeyan. Di tradîsyona dengbêjiyê de gelek stran hene ku mijara wan mîr û axa û giregirên civakê ne. Gelek karakter hene ku, çarçoveya stranan li ser wan hatiye avakirin, lê derbarê wan de çavkaniyên nivîskî pirr kêma û agahî zêde nîn in. Helbet ji derveyî belgeyên tarîxî û çavkaniyên nivîskî, ji bo xebatên kurdî rêbazeke nû divê û di nav wê rêbazê de metodên alternatîf divê bîn gengeşekirin. Her wisa ji ber kêmbûna çavkaniyan rola wan kesan, di nav kompozîsyona stranan de zelal nîn e. Di vê xebatê de jî kêşeyên heman rengî ihtîmal e, lê hindî pêkan bû, naveroka wan stranan bi çavkaniyan hate ravekirin. Dema ku mirov li stranan dinihêre, di stranan de guherîna rewşa civakî jî diyar dibe û rewşa sîstema patronajê jî. Di gelek stranan de mirov dikare rewşa *çêbûn*, *belavbûn* û *nûbûn* stranan fehm bike. Di vê xebatê de ev veguherînên civakî û sîstema patronajê bi awayekî kronolojîk ji mîran ber bi axayan hate tespîtîkirin û tesira wan a li ser dengbêjiyê hate nirxandin.

Di beşa sêyemîn de, ji bo ku di hîmayekirina dengbêjan û îcrakirina hunerê de roleke wê heye, me pêwîstê pê dît ku cîgehên hîmayekirinê jî di peywenda patronajê de vekolîn. Her wisa qesr û qonax, odeyên giregirên gundan, radyo û saziyên wekî mala dengbêjan, di warê îcrakirina dengbêjiyê de rolek lîstine. Di sedsala XXan de, ji bo avakirina nasnameya kurdî, hin hewldanên siyasî û rewşenbîrî pêk hatin û meylên xwendina kultura kurdî zêdetir bû. Di dîroknûsiya kultura kurdî de dengbêjî wekî bingeha kultura kurdî û aliyê wê yê romantîk hate formule kirin. Rewşenbîrên kurd ên wekî Celadet Bedirxan, di qonaxa kovara

Hawarê de, ji ber ku kultura gel û tradîsyona dengbêjiyê wekî bingeha kultura kurdî didît, pêdivî bi berhevkirina stranên dengbêjan dît û dengbêjen wekî Ehmedê Fermanê Kîkî li cem wî bûn. Ev yek di qonaxa sîstema hîmayekirinê de nîşaneyê veguherîneke esas bû. Êdî mirov dikare bibêje ku kultura dengbêjiyê, digel vê qonaxê gehiştê merheleyeke siyasî. Pûtepêdana wê kulturê jî, di peywenda avakirina nasnameyê de hate pê. Her çend bi awayekî sîstematîk nebe jî, di radyoyan de jî li gorî berjewendiyên siyasî yê navdewletî, patronajek pêk hat. Gelek dengbêjan bi saya radyoyê bi nav û deng bûn û hunera dengbêjiya xwe ji nû ve afirandin. Îro jî li mala dengbêjan, bi motîvasyonên vejandina kultura “arkaîk”, hunera dengbêjiyê hem gehiştîye qonaxê siyasî û hem jî wesfekî wê yê sazûmanî heye. Di vê beşê de xalên werçerxê yê vê hunerê di konteksta mekanê de hate gengeşekirin û agahiyên derbarê lîteraturê hatin neqlkirin. Lewma jî li ser zemînê mekanê, veguherînên temayên hunera dengbêjiyê, cudabûna sîstema patronajê û tesira îmkanên nivîsê û amûrên teknolojiyê yê li ser vê hunerê hate vekolandin. Ji bo ku çarçoveya vê guherînê diyar bibe, me di dawiyê de performanseke mala dengbêjan li xebatê zêde kir.

Ev xebat, ji ber kêmasiya çavkaniyan û xebatên bi vî rengî, metodolojiya xwe “di nav xwe de” diafirîne. Her wisa, ji rêbazên dîsîplînên zanistên civakî jî sûdê werdigire. Di amadekirina vê xebatê de ji bo alîkariya wî spasîyê bo cenabê şewirmendê xwe Doç. Al. Dr. Hayrullah Acar dikim. Wî, xebata min digel kêmasiyên wê xwend û pêşniyazên girîng ji bo kamilkirina tezê pêşkêş kir. Dîsa mamostayê Zanîngeha Mardin Artukluyê Remezan Alan, di diyarkirina babeta tezê û dirustkirina çarçoveya tezê de gelek alîkariya min kir û spasî bo cenabê wî. Ramazan Pertev, ku ew jî mamostayê Zanîngeha Mardin Artukluyê ye, di teza min de gelek kêşe û kêmasiyên min nîşanî min da û di kamilkirina tezê de keda wî jî hêjayî spasîyê ye. Mustafa Aslan ji bo çarçoveya mîrekiyên kurdan û eleqeya wan a hunerê, pêşniyazên hêja kirin û spasî bo cenabê wî jî. Her wisa di destpêka pejirandina mijara xebatê de, ji bo alîkariya wan spasîyê bo cenabê Prof. Dr. Kadri Yıldırım û Doç. Dr. Abdurrahman Adak jî dikim.

Ji bo dirustkirina çarçoveya teza min, rêkûpêkkirina aliyê wê yê teorîk û peydakirina hin çavkaniyan spasîyê bo cenaba mamostaya Zanîngeha Boğaziçiyê Prof. Dr. Arzu Öztürkmen jî dikim. Dîsa rexneyên Doç. Alk. Dr. Selim Temo, ji bo çarçoveya xebata min sûdwar bû. Bi pêşniyazkirina hin çavkaniyan û di avakirina metodolojiyê de keda wî jî çêbû û spasî bo cenabê wî jî.

KURTEBÊJE

- bnr. : binêre
b.n. : berhema navborî
BOA : Başbakanlık Osmanlı Arşivi (Arşîva osmanî ya Serokwezîrtiyê)
b.z. : berî zayînê
c. :cild
h.b. : heman berhem
j. : jimare
K.T. : Komara Tirkiyeyê
m. : mirin
p.z. : piştî zayînê
r. : rûpel
t.ç. : teza çapnebûyî
vgz. : veguhêzer
wer. :Wergêr
weş. : Weşanxane

DESTPÊK

DI ÇARÇOVEYA KULTURA DEVKÎ Û NIVÎSKÎ DE, KAWDANA GOTIN Û NIVÎSÊ

Kawdana Gotin û Nivîsê

Kultura devkî ku dengbêjiyê jî di nav wê de ye, di van salên dawî de bûye mijara gelek lêkolînan. Lêkolînên ku di nav vê dîsîplînê de jî diyar dikin ku dê heta demeke dirêj jî di nav derûdorên akademîk de zêdetir bête gengeşekirin. Ev gengeşên ku derbarê kultura devkî û nivîskî de têne kirin, xwe dispêrin cudahiya fonksiyona *nivîs* û *gotinê* ya ku tesireke muhim li ser geşedanên kulturî kiriye. Helbet wan faktorên ku ev cudahî zêdetir kirine, îcatkirina çapxaneyê û karîgeriya wê ya li ser çalakiyên kulturî ne. Modernîzm an jî geşedanên sedsala XXan tora xwe ya enformasyonê li ser malûmatên nivîskî ava dikir û destpêka medeniyetê disperte serdemên îcatkirina nivîsê. Îro jî wekî şêweyekî şîroveya dîroknûsî/historiography; keresteyên nivîskî wekî bingeha şaristaniyetê tête qebûlkirin.¹ Her wiha, şîroveya dîroknûsî ya bi vê şêweyê destpêka medeniyetê dispêre Sumerên ku di salên B.Z 3500ê de nivîsa bizmarî îcad kirine. Wekî din, nivîs aksiyoneke sînî ye û ji aliyê mirovan ve bo têgehiştineke qewî hatiye îcadkirin. Pêwendiya di navbera gotin û nivîsê de; mirov dikare bibêje ku li ser cudahiya tiştêkî *mevcûd* û *sînî* xwe aşkera dike. Bi vê nezerê, nivîs; ji bo temamkirina prosesa îfadeyê/discourse heye û ji wê motîvasyonê îro geştiye dereceyeke bilind. Helbet sedemên ku fonksiyon û cihê nivîsê ya dereceya îro diyar kirine, gellek in. Lê tiştê ku vê xebatê eleqedar dike ew e ku, nivîs û gotin, tesirên çawa li ser bizavên kulturî kirine, pêkole bike.

Cudahiya strukturel a di navbera kultura devkî/zarekî û kultura nivîskî de, di peywenda muxatabên van her du kulturên ji hev cuda de jî, bûye sedema hinde cudahiyan fikrî û tecrubeyên civakî. Sedema van cudahiyan, fikrandina ku ji taybetmendiya karakterê nivîs û gotinê aşkera dibe. Her çend nivîs sistemeke herfan, qeydkirin û her wiha neqlkirina tecrubeyan be jî, ew kes/grûbên ku wê bikartînin, xwedî karektereke ji hev cuda dibin. Wan her duyan jî li ser esasên du pratîkên cuda, encamên îfadekirinê û tecrubeyên cuda derxistine. Ev pêwendiya nivîs û gotinê, ne dijberên hev in. Her duyan jî wekî nosyonên cuda di geşedan,

¹ Ji bo vê behsê, gengeşeyên di navbera Lévi-Strauss û Jacques Derrida, muhim in. Strauss karîgeriya nivîsê ya li hemberî gotinê, di nav konteksteke kolonyal de rave dike û wê wekî enstrumanekê mêtîngeriye li hemberî civak û komên biyanî dinirxîne. Li hemberî Strauss; Derrida, van tespîten Strauss ên "otantîk" red dike û wan wekî îlûzyoneke romantîk dinirxîne. Ji bo gengeşeya di navbera Lévi-Strauss û Jacques Derrida bnr: Madan Sarup, *Post-Yapısalcılık ve Postmodernizm*, Wer: A.Baki Güçlü, Weş. Ark, Ankara, 1997, r. 55-69

guherîn, têkçûn û werçerxîna hevdu de tesir li ser hevdu kirine. Di vir de divê gotin û nivîs, wekî du nosyonên li dijî hevdu neyê formulekirin. Mirov dikare bibêje ku gotin û nivîsê di çêkirina îfadeyê de, bandor li ser hevdu kirine û di encamê de, bûye sedema çêbûna kuliya teke cihêreng.

Dema ku mirov li dîroka mirovayeti dinihêre, dîtina/îcatkirina nivîsê gelek dereng rû daye. Antropolog; *Homo Sapiensê* (mirov) teqrîben bi 50.000 hezar salan sînor dikan. Lê nivîs û destxeta bizmarî, ji aliyê Sumeriyan ve hatiye îcatkirin û teqabûlî salên 3500î tê.² Ev yek fonksiyona gotinê, ya di jiyana mirovahiyê ya di pêşdemên nivîsê de bi awayekî aşkera nîşan dike. Anku mirov dikare bibêje ku ji salên beriya mîlatê 50.000 hezarî heta 3 500î, yanî teqrîben 46.500 salî mirov bi nivîsê re eleqeder nebûne û di nav jiyana û alemê deng û gotinê de jiyane. Her çend nivîs teqrîben 5.500 sal berî niha hatiye îcatkirin jî, îro gellek civak hê jî ne xwendewar in. Nivîs her çend ji aliyê Sumeriyan û li Mezopotamyayê hatiye îcatkirin jî, îro gelek civakên li Mezopotamyayê dijîn, hê jî bi nivîsê re zêde eleqedar nîn in û karûbarên wan di nav sîstemeke devkî de çêdibe. Gelên ku li Mezopotamyayê dijîn ji ber gellek sedemên ji hev cuda, xwedî pratîkên devkî bûne.³

Pêwendiya nivîs û gotinê, ya diyalektîk⁴ ji mijûlahiya (cehd) mirovan a digel tebîetê qewimiye. Bi îcatbûna nivîsê, zanîn⁵ cara yekem ji aliyê mirovan ve hatiye “komkirin”, “neqlkirin” û “parastin.” Nivîs cara yekem ji aliyê mirovan ve, bo hesabên têkel, wekî kareke hêsankirinê hatiye îcatkirin û ji pêdiviyên rênçberiyê derketiye. Nivîsa ku yekem car ji aliyê Sumeriyan ve hatibû tecrubekirin, li gor fikr û hîpoteza arkeolog Denise Sshmandt-Besserat, bo qeyd û tomarkirina hesabên rênçberiyê û muhasebeyên debr û berê û ajotvaniyê hatiye îcatkirin.⁶ Lêbelê, beriya rêkûpêkkirina alfabe, hinde teşebisên sîstema nîşaneyan a herf û sembolan hatiye îcatkirin. Ev hesabên rênçberiyê, bingeha sîstema alfabe ya neolîtîk pêk tîne. Her wisa, geometrî jî, xwe dispêre *geo* û *metrîyê* anku “pîvandina erd”ê û ji pêdiviyên ekonomiya siyasî rû daye. Piştî şoreşa neolîtîkê (B.Z. 8000-5500), zêdebûna debr û berê, bi xwe re sinifeke keşîş/rehîb û rêvebiran peyda kir. “Vê sinifê, B.Z. di salên 3200an de elfabe,

² Ji Diringer David vgz. Walter J. Ong, *Sözlü ve Yazılı Kültür*, Wer, Sema Postalcioglu Banon, Weş. Metis, İstanbul, 2007, r. 103

³ Abidin Pariltı, *Dengbêjler Sözüün Yazgısı*, Weş. İthaki, İstanbul, 2006, r. 15-16

⁴ Di vir de qesta ji diyalektîkê; ew prosesa ku ji dijberiya (tezaad-antonîm) lêkdana fikrekî, guherîna civakê an veguherîna bizavê ya ne sabît (ne westar) e. Faktora ku, tesirê li ser cudatiya bizûtneweyê/heraketê dike, bi xwe ye. Gotin û nivîs jî, du bizavên ji hev cuda ne û faktora ku cudatiya wan eyan dike, dijberiya wan e û her du jî taybetmendî û karakterê serdemên ji hev cuda nîşan dikan.

⁵ Di vir û sertaserê metnê de, ji bo *bilgiya* tirkî û *informationa* îngilîzî “zanîn” hatiye bikaranîn. Herçend îro ew di konteksteke modern de ji bo zanînen teorîk/sîstematîk hatiye formûlekirin jî, di civakên ne xwendewar de, beramberî zanînen ampîrîkê.

⁶ Osman Doğu Bingöl, *Günümüz Kent Yaşamında, Sözlü Kültürün Yeni Sanatsal İfade Aracı Olarak Kullanımı*. YTÜ Sosyal Bilimler Enstitüsü, r. 10, t.ç.

matematîk, nivîs û salname pêşxistibû.”⁷ Belê her çend ev kawdana dîroka pêşveçûna kuliyata nivîsê, di destpêkê de pêwendî bi muhasebeyên rênçberiyê hebin jî, di reh û karakterê hemû civakan de kuliyata kultura devkî her heye û di gelek tecrubeyên wan de jî her diyar dibin. Di çêbûn û înşakirina pênaseya kulturî de, vê kultura devkî bi teşebis û daxwazên dîsîplînekirî her tim, bingeha kultura netewî ava kiriye. Mirovên ku xwe aidî civakekê dibînin, di warê nîrx û qiymet, bawerî, bîr û boçûn, exlaq û şiklê jiyânî ve xwe her tim li ser esasên kultura devkî ava dikin.⁸ Nivîs û tecrubeya ku li ser lîteratura nivîsê hatiye çêkirin, her çend îcateke dereng/nû û referansên wê aqil be jî, di dirêjahiya dîrokê de bi kodeke estetîk tê sabîtkirin û di înşakirina hefizeya civakî de nosyoneke pir girîng e. Bi saya nivîsê, îro mirov ji dîroka şaristaniyetê û tecrubeyên reng û dengê heyama mirovan haydar in. Her wiha hemû ceribandînan mirovan, piştî wan meşqaleyan, bi awayekî sîstematîk nebe jî hatine qeydkirin û neqlî nîfşên dîtir bûne. Ev yek bibû sedema qeydkirina zanîna û tecrubeyan û edebiyat, helbest, felsefe, kultur û hunerê; lewma jî çalakiyên bi vî rengî ji geşedanên vê prosesê kamil bûn.

Nivîs; li gor tecrubeyên miletan ên dîrokî, civakî, aborî û hunerî, di demên curbicur de, li gor pêdivî û tecrubeyên ji hev cuda hatiye îcatkirin. Her çend nivîs, di şert û mercên îro de li gor pêdiviyên geştiyê dereceyên bilind û ji bo tevahiya mirovan wekî nîşaneyên nosyoneke hevpar bê formulekirin jî, hemû millet di heman serdemê de, bi heman motîvasyonî, pêwendî bi nivîsê re danên e. Her ji ber wê jî, nivîs; di form û teşeyên cuda de, ji aliyê mirovan ve, ji bo pêdiviyên ji hev cuda, di deverên curbicur de ji bêyî hevdu hatiye bikaranîn. Nivîs berî her tiştî hinde sembol û nîşaneyên beramberî pêdiviyên mirovî tê û rîyeke ragihandin an muhasebeyê ye. Li gor agahiyên îro tê qebûlkirin, nivîs cara yekem li Mezopotamyayê, di dema B.Z. û teqrîben 3500an de hatiye îcatkirin. Ev nivîs wekî nivîsa bizmarî/mixî tê qebûlkirin. Hiyeroglîfa Mîsîrê, ku di salên B.Z. 3000an de hatibû îcatkirin jî, dibe ku ji tesira nivîsa bizmarî ya Sumeriyên hatiye îcatkirin. B.Z. 1200an de, nivîsa Mînos an Mîkenai ku wekî nivîsa “Xêza B”; B.Z. Di navbera salên 3000 û 2400’an de nivîsa Hîndû, B.Z. 1500an de Çînî, û piştî zayînê, di salên 1400an de jî nivîsa Aztekan hatiye îcatkirin.⁹

Nivîs; bi taswîreke gelemperî, ji sembol û formên derbirinê anku tomarkirina îşaretên axaftinê pêk tê. Lewma nivîs; her çend îfadeyê bi temamî nehundurîne jî, perçeyek ji derbirinê ye. Ji ber vê jî, nivîs û gotin, divê wekî du nosyonên ji hev cuda li dijberî hevdu neyên formulekirin. Wan her du bizavên cuda jî wekî du qonaxên cuda tesir li ser hevdu kirîne û îro jî hê bi awayekî esasî, ji hev neqetiyane. Ev her du nosyon, hevdu temam dikin û du karakterê

⁷ Ji Joseph Campbell vgz. John Zerzan, *Gelecekteki İlkel*, wer. Cemal Atila, Weş. Kaos, İstanbul, 2000, r. 92

⁸ İsmail Görkem, *Halk Hikâyeleri Araştırmaları*, Weş. Akçağ, Ankara, 2000, r. 4

⁹ Abidin Pariltı, b.n., r. 16

kulturî yê cuda nîşan dikin. Lêbelê her çî be jî, îfade û derbirina nivîskî xwe her li ser paşxaneyê devkî ava dike. wekî Saussure jî dibêje, “nivîs, bi tena serê xwe, hem sûdwar, hem nebes, hem jî bi talûke ye.” Her wiha li gor Saussure, nivîs; bi tena serê xwe faktoreke wisa ye ku şeweya fikrandinê naguherîne û derbirinê an axaftinê bi tenê tamam dike, ye.¹⁰

Her çend, kuliyata nivîsê, ji paşxaneyê cuda ya dîrokî, civakî û psîkolojîk sûd werbigre jî, îro di şert û mercên heyî de, beramberî sosyolojî û rasyonallîteyê cuda tê. Ev her du mefhûm ji heman keys û derfetan durist nabin. Çimkî, nivîs; xwe dispêre lîteratûrê û tecrubeyên zanyarî tomar dike. Ev ceribandinên ku di çarçoveya îmkanên nivîsê de derketiye jî neqlî nîşên din dibe. Lîteratura nivîsê her ji ber vê yekê, lîteratureke berfireh, rêkûpêk û xurt e. Her çend civakên ku di nav alemeke gotinê de ne, tecrube û zanyariyên kolektîf/hevpar, bi riya hefizeya kolektîf neql û qeyd bikin jî, ew wekî nivîsê, xwedî sîstemeke rêkûpêk nîn e. Ev yek jî cudahiyan struktural ên di navbera gotin û nivîsê aşkera dikin. Gotin, zêdetir di nav sîstemeke estetîk de dermale dibe û lewma jî, ji bilî hinde qaîdeyên zimanî, gotin; xwe ne li gor dahatûyê, berovajî wê li gor hêmanên heyî û tasawurên heyî xurt dike. Xuya ye ku, nivîs û gotin, şeweya estetîk bigre heta hefizeyê, fikra analîtîk û heta meşqaleyên mêtî, bûye sedema gellek cudahiyan. Her çend îro di halê heyî de, diyalektîka gotin û nivîsê, ji hevdu neyê terxankirin jî, wekî encam ew ji hev cuda bûne û bo nimûne “fîrkirina biyanî, di nav xwe de, rêkûpêk e, lê ji bo xwe nafikire.”¹¹ Fîrkirin, wekî di gelek nimûneyên devkî de jî aşkera dibe, di nav xwe de analîtîk û sîstematîk e. Di gelek civakên ku jiyana xwe bi formulasyona gotinê ava dikin de jî, giregirên/zanyarî wan civakan ên ku waqîfî zanînen ampîrîk in, ji aliyê wan civakan ve wekî zana û şareza tene qebûlkirin. Lêbelê kêşe û girîftiya herî mezin a kultura devkî ew e ku ev kesên ku wekî zana tene qebûlkirin, van zanînen û tecrubeyên xwe nikarin sîstematîze bikin û ji rê û rêbazên lêkolîn û lêgerînê mehrûm in. Her ji ber vê yekê jî, ew nikarin zanînen û tecrubeyên xwe di ilmên modern de bi kar bînin.

Îro, ew mîletên ku jiyana wan di nav formulasyona nivîsê de avabûyî, êdî geşedanên teknolojiyê jî bo hêskirina jiyane tecrube dikin. Çawa ku di demên pre-modern de, gotin û efsûniya gotinê di dema xwe de xwedî giramiyê hêja bû, di demên modern ên karîgeriya çapxaneyê xurt e jî, nivîs xwedî giramiyê qedirbilind bû. Lewma ew ji bo muxatabên xwe mefhûmeke fonksiyoneltir tê qebûlkirin. Ev geşedanên bizavên kulturî, peyderpey pêk hat û

¹⁰ Ji Ferdinand de Saussure vgz. Walter J. Ong, *Sözlü ve Yazılı Kültür*, r. 17

¹¹ Oliver Abel, *Lévi-Strauss'un Antropolojik Yapısalcılığına Yaklaşım Lévi-Strauss, Irk ve Tarih*, wer. Işık Abel, Weş. Metis, İstanbul, 1985, r. 24

fonksiyona nivîsê di sed sala XIX. ji aliyê zana û lêkolera gellek hate gengeşekirin.¹² Çimkî îro, di halê heyî de, îdare û kontrolkirina zanîn û ilmê, bi rêka xurtkirina lîteratura nivîsê pêkan e. Ev yek, tecrube û berhemdariya hunerî, kulturî û edebî ya ku aîdî civakên devkî, ji holê ranake. Ji bilî wê hewl dide da ku dînamîkên wan civakan fehm bike. Têkiliya nivîs û gotinê ya ku ji gotinê werçerxî nivîsê bûye, hindî em pê dizanin, di jiyana civakî de bûye sedema têgehên hêja yê ku di jiyana mirovan de cih girtiye. Derbarê geşedanên van bizavên kulturî de Florence Duppont wiha dibêje:

“Ev pêwendî, bo nivîsê, îro bûye sedema damezrandina dîsîplînen wekî mantiq, felsefe, teknoloji, huner û demokrasiyê. Bi riya kuliyata nivîsê, mirovahiyê tecrubeyên xwe neql kirin û gehîştin têgehên wekî demokrasi, tarîx, edebiyat, felsefe û hunerê. Ji ber van geşedanên dîrokî ya ku bandora wan li ser têgehên îro ne jî, pêşiyê Yewnanîstan, piştî Roma, ji efsaneyan, dij-aqiliyê, dîn û ji barbariyê rizgar bûn û ji nezaniya skolastîka Serdema Navîn bi dûr ketin.”¹³

Ev nêrîn û perspektîf, her çend, nivîsê li hemberî gotinê bi avantajtir nîşan bike jî, beriya ku nivîs nehatibû îcatkirin, wezîfeya ku nivîs îro dibîne bi riya gotinê pêk dihat. Ev hemû çalakiyên ilmî, hunerî û edebî, bi rêya gotinê pêk dihat û berhemdariya kulturî bi wî awayî dihate kirin. Di gelek sehayên zanistî de bo nimûne li cem yewnanan, felsefe bi awayekî devkî dihate kirin, di mekteban de bi rêbazên gotinê çarçoveya wê dihate neqlkirin. Wekî din, tradîsyona yewnanî ya siyasî û demokrasiya yewnanî, li ser dîskûreke devkî hatiye damezrandin. Nivîs bi tenê, di nameyên balyoz û qasidan, di dozên wê demê de û di belgeyên şahidan û qanûnên yewnanan de dihate bikaranîn.¹⁴

Di nav civakên devkî û yê ku nivîsê tecrûbe dikin de, derbarê têgehîştina dinyayê û derbirina wê de hinde cudahiyan struktural hene. Ev cudahî, yekser, di şeweyê zanînê û rêbazên ku pêwendiya mirov bi zanînê ve aşkera dike de nîşan dibe. Divê mirov berî her tiştî diyar bike ku, cudahiya sînorê kuliyata kultura devkî û kultura nivîskî, ji *ziman* cuda dibe. Dînamîka zimanî, veguherînên van her du kulturên ji hev cuda biserûber dike û sînorê çarçoveya wan zelal dike. Muxatabên van her du kulturên cuda, zêdetir di cudahiya derbirinê zimanî de aşkera dibin û temsîliyetên wan ên kulturî jî, cur bi cur in. Civakên ku bi zar an gotinê difikirin an xwe îfade dikin, di alemeke, *deng* de dijîn. Ew civakên ku bi nivîsê jiyana xwe ava dikin jî, di alemeke *dîtinî* de dijîn. Civakên ku wekî modern tene qebûl kirin, çî bibînin an bi çavên xwe rastî çî bîn, baweriya xwe bi wê tînin. Lêbelê ew civakên ku bi

¹² Marc Auge-Jen Paul Colleyn wer. İsmail Yerguz, *Antropoloji*, weş. Dost, Ankara, 2005, r. 92

¹³ Florence Duppont, *Edebiyatın Yarattığı, Yunan Sarhoşluğundan Latin Kitabına*, wer. Necmettin Sevil, weş. Ayrıntı, İstanbul, 2001, r. 15.

¹⁴ H.b. r. 19

gotinê jiyana xwe didomînin jî, çi bibihîzin, baweriya xwe bi wê dînin. Di nav civakên devkî de organa bihîstîne ya esas, *guh* e. Li berovajî wê çav, organê nîşaneya îradeyê ye.¹⁵ Ji bo civakên devkî girîngiya *guh*, şiklê fikrandina wan jî diyar kiriye. Her çend îro, ew kultur û kuliya di nav xwe de li gorî hizra modern wekî analîtîk neyê dîtin jî, dîsa jî di çarçoveya derbirinê û sînore îfadekirinê de sentetîk e. Muxatabên vê kulturê, berî her tiştî, ew pêwendiyên civakî yên aloz, bi sînora û derfetên kultura devkî fêm dikin. Derbarê vê babetê de “Gundiyeke ku ne xwendewar be û bi kîlometreyan dûrî bajarekî be, bi awayekî kubar, bêtevger û *ji bo xwe* di nav alemeke bêhempa de dijî. Lê dîsa jî, di sîstemên zimanî yên curbicur de dijî; bi zimanekî duayên xwe bo Xweda dike, bi zimanekî di stranên dibêje, bi zimanekî dîtir jî, li gel malbata xwe û derûdora xwe pêwendiyê datîne. Dîsa bi riya katîbekî, ji hêzên herêmi re daxwaznameyan dişîne û bi zimanekî çaremîn jî pêwendiyên xwe xurt dike.”¹⁶

Cudahiya esas a kultura devkî û ya nivîskî, bi taybetî jî bi îcatkirina çapxane û belavkirina kitêban ve rû daye. Bi îcatkirina çapxaneyê re kitêbên zanistî, edebî, dîni, kulturî, pir zû belavî nav mirovan bûn. Bi wê re ilm û zanîn belav bû, bi xwendina kitêban ve, karakterê têkiliyan guherî û belavbûna zanîne jî her hêsantir bû. Li Ewropayê, îcatkirina çapxaneyê, karîgeriya zanistê zêdetir kir û felsefe û zanist ji bindestiya otorîteya sinifên dîni rizgar kir.¹⁷ Bi îcatkirina çapxaneyê re, zanîn û ilm ji destê wê grûba dîni derket û belavî nav xelkê bû. Ev merhele, di neqlbûna kultura devkî ber bi sefheyeke nivîskî, wekî xaleke werçerxê ye. Çapxane, di heman demê de bi heman awayî, ji aliyê miletan ve nehat bikaranîn. Lewma jî encamên wê jî, li ser miletan bi awayekî curbicur bû. Çapxane, li gorî şert û mercên siyasî, kulturî û dîrokî, tesireke pîralî li ser civakan kir. Her millet, di heman prosesê re derbas nebûn û lewma jî, tesira îcatkirina çapxaneyê, tesireke hevpar li ser kultura dinyayê nekir. Îcatkirina çapxaneyê di sefheyên curbicur de tesireke pozîtîf li ser zanyariyê kir û bû sedema gelek boçûnên fikrî, hunerî û dîni. Her wiha îro, di halê heyî de, nosyonên wekî *neteperwerî* û *ronîbûn*, bi geşedana îmkane çapxaneyê re, din av miletan de berbelavtir bû.¹⁸ Bi îcatkirina çapxaneyê re, gelek kitêb û destxet hatin çapkirin û ew bi lez belavî nav mirovan bûn. Ev

¹⁵ Marshall Mc Luhan, *Gutenberg Galaksisi*, wer. Gül Çağalı Güven, Weş. YKY, İstanbul 2001, r. 29

¹⁶ Mikhail Bakhtin, *Karnavaldan Romana*, wer. Cem Soydemir, Weş. Ayrıntı, İstanbul, 2001, r. 73-74

¹⁷ ber. Alev Alatlı, *Batıya Yön Veren Metinler*, (*Aydınlanma/ Burjuvazi Yüzyılı/Bilim Çağının Zaferi 1650-1800*) Cild 3, Weş. İlke Eğitim ve Sağlık Vakfı, Nevşehir, 2011, r. 972

¹⁸ Ji bo vê behsê, Benedict Anderson, di kitêba xwe ya bi navê *Imagined Communities* (Cimaetên Muxayyel) de, îcatkirina çapxaneyê, digel sazkirina xerîteyên milî û muzexaneyan, yek ji hêmana herî girîng a bo avakirina nasnameya netewî dibîne. Bi qewlê wî, weşangeriya kapîtalîst (print capitalism) piştî rûdanên têkçûna împaratoriyan û şoreşa endustriyê, pêwendiya mirovan zêdetir kir û ev yek bû sedema avakirina têgehên hevpar di navbera miletan de. Çapxaneyê, ew bingeha ku îro netew-dewlet li ser wê avabûne, di dirêhajiya dîrokê ya du sed salên dawîn de belavtir kir. Bnr. Benedict Anderson, *Hayali Cemaatler, Milliyetçiliğin Kökenleri ve Yayılması*, wer. İskender Savaşır, Weş. Metis, İstanbul, 2009

îcata ku tesireke esasî li ser kulturê kir, piştî sedsala XV û XVIan heta îro, gelek tecrubeyên cuda jî bi xwe re anîn. Berbalavbûna çapkirina kitêb û destxetan, rêjeya xwendin û nivîsandinê jî zêde kir û zanistên pozîtîf, êdî di nav meydana bêsêrûbin de geş bû. Derbarê vê babetê de Benedict Anderson agahiyên girîng dide me:

“Gelek bizavên me yên dîrokî, ku xwe dispartin neqlkirineke devkî bi îcatkirina çapxaneyê re guherîn. Şeweyê hizirkirina mirovan ji formeke devkî veguherî û hate ser zemîneke nivîs û kaxezê. Bi hezaran kitêb çap bûn û ketin ber destê gel. Bi van pêşveçûnên esasî ve, şoreşa reform û ronansê pêk hat.”¹⁹

Her wisa, wekî Elizabeth Eisenstein di kitêba xwe ya bi navê *The Printing Pres as an Agent of Change* de dibêje; bi saya çapxaneyê, ronansa Îtalî ji sînorê Îtalyayê derket û tesireke berbelav li ser hemû kultura Ewropayê kir û bû ronansê Ewropî. Her wisa, tevgera protestanan a reformê destpê kir û pê re mezheba katolîk, ji xwe re rêgeheke nû vejart. Çapxaneyê, tesir li ser têkiliyên sîstema ekonomiyê jî kir û kapîtalîzma modern bi saya serê çapxaneyê pêşveçû, û li Rojhilata Ewropayê, dewra îcat û keşfan destpê kir. Îcatkirina çapxaneyê, têkiliyên malbatî û xizmatiyê jî guherand, polîtîkayên dewletan cuda kir û bizavên zanistî di nav mirovan de belav kir. Xwendewarî li gor dema beriya îcata çapxaneyê zêde bû û her wisa dîsîplînên modern û zanistekî dînamîk zîl da. Di jiyana civakan de di warê zîhnî de geşedanên esasî û curbicur peyda bûn.²⁰

Îcatkirina çapxaneyê, têkiliyên “desthilatî” jî guherand. Ji ber ku bikaranîna *nivîsê*, li gor dema xwe amûreke kultura serdest bû, encamên wê jî di vê kontekstê diyar dibûn. Îro, nivîs ji bo têkiliyên hegemonîk hê jî kultureke serdest e û karîgeriya wê, encamên wisa didomîne. Lewma jî li hemberî wê, tradîsyon, di rewşeke xeternak de tê qebûlkirin û îmkânên desthilatîyê, ji bo tradîsyonê her tîk diçe. Ev yek jî bi xwe re windabûna gotinê û kultura devkî tîne. Bi vê yekê, tradîsyon; hem bi xwe, hem jî digel muxatabên wê yên ku wê kevneşopiyê dewr werdigirin, di talûkeyekê de ne. Axir her du jî dibin keresteyên sinifên desthilatdar. Divê mirov, tradîsyonê, ji lepê konformîzma sinifên desthilatdar werbigre û vê yekê sertaser ji nû ve ava bike.²¹

¹⁹ Benedict Anderson, *Hayali Cemaatler, Milliyetçiliğin Kökenleri ve Yayılması*, wer. İskender Savaşır, Weş. Metis, İstanbul, 2009, r. 53-54

²⁰ Ong, b.n, r. 140 -141

²¹ Walter Benjamin, *Son Bakışta Aşk*, wer. Nurdan Gürbilek, Weş. Metis, İstanbul, 1995, r. 41-42

Hefizeya Civakî/Kolektîf

Elfabe û sembolên herfan, her çî çend kultura nivîskî temsîl bikin, mirov dikare dînamîka kultura devkî jî, wekî hefizeya/bîra civakî bi nav bike. Wekî di beşên pêşî yên ku li ser cudahiya kultura nivîskî û devkî de jî hatibû gengeşekin, çî şans û firsenda wan mirovên ku jiyana xwe bi dînamîkên kultura devkî didomînin û di nav alemeke *gotinê* de ne, nîn e ku tecrubeyên xwe neqlî nivîsê bikin. Ji ber wê jî, ew tecrubeyên ku li derûdora wan diqewimin, nikarin qeydî sehayeke nivîskî bikin û hemû rûdanên jiyânî û civakî bi rêya hefizeyê tê tomarkin. Li beramberî îmkanên tecrubeya nivîsê, civakên devkî, xwedî rêbazên hefize û hîndekariyê yên curbicur in. Piştî vê gîrîzgaha hefizeya civakî/kolektîf, mirov dikare tiştêkî wiha bipirse: gelo ew kes an civakên ku tiştêkî bi tenê dibihîzin, an rûdaneke dîrokî, bûyerên ku derûdora wan diqewimin bi çî awayî qeydî hefizeya xwe dikin? Çî faktor hene ku bûyerên civakî, piştî gelek salan jî di hefizeya civakî de zindî dihêlin? Çî û kî/ê, dibe sebeb ku ew rûdan neqlî nifşan dibin û her wisa dibe nosyoneke hevpar bo civakekê. Di vir de îhtîmal e ku mirov nikare hefizeyê tenê wekî biwareke *mêjî* qebûl bike. Her wisa hefize mefhûmeke şexsî jî nîn e ku tê de ceribandînen takekesî bihewîne. Bi hemû taybetmendiyên xwe, hefize; ji bilî seheyê şexsî, ji rihê kolektîvîzmê tê dariştin. Ev yek, têgehiştina nosyona hefizeyê, di peywenda kultura devkî de, tîne merheleyeke din. Eger em ceribandînen civakên kultura devkî, wekî kultureke ne-nivîsandî formule bikin, di vir de tiştê muhim ew e ku divê bê diyarkirin; zanîn di nav wan civakan de wekî hefizeyê ye.²² Hefizeya civakî ji bo dahatûyê, xwe pêk tîne û wekî hêmayekê, taybetiyên xwe heye. Ev yek bi awayekî zelal dînamîka kultura devkî aşkera dike. Lewma jî hefize; ji bo civakên ne xwendewar, mîsyoneke qeydkirinê dibîne û di navbera rabirdû û dahatûyê de bizaveke civakî ye. Her çend dê di beşên din de bête gengeşekin jî, di nav behsa vê beşê de, taybetmendiyên kultura *dengbêjîyê* di peywenda hefizeya civakî de zêdetir aşkera dibe. Dengbêj jî di nav hefizeya civakî de, nûnêrê/a neqlkirinên rûdanên civakî ye. Li ser vê babetê di van demên dawî de, hinde xebatên ku pêwendîya hefizeyê û kultura dengbêjîyê pêkole dike, hatine kirin.²³

Derbarê hefizeya civakî de, lîteratura xebatên civakî pir berfireh in. Di nav wan xebatkaran de yek ji xwendekar û şopgerê Emile Durkheim, Maurice Halbwachs e ku, têgeha, hefizeyê, di nav konteksta kolektîf de dibîne û wê ji derveyî nixandînen şexsî/takekesî û

²² Mikhail Bakhtin, *Karnavaldan Romana*, wer. Cem Soydemir, Weş. Ayrıntı, İstanbul, 2001, r.179

²³ Yek ji wan xebatan jî, teza masterê ya Yusuf Uygur e ku pêwendîya hefizeya civakî û dengbêjîyê gengeşe dike. Xebata ku bi navê "*Kültürel Bellek ve Dengbêjlik: Doğu Anadolu'daki Dengbêjlik Geleneğinde Bellek Üretimi*" (Hefizeya Kulturî û Dengbêjî: Di Tradîsyona Dengbêjîyê ya li Rojhilata Anatoliyayê de Berhemdariya Hefizeyê) de Uygur, rola hefizeya civakî di veguheztina berhemên dengbêjîyê de bi awayekî zelal, li gel nimûneyan aşkera dike. Uygur, di xebata xwe de, dînamîka esasî ya ku vê kulturê neql dike, wekî hefizeyê formule dike.

pîskolojîk dinirxîne. Halbwachs, hefizyê yekser wekî hêmaneke civakî dibîne û hemû taybetmendiyên wê dispêre ceribandîna kolektîf. Lewma jî paşxaneya têgeha hefizyê ya epîstemolojîk, li ser esaseke civakî îzah dike. Ew tiştên ku di hefizyê de tên veşartin, temsîlên şexsî nîn in û nemaze ew, di têkiliyên rabirdûyê de pêdiviyên bo însakirina dahatûyê ne. Di vir de tiştê balkêş ew e ku, fonksiyona hefizyê, ne di dema têdeyî de aşkera dibe, her wisa ew ji bo têkiliyên serdestî-bindestî de jî heman wezîfeyê dibîne. Gelo mimkun e ku mirovek wextê tiştê bi bîr tîne, bi temamî ji çarçoveya civakî dûr bikeve. Her wisa ew kes car caran xwe di perspektîfa civakeke aktuel de jî dinirxînin. Di vir de tiştê vê xebatê eleqedar dike, nûnêrên civakî yên bizavên kulturî bi xwe ye. Ew kesên wekî edîb, hozan, zana û kesên di nav civakekê de hatine qebûl kirin, vê yekê temsîl dikin. Ev yek ji bo xebat û xwendinên dengbêjiyê jî, perspektîfê cuda û alternatîfê dide pêşberî me. Halbwachs yadkirin/bîranîn û hefizyê, naspêre bizaveke mêjî û wî wekî netîceya pêwîstiya civakî û şert û mercên jiyanî dinirxîne. Anku mirov dikare bibêje ku tiştê ku çarçoveya hefizyê diyar dike, civak e. Ev yek nayê wê maneyê ku, hefizyê civakî bi serê xwe ye e û li gorî şert û mercên geşedana ber bi dumahîkê ve û encax bi têgehiştina hefizyê ve pêkan e, ji bilî wê tiştê din nîn e.²⁴

Ev nirxandin, pêwendiya wan kulturên devkî ku berhemên xwe li gorî esasên hunerê û edebiyatê diafirînin û tecrûbeyên seyr nîşanî me dikin. Her wiha, filolojiya modern, teknîkên hîndekariyê û hefizyê û gelek dînamîkên wê, li gorî tebîeta kultura devkî têne rêkûpêkkirin. Mirov li ser van agahiyan dikare bibêje ku, wekî dengbêjan, li dinyayê gelek kesên îcrakarên vê kulturê jî, berhemdariyên musîqeyê û yên hunerî li ser van esasên hefizyê îcra dikin.

Hefize bi tenê di berhemdariyên musîqî û edebî de nayê afirandin. Bi vê nêrînê mirov nikare taybetmendiyên vê nosyonê fehm bike. Çimkî hefize, gelek caran, wan bûyerên ku di binehişê civakekê de ûniştine, ji aliyê hinde hozanên wê civakê ve *jinûve* diafirîne û aîdî wê civakê dike. Di kelepûra kurdan de, geh di edebiyata klasîk de û geh jî di edebiyata gelêrî de, nimûneyên ku vê yêke bi awayekî zelal piştras dikin hene. Bo nimûne Destana *Memê Alan* di vê xalê de nimûneyeke balkêş e. Ew destan di nav gel de dihate vegotin û xisûsiyetên kultura devkî nîşan dida lê ji aliyê Ehmedê Xanî ve jinûve li gorî qaîdeyên edebî dîsa hate afirandin bi navê *Mem û Zîn*.²⁵ Her wisa dema ku mirov şopa berhemên devkî di dîsîplînan de dinihêre, têkiliyê berbiçav di navbera berhemên gelêrî û dîsîplînan, nemaze jî edebiyatê de heye. Lewre jî folklor, ji bo edîb û şairan, wekî “çavkaniyên sereke û dewamî” têne hesabandin.²⁶

²⁴ Maurice Halbwachs, *Kolektif Bellek ve Zaman*, Kovara Cogito, j. 50, r. 76

²⁵ Ji bo agahiyên berfirehtir ên derbarê pêwendiya destana Memê Alan û berhema Ehmedê Xanî ya Mem û Zîn bnr, H. Mem, *Mem û Zîn Îdeal, Memê Alan Destan Masal*, Weş. Enstîtûya kurdî ya Stenbolê, Îstanbul.

²⁶ Kadri Yıldırım, Ramazan Pertev, Mustafa Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê kurdî*, Weş. Mardin Artuklu Üniversitesi, İstanbul, 2013, r.38

Dîsa li ser *Evdalê Zeynikê, Siyabend û Xecê, Kerr û Kulîlk* jî berhemên edebî yê modern hatine afirandin.²⁷

Hefîze, biwareke sabît nîn e û her ji nû ve xwe diafirîne, tiştên ku di mêj de qewimîne jî di hefîzeyê civakan de her tim sabît nîn in. Di vir de qest ne ew e ku hefîze her tiştê rabirdûyê vedişêre û neql dike, her wisa berdewamiya/continuity jiyanî bi tenê bi rêya hefîzeyê jî pêk nayê²⁸ û gelek dînamîkên cuda jî hene. Di vê peywendê de guhêrbariya hefîzeyê ya ku eleqeyê bi tiştên niha û berê ve datîne, em dibînin ku, hefîze; ji bo afirandina berhemên gelek nimûneyan di nav xwe de diheve. Hefîze tiştên ku nû diqewimin, ne li gorî formeke nû, her wisa wê bi awayê ku di rabirdûyê qewimiyê diafirîne, lê belê ji nû ve li gorî texeyyula îcrakarên wê bûyerê ava dike. Wekî Jan Assmann jî gotiye; tradîsyon bi tenê bi tradîsyonan re, rabirdû jî bi tenê bi rabirdûyê re tê guhertin.²⁹ Her wisa, mimkun e ku, dengbêj jî, gelek rûdan û tecrubeyên dîrokî, yê ku di hefîzeyê civaka kurdan de mane, li gorî dînamîk û taybetmendiyên wê kulturê, ji nû ve avakirine û di netîceyê de gelek varyantên cureya edebiyata gelêrî, yê wekî dastan, efsane û çîrok afirandine. Çêbûna van varyantan, wekî ku Assmann jî dibêje, fonksiyona hefîzeyê ya ku xwe li ser wan tecrubeyan ava dike, nîşanî me dide. Hêza hefîzeyê, ya beriya qonaxên xwendewariyê, bi tenê ji bo muxatabên wê, pir ecêb e. Parastina zanîna ya ku bûye malê civakê, di jiyana civakî de her tim bi saya serê hefîzeyê zindî dibe. Kesên ku vê wezîfeyê dibînin hene di nav civakan de û bi taybetî hozanan, ev yek anîn e dereceyê bilind. Di afirandina wan tecrubeyan de helbet rola wan kesên ku wê neql dikin jî hene û huner û berhemdariya wan perçeyek ji hefîzeyê wan hozanan e.³⁰

Hefîzeyê kolektîf, xwe li ser rih û ramana kolektîfî ya hevpar û ji aliyê civakê ve tê qebûlkirin diafirîne û bi wî awayê qeydî hefîzeyê civakî dike. Ev tiştên ku qeydî hefîzeyê kolektîf dibin û paşê di jiyana miletan de wekî norm tên pesindkirin, xwe naspêrin yasayên nivîskî. Lewma jî, çî peymanekê civakî nîn e ku jiyana mirovan, bi yasayên civakî rêkûpêk bike. Ev hefîzeyê mîmetîk e ku, kar û kiryarên civakî, bi tecrubeyên neqlkirî dirust dike. Derbarê vê meseleyê de Nuri Bilgin van tiştan dibêje:

“Mekanên hefîzeyê, yê ku di demên berê de çêbûne, bi awayekî giştî, mirov ji aîdiyetên wekî milî, hîsî, malbatî an grûbî haydar dikin. Di nasnameya kolektîf de, aliyek heye ku mirov her tim ber bi tarîxê ve dibe. Çimkî nasnameya kolektîf, ji hinde sembolên yadîgariyan, şaheserên hunerî, gerdiş û

²⁷ h.b, r.39

²⁸ Michel Foucault, *Kelimeler ve Şeyler*, wer. Mehmet Ali Kılıçbay, Weş. İmge, Ankara, 2006, r. 228

²⁹ Jan Assmann, *Kültürel Bellek*, wer. Ayşe Tekin, Weş. Ayrıntı, İstanbul, 2001, r. 43

³⁰ George Thomson, *Eski Yunan Toplumunu Üstüne İncelemeler, Tarihöncesi Ege II*, wer. Celal Üster, Weş. Payel, İstanbul, 1991, r. 331

tecrubeyên civakî û nirxên miletan pêk tên; zanîn vê tradîsyonê li ser mîrasiya serboriyan, anku hefizeya kolektîf ava dike.³¹

Hefizeya civakî di warê jiyana de, bi riya ziman ji xwe re cohikan ava dike. Ziman û hefize, wekî nosyonekê, bingeha tradîsyonan ava dike û wezîfeya neqlkirinê dibîne. Gelek antropolog derbarê vê meseleyê de, civakên devkî bi çarçoveyê gotinê û her wiha rîtuêlan sînor dikin. Gelek civak bi xisûsiyetên rîtuêlist ve dibin civakên devkî. Eger civakek, bi tenê di nav sîstemeke devkî an gotinê de bijî jî, mecbûr e ku wan taybetmendiyên bi awayekî ne berbelav îfade bike û neqlkirina wan jî mimkun e. Eger zimanek pêdiviyêke bi vî rengî di nav xwe de bihewîne gelo dê çawa wekî din bi awayekî devkî bimîne? Bersiva vê kêşeyê di nav îfadeyên rîtuêlên civakan de veşartî ye. Dema ku mirov li taybetmendiyên wê civakê yê zimanî dinîhêrî, diyar e ku rêzkirina qalibên zimanî yê sabît li gor sîstemekê dubare dibin û nemaze jî ew xisûsiyet di nav tradîsyonê de veşartî ye. Divê zimanên bi wî rengî wiha bi guh were bihîstin û were hîn kirin. Ev yek ji bo tecrube ya civakên devkî xaleke balkêş e û bi nêrîneke modern a ku tesireke esas li ser têhegiştina me kiriye jî, cuda ye. Hînbûn û perwerdehiya modern an jî ya tradîsyonel; bi riya rîtuêlan pêk tê. Yadîgarî; term û têgehên takekesî ne û ji bo her ferdeke/î civakekê, ji bo jin, mêr û zarokan heman tiştî îfade nake. Lê tema û naveroka wan yadîgaran û zimanê wê hevpar û sabît e. Ew tişt, tradîsyonên civakekê û nasnameya wê ya dîrokî jî destnîşan dike.³²

Gotin û nivîs, bi tenê ne formên cuda yê zimanî ne. Di kultura nivîskî û nav civakên xwendewar de, *xwendevan* û *şîrovevan*; di nav civakên ku ne xwendewar de anku di nav kultura devkî jî ji *guhder* û *axaftvanan* pêk tê û ji wir sîd werdigre. Di nav van hemû kes û grûbên ji hev cuda de, car caran bi awayekî dîrekt, car caran jî pêwendiyêke civakî ya îrtîcalî nasnameyekê û hefizeyekê ava dike.³³ Ev hefizeya çêbûyî, di geşedana civakî de zanîn û eleqeyê civakî jî wekî navendekê dihêle.

Hefize; di nimûneyên kultura devkî ya edebî, hunerî û musîqî de û ji aliyê kesên ku wan çalakiyan temsîl dikin, li gor tecrube û şert û mercên civakan her tim cuda ne. Gelek caran, çîrok û efsane û nimûneyên kultura devkî bi rewanbêjiya zimanî û nuktedaniyêke estetîk ji bo yadkirinê fonksiyoneltir dibe. Di kultura kurdî ya devkî de, fonksiyona yadkirinê û taybetiyên wê, bi teknîkên yadkirinê yê zimanî ve eleqeder in. Çimkî, forma zimanê kurdî, ya wekî komkirî, (rêzkirina peyvên hevmane) hefizeyê her û her dermale dike û kultura ku di wê çarçoveyê de tê avakirin jî xurt dike. Di civakên devkî de zanîn, di kategoriyên wekî madî

³¹ Nuri Bilgin, *Kimlik İnşası*, Weş. Aşina, İzmir, 2007, r. 218-219

³² Barry Sanders, *Öküz 'ün A'sı*, wer. Şehnaz Tahir, Weş. Metis, İstanbul, 2010, r. 18.

³³ Murat Yağcı, *Sözlü Kültürden Yazılı Kültüre ve Elektronik Kültüre Geçiş Süreçlerinde Düşünsel ve Toplumsal Değişimler*, Ankara Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Etnoloji A.B.D, t.ç., Ankara r. 38

û akademîk de nayê kategorîzekirin. Di kulturên devkî de, kategoriyên bi vî rengî ji ber ku nayên bi pêşxistin, mirovên aîdî wê kulturê, ji bo ku wan zanîn û agahiyan veşêrin, rêkûpêk bikin û neql bikin, çîrokan diafirînin. Hema hema di hemû kulturên devkî de, heta niha gelek nimûneyên dirêj an rêzegotin hatine afirandin.³⁴

Xebatên derbarê hefizyê yên, di van salên dawî de hatine kirin, ji bo dîsîplînên din jî sêdwaz bûne. Gelek sehayên zanistî, ji rêbaz û encamên xebatên hefizyê sêd werdigirin. Her wisa, hefize, ji bo *kultura devkî* û *dîroka devkî* û nemaze jî bo salên nêzîk sehayêke muhim e. Ji bilî wê jî, di performansa kultura devkî û hunera devkî de jî dîsa wezîfeyêke wê ya esasî heye. Di her lêkolînên dîsîplînî de mirov dikare jê sêdê werbigire. Xebatên zanistî yên ku xwe dispêrin îmkanên nivîsê, di nav derdorên zanistî de gelek tîstîfadedekirin. Lêkolînên li ser hefizyê, li hemberî wê berhemdariya muqtedîrî, alternatîfêke herêmî ye. Wekî sehayê zanistî, li hemberî dîroka fermî, eger bê arşîvkirin dê di avakirina lîteratureke alternatîf de bibe jêderkeke alternatîf. Di vê xalê de her çend faktora ku bergehên van xebatan diyar kiribe, desthilatî be jî, îro; folklor an kultura devkî, li ser çarçoveyêke alternatîf ê lîteratura fermî tê avakirin. Wekî din her çend ev seha li ser tîpolojîyêke însanî kûr bibe jî, xuya ye ku ji van sehayan bi dîr dikeve. Sehaya edebiyatê ya ku ji folklorê sêd wergirtiye, dê di dawiyê de her û her ji folklorê veqete û bi dîr bikeve. Çimkî edebiyat xwe dispêre hiş û feraseteke cihewaz.³⁵ Derbarê vê meseleyê de Andreas Huyssen van tîştan dibêje:

“Hefize berî her tîştî bi rîya metakirinê li hemberî eşyabûnê (*tîştûn-reification*) panzehîreke jîyanî û tanzîmkirina jîyanî ye. Ew girankirina prosesên zanistî, berxwedana li hemberî zeman û helandina arşîvan ên ku di nav senkronîzmê de çûyî ye. Her wisa, hefize; yekalî û tekalîbûn e, belavbûna zanîne û torên kablotîk ên alternatîfa fikr û ramanêke din û şaşwazî û heterojeniyêke tehdîtkar e di nav biyanîbûnê de. Lewre jî sehayêke paqij û zelal temsîl dike.”³⁶

Kulturên devkî îro, zêde ji îmkan û amûrên elektronîk sêd wernagrin. Helbet, di vir de wezîfeya amûrên elektronîk ên qeydkirinê dibîne, di nav kulturên devkî de jî, hefize bi xwe ye. Hefize faktoreke sereke ye ku, tradîsyonê ji nîşan neqlî nîşên din dike. Zanîn û têgehiştinên li rabirdûyê pêk hatibûn, bi tenê ji şop û rêçên wan diyar dibin. Ev tîst, geh hestûyên di nav sîperên roma de veşartî, geh kevîrekî xopan û dêrisê norman, geh peyveke yewnanîk ku bi şixulandin û forma xwe ve nîşaneyê tradîsyonekê ye; geh jî ji çavdêriyên

³⁴Walter. J. Ong, h.b., r.165

³⁵Vladimir Propp, *Folklor Teori ve Tarih*, wer. Necdet Hasgöl-Tolga Tanyel, Weş. Avesta, İstanbul, 1998, r. 27

³⁶Andreas Huyssen, *Alacakaranlık Anıları*, wer, Kemal Atakay, Weş. Metis, İstanbul, 1998, r. 19

kesekî pêkhatî ye. Ev hemû di rastiyê de heqîqetên dîrokanekî/ê ne. Anku ev, nîşane û sembola fenomenekî/ê ne ku çi îmkân nemaye ku mirov xwe bigehîne.³⁷

Dîroka Devkî

Dîroka devkî qadeke zanistî ya alternatîf e ku kultura dengbêjiyê jî di nav xwe de di hundirîne û wekî qadeke girîng tê qebûl kirin. Dîroka devkî, girîngiya xwe ya vê behsê, ji karakterê xwe ya “alternatîf” werdigre. Ji ber ku nivîs, şeweyê aksiyoneke desthilatîyê di nav xwe de di hewîne û ev qad, her tim guh dide gotin û serencama kesên ku ne muqtedîr an ew kesên ku di dirêjahiya dîrokê de her tim nebûne aktorê rûdanên dîrokî. Dîroka devkî bi rêbaz û îdiaya xwe hewl dide da ku bibe dengê wan kesên ku bêdeng û ji firsandên nivîsandinê mehrûm mane. Ev rêbaza dîroka devkî, ji bo xebatên kurdî ku ji firsandên desthilatîyê mehrûm in jî, pêwîst e. Çimkî bi arşivkirina materyal û dokûmantên vê dîsîplînê, qadeke alternatîf peyda dibe. Ji ber ku dîroknûsiya desthilatîyê li ser esasên heqîqetêke mutlaq nayê nivîsîn, rêbazeke wiha divê ye. Dîroka devkî ji bo nirxandike ji nû ve ya hinde bûyerên ku di dirêjahiya dîrokê de rûda ne, sûdwar e. Ev yek jî karakterê xwe ji encamên têkiliyên desthilatîyê werdigre. Çimkî gelek tişt ji ber ku ne di kontrola bindestan de ne, her tim hatine piştguh kirin û li ser wan zêde nehatiye sekinandin. Di gelek cihan de jî ew tişt hatiye texrip kirin. Ferqa dîroka devkî û ya nivîskî ew e ku ew hevdi tin û roportajên ku bi hinde kesan re tên kirin, ne di dirêjahiya dîrokê de an ne di dema rûdan û qewimînên dîrokî de, berovajî wê piştî wan rûdawan pêk tên. Ev tişt piştî wan qewimînên pêk tê û xwe dispêre referansa hefizyê. Ji ber ku dîroka devkî subjektîf, aktuel û li gor behsnameyê ye, ew tişt ji bo ku ew rûdanên dîrokî îro çawa bê fehm kirin jî muhim e.³⁸

Xebatên dîroka devkî, li ser rûdanan ava dibe û rûdan û qewimînên jî her tim li ser fenomenekê diafirîne. Bi vê taybetmendiyê xwe ve, ew derbarê dîroknûsiyê de, xwe wekî dîsîplîneke alternatîf formule dibe. Ev dîsîplîn piştî sedsala XXan ve, ji rêbaz û taybetmendiyên parametreyê zanistên civakî jî sûd wergirt. Bi vê îdiaya xwe ve veguherî gotin û dîsîplîneke ku girîngiyê dide rûdanên civakî bi xwe. Dîroka devkî; li hemberî dîroknûsiya resmî ya karîzmatîk û bi awayekî giştî, ew dîroknûsiya ku li ser şexsên dîrokî hatiye nivîsandin wekî îtirazekê xwe formule dibe. Her ji ber wê jî, kes û şexsên ku di dîroknûsiyê de wekî suje û aktor nayên qebûl kirin, li gorî rêbaz û îdiaya dîroka devkî de, suje an aktor in. Ji ber vê yekê jî, dîroknûsî, bi dîroka devkî ve, ji zemînê meseleyêke leşkerî û siyasî derdikeve û dibe meseleyêke civakî.

³⁷ Paul Connerton, *Toplumlar Nasıl Anımsar*, wer., Adam (Alaeddin) Şenel, Weş. Ayrıntı, İstanbul, 1999, r. 25

³⁸ Leyla Neyzi, *Ben Kimim? Türkiye’de Sözlü Tarih, Kimlik ve Öznellik*, Weş. İletişim, İstanbul, 2007 r. 10

Dîroka devkî, her car, ji bo têgehiştina dîroka fermî, wekî qadeke alternatîf nayê formulekirin, her wiha ew; dîroka resmî car caran tamam dike û jê re dibe alîkar jî. Dîroka devkî, li ser zanîn, tecrube û yadîgariyên şexsî tê avakirin. Ev jêderk û çavkanî, gelek caran ji bo dîrokzanan, wekî belgeyên alternatîf û alîkar tene qebûlkirin.³⁹ Dîroka resmî, ji aliyê muqtedîran ve, ji bo xurtkirina hegemonyaya wan qadeke sûdwar e. Lêbelê, dîroka evkî, di pêwendiyên desthilatîyê de wekî dîsîplînî ji destpêkê heta niha, her û her bo wan kesên ku ji aliyê muqtedîran ve hatine binpêkirin û nemaze jî wekî rêbaza bindestan tê formulekirin. Her wiha ew kesên ku dîsîplîna dîrokê dispêrin belgeyên tarîxî, rexneyan li vê qadê bikin jî, îro di halê heyî de, her ku diçe bêhtir qiymet û mecbûriyeta vê seheyê tê qebûlkirin. Ew kesên ku zêdetir girîngiyê didin dîsîplîna dîrokê ya kevn, gelek rexneyan li vê qada dîsîplînê ya ku referansên wê ew kesên ku hîn dijîn û car caran jî wê biçûk dibînin.⁴⁰ Lêbelê her çend rexneyên bi vî rengî li rêbaza dîroka devkî bînin kirin jî, di halê heyî de, îro gelek rexneyên esasî li belgeyên nivîskî jî tînin kirin. Belge jî, dîroknûsiya ku bi belgeyan tê pesindkirin jî, îro di xwendinê gelek cuda re derbas dibin û rexneyên esasî li wan jî tê kirin. Di tîkiliyên hegenomîk de jî, dîroknûsiya ku xwe dispêre belgeyan, ne li gor rastî û heqîqetê hatiye belgekirin. Îro bi kawdana teknolojîk a ku gehîştîye merheleyên mezin ve, li gelek welatên biyan û cîran, bêhtir girîngiya xebatên dîroka devkî tê fehmkirin. Li ser vê qadê jî, lîteratureke mezin hatiye avakirin

Tradîsyona devkî bi tenê rêbazeke modern nîn e û berî serdema xwendewariyê jî hatiye tecrûbekirin. Ew tradîsyon di wan pêş-serdeman de jî dîsa xwe li ser hefizeyeke kolektîf ava dike. Ev rêbaza zanistî ya bi îdiayeke alternatîf formule dibe, li gelek deverên cîhanê jî hatiye tecrûbekirin. Îro gelek civak û millet dîroknûsiya xwe, bi rêbazên dîroka devkî dinivîse. Ev qad, xisûsî ji bo xebatên kurdî yê ku di sînore desthilatîyê de fetisîne muhim e lê; hê jî ji aliyê lêkolîneran ve wekî rêbaz belavî nav xebatên dîrokî û dîroka kulturî nebûye. Di serê sedsala XXan de gelek rûdanên dîrokî û civakî li Kurdistanê qewimîn. Ew rûdan û tecrûbeyên dîrokî ji aliyê dengbêjan ve hatin honandin û bi hemû kêmasî û kêşeya xwe ve hatin qeydkirin. Nemaze jî tîkiliyên desthilatîyê yê ku ne li ser zemîneke yeksan di navbera kurd û dewleta tirk de avabûyî, di hefizeya civakî de cih girt. Lê lêkolînerên ku li ser vê seheyê kûr dibin hê jî li ser vê qadê lîteratureke alternatîf ava nekirine. Ev yek bi karaktera xwe ya berbelav ve, xebatên ji bo vê qadê her tim xurt nake. Gelek karakterên vê seheyê, bi xwedî taybetmendiyên xwe ve li vê seheyê hene lê hê jî metodeke zargotina kurdî nehatiye

³⁹ Stephen Caunce, *Sözlü Tarih ve Yerel Tarihçi*, wer. Alper Yalçınkaya- Bilmez Bülent Can, Weş. Tarih Vakfı Yurt Yayınları, İstanbul, 2011, r., 8

⁴⁰ John Tosh, *Tarihin Peşinde*, wer. Özden Arıkan, Weş. Tarih Vakfı Yurt Yayınları, İstanbul, 2011, r. 197

avakirin. Piştî serdema Ronahiyê, li Rojava, gelek kesên li ser kulturên civakên din dixebitîn û derbarê kultura wan de malûmat kom dikirin û mîsyoner bûn, hinde malûmatên kurdî jî kom kiribûn û rabirdûya vê yekê di xebatên kurdî de jî krîstalîze dibe. Gelek gerrok û seyahên ku li Kurdistanê geriyabûn, gelek çîrok û cureyên ve seheyê yên cuda qeydkirin.⁴¹ Kitêba Evliya Çelebî ya ku ji çavnêriyên Çelebî yên Kurdistanê pêkhatî îro jî di vê qadê de gelek malûmatan dihewîne. Her çend ew xebat 400 sal berî niha hatibe nivîsîn jî xwedî pûteyêke bilind e.

Geşedanan qada dîroka devkî bi xwe re keşfkirina cudahiyên jiyana kulturî û civakî jî pêk tîne. Bi rêbazên ve qadê ve, taybetmendiyan kulturî û civakî jî wekî alternatîf li dijî lîteratura fermî tîne avakirin.⁴² Kawdanên li Rojava pêk hatî yên ku karaktera siyasî û aborî guherand, di dawiyê de grubên cuda jî bi xwe re peyda kir. Bi wan ve, meylên curbicur jî peyda bûn. Karaktera qadên qamûyê jî bi wê re veguherî û tradîsyon jî bi heman awayî gehiştê rengêkî din. Lê ji ber ku fikra neteweperestiyê di nav milletên cihanê de xurt bû, bîr û boçûnên sekuler tesireke mezin li ser rewşenbîran kir. Bi vê yekê meyleke ji bo kultura gelêrî peyda bû di nav ronakbîran de. Her wisa xebatên derbarê folklorê de nemaze jî yên berhevkerinê hat îcrakirin, gelek malûmat û dokumentên derbarê kultura gelêrî de hat qeydkirin. Ew xebat îro jî, ji bo dîsîplînên wekî sosyolojî, antropolojî, dîrok û edebiyatê gelek tîne îstîfadekirin. Ew taybetmendiyan gelêrî ku aîdî koma mirovan e, ji rêbaza dîroka devkî pêk tê, ji hefizeya wan tîne komkirin û dibe çavkaniyên alternatîf.⁴³ Malûmatên devkî êdî bi vê yekê ve dibin arşîvên alternatîf û di warê şîrovekirina dîsîplîna dîrokê de lîteratura heyî/resmî jî tîne ser zemîneke gengeşeê. Ev qada dîroka devkî, her wisa ji bo xurtkirin û tesdîqkirina dîroka fermî xwedî taybetmendiyeke esas e jî. Di vir de tiştê ku divê mirov guh bidê ew e ku, ew civakên ku bi sedema gelek faktorên tarîxî û siyasî ji aliyê dewletên serdest ve hatine kontrolkirin, her tim pêdivî bi rêbazên bi rengî dibînin. Wekî li jor jî hatibû gengeşekirin, dirustkirina kuliyata ku piştî xwe dispêre îmkanên nivîsê, di dawiya dawî de, desthilatiya xwe jî pêk tîne. Civakên ku ne xwendewar in jî her di bin çewsandina wan de dimînin. Ev rêbaz û qada dîroka devkî, xisûsî bo xebatên kurdî jî divê ye. Çimkî xebatên kurdî yên kultura devkî, hê jî bi dirustkirina malûmatên dîroka devkî nehatine xurtkirin. Derbarê xelkeya kulturî de hê

⁴¹ Ji bo vê behsê lazim e ku mirov behsa metnên folklorîk ên ku ji sedsala XIXan ve hatine berhevkerin, wekî nimûne nîşan bide: Peter Ivanoviç, Lerch (1827-1884) *Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaldaer*, (1857-58) Albert Von Le Coq (1860-1930), *Kurdische Texte* (1903) Oskar Mann (1867-1917) *Kurdisch-Persisch Forschungen* (1906) Karl Haddank *Mundarten der Zâzâ. Hauptsächlich aus Siwerek und Kor* (1932)

⁴² Di kitêba xwe ya bi navê *L'archéologie du Savoir* (Arkeolojîya Zanînê) de Michel Foucault, di pişka *Aprioriya Dîrokî û Arşîvê* (r.164-172) de behsa girîngiya rêbaza wan çavkaniyên ku ji aliyê serdestan nehatine bikaranîn/formulekirin dîke û girîngiya wan a bo bindestan her tîne zimên. Her wisa, li gorî wî, bi arşîvkerina kuliyata dîroka devkî ve dirustkirina zanistêke alternatîf pêkan dibe. Michel Foucault, *Bilginin Arkeolojisi*, wer. Veli Urhan, Weş. Birey, İstanbul, 1999, r.164-172

⁴³ Celal Metin, *Sözlü Tarih ve Türkiye'de Gelişimi*, Kovara Türk Kültürü Dergisi, j. 469, r. 288-298

jî lêkolîn kê m in. Bo nimûne îro em nizanin ka dîwan/conkên (cönk) kurdî hene ku dengbêj an hozanan tê de helbest an hikayet îcra kirine an na. Di peydakirin û lêkolînên bi vî rengî de jî têkiliyên desthilatî, bergehên wê aşkera dike. Belgeyên dîroka zargotina kurdî hîn jî ji malûmatên bi vî rengî mehrûm in.

Di xebatên dîroka devkî de, tiştê ku dibe armanca xebatkar, bi tenê peydakirina wan materyalan nîn e. Her wiha, yek ji tiştê pêwist ew e ku divê psîkolojiya wan kesên ku di demên wan rûdanan de jiyane û wan tiştan neql dikin jî neyê piştguhkirin. Ev daxwaz ji bo hînbûna wan kesên ku di wê demê jiyane muhim e û ji bo bersiva hinde kêşeyan jî firsendek e. Her wisa ev yek bi xwe di nav vê qadê de meseleyeke rêbazê ye. Di nav de analîzên psîkolojîk û sosyolojîk ên ku bûne sedema çîrokan û vegotinê jî dihewîne. Di vê qada dîroka devkî de xebat û lêkolînên ku tên kirin, bi piranî encamên analîtîk nadin.

Kultura Kurdî ya Devkî

Gelek lêkolîner, gerok û xebatkar, jiyana kurdan, wekî jiyaneke pastoral û her wiha wan jî wekî mileteke devkî teswîr dikin. Ji ber vê jî, afirandina zanyariyên derbarê kurdan de her û her li ser esaseke “devkî” ava dikin.⁴⁴ Ev nêrîn, heta dereceyekê xwe dispêre rastiyekekê û tecrubeya bikaranîna nivîsê ya di dirêjahiyê dîrokê de, sedema çêbûna vê fikrê ye. Helbet di vir de faktorên bajarbûnê, bikaranîna nivîsê û derengmayîna netewî, faktorên sereke ne ji bo vê qenaetê. Her çend ev nêrîn, hemû lîteratura kurdî di nav sînoreke devkî de ditepisine jî, xwe dispêre rastiyekekê tarîxî. Ev rastî geh mehrûmbûna îmkanên desthilatîyê, geh jî kêmbûna malûmatên nivîskî ne. Kurd her çend bi giştî civakeke devkî bin jî, xwedî lîteratureke nivîskîne jî. Derbarê vê babetê de, lêkolînên ku tên kirin her ku diçin zêdetir dibin. Lê di vir de motîvasyona ku van xebatan dide kirin, zêdetir îspatkirina hebûna belgeyan e, lewma jî zêdetir xwe dispêre aksiyoneke îşakirinê. Tradîsyona nivîskî helbet bi geşedanên îcatkirina çapxaneyê û desthilatîyê ve eleqedar in û ev yek ji bo hemû milletên Rojhilata Navîn jî ne rastî demeke kevnar tê. Çarçoveya tradîsyona devkî û nivîskî, xwe dispêre tesewirên wekî neteweperweriyê, îşakirina nasnameyê û qonaxa netew-dewletê. Her wisa, standartkirina term û têgehên netewî, zimanê netewî ji sedema vê biwarê gehîştîye merheleyekê. Her çend çapxane bi tena serê xwe faktoreke ku vê yekê araste dike nîn be jî, tesireke mezin li ser geşedana van babetan dike. Geşedanên dîrokî, teşebîsên nû, îqtîdar, bindestî jî bandoreke mezin li ser çêbûna kultura nivîskî dike, an dibe egera çêbûna kultura devkî. Helbet di vir de

⁴⁴ Derbarê kurdan de, ew xebat û lêkolînên ku di sedsala XIX. de hatibûn amadekirin ên wekî Peter Ivanoviç, Lerch (1827-1884), Albert Von Le Coq (1860-1930), Oskar Mann (1867-1917) Valadimir Minorsky (1877-1966), Basil Nikitin (1885-1960) derbarê vê babetê de nimûneyên sereke ne.

peyva kulturê (wekî forma latînî de jî diyar e, kulturina tiştan bo erdê) divê ne wekî peyveke ku ji derveyî siyasetê û têkiliyên desthilatîyê were formulekirin. Lê kultur; wekî rexnegirê îdeolojiyê Raymond Williams jî behsê dike, “peyva zimanî ya herî tevlihev e” û li gor gelek sedemên curbicur her diguhure û divê mirov wekî têgeheke sabît nenirxîne.⁴⁵ Lewma jî lêkolînên ku derbarê kultura kurdî de têne kirin, gelek çaran, van xisûsiyetan piştguh dikin û ji derveyî çarçoveya desthilatî, wekî guherîna kulturê têne hilsengandin.

Ew miletên ku bi kurdan re cîran in, di dirêjahiya dîrokê de û nemaze van 200 salên dawî, ji bilî îmkanên hêza desthilatîyê xwedî tecrubeyeke wekî kurdan in. Hemû civak her çend di prosesên siyasî û yê jî hev cuda re derbas bibin jî, rabirdûya wan û têkiliya wan a digel kultur û hêmanên wê nêzî hevdu ne di warê xwendewariyê de. Di kamilbûna kultura devkî û ya veguherîna ber bi nivîskî û peydabûna paradoksên di navbera wan de divê mirov rola çapxaneyê jî bîr neke. Lê îcatkirina çapxaneyê jî li gor pêdiviyên civakî û bizavên kulturî her gehiştê dereceyêke din. Piştî wê dema ku çapxaneyê tesira xwe li ser geşedanên kulturî û hunerî kir, cudahiyeke di nav wan kulturên de peyda bû. Bi vê serdemê re, mirovên ketûber daxilî nav bizavên kulturî bûn û ew çalakî ji hegemonyaya komekê derket û belavî nav mirovan bû. Her çend di piştî sedsala IIan de hatibe îcatkirin jî, çapxane, piştî sedsala XVan zêdetir karîger bû û bû egera geşedanên kulturî, hunerî, ilmî, edebî. Herî zêde ev geşedan li Rojavayê Ewropayê peyda bû û piştî ku çapxane bû sedema gelek veguherînan; rîtuêlên dînî û kulturî gelek hatin gengeşekirin. Tevgera li Ewropayê ya reform û ronesansê, bi riya çapxaneyê fikr û nêrînen xwe berbelavkirin. Bi îcatkirina çapxaneyê ve gelek destxet jî hatin çapkirin û belav bûn.

Çapxane herî zêde bû sedema veguherînen fikrî yê wekî, neteweperwerî, dewlet û avabûna nasnameyê. Bîr û boçûn, şert û mercên siyasî ji ber çapxaneyê zûtir veguherîn. Bi gotina Francis Bacon, bi îcatkirina çapxaneyê ve “rewş û pozîsyona dinyayê guheriye.”⁴⁶ Ev nêrîna Bacon a ku qiymetê dide çapxaneyê, di şert û mercên îro de bêhtir tê fehmkirin. Di salên wekî 1500-1550an de ji ber ku li Ewropayê, refah û seadeteke pirr zêde hebû, weşangerî jî, ji vê halê civakê û rewşa mirovan sîd wergirt û ew jî pirr pêşve çû. Di gelek deverên Ewropayê de, gelek weşanxane hatin damezirandin, bi milyonan kitêb hatin çapkirin û belavî nav mirovan bûn. Bi vê yekê weşangeriya kitêban kete destê kapîtalîstan. Her çend li Çînê hatibe îcatkirin, an li Koreyê hatibe tecrubekirin jî, çapxane herî zêde li Rojavayê Ewropayê dengêkî zêde veda. Çi guman nîn e ku zimanên wekî îngilîzî û frensî yê evkî, bi saya

⁴⁵ Thomas Hylland Eriksen, *Kültür Terörizmi*, wer. A. Önder Otçu, Weş. Avesta, İstanbul, 2001, r.25

⁴⁶ Ji Elisabeth L. Eisenstein vgz. B. Anderson, *Hayali Cemaatler*, r. 52

geşedanên çapxaneyê, bûne zimanên netewî, standart û nivîskî.⁴⁷ Atmosfera Ronahiyê, ya ku bi tesira çapxaneyê peyda bibû, di zemanêke dûr û dirêj de tesira xwe berfirehtir kir. Bazar û bazirganiya çapxaneyê, di serî de li Ewropayê bû û li wê derê di demeke kin de belavî nav gelek der û deverên Ewropayê yên din bû. Wê demê xwendevanên latînî jî hebûn. Piştî ku 150 sal di ser re bihurî, ev bazar gehiştê merheleyên mezin.⁴⁸

Her çend çapxane şeweya belavbûna zanîne û karîgeriya nivîsê zêdetir kiribe jî, tesira kultura elektronîk ev yek anî merheleyeke bilindtir. Her wisa pêwendiya kulturî ya digel civakên dîtir jî gur û geş bû. Tecrubeya bajarên kurdan a bi çapxaneyê re, bi awayekî sistematîk pêk nehat û encamên çapxaneyê jî tesireke erênî li ser geşedanên civaka kurd nekir. Helbet di vir de gelek sedem hebûn, lê faktora bajarbûnê, di vir de faktoreke sereke ye. Di serdema Împaratoriya osmanî de, li bajarên Kurdistanê avakirina çapxaneyê bi vî rengî bû: Bedlîs: 1865-6 an 1893, Diyarbekir: 1868-9 û Wan: 1889-90. Di vir de xuya ye ku çapxane piştî îcatkirina xwe (1450) pirr dereng li Kurdistanê hat bikaranîn. Ew çapxaneyên ku li Kurdistanê hatin damezirandin, hemû jî ji aliyê hikumeta osmaniyan ve hatine damezirandin û lewre jî roleke ronahiyê de di nav kurdan de nelîst. Xwediyê çapxaneyan jî her wiha hikumet bi xwe bû û lewre jî, tiştên ku neşr dibûn bi zimanê tirkî bûn.⁴⁹ Yek ji sedema derengmayîna belavbûna fikrên netewî jî bikaranîna çapxaneyê ya li Kurdistanê bû û ew yek karîgeriya zanîne jî derengtir hişt.

Her çend berî niha 150 sal li Kurdistan, çapxane hatibe bikaranîn jî, di sedsala XXan de ew prosesa kurdan a polîtîk, siyasî û geşedanên zanistî, di nav rewşeke mehrûmîyetê de bû. Lewma jî kurdan ji firsendên çapxaneyê sûd wernegirtin. Malûmatên derbarê kurdan de çî siyasî çî kulturî, li derveyî Kurdistanê hatin çapkirin. Derengmayîna kultura kurdî ya nivîskî, di sedsala XXan de, ji ber egerên polîtîk û siyasî rû dan. Her çend kurdan jiyana xwe zêdetir bi *gotinê* dirust kiribûn jî, ji bilî van geşedanên, xwendewariya kurdî, ber bi îro ve her ku çû zêdetir bû. Rewşa kurdan a xwendewariyê di salên 1920an de ji % 4 bû, lêbelê; di salên 1990an de ev reqem gehişt ji %50. Nîspeten, di warê kulturî û zimanî de kurdên Qefqasyayê ji yên dî rehetir bûn û wê demê di nav kurdên sowyetê de hema hema hemû kurd xwendewar bûn.⁵⁰ Di vir de tiştê balkêş ew e ku, li Kurdistanê ji sedema desthilatiya tirk, fars û ereban, pêwendiya digel çapxaneyê û karûbarên zanistî pir kêr bû. Lê li derveyî Kurdistanê, di nav Sovyetan ev rewş cuda bû û lewma jî gelek berhemên zanistî, kulturî û edebî hatin nivîsîn.

⁴⁷ Amir Hasanpour, *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil*, wer., İbrahim Bingöl-Cemil Gündoğan, Weş. Avesta, İstanbul, 2005, r. 276

⁴⁸ B. Anderson, b.n., r. 53

⁴⁹ A Hasanpour, h.b., r. 276-277

⁵⁰ Amd. Philip Kreyenbroek-Christine Allison, *Kürt Kimliği ve Kültürü*, wer. Ümit Aydoğmuş, Weş. Avesta, İstanbul, 2008, r. 106

Miletêk xwendewar nebe jî, hemû îmkânên nivîs û çapxaneyê bi kar bîne jî, ev yek xwe dispêre encama rewşên siyasî. Çimkî di sedsala XXan de, rewşa ronahiya civakan bi riya dem û dezgehên pêk hat. Di nav kurdan de dezgehên tradîsyonel ên wekî medreseyan heta dereceyekê xwendewarî hebû. Wekî li hemû Rojhilata Navîn û miletên li wê derê dijîn, di nav kurdan de jî, mela û hinde şexsiyetên di derdora medrese û îslamê jî xwendewar bûn û ew her tim di nav kurdan de diman. Mela jî ji ber lîteratura Îslamê xwendin û nivîsandin dizanibûn. Dema ku wan pêwendî bi gundî û gel re datanî, bi wî awayî dibûn qedirgiran. Di vê çarçoveyê de, pêwendîya kurdan a ku bi nivîs û xwendewariyê, metnên dînî, lîteratura medreseyê bû. Lê piştî sedsala XXan, ev dezgeh jî ji sedemên siyasî hatin girtin û di bin tesira modernîzasyona tirk de fetisîn

Di kultura kurdî ya devkî de reng û taybetmendiyeke tradîsyonel heye. Ev yek ji sedema derengmayîna modernbûnê û polîtîkayên dewletan zêdetir bû. Her wisa kurd bi xwe di serê sedsalê de ji % 65-80⁵¹ gundî bûn û ev jî faktoreke girîng bû ji bo derbasbûn û tecrubekirina kultura nivîskî. Kultur, wekî neynikekê, tecrubeyên jiyânî temsîl dike û di kultura kurdî ya devkî de jî ev tişt xuya bûne. Rûdanên dîrokî, tecrubeyên kulturî, her tim rengê xwe dane zargotina kurdî. Lewma jî karakterê wê cuda ye ji yên miletên cîran, û bi gelek taybetmendiyan xwe yên esasî ve ji wan cuda dibe. Kultura kurdî ya devkî, di atmosfereke pastoral de hatiye honandin û afirandin. Kompozîsyoneke tematîk a encamên siyasî, edebî û civakî, di kultura kurdî ya devkî de diyar dibe. Di folklorê kurdî de tema an tebîat bi xwe ye, an rûdanên tebîetê ne, an jî tiştên di derbarî tebîetê de ne. Destan û hikayetên şer, di dawîya dawî de li ser bîngeheke serfiraziya tebîetê û pêwendîya mirov û tebîetê de hatiye honandin.⁵² Kultura kurdî ya devkî, li gor şeweyên vegotinê, bi gelek cudahiyan hatiye meyndin. Nuktedanî, hefîzeyên ku li ser kultureke devkî ava dibe, bûye sedema çêbûna gelek materyalan û ew jî bûne kuliya tek.

Kultura devkî ya kurdî, bi cureyan xwe, cudahiyan tematîk û bi taybetmendiyan xwe ve, li ser kuliya kurdî ya nivîskî jî tesîrek peyda kiriye. Îro gelek nimûneyên edebiyata kurdî ya klasîk, yekser ji taybetmendî û karakterê tradîsyona kultura devkî sîd wergirtine. Folklorê kurdî, destan û efsaneyên curbicur, xwe di berhemên klasîk de aşkera kirine. *Mem û Zîn* a Ehmedê Xanî (1650/1-1707), *Beyta Zembîlîroş* a Feqîyê Teyran (1590-1660), *Beyta Dimdim*, *Derwêşê Evdî* û gelek ên din di wî warî de nimûneya berbiçav in. Destana *Memê Alan* a folklorîk bi gelek taybetmendiyan xwe veguheriya û bûye *Mem û Zîn* a Xanî. Ehmedê Xanî,

⁵¹ Ev rewşa derbarê xwendewariya kurdan de, îro guheriya, lê di kitêba Thomas. Bois (1964), Vladimir Minorsky û D.N. Mc Kenzie (1945) de ev agahî tîne aşkerakirin. Ji bo girtina vê referansê bnr. Th. Bois, V. Minorsky. D.N. Mac Kenze, *Kürtler ve Kürdistan*, wer. Kamuran Fıratlı, Weş. Doz, İstanbul, 2004, r.141

⁵² Mehrdad R. Izady, *Kürtler*, wer. Cemal Atila, Weş. Doz, İstanbul, 2004, r. 414-415

di wê hikayetê de, gelek tişt guhertin û bi gelek sembolan ve maneyên curbicur lê bar kir. Taybetmendiyeî edebiyata klasîk, fikrên mîstîk û metafîzîkî, bi zanîna xwe ya felsefeya siyasî ve geş kir. ⁵³ Ne bi tenê ji bo şairên klasîk, her wisa ji romannûsan jî ev yek motîvasyoneke girîng bû û îro jî hê berdewam dike. ⁵⁴ Kultura kurdî ya devkî, ji bo şairên dîwanê jî bû îlhamek. Di edebiyata kurdî ya modern û cureyên wê yên wekî, roman û kurteçîrok û helbest jî di bin bandora folklor û kultura kurdî ya devkî de man. Fikrkirina ku xwe dispêre kultura devkî, şêweya fikr û derbirînê bi xwe re guherand. Her ji ber vê yekê, di navbera kultura kurdî ya devkî û klasîk de, temasek her hebûye. Bi îfadeyeke din, tradîsyona nivîskî ya kurdî, ji taybetmendiyeî zargotinê her sûd wergirtiye. Di vî warî de gelek nimûneyên cuda jî hene. *Destana Zembîlfiroş* a folklorîk, ji aliyê gelek şairên kurdan ve hatiye honandin û di edebiyata kurdî ya klasîk de cihê xwe girtiye. Melayê Cizîrî (1570-1640), Muradxanê Beyazidî (1736-1778) û Melayê Bateyî (1675-1755), çîroka Zembîlfiroş, bi formeke edebiyata dîwanê ji nû ve honandine. Folklor bi her awayî bandor li ser edebiyata kurdî ya modern jî kiriye. Bo nimûne, *Siyabend û Xecê* ya ku bi awayekî manzûm hatibû nivîsîn, ji aliyê Sementê Siyabend (1909-1998) ve dîsa hate nivîsîn. Heman çîrok, ji aliyê Tosinê Reşît ve kete formeke piyesê (1941-). Ji bilî wê, mirov dikare bibêje ku di afirandina edebiyata nivîskî de û folklorê kurdî her tim hatiye dotin û jê sûd hatiye wergirtin. Lewma derbarê hin berheman de mirov nizane ka kîjan behrem beriya kîjanê hatiye nivîsîn. Bo nimûne, manzûmên çîrokî yên wekî *Şêx Senan* (Dota Gurcî) *Hespê Reş* û Bersisê ‘Abid Feqiyê Teyran, di nav kultura kurdî ya folklorîk de xwedî varyantên cuda ne. ⁵⁵

Di kultura kurdî de êzidiyatîyê jî di warê têgehîştina taybetmendiyeî kultura kurdî de taybetmendiyeî balkêş nîşan dide. kurdên êzidî, gelek motîfên arkaîk, ji ber sîstema êzidiyatîyê ya hiyerarşîyeke tund ve muhazeze kirine. Her wisa gelek cureyên edebî di nav wê kulturê de peyda bûne. Bi misilmanbûna kurdan ve ji ber sînoren baweriya îslamê, di warê muzîkaliteyê de, zêde nimûne nîn e. Li gor lêkolîner û xebatkaran, babet û motîfên stranên gelêrî yên kultura kurdî, bi gelek xisûsiyetên xwe ve, dişibe paganîzmê û bi raya wan stranên kurdî, li ser mîraseke paganîk ava bûye. Di dema xwe de, di nav mensûbên Paganîzmê de,

⁵³ Martin van Bruinessen, Ehmedê Xanî'nin Mem û Zîn'i ve Kürt Millî Uyanışının Ortaya Çıkışındaki Rolü, amd. Abbas Vali, *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, wer. Fahriye Adsay-Ümit Aydoğmuş-Sema Kılıç, Weş. Avesta, İstanbul, 2005, r. 69

⁵⁴ Remezan Alan bi navê *Folklor û Roman* kitêbek derxist û tê de pêwendîya folklor û romanên kurdî bi awayekî zelal aşkera kir. Wekî di wê kitêbê de jî xuya ye, kultura kurdî ya devkî, xisûsî di warê teknîka nivîsê û çekirina naverokê de hê jî motîvasyoneke mezin e ji bo romannûsan. Bnr. Remezan Alan *Folklor û Roman*, Weş. Peywend, İstanbul, 2013

⁵⁵ Kemal Burkay, *Geçmişten Bugüne Kürtler ve Kürdistan*, Weş. Deng, İstanbul, 2008, r. 216

gelek eşîretên kurdan ên misilman jî hebûn.⁵⁶ Lê ev mesele, di nivîsîna dîroknûsiya kulturî ya kurdî de, hê jî bi daneyên zanistî nehatiye piştraskirin. Di gelek aliyên de motîfasyona vê pêwendiyê xwe dispêre însakirina kultureke serbixwe, lewma jî mirov dikare wekî îcatkirina tradîsyonê jî binirxîne.⁵⁷ Ji ber ku derbarê dîroka kurdan a pêş-modern de zêde xebat nehatine kirin, ev gengeşe hîn jî berdewam dikin.

Taybetmendiya kultura kurdî ya devkî, di çarçoveya encamên taybetmendiya xwendewariyê de maye. Wekî di beşên din de jî hate gengeşekirin li gelek aliyên dinyayê, serdestiya kultura nivîskî, bi geşedanên avakirina netew-dewletê ve gehiştê merheleyên mezin û pey re xurt bû. Bi avakirina netew-dewletê ve, di warê pêşveçûnên teknolojik de şoreşeke mezin rû da. Kultura elektronîk, cudahiyeke kulturî peyda kir û lewma jî gelek ziman standardîze bûn. Bi standardîzebûna zimanan ve gelek cudahiya zimanî, dewlemendiya herêmî hatin tepisandin. Ev yek di kultura kurdî ya devkî de jî bû egera têkveçûn û guherîna kulturî. Li gor Vilçevsky, gewrebûn û dewlemendiya kultura kurdî ya devkî, encax bi karakterê kurdan ên *oral* û sinifî tê îzahkirin. Di kultura kurdî ya devkî de, gelek feodal û mîrên kurdan, ji bo ku hikmê wan li ser gel ferz bibe, şivan û cotkarên kurdan, her ji xwe re xistine qasid û berdevk. Ji ber vê yekê ye ku, di kultura kurdî ya devkî de, temaya stran, destan û cureyên folklorîk ên din de, gelek nîşaneyên desthilatiya mîr, axa, şêx û kesên giregir ên ku bi serfiraziya wan û lehengiya wan ve hatiye honandin heye. Ev rewşa folklorîk a civaka kurdan, bi tenê ji rewşa kurdan ya feodal ve nayê îzahkirin. Çimkî, civaka kurdan, bi sedsalan, di nav sîstemeke feodalî de heliyaye. Ev yek jî, tesireke mezin li ser kultura kurdî kiriyê.⁵⁸

Kultura kurdî ya devkî, babeteke civakî ye. Lê di nav seranserî kurdan de, kesên ku vî karî wekî hunerekê îcra dikin bi navên curbicur hatine terîfkirin. Di nav kurmancan û nemaze li bakûr, wekî dengbêj, Li başûr û nemaze di nav soranan jî wekî goranbêj tê binavkirin, di nav kirmancan/zaza de jî wekî dengbêj/deyrbaz hatiye binavkirin. Ev xebat ji ber ku bi dengbêjiyê hatiye sînorkirin, dê zêdetir li dor wê behsê bisekine û nemaze ew berhemdariya ku di çarçoveya dengbêjiyê de peyda bûye pêkole bike. Çimkî dengbêjî; hem di warê îcrakirina vê kulturê ya li cihekî an di nav komê hem jî, bi temayên ku bûne mijara wan berhemana ve kultureke kurmancan e. Belê mirov dikare vê yekê bibêje ku dengbêjî, kultureke

⁵⁶ Bazil Nikitin, *Kürtler Sosyolojik ve Tarihi İnceleme*, wer. Hüseyin Demirhan, Cemal Süreyya, Weş. Deng, İstanbul, 2002, r. 240

⁵⁷ Kitêba Eric J. Hobsbawm, Terence Ranger a bi navê *Geleneğin İcadı (İcatkirina Tradîsyonê)*, di vê meseleyê de çavkaniyeke girîng e bo nirxandina kevneşopîyan a ku ji hebûna xwe re kokekê îcat dike û wê bi pêş-demên tarîxî ve girê dide. Têkiliya paganîzm û temayên kultura kurdî di vî warî de li dor behsa van gengeşeyan xaleke girîng e. Bo zanîneke berfirehtir, bnr. Eric, J. Hobsbawm/Terence Ranger, *Geleneğin İcadı*, wer. Mehmet Murat Şahin, Weş. Agora, İstanbul, 2006

⁵⁸ h.b., r. 436

bi tenê di nav gruba kurmancan de peyda bûye. Wekî zimanî an linguîstîk jî, kultureke *kurmancîk* e. Ew kultur, di kultura kurdî ya devkî de, nemaze di nav atmosfereke pastoral de hatiye honandin û xwe zêdetir spartiyê rûdanên dîrokî û civakî. Geşedanên teknolojîk, amûrên pêwendiyê yên wekî radyo, televîzyon, telefon, zêdebûna firsandên çapxaneyê, koçrevî û polîtîkayên kulturkujî û zimankujiyê tesirek li ser cudabûna vê tradîsyonê jî kir. Bi van geşedanan ve, êdî bizavên kulturî kete qonaxe veguherîneke tund û ji ber ku hemû firsandên îcrakirina vê kulturê hatibûn girtin, ev kultur têk çû an veguherî. Ji ber vê, gelek nimûneyên ji kelepîra kurdî ya devkî, bi her awayî modernîze dibe û ji nû ve tê afirandin. Ew cureyên kultura devkî, dibin çavkaniyên nivîskî yan lîstok û cureyên nivîskî.⁵⁹ Kultura kurdî ya devkî, ji bilî wê îro di warê musîqeyê de, musîqeya kurdî ya modern bi her awayî, dihewîne û jê re dibe çavkanî. Gelek hunermendên kurdan, stranên kultura kurdî û ya dengbêjiyê, bi awayekî musîkal modernîze dikin. Hunermendên wekî, Ciwan Haco, Şivan Perwer, hem kilam û stranên dengbêjiyê xwendine, hem jî gelek di bin tesira uslûp û şêweyê hunermendiya wan de mane. Nemaze hunermend Ciwan Haco, bingeha musîqeya xwe dispêre dengbêj Karapetê Xaço û Mirado.⁶⁰

Her çend li bakur hereketên siyasî yên kurdan, modernîst û sekuler bin jî heta niha gelek taybetmendiyên kultura devkî, di nav dîskorseke netewetiyê de bikaranîn. Ji bo ku tesirê li ser gel bike û mobîlîzasyonekê di nav gel de peyda bike, gelek nimûne û performansên vê kulturê, di nav gotinên xwe de bikaranîn e. Kanalên kurdî, di wî warî de, musîka kurdî ya ji kultura kurdî ya devkî, performansan pêşkêşî temaşevanan dike. Ji ber ku di nav guhdêran de, têgeheke “varyanta rast” peyda bûye teşebûsên wiha, tesirê li ser tradîsyonên devkî dikin û car caran jî, kesên ku meyla wan bo kulturê heye û nemaze jî ciwan, materyalên wiha an ji kitêban peyda dikin an jî ji weşanên wiha.⁶¹

Dengbêjî

Di vê xebatê de aliyekî lêkolînê jî tradîsyona dengbêjiyê ye. Dengbêjî beşek ji folklorê kurdî ye. Lêkolînên li ser dengbêjiyê, di bin tesnîfa folklorê de werin kirin, lê ew kesên ku vê kulturê îcra dikin, performanseke musikî jî pêk tînin. Di nav kultura devkî de, dengbêjan, di peywenda vê tradîsyonê de rûdanên civakî û fiksiyonên cihêreng îcra dikirin. Heta, dengbêj, ji derveyî maneya xwe ya îro, di maneya peyva *nivîskar* a ku di çarçoveya *nivîsê* de em fehm

⁵⁹ Christine Allison, *Yezidi Sözlü Kültürü*, wer. Fahriye Adsay, Weş. Avesta, İstanbul, 2007, r. 44

⁶⁰ Sinan Gündoğar, *Üç Kürt Ozanının Hikayesi*, Weş. Elma, İstanbul, 2005, r. 210

⁶¹ Christine Allison, h.b., r. 44

dikin jî hatiye binavkirin.⁶² Helbet kultura dengbêjiyê jî di nav xwe de dabeşî gelek mijaran dibe. Derbarê vê performansa kulturî de heta niha gelek tesnîfên cuda hatine kirin. Di vê xebatê de jî ne mimkun e ku, hemû taybetmendiyên dengbêjiyê bêne ronkirin. Ji ber ku ev binavkirin ji bo şair, edîb, hunermend⁶³ jî hatiye bikaranîn û derbarê vê peyvê (dengbêj) de hê jî kêşeyên esasî hene. Balkêş e ku ev peyv, di berhemên klasîk de nehatiye bikaranîn û nimûneyên pêşîn ên ku em rastî wê dihên, nê di demên berê de hatiye bikaranîn. Di navbera helbest û destanên kultura dengbêjiyê û dîwanên şairên klasîk de hindêk cudahiyên esasî hene. Ew her du ekol ji hev cuda ne û kultura dengbêjiyê wekî kultureke avamî** tê dîtin û nemaze şairên xwedî dîwan layiqî pesn û senayên hamiyan tên dîtin. Di edebiyata tirkî, erebî û farisî de vê yekê wekî ekolekê berdewam kiriyê. Di vê beşê de gengeşeya wê dê bête kirin, lê di vir de tiştê girîng ew e ku, peyva “dengbêj”yê, di nivîsandina dîroka kultura kurdî de, peyveke nû ye. Beriya wê jî ev kultur, ev performans hatiye îcrakirin, lê ev berbelavbûna vê binavkirinê, beramberî serdemên nû/nêzîk tê.⁶⁴

Peyva dengbêj ji bo wan kesên ku bi ezberî helbest, destan, stran, kilam, qewlik û cureyên kultura devkî pêk tînin tê gotin. Ev peyv, li gor cureyên kultura devkî ji bo stranbêj, kilambêj û hunermandan jî tê gotin. Lê ev peyv ji bilî zaravayê kurmancî, di zaravayên din de nayê bikaranîn. Di soranî de *goranîbêj*, di zazakî de *deyrbaz* lê hinek cihên ku zaza lê dijîn û nêzî kurmancan e jî wekî dengbêj tê bikaranîn. Her wisa mirov dikare bibêje ku dengbêjî, wekî hunereke *kurmancîk* e. Faktorên ku bûne egera vê tesnîfê, şeweya belavbûna demografyaya kurd, taybetmendiyên desthilatiya zimanî û kulturî ne. Wekî li jor jî hate gotin, di vê xebatê de jî ev huner, wekî hunereke *kurmancîk* hatiye formulekirin, lewma jî çarçoveya wê dê di nav vê kategoriyê de were destnîşankirin.

Dengbêj li gor gelek lêkolîner û nivîskarên bi awayekî etîmolojîk xwe dispêre *deng* û *gotinê* û di çarçoveya tradîsyona kultura devkî de bi deng/sewt/voice tê îzahkirin. Bi rastî jî

⁶² Azra Erhat, *Mitoloji Sözlüğü*, Weş. Remzi, İstanbul, 1996, r.4

⁶³ Qanadê Kurdo, di kitêba xwe ya *Tarîxa Edebyata kurdî* de şairên klasîk Feqiyê Teyran, Melayê Cizirî, Selim Silêman, helbestvan Cigerxwîn, Hejar û Wefayî, wekî dengbêj bi nav dike. Di vir de helbet ew kes wekî ku em îro fêhm dikin ne dengbêj in, lê wekî Qanadê Kurdo jî kiriye, di xebatên li ser kultura kurdî yê piştî sedsala XXan de, dengbêj wekî sifet jî hatine bikaranîn û ji bo şair, helbestvan û edîban jî hatiye gotin. Bnr. Prof. Qanadê Kurdo, *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, Weş. Öz-Ge, Ankara, 1992, r. 70-92-103-140-230-351

* Serdema Peşîn, ji dîtina nivîsê (3500) heta dabeşbûna Împaratoriya Romayê (395) tê qebûlkirin.

** Gelê ji tebeqeya jêr, xelk. Di tîkiliya navbera hunera avamî û şairên xwedî dîwan ên klasîk de, berberiyêke hunerî heye. Dengbêj, xanende, ramişger (Xanî bo dengbêjan dibêje) helbest û destanên xwe bi ezberî dixwînin, lê şairên klasîk dinivîsin. Di vir de jî serdestiyeke kiryarê *nivîsê* heye li hemberî *gotinê*. Xuya ye ku zanîna xwendin û nivîsandinê di çalakiyên edebî de jî tîkiliyeke desthilatiyê dirust kiriye.

⁶⁴ Ev peyv di edebiyata kurdî ya klasîk de ji aliyê şairan ve nehatiye bikaranîn. Lê di helbesteke Feqiyê Teyran a bi navê *Dengbêjê Jaran* de, wekî berhemeke wî tê destnîşankirin. Em dizanin ku Feqiyê Teyran çî di aliyê temayê de, çî jî di aliyê zimanî de zimanê gel bikaraniye û ew di nav gel û hin dengbêjan de wekî “dengbêj” jî hatiye qebûlkirin. Lê helbesta bi navê *Dengbêjê Jaran*, îhtîmal e ku ne helbesta wî ye. Di xebatên kurdî yê modern de Mela Mehmûdê Beyazidî û Celadet Ali Bedîrxan, ev peyv cara pêşîn bikaranîn e.

derbarê berhemên dengbêjiyê de lîteratureke berhevkerinê ya berfireh ava bûye. Wekî li jor jî hate aşkerakirin, lêkolînerên ku hewl didin terîfa dengbêjiyê ji aliyê etîmolojîk ve bikin, nemaze wê dispêrin *deng* û îcrakirina wê tradîsyonê bi deng rave dikin. Di çêbûna vê terîfê de tenê ne lêkolîner, edîbên wekî Mehmed Uzun jî, vê kulturê wiha dinirxînin:

“Di zimanê bav û kalên min de dengbêjî, li ser *deng* û *bêjê* çêbûye. Deng nefes e û bêj jî, yê ku wê nefesê neql dikin û vî karî ji xwe re wekî wezîfeyekê dibînin in. Yên ku rih dixin nav deng û wan zindî dikin in. Yên ku karûbarên wan deng in wê ji xwe re wek meslekekê dibînin dengbêj in. Dengbêj deng dixê kelam û kelamê jî dixê kilam û kilamê jî dixê stran. Dengbêj ew kes e ku dibêje û distrê ye.”⁶⁵

Peyva dengbêjiyê li Kurdistana Bakur û di nav kurmanc û zazayan hatiye bikaranîn û belav bûye. Her wiha li Kurdistana Başûr bo wan hem goranîbêj hem jî wek Jwaideh dibêje *şair* tê gotin. Hin dibistanên ku çîrokên populer ên kurdan jiberxwe dibêjin û şairên tembûrê perwerde dikin hene. Ev kesên vê hunerê îcra dikin li bakûrê Kurdistanê *dengbêj* li başûr jî *şair* in.⁶⁶ Ji bilî wê, her çend di heman kontekstê de nebe jî li başûr bo ew kesên ku vî karî îcra dikin, goranîbêj jî tê gotin.

Xebatên li ser dengbêjiyê, ji sedsala XIXan dest pê dikin û teswîrên bo dengbêjiyê jî di nav konteksta oryantalist de wekî keşfkirina kultureke “nû” derdikeve pêş. Thérèse Albertine, F. Dubois de Montpereux (1830), L. Robinson (1840), Moritz Wagner (1844) û Bodenstedt (1844), dr. Oskar Blau (1858) û Êrmênên wekî Xacatur Abowian û Gaspar Ter-Gewandjan⁶⁷ cara yekemîn derbarê dengbêjiyê de xebatên berhevkerinê kirine û hunera dengbêjiyê di çarçoveya muzîkalîte de pir payebilind nirxandine. Di vir de tiştekî muhim heye, ew jî derbarê peyva dengbêjiyê de ye ku wekî deng/sewt/voice tê terîfkirin. Peyva dengbêjiyê wextê ku bi “deng” tê terîfkirin, ew tenê wekî hunereke musîqî rave dibe û naveroka wê aşkera nabe. Gelo dengbêjan ev binavkirin, ji çi wergirtine, stranbêj; stranan dibêje, çîrokbêj; çîrokan dibêje, qewlibêj; qewlikan, klambêj; kilaman dibêje. Lê dengbêj çi dibêjin? Derbarê çêbûna maneya peyva dengbêjiyê de, xebat hê zêde nehatine kirin, lê li ser vê behsê lêkolîner Mazlum Doğan van tiştan dibêje:

“Piraniya şareza û pisporan di wê baweriyê de ne ku peyva “dengbêj” ji “deng” peyda bûye. Lê dema mirov bala xwe dide paşxaneya zarkî û zimanê xelkê asayî, xuya dibe ku peyva “deng” di vir de beranberî “behs” hatiye xebitandin ku ev yek ne ciyê gumanê ye. Her wekî diyar e di

⁶⁵ Mehmed Uzun, *Dengbêjlerim*, Weş. İthaki, İstanbul, 2008, r. 11

⁶⁶ Wadie Jwaideh, *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi*, wer. İsmail Çekem-Alper Duman, Weş. İletişim, İstanbul, 2009, r. 47

⁶⁷ Mehmet Gültekin, *Zargotina Kurdên Serhedê*, Weş. Avesta, İstanbul, 2013, r. 20-22-23

zimanê kurdî de hindêk peyv hene ku digel peyveke erebî ya hevwatera wê bi hev re têne xebitandin. Bo nimûne, “der û cîran” Peyva “dengûbehs” jî yek ji wan peyvane e ku dide xuyakirin ku dengbêj, behsbêj e ne ku sewt-sedabêj e. Her wekî dî “deng û dengî” ku bi kurmanciya jêrîn jî dibêjin “dengo” beranberî “behs û riwayet-söylenti” ve têne xebitandin.”⁶⁸

Dengbêj li gorî tradîsyona devkî û dîroka devkî, permormansa xwe ya hunerî li ser esasên hefizyê ava dîkin. Ew xwediyê hefizyên pir xurt û fiksiyonên pir serkeftî ne. Bi vê hefizya xwe, meseleyên ku li der û dora wan rûdane, wekî romannûsekî/ê *jinûve* li gorî terzê û berhemdariya xwe afirandine. Kilam û stranên dengbêjiyê, her çend tiştên fiksiyonel bin jî, di nav berhemdariya hunermendiya wan de, gelek rûdanên ku xwe dispêrin rûdaneke/rastiyeke dîrokî jî hene.⁶⁹ Ev taybetmendî wekî çarçoveya tradîsyona kultura devkî, di gelek berhemên wan de aşkera dibe. Stranên ku ji aliyê dengbêjan ve têne gotin, yekser xwe dispêrin keşeyên civakî û her wiha rasteqîn. Ew stran wekî destanekê têne rîstandin û leheng û karakterên wan stranane, di gelek nimûneyan de kesên xeyalkirî û fiktîf nîn in.⁷⁰ Dengbêj wekî tradîsyonel, xwedî hefizyeyeke pir xurt in, dengê wan jî xweş in û hunera xwe bi enstruman û amûrên mûsîqeyê îcra dîkin. Atmosfera ku ew di nav de dijîn, tesîra xwe li ser terza berhemdariya wan jî dike. Ew di nav jiyaneke gundewar de û bi rêbazên devkî mezin dibin û taybetmendiyên pastoral di nav hunera wan de her xwe aşkera dike. Dengbêj bi tenê rûdanên herêmî, ji Kurdistanê belav nakin. Ew xisûsî, taybetmendiyên Kurdewar wekî aktorekî belav nakin, û bi xwe jî disêwirînin an diafirînin. Ew bestekar û şair in jî.⁷¹ Dengbêj berhemên kurdî, bi tenê belav nakin û naafirînin. Her wiha ew stran û helbestên kurdî, gotin û xisûsiyetên folklorîk jî dîkin anonîm û afirîneriya bizavên folklorîk dîkin. Ev taybetmendî ji bo cihê wan û fonksiyona wan a di nav kultura kurdî de jî aşkera dike.

Dengbêj; stran, poem û klamên xwe wekî teşeyî, hem bi awayekî manzûm, hem jî bi awayekî pexşan dibêjin. Bo vê yekê jî, stranên dengbêjiyê di nav kelepîra kurdî de, form û cûneke cuda ne. Lewra ew hem pexşan û hem manzûm û hem çîrok û hem jî stran in. Dengbêj jî van stranane bi meqam dixwînin û çîrokan bi terzê xwe dibêjin.⁷² Lêkolînerên ku li ser dengbêjiyê dixebitin, berhemên dengbêjan wekî belgeyên dîrokî dinirxînin û stranbêjiya kurdî bi tenê wekî stran hizir nakin. “Kilamên kurdan, mînanî stranên gelên din ne tenê stran in.

⁶⁸ Mazlum Doğan, *tirkîfikasyona Xwemalî, Di Zimanê Medyaya Kurdî de Li Bakûrê Kurdistanê*, (Ev nivîsar, li Komxebata Ziman û Perwerdehiyê ya Navnetewî 2010 hate pêşkêşkirin.) (<http://www.zazaki.net/file/tirkifikasyon-.pdf>) (12.05.2012)

⁶⁹ Mela Mehmûdê Bazîdî, derbarê rûdanên derdor qewimî û honandina wan a ji aliyê dengbêjan ve di kitêba xwe ya bi navê *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî* de gelek nimûneyan pêşkêş dike bo xwendavanan. Bo agahiyên bêhtir bnr, Mela Mehmûdê Bazîdî, *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, amadekar, Ziya Avci, Weş. Lîs, 2010, Diyarbakir, r.127

⁷⁰ Nedim Dît, *Dengbêj Geleneğinin Sonu ve Bu Geleneğin Son Halkası*: Reso. Kovara Bîr, j. 6

⁷¹ Kendal Nezan, *Kürt Müziği*, wer. Necdet Hasgül, Weş. Avesta İstanbul, 1996, r. 12-13

⁷² K. Burcak, h.b., r. 216

Taybetiyên xwe hene. Ew hem stran in, hem jî belgeyên dîrokî ne. Hem neynika sosyolojiya kurdan û mantalîteya kurdan in û hem jî xezîneya zimanê kurdî ne.”⁷³

Dengbêjî wekî beşeke kultura devkî û forma edebiyata gelêrî, li gor sîstemekê îcra dibe. Ev kultur her çend di nav gel de, ji aliyê gelek kesan ve bê îcrakirin jî, yekser li gor sîstemekê pêş ve çûye û bûye tradîsyonek. Ev kultur çî di nav gel, çî jî di nav arîstokrat û asilzadeyan de hatiye icrakirin. Naveroka van stran û destanên gelêrî, li gor rastiyên wê pir cuda ne. Rûdanên li nav gel, meselok, kêşeyên siyasî, lehengiya ji aliyê gel ve hatiye qebûlkirin, evîn û hezkirinên ji aliyê civakê ve hatine sînorkirin, şer û cengên kurdan, yên ku di dema xwe de qewimîne, destan, efsane û her wiha hêmanên hîcw û qewlikî di nav vê hunerê de hatine îcrakirin.⁷⁴ Şîroveyên derbarê dengbêjan de, piştî sedsala XXan di nav konteksteke netewî de hate ravekirin û derbarê bingeha kultura kurdî referansên arkaîk, her lê hate barkirin: “Gelê kurd, ji dîrokê ta niha, bi kultura dengbêjîyê, şert û mercên siyasî û civakî, êrîş û gefên li her şeweyê jiyanê, pesn û senayên estetîk û jiyana rojane bi dengbêjan têgehiştîye û wekî huner îcra kiriye”.⁷⁵

Wekî li jor hatî diyarkirin, dengbêj di nav rûdanên di jiyana kurdan de qewimî, yên dîrokî de cihekî fonksiyonel girtine. Gelek şerên rû dane, bi formeke edebî îcra kirine û ev yek di nav tesnîfên berhemên dengbêjîyê de mirov dikare wekî *epîk* jî terîf bike. Lewma jî gelek destan, stranên derbarê rûdanên nav eşîran, gehîştine îro. Dema mirov wezîfeya wan berhemên ku ketine nav hefîzeyaya civakê dinihêre, dengbêj bi tenê kesên ku muzîkjen nîn in. Çimkî ev berhemên ku gehîştine ber destên me, derbarê rûdanên dîrokî de jî me bi gelek tiştan dihesînin. Serhildanên ku nêzî 100 sal berî niha qewimîne, bi teswîrên wan, îro ji aliyê lêkolîneran ve wekî malûmatên dîrokî jî têne qebûlkirin. Li ser *Abdal Xan, Yezdan Şêr, Şekir Axa, Şêx Seîd, Nurullah Paşa, Xelîl Begê Cibrî, Îhsan Nurî Paşa, Biroyê Heskê Têlî, Şêx Mehmûd Berzencî, Seyîd Riza*⁷⁶ û gelek kesên din, ji aliyê dengbêjan ve wekî lehengên destanan hatine honandin. Her çend ew di nav lêkolîneran de zêde bêne romantîzekirin jî, dîsa ev rastî di stranan de bi awayekî edebî û hatiye honandin.

Dengbêj bi tenê hunermendên deng û gotinê nîn in. Ew wehayên berî û çolistanên mêjî û dilan bûn. Trajedyên wekî Dêrsim û Şêx Seîd, bi gotin û awazên wan, ji bo kurdan bûn bîr

⁷³ Ahmet Aras, *Kilama kurdî û Dengbêjiya Serhedê*, Kovara Bîr, j. 7,

⁷⁴ A. Pariltî, b.n., r. 27-44

⁷⁵ Mehmet Zahir Kayran, *Kürt Folklorunda Dengbêjlik Geleneği*, amd. Mehmet Bayrak, *Kürt Müziği, Dansları ve Şarkıları*, Cilt 1, Weş. Özge, Ankara, 2002, r. 510

⁷⁶ Helbet ew kesên ku di berhemên dengbêjan de bi cih digrin, di hefîzeyaya civakê de jî şexsiyetên qedirgiran in û ji xwe yek ji wezîfeya dengbêjan honandina wan e. Di vê tşkiliya payebilindkirina şexsiyetan de, gelek faktor hene. Lê faktora herî girîng, patronaj e. Dengbêj, di stranên de, nemaze kesên xwedî statûyeke civakî û qedirgiran dihonin û piştî demekê dibin dengbêjê wan kesan.

û baweriyeke dîrokî.⁷⁷ Dîsa di dîrokê de jî, gelek rûdan bi tradîsyona dengbêjiyê îro wekî çavkaniyên dîrokî tên nirxandin. *Xanê Lepzêrinê* ku li dijî *Şah Abbas* serî hildabû û wekî efsaneyekî di hefizeya civakî de mabû, di destana *Dimdimê* de ji aliyê dengbêjan ve hatibû qeydkirin. Ev çîroka wî xwe dispêre rûdaneke dîrokî, lê ew hem di edebiyata nivîskî de hem jî di zargotina kurdî de wekî çîrokeke manzûm hatiye rîstandin⁷⁸ Ji bilî forma manzûmê, piştî forma pexşanê jî di nav destanê de bi cih girtiye. Girîng e ku ev destana ku ji aliyê dengbêjan ve hatiye honandin û rûdana ku di navbera salên 1608, 1610an de li devera Mergêverê qewimiye, ji aliyê dîroknûsê Îskender Bek Turkman (1560-1633) ve jî hatiye qeydkirin. Di kitêba wî ya bi navê *Tarih-i Alamaray-i Abbasi*⁷⁹ de behsa wê rûdanê tê kirin û ji wê seyr û ecêbtir, ew tiştên ku dengbêj di destanê de dibêjin, agahiyên ku ji aliyê Îskender Bek Turkmanî ve hatine gotin piştras dikin.

Tradîsyona dengbêjiyê di nav têkiliyên pêşveçûna kultura nivîskî û elektronîk û kultura devkî de pir zû tê guhertin û ew yek jî dibe sedema guherîna/têkçûna wê tradîsyonê. Helbet kultur ne babeteke sabît e û heta niha çî kultur jî nekaribûne xwe li hemberî veguherînan biparêzin û kultur ne ew tişt e ku were parastin jî. Gelek sedemên dîrokî, civakî, kulturî û siyasî tesirên esas li ser geşedana kulturî dikin. Berî her tiştî dengbêjî êdî di nav jiyaneke nivîskî de, di nav îmkanên teknolojîk ên wekî radyo, televîzyon, telefon û gelek enstrumanên din de, ji xwe re nikare seheyên kulturî peyda bike daku geş bibe û ji nû ve bê îcrakirin.⁸⁰ Ew di nav têkiliyên kulturî de vediguhere qadên kulturî yên din. Her çend îro, stranên dengbêjiyê ji aliyê gelek kesan ve bêne gotin jî, dîsa tradîsyona dengbêjiyê êdî wekî *kultureke qedîm* û *âidî heyamên berê* tê dîtin.⁸¹ Çimkî kultur, tiştê sabît nîn e ji rûdanên der û dor mutesir dibe û her û her diguhere.

Çawa ku li jor jî hate diyarkirin, hunera dengbêjî û ew şerîta tradîsyona klasîk, ji ber gelek sedeman heta serdemekê gelek xurt û zindî bû. Çimkî di bingeha motîvasiyona berdewamkirina vê hunerê de, têkiliyeke hîmayekirinê hebû ku dibû sedema afirandina hunerê. Gelek dengbêj, li qesr û qonaxên mîr û begên kurdan û esilzadeyan de di bin bandora

⁷⁷ Salihê Kevirbirî, *Kürt Halk Türkülerinden Seçmeler*, Weş. Evrensel, İstanbul, 2004, r. 10

⁷⁸ Kemal, Burak, b.n., r. 216

⁷⁹ Ev kitêba *Tarih-i Alamaray-i Abbasi*, ji aliyê Ordîxanê Celîl ve, bo lêkolînên derbarê xebatên Kurdistanê yên sedsala XVI, XVIIan jî wekî kitêbeke hêja tê qebûlkirin. Ev agahiyên derbarê wê kitêbê jî ji Ordîxanê Celîl hatine wergirtin. Bo agahiyên berfirehtir, bnr. Ordîxanê Celîl, *Kürt Kahramanlık Destanı Dimdim* de wer. İbrahim Kale, Weş. Avesta, İstanbul, 2004, r. 11-14

⁸⁰ Di vir de tiştêkî balkêş jî heye ku, îmkanên kultura elektronîk û teknolojîyê, her çend li dijberî kultura devkî werin formulekirin jî, di rastiyê de îcrakarên kultura devkî, bi îmkanên teknolojîyê û amûrên elektronîk, dikarin hunera xwe belav bikin. Îro, em baş dizanin ku, bi saya îmkanên amûrên elektronîk, dengbêjî di nav civaka kurdan de belavtir bû.

⁸¹ Di xebatên derbarê dengbêjiyê de, referansên arkaîk her tim bo kultura dengbêjiyê tên kirin û ew wekî kultureke qedîm tê nirxandin. Antolojiya Dengbêjan, xebatên navenda kulturana, bernameyên televîzyonan ên dengbêjiyê de ev yek her wisa tê terfîkirin.

wan de kesan de bûn. Lê kengî ku şert û mercên polîtîk û pêwendiyên hegemonîk veguherîn, ew jî di nav xizaniyê de û her wisa bê hamî man. Bi guhertina şert û mercên wan ên sınıfî ve şêweya stran û klamên wan jî qels bûn û naveroka berhemên wan jî guherîn. Taybetmendiyên wê yên destanî têk çûn, epîk xerab bû û kesên ku ew huner îcra dikirin jî di nav xizaniyê de man. Van geşedanan, hunera dengbêjiyê bi awayekî esasî veguherand û mirov dikare wê serdemê wekî serdema klasîk bi nav bike. Bi guherîna têkiliyên hegemonîk ve, piştî ku mîr û begên kurdan têk çûn ew jî êdî ji patronajê/hîmayeyê mehrûm man. Piştî sedsala XXan bi pêşveçûna îmkânên nivîsê û tezahurên şoreşa teknolojiyê rituelên devkî zû guherîn.

Hunera dengbêjiyê ya ku xwe dispêre tradîsyoneke devkî, çî ji aliyê formê, çî ji aliyê naverokê ve, di hemû kultura civakan de heye. Her millet û civak; di qonaxên xwe yên pêş-modern de (nemaze jî tezahurên nivîsê kêr) beriya ku neketibûn bin bandora kultura nivîskî, xwedî tradîsyonên devkî yên bi vî rengî bûn. Di nav civakên Rojava bi *Homeros* ev kultur geştiye merheleyeke bilind. Şagirt û şûnşopên *Homeros* piştî mirina *Homeros* xwendîngeha vê hunerê vekirin û ev huner piştî mirina wî jî dom kir. Ew kes jî bi şivên *rhabdosê* geriyane û destan û helbestên xwe gotine. Di dema serdema navîn de li Ewropayê jî kesên ku ev huner di nav tradîsyonekê de îcra dikirin hebûn. Ev huner ji aliyê *mînstrel* û *bardan* dihate îcrakirin. Li Îngilistanê navê wan hozanan *Jester* an *Mummer*, li Fransayê *Troubadour* bû. (Troubadorên frensî, li gor muxteviyata vegotinê û têkiliyên bi pergala Şovalîtiyê gelek dişibin dengbêjan û ji bilî wê, li hemberî musîqeya dêrê cureyê musîqeyê nû derxist holê. Nemaze ew huner di şer de li der û dora agir hin stran û çîrok hatin gotin û ev di paşerojê de belavî nav gel bû.⁸²) Piştî êrişa normana ya li Îngîlîstanê, hin çîrokbêj derketin û ev bi eslê xwe Anglo Sakson bûn û navê wan *Gleeman* bû. Îcrakarê vê hunerê di nav elmanan de *Bangelsanger* bûn û wan kesan çîrokan xwe li mîhrîcanan, panayiran û bazaran bi melodiyên yekaheng vedigotin. Ew kes jî evdal û gerok bûn. Li gel Çermsoran jî ev huner pirr zindî bû. Ji bo ku mirov bibin kesên qenc û xwedanxêr, divê wan guhdariya çîrok û metelokan bikira. Kevneşopiya çermsoran bi motîfên dîrokî, mîtolojîk û kulturî xemilandî bû. Li Asyaya Rojhilat jî ev kultur bo wan civakan gelek bi hêja bû. Li Hîndîstanê bawermendên *Vedîzmê*, heta ku nivîs hatibû îcatkirin, beriya zayînê 1500-900an kitêba pîroz a bi navê *Veda* bi devkî digotin û ew jiber dikirin. Vedaya ku wekî “zanîna pîroz” dihat pejirandin, di pey re de bi form û teşeyên tradîsyonel xemilî bû. Mamosteyên Brahman û *Guruyan* ew kultur bi esasên hosta-şagirtiyê jiber dikirin. Îro jî li Hîndîstanê hikayetbêj hene, ji wan re dibêjin *harîkatha*. Di kevneşopiya japonan de jî huner bi mûsîqeyê û dengê xemiliye. Ji van kesan re dibêjin *Heike* û wan

⁸² Cavidan Selanik, *Mûzik Sanatının Tarihsel Serüveni*, Weş. Doruk, Ankara, 1996, r. 46,

hozanan hunera xwe hem bi mûsîqe û hem jî bêenstruman îcra kirine. Di nav koreyîyan jî ev kultur bi xisûsiyetên şanoyî îcra bûne.⁸³

Dengbêj îro li gor sîstemeke tanzîmkirî perwerde nabin. Ev yek jî taybetmendiyeye kultura devkî bi xwe ye. Perwerdeyeye biserûber, her çend têgeheke modern û metodolojîk be jî, di nav xisûsiyetên zargotinê de, bi rê û rêbazên gerdîşî, dengbêjan xwe perwerde kirine. Ev prosesa gehîştina wan, di dirêjahiyê temenê wan de hêdî hêdî kamil dibe. Yekser kesek li ber destê dengbêjekî hînî vê tradîsyonê dibe. Wadie Jwaideh, ji bo perwerdebûna dengbêjan (ew nabêje dengbêj lê mexseda wî ew e.) û îcrakirina vê hunerê, behsa pergaleke perwerdeyê nake. Lê di sedsala XVIIan de, li Başûrê Kurdistanê, behsa dibistanên ku şair û goranîbêjên lê perwerde dibin, dike.⁸⁴ Her çend li başûrê Kurdistanê mektebên perwerdeyê yên şairan hebin jî, li bakûrê Kurdistanê em rastî çî çavkaniyên ku behsa vê tradîsyonê dikin, nehatin. Dicle Yıldız Katar, di xebata xwe ya li ser dengbêjiyê de diyar kiriye. Di serdema klasîk de, perwerdehiya dengbêjiyê, li gor cudahiyên cografîk li deveran curbicur bûye. Her çend li başûr û rojavayê Kurdistanê, ji bo perwerdekirina şair û edîbên xwedî dîwan, mekteb hebin jî, ev tradîsyon, li Bakûrê Kurdistanê, di nav gel de û bi taybetî li malên giregiran û li qesr û qonaxan îcra bûye.⁸⁵ Îro jî hin sazîyên kurd ên ku xebatên xwe di bin banê şaredariyan de dimeşînin ên bi navê *Mala Dengbêjan*, û navendên kulturalan, ji bo ku dengbêjiyê ji geşedana teknolojiyê û tezahurên kultura nivîskî rizgar bike, hewl dide. Helbet teşebîsên bi vî rengî, xwe dispêrin polîtîkayên kulturkujiyê yên dewleta tirk. Lê ev tişt vê hunera dengbêjiyê di nav paradokseke dîrokî de heps dike. Çimkî, tezahurên çêbûna bajarvanîyê, îcatbûna amûrên teknolojiyê, karîgeriya radyo, televîzyon û kiryarên nivîsê, her tim dibin sebeb û vê kulturê diguherînin. Ev xal dê beşên din de jî dê were gengeşekirin.

Piştî hêza mîrektiyên kurdan hilweşîyan, cihên wan ên wekî qesr û qonax jî têk çûn, tekya û zaviye jî hatin girtin. Her wisa, avahiyên kevneşopî yên perwerdeya ilmî û dînî lê dihat kirin jî têk çû. Ji ber ku prosesa avakirina nasnameya kurdî li bakur, bi rengekî sekuler, pêş ve çû, ew avahî jî di bin tesira wê de man. Rewşenbîrên kurd anku Marksîzm bi serobero fêr bûn û bi nêrîneke “sekuler” li medreseyên kurdan nihêrin. Cegerxwîn û Şivan Perwer digot “Şêxa bikujin, mela pelêxin.” Ev nêrîna rewşenbîrên kurdan jî bû sedema têkçûna sinifa

⁸³ A. Parilti, b.n, r. 47-57

⁸⁴ W. Jwaideh, h.b, r. 47

⁸⁵ Dicle Yıldız Katar, *Kürt Sözlü Kültüründe Kadın Dengbêjler: Ayşe Şan ve Meryem Xan*, t.ç., Zankoya Yakın Doğu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, r. 30

kurdan a ku nivîs û xwendewarî di destê wan de bû.⁸⁶ Di qelsbûn û têkçûn an jî binavkirineke din ve, guherîna kultura dengbêjiyê de, gelek faktorên ji hev cuda hene.

Pêwendîya berhemên kultura devkî ku tê de behsa gelek serencam, efsane, çîrok û helbest hene, ji bilî van tiştan bi awayekî asayî li ser formeke muzîkal jî ava bûne. Ev taybetmendî jixwe di kultura devkî de di nav hevdu de ye ku, ew kesên stran, çîrok, efsane û gelek nimûneyên zargotinê îcra dikirin, ji aliyekî din ve îcrakarê muzîkî jî bûn. Ango mirov dikare bibêje ku, muzîk û berhemdariya kultura gelêrî û nemaze jî dengbêjî, bi hevdu re gelek eleqedar in. Di dema Şamanan (Şaman; alimên dînî yên hin milletên eşîrî yên ku gazî rih û cinan dikirin) de jî, ku mirov dikare wê jî di nav tesnîfa kultura devkî de bike, rol û mîsyoneke wan a mîstîk jî hebûn. Gelek bela û bobelatên dihatin serê xelkê, ji aliyê wan ve dihatin defkirin û ew xwedî wezîfeyeke terapîk jî bûn. Derbarê vê tîkiliyê de Remezan Alan van tiştan dibêje:

“Ku em ji vir dest pê bikin em ê bibêjin: Ji bo gel û civakên wisa, mûzîk û helbest û dengbêjê afirînerê wan, aktorên vê kulturê ne. Ji Fuat Köprülü ji bo tirkên; ji Georg Thamson jî ji bo yewnanî û îrlandîyan em hîn dibin ku di van gelan de mûzîkeke tenê ji amûrê pêkhatî tunebû, helbestên herî xweş ji bo ku bi awazekê re bêne xwendin, dihatin gotin. Yanê di destpêkê de mûzîk û helbest yek bû. Ne ji hikmê wan, ji rola dengbêj wisa bû. Ev kesê payebilind, merasîmên herî kevin (ku tev jî olî bûn) bi rê ve dibir, di wan de bi miqamî helbestan dixwend, ji xeybê xeberan dida, nexweşî û bêyomîyan dahf dikir... Di nezera pir gelî de dengbêj, remildar û kahîn bû jî. Pertbûna vê baweriyê, ji vê waqiyê dîza: Dengbêj, ji ber ku rabirdûyê dizaniya, ji dahatûyê jî xeberdar bû. Îlmê wî, ilmê çavkaniyan bû.”⁸⁷

Di nav milletên cîran ên wekî tirkên de jî tradîsyona wêjeya aşiqan, bi hin taybetmendiyan xwe, karakterekî wekî dengbêjan nîşan dide. Aşiqên tirkên jî, di çarçoveya wêjeya serayê û ya gundan de wekî dengbêjan karakterekî gundewariyê temsîl dikin.⁸⁸ Tradîsyonê aşiqiyê, ji sedsala XVIan vir ve di nav wêjeya gel de tê tasnîfkirin û her wisa aliyê wê yê hikayet û musîkê jî tê destnîşankirin. Her çend ev tradîsyon zêdetir di nav ocaxên leşkerî de zêdetir hatibe pêşxistin jî, wekî kultureke gel, aşiqî vê navê xwe ji zimanê ermenî *aşuğê* werdigre û di edebiyata tirkî de jî bi heman awayî tê binavkirin.⁸⁹ Dema ku mirov li taybetmendiyan vê tradîsyonê dinihêre, gelek karakterên wekî tradîsyona dengbêjiyê jî di nav

⁸⁶ Nezan Çelebî, *Kürt Müziğinde Dengbêjlik* (<http://www.daplatform.com/news.php?nid=12757&PHPSESSID=cb857d26a3d3003f09eb56001f5272b1>) (05.05.2012)

⁸⁷ Remezan Alan, *Bavê Hlebesta Gelêrî û Ferxên Wê*, Kovara Bîr, j. 1, 2005 (<http://www.kovarabir.com/remezan-alan-bave-hlebesta-geleri-u-ferxen-we/>) (07.05.2012)

⁸⁸ Pertev Naili, Boratav, *Halk Edebiyatı Dersleri*, Weş. Tarih Vakfı, İstanbul, 2000, r.90

⁸⁹ Pertev Naili, Boratav, *Âşık Edebiyatı*, Kovara Türk Dili Türk Halk Edebiyatı Jimara Taybet, C. 19, j. 207, 1 Kanun 1968 (340-357), r. 340

xwe de dihewîne. Ew kultur jî xwe dispêre honandina devkî û temsîlkarên wê yên wekî aşiq jî xwediyê hefizeyeke xurt in. Aşiq, vê hunera gelî, ji hostayekî fêr dibe û tecrubeya ku werdigre jî neqlî nîfş û aşiqên din dike. Di vê neqlkirinê de tiştê muhim ew e ku, ew neqlkirin bi riya devkî pêk tê û bi vî karakterê xwe ve taybetmendiyan wekî dengbêjan nîşanî me dikin. Wehkeviya kulturî ya di navbera dengbêjan û aşiq/ozanên tirkî vê lêkolînê bi vî awayî eleqedar dike. Pertev Naili Boratav vê yekê di xebata xwe wiha îfade dike:

“Hozanên gundan, an ji navendên kulturî ji dûr mane, an jî -her çend di wan deran re jî derbas bibin- taybetmendiyan xwe parastine û yekser li wan deran nemane. Ev temsîlkarên kulturî, hunera xwe li odeyan gundan, li dawet û organîzasyonên gundiyan, an jî li cihên zêde taybetmendiyan bajarî nîşan nadin ên wekî mala axayan, began û giregirên gundan îcra kirine. Divê ev yek were destnîşankirin ku, aşiqan; li çolteran/taşrayan komeke ku di warê ekonomiya gundewarî de serdest, nemaze jî li cihên wekî Anatoliya Rojhilat ji xwe re her tim girseyeke ku guhdariya wan kirine peyda kirine.”⁹⁰

Her çend di warê îcrakirina kulturî de aşiqan, taybetmendiyan wekî dengbêjan nîşan bidin jî, di warê ziman, motîf, ûslub û formên metnan de jî heman karakterî temsîl dikin. Wekî di beşên pêş de jî hate destnîşankirin, aşiqên wêjeya tirkî, di hunera xwe de qalibên zimanî yên hunerane, biwêjên dewlemendiya ziman nîşan dikin û formên kultura kolektîf ên wekî gotinê pêşyan jî di hunera xwe de afirandine.⁹¹

⁹⁰ Pertev Naili, Boratav, h.b., r. 343

⁹¹ Erman Artun, *Aşık Şiiri Geleneğinde Dil, Üslup, Motif ve Metin Merkezli Anlama-Açıklama Üzerine Düşünceler*, Sempozyuma Güneydoğu Avrupa’da Osmanlı ve Osmanlı Sonrası Türk Uygarlığının Öteki Uygarlıklarla Halk Kültürü Yönünden Karşılıklı Etkileşimi, Gagavuzyeri, Moldova 2007, r.5 (http://turkoloji.cu.edu.tr/HALK%20EDEBIYATI/erman_artun_asik_siiri_gelenegi_metin_merkezli_yaklasim.pdf) (29.06.2014)

BEŞA YEKEM

DI DEMA OSMANIYAN DE, PERGALA ÎDAREKIRINÊ Û SERBESTIYA MÎREKTIYÊN KURDAN

Ji bo têgehiştina paşxaneya kultura kurdî ya ku pêwendî bi desthilatî re heye, divê mirov çav li sîstema mîrektiyan bigerîne, da ku bibîne, di çêbûn û belavbûna kulturê de rola desthilatîyê heta çî dereceyê heye. Di paşxaneya bizavên kulturî de, roleke desthilatîyê heye û ev yek ji bo hunermend, edîb û zanayan dibe motîvasyona pêşxistina hunerî û edebî. Her wisa, sîstema mîrektiyan a ku tesira wan li ser geşedana kultur û edebiyata kurdî çêbûye, dê ji bo vê xebatê jî bibe xaleke girîng û çarçoveya xebatê rave bike. Di nav pergala dewleta osmaniyan de mîrektiyan kurdan, xwedî hindek statuyan bûn ku, di nav desthilatîya xwe ya bi sînor de rêveberiya xwe dikirin. Împaratoriya osmaniyan, teqriben 700 salî li cîhanê bi sîstemeke patrîmonyal serdestiya xwe qayîm û daîm kiribû, li gelek der û deveran hikumraniya xak û îdareyê mîletên cur bi cur kiribû. Li Kurdistanê jî, piştî têkçûna dewleta selçûkiyan, pêwendiya osmanî û mîrektiyan kurdan dest pê kir. Di sedsala XV û XVIan de ev pêwendî geştiyê dereceyê bilind û hin mîrektiyan kurdan, li hemberî geşedanên alîgiriya osmaniyan, hindekê din jî li dijî osmaniyan bûn û têkiliya wan a dualî heta sedsala XXan berdewam kiriye. Di nav van têkiliyan dualî de, geşedanên siyasî, tesira xwe li ser geşedanên edebî û hunerî jî kir. Di vê beşê de, ev yek dê were nirxandin.

1.1. Pergela Îdarekirina Kurdistanê

Karakterê civaka kurdan, heta sedsala XXIan sertaser, ji pêkhatiyên eşîr, koçer û gundî ava bûye. Sîstema îdareya kurdan jî di peywenda vê karakterê de ava bûye. Di gelek çavkaniyan dîrokî de em dizanin ku îdareya Kurdistanê, di nav xwe de bi awayekî serbixwe bûye û piştî geşedanên siyasî û civakî, ev sîstem guheriya an hatiye guhertin. Ev avahiya civaka kurdan, li gor dînamîkên dîrokî pergaleke îdarekirinê jî derxistîye meydanê. Kurdan, di nav şert û mercên xwe yên civakî de, pergala xwe ya îdarî jî tanzîm kirine.

kurd bi rêveberiya mîr û derebegan, ji sedsala VIan heta sedsala XVIan. di nav rewşeke pîrr dînamîk de îdare bûne. Ev dem, bi qebûlkirina Îslamê ve reng û temayeke Îslamîk li ser civak û sîstema îdarekirina Kurdistanê kiriye. Helbet li her aliyê Kurdistanê, ji ber sedemên dîrokî, heman rûdan nehatine pê û li deverên cur bi cur, encamên îdarekirine yên cuda aşkera bûne. Encamên şertên makrososyolojîk ên ku ji derveyî dînamîzma mîrektiyan jî

di vir de karîger e. Nemaze têkiliyên desthilatîyê yên osmaniyan û safeviyan, ji bo mîrektiyan, bû teraza xurtkirina sîstema mîrektiyan. Bi alîkariya mîrektiyan, osmaniyan îstîqarara xwe ya îdarî li Kurdistanê û Mezopotamyayê ava kir. Li beramberî van alîkariyan ew jî ji aliyê osmaniyan ve dihatin qebûlîkirin⁹² Têkiliyên li gorî berjewendiyên wan dihatin avakirin an xerabkirin.

Îstîlayên Moxol û Turkmenan a ku ber bi Rojhilata Navîn (sedsala XI. û XIV.) hem li Kurdistanê hem jî li Rojhilat bûne sedema bêîstîqrariyê û atmosfera siyasî, civakî û têkiliyên desthilatîyê gelek guherand.⁹³ Encamên van rûdanan bi awayekî aşkire, tesira xwe li ser kurdan kiriye. Eşîr û mîrektiyên kurdan jî ber bi bakur û rojava koçber kirin û heta Ermenîstana îro hatin. Piştî dawiya sedsala XVan û destpêka sedsala XVIan di navbera dewleta osmaniyan û safewiyan de têkoşîn û şerê desthilatîyê derket holê û ev yek di encamê de li Kurdistanê îstîqrareke siyasî derxiste holê. Her du împaratorî li Kurdistanê derketin pêşberî hevdu û mîrektiyên kurdan jî di nav şerê wan de xwedî hêz û desthilatîyên curbicur bûn. Di sedsala XVIan de rêveberên osmaniyan hem bi serkeftinên xwe yên leşkerî û hem jî bi polîtîkayên xwe yên aqilane, îdareya Kurdistanê bi dest xistin û mîrektiyên kurdan xistin bin bandora xwe û Kurdistan îlhaq kirin.⁹⁴ Her çend Kurdistan bi awayekî îdarî di bin bandora osmaniyan de be jî, mîrektiyên kurdan jî, ji şerê wan her du împaratoriyan sûd wergirtin û desthilatîya xwe însakirin. Mîrektiyên kurdan, îdareya Kurdistanê hildan destê xwe û ev yek wekî sîstema monarşîk ji bav derbasî lawîk bû û xanedaniyên mezin derketin holê. Piştî berberiya dewleta osmaniyan û safewiyan, rayedariyên mîrektiyên kurdan qewîtir bûn û dilsoziya mîrektiyan a bo hegemonyaya osmanî zexmtir bû. Di şer û sulhê de ew rêvebirên osmaniyan ên ku li devera Wanê cîwar bûn, bi saya serê mîrektiyan dihatin parastin.⁹⁵ Li vir mirov dikare bibêje ku, siyaseta sînor a osmaniyan û safewiyan, di çarçoveya makrososyolojîk de, Kurdistan wekî parêzgehekê (tampon) hiştiye û sedema hebûna wan dewletan, rewşa Kurdistanê bi xwe bû.⁹⁶

Di destpêkê de artêşa osmaniyan ji siwariyên eşîretan ku wekî *sipahî* dihatin zanîn pêk dihat. Ji ber ku wan xizmetguzariya leşkerî dikir, navê wan “derebeg” bû û ji bo

⁹² İlber Ortaylı, *Türkiye Teşkilat ve İdare Tarihi*, Weş. Cedit, Ankara, 2010, r. 121

⁹³ Derbarê koçberkirina tirk û moxol û tataran de çavkaniyên kurdî, vê yekê bi refleksên bindestiyê her rave dikin. Lewma jî, bindestiya kurdan dispêrin talankirin û barbariyê. Çavkaniyên derbarê dîroknûsiya kurdî de ev xal gelek caran tê dubare kirin. Bo vê behsê, bo zanînen berfirehtir, bnr. Ekrem Cemil Paşa, *Dîroka Kurdistan Bi Kurtebirî*, Weş. Enstituya kurdî ya Brukselê, Bruxelles, 1995, r.200

⁹⁴ Martin van Bruinessen, *Ağa, Şeyh, Devlet*, wer. Banu Yalkut, Weş. İletişim, İstanbul, 2004, r. 204-205

⁹⁵ Sinan Hakan, *Müküs Kürt Mirleri Tarihi ve Han Mahmud*, Weş. Pêrî, İstanbul, 2002, r.16-17

⁹⁶ Hasan Yıldız, *Aşiretten Ulusallığa Doğru Kürtler, Politik Felsefe Açısından Kürt Toplumunun Kritiği*, Weş. Hêviya Gel, Stockholm, 1989, r. 25

xizmetguzariya wan a leşkerî erd û xak ji aliyê sultanen ve wekî *tîmar* bo wan dihat dayîn. Xwedîyên *tîmaran*, li gor qanûnên eyaletan, rêveberiya gundiyan dikir û ji wir sûd werdigirt. Lê li beramberî vê yekê hindêk berpirsiyariyên wan jî hebûn. Divê bo xezîneyê dewletê *bac* kom bikirina û divê erd û xaka ku di bin hikumraniya wan de bûn biajota, an bida ajotinê. Ya din jî ew leşkerên siwarî ku di bin fermana wan de ne, bihewîne û bi sîleh û çek bike daku bo seferên împaratoriye her tim wan amade bike. Hejmara siwariyan (cebelî) li gor hasilata zêdebûna *tîmarê* dihat diyarkirin û ev yek bi hesabê akçeyê dihat hesabkirin. Her wisa *Zeamat* ji bo efsarên sipahiyan dihat dayîn. Tîmareke cuda jî hebû ku bo kesên rutbedarên împaratoriye yê wekî mîrê senceqan dihat dayîn. Navê wê jî *xas* (has) bû. Xas ji gund û gundiyan dihat wergirtin û bi berhevkirina bacan îdareya împaratoriye pêk dihat. Têqriben di navbera 100.000 û 600.000 hezar akçe bo mîrê senceqan dihat dayîn û milyonek akçe jî bo mîrê mîran dihat dayîn. Ji ber sîstema bexşkirina xakê, nîzama artêşa sipahiyan ya hiyerarşik jî belavî hemû erd û xakên ku di bin hikumraniya împaratoriye de dibû.

Di navbera salên 1514 û 1517an de ew erdên ku ketibûn nav xaka împaratoriya osmaniyan, li Kurdistanê dabeşî 3 eyaletan bibû. Diyarbekir, Rakka û Musil. Di nav van eyaletan de rêxistina îdarî cara ewil li Diyarbekirê destpêkir. Ev sîstema îdarekirinê, bi berpirsî û mesuliyeta Îdrîsî Bîdlîsî ve hat kirin. Îdrîsê Bidlîsî binemal û malbatên esilzade yê li Kurdistanê anî ser wezîfe û meqamên bilind. Her wiha rewşa wan malbatên esilzade bi hêztir bû. Gelek deverên Kurdistanê jî bi wî awayî *serbixwe* bûn. Ew yekîneyên ku îdareya Kurdistanê dikirin, bi navê hikumeta kurd dihatin zanîn û ew kes ne mecbûr bûn ku bacê bidin împaratoriye û leşkerên xwe bişînin nav artêşa sipahiyan. Xakê ku di bin hikumraniya wan de bû jî, nedibû zeamat û tîmar. Deverên eyaletê yê din jî, dabeşî bîst senceqan bibû. Hindêk ji van senceqan, ji aliyê mîrê senceqan ku ji aliyê sultanen ve dihatin tayînkirin, îdare dibû. Hikumeta navendî, xwedî maf û mesuliyetê bû ku têkilî rêveberiya van senceqan bibûya. Ew kesên erkdar, ji aliyê mîrêmîran ve dihatin wezîfedarkirin, lêbelê ev bi tenê mirovên ji malbatên esilzade û di karûbarên resmî de dihatin tayînkirin.

Mîrekiyên kurdan bi motîvasiyona berdewamkirina desthilatiya xwe, ji bo neqlkirina îdarî ya ku ji bavan derbasî lawan dibû têkoşîn dikirin. Lewma di navbera wan de jî her şerên desthilatiyê yê navxwe rû didan. Ev yek dibû sebeb ku li Kurdistanê sîstemeke îdarî çênebe. Wekî tê zanîn, ev dînamîka îdareyê ya di navbera osmanî û Kurdistanê de, li gor nîzamekê heta sedsala XIXan berdewam kir. Her çend osmanî xwedî qudret û hêzeke mezin be jî, pêwendîya wê ya digel Kurdistanê li ser van esasan rê ve çûye. Osmanî dilsoziya vê îdareyê

kiriye heta sedsala XIVan, lê ev yek wekî dilsoziyekê na, wekî daxwaz û talpên desthilatên kurdan ên wek azadperwer alîgirê serbestiyê tê qebûl kirin.⁹⁷

1.2. Pêwendiyên Dewleta Osmanî û Mîrekiyên Kurdan

Ji ber ku dewleta osmaniyan, di 700 saliya temenê hikumdariya xwe de xwedî şert û siyasetên cuda û di bin geşedanên makrosiyasetê de bû, pêwendiyên wê û mîrekiyên kurdan jî li gor şert û mercan guherbar e. Lewma jî di cografyayeke berfireh de, di heyameke dîrokî ya dûr de û di nav gelek pêkhateyan de, zehmet e ku mirov analîza rûdanên wisa aloz û komplîke bike. Lê di vê xebatê de pêwendiyên dewleta osmaniyan û mîrekiyên kurdan, ji ber gelek sedeman, bi sedsala XVIan ve hatiye nirxandin. Nemaze jî şerê Çaldiranê (1514) têkiliyên mîrekiyên kurdan a digel dewleta osmaniyan bi awayekî esas guherand. Hinek dîroknivîs, Şerê Çaldiranê, wekî destpêka siyasî ya nû ya kurdan dihesibînin. Ji ber ku Kurdistan ji bakur bigre heta Kerkûkê ku di bin destê dewleta safewiyan de bû, ket bin destê dewleta osmaniyan. Ew şer di tabloyên *Şerefnameya* ku cara yekê behsa mîrekiyê û her wiha dîroka kurdan dike jî hatiye teswîrkirin⁹⁸

Piştî têkçûn û xerabbûna Selçûkiyan, teşeya pêwendiya dewleta osmaniyan û mîrekiyên kurdan jî veguherî. Piştî têkçûna Eyubiyên, kurd di nav xwe de belawela bûn. Gelek mîrekiyên kurdan li aliyekî, li dijberî Moxol û safewiyan, hewl didan ku serbestbûna xwe biparêzin, li aliyê din jî, li rexê dewleta osmaniyan radiwestiyan ku nemaze li hemberî Îranê wekî hevalbend û mutefiqê dewleta osmaniyan dihat kifşê. Bo nimûne di şerê Çaldiranê ku di navbera Yavuz Sultan Selim û Şah Îsmâîl de rûdabû, bo pêwendiyên dewleta osmaniyan û mîrekiyan wekî xala werçerxê tê qebûlkirin. Alîgiriya mîrekiyên kurdên ku li rexê osmanî bûn, di diyarbûna encamên şer de rolek lîstin. Ji ber ku gelek ji wan mîrekiyên kurdan, li sînorê Îranê kom bibûn û li wir cîwar bûn, ev yek bo stratejiya osmanî gelek girîng bû. Her çend pêwendiyeyeke bi vî rengî di navbera osmaniyan û mîrekiyan de hebe jî, polîtîkayeke hevgerî ya mîrekiyên kurdan a li hemberî osmaniyan û împaratoriya persan tunebû. Mîrekiyên kurdan di navbera siyasetên safewî û osmaniyan de mabûn û îstîqrara wan a îdarî tunebû. Şah Îsmâîl waliyekî bi navê Muhammed Xan İbnî Ustaçlu wezîfedar kir lê Diyarbekiriyên li hemberî vê yekê serî hildan û ketin bin hikmê osmaniyan⁹⁹ Her mîrekiyeke

⁹⁷ Martin Van Bruinessen, h.b, r. 220-240

⁹⁸ Ebdurreqîb Yusif, *Hunerê Tabloyên Şerefnameyê*, Wer. Ziya Avcı, Weş. Avesta, İstanbul, 2007, r. 148

⁹⁹ Muhammed Emin Zeki Beg, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, wer. (Vahdettin İnce-Mehmet Dağ-Reşat Adak-Şükrü Aslan), Weş. Nûbihar, İstanbul, 2010. r. 162

kurdan, li gor berjewendiyên xwe polîtikaya xwe diajot. Lewma jî, gelek mîrekiyên kurdan li rexê Yavuz Sultan Selim, yên din jî li rexê Şah Îsmâil sekinîbûn û parêzvaniya wan dikirin.¹⁰⁰

Ji sedsala XVIan ta sedsala XIXan di navbera împaratoriyên osmanî û safewiyan de şerekî dijwar hebû. Her çend bi peymanê Qesra Şêrîn a ku di sala 1639an de hatibû danîn, kêşeyên sînor a di navbera dewleta osmaniyan û dewleta safewiyan de çareser bibe jî, mîrekiyên kurdan ji şerê di navbera osmanî û safewiyan de qewimî sûd wernegirtin. Yekîtiya xwe bihêz nekirin û ji bilî wê jî di navbera hevdu de bi hevdu re şer kirin. Ev yek di kitêba *Şerefxanê Bedlîsî* di *Şerefnameyê* de jî bi awayekî aşkire hatiye diyarkirin. Pêwendiyên dewleta osmaniyan û mîrekiyên kurdan, nemaze ji aliyê Îdrîsê Bidlîsî ve hate qewîkirin.¹⁰¹ Qismek dîrokzanên kurdan, Îdrîsê Bidlîsî wekî xayîn, sedema nedewletbûna kurdan, qismekê din jî wî wekî zana û serokekî kurdan qebûl dikin. Helbet di vir de, bi nêrîneke modern û bi kategoriyeke netewî mirov nikare serdema wî û rola wî ya di dirêjahiya dîrokê de bi cih aniyê, binirxîne. Lê tiştê ku lêkolîner hemfikir in ew e ku têkiliyên kurdên sunî û dewleta osmanî bi destê wî hatiye xurtkirin. Piştî ku ew tê Stenbolê ji aliyê Siltan Beyazîdê 2. ve tê taltîfkirin, daxilî nav serayê dibe û bi daxwaza siltanê kitêba xwe ya derbarê dîrokê de ya bi navê *Heşt Behîşt* bi zimanê farisî dinivîse.¹⁰²

Berberiyên di nav seltenata dewleta osmaniyan bi xwe de qewimî, qedr û payeya Îdrîsê Bidlîsî zêdetir dike û piştî ku Yavuz Siltan Selîm bavê xwe Beyazîdê 2. ji text tîne xwarê û dibe padîşahê osmaniyan, diyariyan bo Îdrîsê Bidlîsî dişîne û wî vedixwîne Stenbolê. Li Stenbolê di hikumdariya osmaniyan de wezîfeyeke mezin werdigire û ji Yavuz dixwaze ku seferekê bo Şah Îsmâil pêk bîne.¹⁰³ Digel têkoşîna desthilatîyê, îhtîmal e ku li gor dînamîkên wê demê cudahiya mezhebên wekî sunî û şî'î, têkiliyên dewleta osmaniyan û safewiyan kifş kiribû. Jixwe ji ebbasiyan vir ve tradîsyoneke sunîtiyê di nav eşîrên kurdan de hebû û ji ber vê sedemê eşîrên kurdan di nav berberiya osmaniyan û safewiyan de alîgiriya osmaniyan kir. Ji 25 mîrekiyên kurdan 24ê wan, bi destê Bidlîsî, hikumraniya osmaniyan qebûl kirin. Derbarê vê babetê Emîr Hasanpour van tiştên muhim neql dike.

“Xurtbûna hêza kurdan a siyasî di sedsala XV û XVI de, gelekî bi hurgilî hatiye belgekirin di *Şerefnameyê* de. Nivîskar, Şeref Xan, mîrê mîrekiya xurt a Bedlîsê bû. Wî bi rewşa siyasî a li Asyaya Rojava dizanî, ku li wê deverê dewletên osmanî û safewî tim şer dikirin û wêrankarî pêk dianîn ji bo bidestxistina kontrola deverên Kafkasya, Azerbaycan, Kurdistan û Tengava Îranê. Bavê wî piştî safewiyan girtibû, lê belê paşî wî teref guhert û vegeriya da ku mîrekiya

¹⁰⁰ Ahmet Kahraman, *Kürt İsyânları, Tedip ve Tenkil*, Weş. Evrensel, İstanbul, 2004, r. 31

¹⁰¹ B. Nikitin, b.n., r. 319

¹⁰² Müfid Yüksel, *İdris-i Bitlisî ve eserleri*: <http://www.haber10.com/makale/11116/> (25.10. 2013)

¹⁰³ Müfid Yüksel, h.b.: <http://www.haber10.com/makale/11116/>

xwe ya Bedlîsê bi rê ve bibe, ku li wê derê yekem berhema li ser dîroka kurdan nivîsî. Dema li dîwana safewiyên xizmet dikir, Şeref Xan bibû xwediyê tecrubeyên bi qinyat li ser sazûmana îdarî ya dewleta Îranê.”¹⁰⁴

Di navbera împaratoriya osmaniyan û mîrekiyên kurdan de gelek caran kêşeyên rêveberiyê û îdarekirinê jî rû dan. Piştî ku împaratoriya osmanî hikumraniya xwe li gelek der û deverên cîhanê qewî kir, di rêveberî û îdareya wê de jî hinde aloziyên esasî derketine holê. Her ji ber wê jî, berfirehbûna xak û erdên osmanî, hinde reform û veguherînin esasî di çarçoveya îdarî de dabîn kirin. Di wê prosesê de, di navbera dewleta osmaniyan û mîrekiyên kurdan de xisûsî di 2 xalan de veguherînin esasî derketine holê. Ya yekem, dewleta osmanî daxwaz kir ku ew mîrekiyên kurdan ên ku rêveberiya gelek deveran di destê wan de ne, biçûk bike. Îdareya herêmî ji destê wan werbigre, ew erd û rêveberiya wan berze bike û bîne merhele û dereceya “wîlayet”an. Mîrekiyên kurdan ji van geşedanên di nav rêberiya osmaniyan de qewimîn gumanbar bûn û pêwendiyên wan her xerabtir bûn. Gelek mîrekiyên kurdan, ji ber vê yekê serî hildan û problemên di navbera dewleta osmaniyan û mîrekiyan de hêdî hêdî zêdetir bû. Ev geşedan heta sedsala XIXan dewam kir û axir bi xerabbûna mîrekiyên kurdan encam da. Bi tenê ne li hemberî osmaniyan, li hemberî împaratoriya safewiyên jî ew kêşe rûdan. Qanûnî Sultan Sileyman gelek caran bi safewiyên re şer kir û nemaze di şerê wî û safewiyên de hîsarên herî mezin deverên Kurdistanê dît. Li vir tiştê herî balkêş ew e ku ev şerên mezin, her û her li ser xaka Kurdistanê qewimîn û wekî netîce di şerê navbera dewleta osmaniyan û safewiyên de, Kurdistan wêran bû û zirareke gelek mezin dît. Seranserê Kurdistanê hem zirareke însanî û hem jî zirareke cografyayê dît.¹⁰⁵

Kêşeya din, li ser daxwaza hikumranbûna mîrekiyên kurdan, ên ku li devera xwe xwedî hêz û şiyaniya îdarekirinê bi dest xistibûn derkete holê. Mîrekiyên kurdan daxwaz dikirin ku li ser sîstema maliyeyê muktêdîr bibin. Ji ber vê yekê jî, dilsozî û girêdana xwe ya li rex osmanî êdî pêk neanîn. Bacên xwe nedan û mesuliyetên xwe bi cî neanîn. Gelek mîrekiyên kurdan jî, mafê hinde karwanên bazirganan daxwaz kirin û ev bû egera kêşeyên di navbera împaratoriya osmaniyan û mîrekiyên kurdan. Mîrekiyan jî li Kurdistanê serdestiya xwe qewî kiribûn û bi gelek leşker û tebayên xwe ve, li hemberî osmaniyan wekî hêzeke cuda derketibûn holê. Ev yek di dirêjahiyê dîrokê ya piştî geşedana hewlên derketina fikr û ramana netewetiyê, car caran ji bo osmaniyan, gelek caran jî bo yekbûn û pêkanîna yekîtiya netewetiyê kurdan xeter û talûkeyên esasî derxistin holê.

¹⁰⁴ Emîr Hasanpour, Şerefname: *Dewletbûn, Derebegîti, û Serwerî*, wer. bo Kurdi Ergîn Opengîn, Weş. Avesta, İstanbul, 2007, r. 11.

¹⁰⁵ Muhammed Emin Zeki Beg, h.b, r. 176

Pêwendiyên împaratoriya dewleta osmanî û mîrekiyên kurdan, bi gelek girîftiyên mezin, li ser esasekî berjewendiyê ava bû. Mîrekiyên kurdan di nav 2 împaratoriyan xwedî hêz de, car caran xwe spartine osmaniyan û car caran jî ketin bin hikumraniya safewiyan:

“Li gor hinde rewşenbîrên kurdan, helwesta Îdrîsê Bedlîsî, ya ku pêwendiya mîrekiyên kurdan û împaratoriya osmanî dirust kiribû, ji bo dahatûya Kurdistanê gelek çewt û talûke tê hêlsengandin. Lê hinde rewşenbîr jî berevajî vê yekê hizr dikan. Diyar û aşkera ye ku ew helwesta Îdrîsê Bidlîsê, hegemonyaya osmanî li ser mîrekiyên kurdan zêde kiriye û îdarekirina Kurdistanê bi destê osmaniyan sanahtir kiriye. Lê eger peymaneke bi vî rengî nehatibe danîn, rewşa kurdan dê di nav împaratoriya osmanî û desthilatiya Îranê de, gelek dijwar bibûya. Bêguman, eger kurdan yekîtiya xwe pêk bîna û bi hevdu de neketina, îhtîmal hebû ku bibûna xwedî hêzeke merkezî, li hemberî hikumraniya Îran û osmaniyan têk neçûna. Her wiha li mîr û derebegên li Kurdistanê, xwedî rengekî eşîrkî bûn û sîstema rêxistina wan li ser esaseke xwe parastinê ava bibû.”¹⁰⁶

1.3. Xweseriya/Otonomiya Mîrekiyên Kurdan

Derbarê statûya mîrekiyên kurdan ên heta sedsala XIXan, hêdî hêdî bi ronahiya belgeyan, agahiyên dîrokî derdikevin holê. Ji fermannameyan rêvebiran heta raporên waliyên dewleta osmaniyan, ji kitêb û seyahatnameyên gerokan heta salnameyan, di gelek çavkaniyan de xweseriya mîrekiyên kurdan wekî *mefrûz-ül kelam* yanî hikumetên xwedî îtîbar, bi awayekî aşkera hatiye destnîşankirin. Têkiliya mîrekiyên kurdan a bi dewleta osmaniyan re li ser hin dînamîkan hatiye avakirin. Li gor hin lêkolîneran, têkiliya dewleta osmaniyan û mîrekiyên kurdan a hevkarîyê piştî şerê Çaldiranê (1514) bi fermannameya Yavuz Siltan Selîm dest pê dike.¹⁰⁷ Dewleta osmaniyan di dirêjahiya dîrokê de nêzî 700 salan, hikmê xwe li dinyayê kir û di 700 saliya xwe de, di qonax û pêvajoyên ji hev cuda re derbas bû.¹⁰⁸ Lewma jî siyaseta wê û mîrekiyên kurdan, li gor şert û mercên cuda veguherî. Mirov dikare bibêje ku siyaseta osmaniyan û mîrekiyên kurdan li ser berjewendiyêke dualî ava bûye. Di gelek çavkaniyan de aşkera ye ku mîrekiyên kurdan di serdema osmaniyan de bi awayekî xweser xwe îdare kirine.¹⁰⁹ Evliya Çelebi, di seyahatnameya xwe de, mîrekiya Hekariyê, wekî *hakan* (xan) bi nav dîke û begên wan jî wekî xweser, xwedî stargeh û ti ezlkirinê qebûl nake

¹⁰⁶ Kemal Burkay, b.n. r. 177

¹⁰⁷ Şakir Epözdemir, *Tarihte Kürtler, Kürdistan ve Osmanlı Dönemi*, <http://www.kovarabir.com/tag/1514-kurt-osmanli-itifaki/> (27.10.2013)

¹⁰⁸ Her çend dewleta osmaniyan 700 salan li dinyayê hikmê xwe ferz kiribe jî, têkiliya wê û mîrekiyên kurdan bi tenê rastî 400 salan tê. Hin dîrokan têkiliya mîrekiyan kurdan û dewleta osmaniyan bi şerê Çaldiranê (1514) didin destpêkirin.

¹⁰⁹ Dündar Ali, Kılıç, di kitêba xwe ya bi navê *İrisân Beyleri, Abbasi Devleti'nden Hakkariya Beyliği'ne* de diyar dîke ku mîrekiya Hekariyê, wekî 300 salan, li Kurdistanê wekî mîrekiyêke xwedî hêz jiya ye û paşê bi navê “Hikumeta Hekariyê” girêdayî eyaleta Wanê bûye. Di wê kitêbê de agahiyên derbarê wê de yê gelek ronak hene. Bo zanîn eke berfirehtir, bnr. Dündar Ali, Kılıç, *İrisân Beyleri, Abbasi Devleti'nden Hakkariya Beyliği'ne*, Weş. Tarih Düşünce Kitapları, İstanbul, 2006, r. 91

nîşan dike. Dîsa li gor agahiyên wî, di nav mîrektiyê de 47 hezar leşkerên *egît û şervan* û otonom, di bin îdareya mîrektiyê de ji derveyî dewleta osmaniyan hene.¹¹⁰

Xweseriya mîrektiyên kurdan beriya avabûna dewleta osmaniyan jî hebû û bi avabûna osmaniyan, heta sedsala XIXan û bi pêkanîna navendîbûna (centralization) wê berdewam kir. Dewleta osmaniyan wekî şêweya îdareyê bi sistemeke monarşîk rêvedîçû û sistema îdarekirina împaratoriye, li her deverê bi wî awayî bû. Wekî li jor jî hate diyarkirin piştî sefera Yavuz Siltan Selîm a li hember safewiyan pêk hatibû bi taybetî eşîrên kurdan, ên sunî û şafî'î yên ji fişar û zextên safewiyan êdî aciz bibûn bi hewl û alîkariya Îdrîsê Bîdlîsî alîgiriya osmaniyan kirin û ji wê demê pê ve, kontrola dewleta osmaniyan qebûl kirin. Li beramberî vê yekê Yavûz Siltan Selîm soz da mîrektiyên kurdan û heta sedsala XIXan deverên wan bi awayekî xweser/otonom ji aliyê mîrektiyên kurdan ve hate îdarekirin. Ev hikumet û emaretên kurdan di karûbarê navxweyî de serbest bûn. Dema ku mîrekî wefat dikir, împaratoriya osmanî hîç têkil nedibû ku çî kes derkeve ser text.¹¹¹ Ew deverên ku di bin hikumraniya mîran de bûn, jê re digotin “hikumeta kurd”. Hikumetên kurd çî caran îpotek nedidan îdareya merkezî û bi awayekî rêk û pêk, di bin mesuliyeta xizmetguzariyên leşkerî de ninbûn.¹¹²

Xweser û otonomiya mîrektiyên kurdan, ji bilî gelek faktorên siyasî, dîrokî û reel-polîtîk, xwe dispêre taybetmendiyêke cografyayê jî. Mezopotamya, ji Asyayê zêdetir bo rênçberiyê xwedî taybetmendiyan kêrhatî ye. Ew eşîrên tirk ji Asyayê hatibûn Mezopotamyayê û Anatoliyayê, bi gelên mezopotamyayê re, yên niştecih wekî kurd, suryanî, ermenan re pêwendî danîn. Bi kawdan û belavbûna Îslamiyetê ve, hikumraniyêke bi rengekî Îslamî û bi serpereştiya ereb û farsan, li aliyê Rojava jî bi îktîdareke Xirîstiyani Kurdistan dorpêç bû. Ev yek, bû sedema xurtbûna mîrektiyên kurdan ku li Mezopotamyayê Îslamiyet qebûl kiribûn. Şert û mercên herêmê yên cografîk û cihê wan mîrektiyên kurdan ku li sînorê wan împaratoriyan derûdor dijiyan jî, faktoreke xweserbûna mîrektiyên kurdan bû. An ev yek, rewşa xweseriya mîrektiyên kurdan hêsantir dikir. Mirov dikare bibêje ku, heta piştî şerê cîhanê yê I emîn. û sînorên gelek dewletan, ji nû ve diyar bûn, mîrektiyên kurdan li deverên xwe bi awayekî xweser hikumraniya xwe ava kirin.¹¹³

Împaratoriya osmaniyan heta sedsala XVIIan ji bilî Kurdistanê li gelek der û deveran, bi awayekî merkezî dihate îdarekirin. Rûdana gelek şeran, têkçûna îdareyê, kêşeyên di nav

¹¹⁰ Evliya Çelebi, *Seyahatname*, Weş. YKY, C. 6, 2010, İstanbul, r. 263

¹¹¹ “Osmanlı Kaynaklarında Kürtler” Çalışma Grubu, amd. Namık Kemal Dinç-Alişan Akpınar 20. *Yüzyıl Başlarında Kürt Milliyetçi Söylemine Bir Örnek, Emir Bedirhan, Lütfî-Ahmet Ramîz*, Weş. BGST, İstanbul, 2007, r. 9

¹¹² İlber Ortaylı, *Tanzimattan Cumhuriyete Yerel Yönetim Geleneği*, Weş. Hil, İstanbul, 1985, r. 26-27

¹¹³ A.Kadir Küçükbayrak, *Kürdistan Sorunu'nun Tarihsel Arka Planı I*, <http://www.kovarabir.com/a-kadir-kucukbayrak-kurdistan-sorununun-tarihsel-arka-plan-i/> (10.01. 2012)

sînorên osmaniyan de yê navxweyî, merkezîbûna osmaniyan her ku diçû lewaztir dikir. Heta sedsala XVIIan osmaniyan di warê îdarekirinê û qewîkirina îdareya merkezî de gelek xurt bû.¹¹⁴ Ji ber vê yekê jî gelek derebeg di nav sînorên osmaniyan de derketin û kêşeyên wan û hikumeta osmanî her ku çû zêdetir bû. Di dewleta osmaniyan de bi navê Kurdistanê, eyaletek jî hebû di sala 1847an de hatibû avakirin. Belê dibe ku pirsyara “çima ne beriya vê tarîxê (1847) lê di wê salê de avabûye” pirseke maqûl e û mirov wisa hizr bike. Faktorên ku bûne sedemên vê yekê pîrr zelal û aşkera ne. Wekî ku tê zanîn, di dema Yavuz Siltan Selîm de, kurdan li hemberî safewiyan li rex rê û îdareya Kurdistanê cihê xwe xurt kiribûn. Ev yek jî aliyekî qebûlkirina kontrol û sîstema osmaniyan jî bû. Li hemberî vê yekê, Sultan Selîm di warê otonombûna herêmê de, bi rastî jî heta sedsala XIXan, li Kurdistanê, hikumet û mîrekiyên kurdan, hebûna xwe berdewam kirine. Ji bo vê yekê jî, herêm neketiye nav kategoriyên klasîk ên sîstema îdarekirina osmanî. Osmaniyan, wekî pêwîstiya rêbaza ku tim bikaranîn e, herêm li gorî taybetmendiya wê bi rê ve birine.¹¹⁵ İlber Ortaylı di derbarê vê babetê de van tiştan dibêje:

“Heta sedsala XIXan hinde xizmetên împaratoriya osmaniyan, di destê grûbên meheli, cimaetên dînî û aîdî weqfan bû. Ew kesên ku alîgirên tanzîmatên bûn, xizmetên bi vî rengî, her ji wan dihat, di nav fonksiyonên rêxistinî hikumeta merkezî de qebûl dikirin. Wan niyet dikir ku îdareyeke merkezî ya ne hejar, yeke qewî ava bikin. Bo nimûne, parêzvaniya hinde dirb û gêdûkan, li beramberî mûafbûna baca avarizê* aîdî wan gundiyên ku jê re digotin derbentvan.** Lê piştî tanzîmatê, ev wezîfe ji wan hat stendin û ew wezîfe êdî di mesuliyeta wan hêzên ku ji aliyê hikumetê ve hatibûn çek û sîlehdarkirin û wezîfeyên resmî bûn. Bo diyarkirina bacê (tarx) û civandina bacan sîstema berê biryar ji aliyê îdareyên cimaetan û giregirên gund û bajarên ve dihat dayîn û ji aliyê multeziman jî dihat bicîanîn.”¹¹⁶

Di vê xebatê de, ji bo ku ji pêwendiya patronajîya mîrekiyên kurdan re bibe paşxaneyek, alî û taybetmendiyan wê yê tarîxî hate ravekirin. Ji bo vê yekê jî divê mirov, wekî sîstemekê, wekî îdarekirinekê, cihê mîrekiyên kurdan û împaratoriya osmaniyan nîşan bide da ku, ew pêwendî bêhtir bê zelalkirin. Her wisa Pêwendiya qedirgirtin û himayekirina şair û hozanan bi desthilatiya hêzekê ve girêdayî ye. Çalakiyên kulturî, edebî car caran bi qedr

¹¹⁴ Mustafa Akdağ, “Osmanlı Tarihinde Âyanlık Düzeni Devri 1730-1839”, Kovara Tarih Araştırmaları Dergisi, C.VIII, r. 14

¹¹⁵ Koma Xebatên Kurdolojiyê/Kürdoloji Çalışmaları Grubu, Kürt Tarihi Araştırmaları 1, *Osmanlı Kürdistanı-Kürdistana Osmanî*, r. 132

¹¹⁶ İlber Ortaylı, *Tanzimat Devrinde Osmanlı Mahalli İdareleri*, Weş. TTK, Ankara, 2000, r. 17-18

*Avariz navê baceke ku di demên awarte de ji gel dihat stendin, cara yekemîn di sala 1505an de ji aliyê Beyazîdê Zemîn ê Siltanê osmaniyan ve hatiye derxistin.

**Derbentvan, ji bo ew kesên ku li sînorên osmanî, parêzvaniya keleşan dikirin, car caran jî, li sînor parêzvaniya hikumraniya dewleta osmaniyan pêk dianîn dihat gotin.

û pûtepêdaneke mîrektiyên gehîştîye dereceyên pirr mezin û car caran jî, xwedînerketina wan bûye sedema gelek arîşeyan di nav edîbên kurd yê klasîk de. Ev yek di gelek nimûneyên edebiyata klasîk de bûye sedema gilî û gazinan û di berhemana de jî ev bi aşkera dibe. Lê cihê wê di nav sînorê vê beşê de nîn e û dê di beşên dîtir de bê gengeşe kirin. Mijara telifê, di serdemên beriya îcatkirina çapxaneyê û belavbûna amûrên çapxaneyê jî xwe disparte hamiyekî/ê. Piştî rûdawên neteweperestiyê, îşakirina dewletên yek û unîter, sîstema osmaniyan jî têk çû. Çimkî di nav împaratoriya osmaniyan de, gelek netewên curbicur, grûbên dînî yê ji hev cuda û sinifên cihêreng hebûn. Bi têkçûna osmaniyan ve, di nav osmaniyan de hinde teşebûsên nû derketin ku, bi daxwaza rizgarkirina împaratoriye hewl dan ku osmanî têk neçe. Ev tişt jî, yek û yek li ser esasên merkezîkirina îdareya osmanî xwe organîze dikir. Bi vê daxwazê hewl didan ku, ew mîrektiyên kurdan ên ku di karûbarên navxwe de serbest bûn, ji holê rakin û hemû rêveberiya wê deverê bispêrin merkeza dewletê. Diyar e ku mîrektiyên kurdan jî, ji vê yekê mutesir bûne û pozîsyona xwe ya otonomiyê wenda kirin.

Ev proses wekî din, rastî pêkhatin û rûdanên modernkirina dewlet û îdareyên împaratoriye curbicur tê. Bi wê kawdan û geşedanê, artêşên gelek dewlet û îdareyan jî hatin revîzekirin. Gelek saziyên dadwerî, îdarî, civakî û kulturî hatin revîzekirin û nûjen bûn. Mîrektiyên kurdan jî, her hewl dan ku pêwendiyên xwe û ya îdareya osmanî ya merkezî sist bikin, da ku ji hikm û fermanên wan derkevin û xweseriya xwe pêştir bixin. Hinde mîrektiyên kurdan jî, wekî qonaxa netewebûna gelek milletên din, fabrîkayên sîlehan û qumaşan jî ava kirin. Ev yek pirr muhim e çimkî, teşebûsên wiha her ji aliyê desthilatan pêk dihat û bi daxwaza wan digehîşt dereceyên bilind. Li gelek nimûneyan ew kes wekî kesên dijberî modernbûnê têne qebûl kirin lê ev yek ne rast e. Çimkî bi fikr û boçûnên netewî ve her pêngavên modernkirinê, bo mîrektiyên kurdan her ku çû bi xeter bû. Ji ber vê yekê jî, dijberiyê wan a bi vî rengî li ser van esasan tê qebûl kirin. Di dirêjahiya dîrokê de vî tiştî, bi têkbirin û xerabkirina mîrektiyên kurdan ve encam da. Di sedsala XIXan de, ev pêşveçûn bû egera gelek rûdanên îro jî ku bandora wan li ser geşedana çalakiyên edebî û kulturî û ilmî çêbûye. Sîstema têkçûna mîrektiyên kurdan, di çarçoveya edebî û hunerî de, bandoreke neyînî li ser van çalakiyan kir. Patronaja edebiyata kurdî ji destê wan muqtedîran têk çû û bazara sîstema berhemdariya bi vî rengî guherî.

BEŞA DUYEM

HAMIYÊN WEKÎ MÎR Û AXA YÊN EDÎB Û DENG BÊJAN

2.1. Di Edebiyata Kurdî de Patronaj

Di vê beşê de ew faktorên ku tesira wan li ser afirandina çalakiyên edebî û hunerî hene û di paşxaneyê wan çalakiyan de, sedemên aborî û motîvasyonên psîkolojîk dê di nimûneya huner û edebiyata kurdî de werin gengeşekirin. Helbet çarçoveya vê xebatê dengbêjî û hunera gel e û dê li pey şopa têkiliya nimûneyên wê bête gerandin, lê ji bo paşxaneyê wê jî nimûneyên edebiyata klasîk jî dê werin nirxandin. Beriya wê divê mirov aşkera bike ku kurd jî wekî civakekê, ji gelek sinifan pêk tên û di nav xwe dabeşî tebeqeyên cuda dibin. Di vir de divê mirov diyar bike ku ew kategoriyên sinifî yên di nav civaka kurdan de xwe dispêre sedemên siyasî û aborî. Lewma jî di vê xebatê de ew kesên ku wekî serdest, patron/hamî û hozan û edîb/klient dê di wê çarçoveyê de werin gengeşekirin. Wekî term, patronaj formulasyoneke Max Weber e û nemaze di çarçoveya sosyolojîk de ji bo xebatan bûye bingeh û têkiliyên hamî û edîbekî di çarçoveya siyasî û aborî de rave dike.¹¹⁷

Di zimanê kurdî de gelek peyv hene ku di nav civaka kurdan de hebûna hêza arîstokrasiyê nîşan didin. Vê yekê, bala gelek lêkolînerên ku li ser civaka kurd dixebitin jî kêşaye. Lêkolîner Bazil Nikitin vê yekê wekî *melezade*, *şêxzade*, *begzade*, *axazade*, *zevedar* tesnîf dike.¹¹⁸ Ev tesnîf û peyv hemû jî, kesên zane, şexsiyetên esilzade û mîr, binemalên pîroz nîşan didin û di zimanê kurdî maneyeke *dewlemendî*, *zengînî* di nav xwe de dihewînin. Hebûn û çêbûna van nosyonan, mirov ber bi sîstemên îdareyê yên Kurdistanê ve dibe. Wekî di beşên pêş de jî hate gengeşekirin, ev yek ji bo serdemên cuda, rastî sîstemên cuda tê. Lewma jî mîrekiyên kurdan ên ku heta sedsala XIXan hebûn, qismek ji wan e. Hebûna van sinifên bilind, di zimanê de gel de jî ev yek bi awayekî balkêş bi formeke tirkî ve wekî *taxima axeler û begleran* xwe nîşan dike.

Ev agahiyên derbarê sinifên civaka kurdan, bi awayekî aşkera, nîşana sîstemeke îktîsadî ya di nav civaka kurdan e. Mîrekiyên Kurdistanê, bi van îmkanên xwe, hem parêzvaniya xak û devera xwe dikirin û hem jî, dixwastin ku hikumraniya xwe bi gelek çalakiyên mîmarî, edebî, kulturî û hunerî ve xurt bikin. Kitêba Şerefhanê Bedlîsî ya *Şerefname* ya ku di derbarê tarîxa mîrekiyên kurdan de hatiye nivîsandin, gelek nimûneyan derbarê van çalakiyan de nîşanî me dide. Gelek medrese, mizgeft, qesr û qonax û dîwan ji

¹¹⁷ Gordon, Marshall, *Sosyoloji Sözlüğü*, wer. Osman Akinhay, Deya Kömürcü, Weş. Bilim ve Sanat, Ankara, 2005, r. 582

¹¹⁸ Rohati Alakom, *Arîstokratên Kurd*: Torin, Weş. Apeg, Forlag AB, Stockholm, 2004, r. 30-31

aliyê mîrekiyên kurdan ve hatine çêkirin. Di wan medrese, mizgeft û meclîsên mîran de gelek ilmdar, zana, edîb, hozan, dengbêj û sazende hatine hîmayekirin.¹¹⁹

Hîmayekirina edîban, parastina hozanan, palpiştiya zanyar û mirovên ilmdar, patronajîya wênesaz û hunermendan, ji dirêjahiya dîrokê heta niha bi awayên cuda xwe nîşan daye. Di dîroka kulturê de, hinek sultan, kral, mîr û rêvebir, bi hîmayekirin û parastina hunermend û edîb û hozanan cihekî pirr mezin girtine. Mîrên kurdan jî, di serayên xwe de, hamîtiya edîb û dengbêjan kirine û li ser kawdan û geşedana wê tradîsyonê roleke pirr mezin lîstine.

Sîstema hamîtiyê, di berhemdariya edebî û hunerî de li gor pergaleke tradîsyonel rû da ye. Ew kesên ku xwedî dîwan û zanayê edebê bûn, di beriya berhemên xwe pesnê Xweda, Pêxember û siltanan/mîran didan. Diyar e ku siltan jî di rêza giramgirtinê ya pesn û senayê de xwedî cihekî mezin in. Ev yek her çend eleqe û pûtepêdana berhemên şair û edîban nîşan bike jî, êdî di nav edebiyata kurdî û edebiyata milletên cîran ên wekî tirk, fars û ereb de wekî tradîsyonekê bû. Di nav vê tradîsyonê de cureyê edebî *qesîde* ye ku ew jî wekî kevneşopî ji edebiyata erebî wekî tradîsyon derketiye û ji bo pesn û senayê ew kesê ku berhemên edebî bo wî hatiye nivîsîn tê pêşkêşkirin.¹²⁰ Di *Şerefnameya Şerefhanê Bedlîsî* ku dîroka mîrekiyên kurdan bi awayekî zelal vedigot de jî, ev yek bi awayekî zelal hatiye nivîsîn. Di sîstemên patrîmonyal de, ku hemû pêwendiyên hegemonîk di destê siltan, mîr an kesekî de ye, ev tişt bi awayekî sirûştî derdikeve holê. Di *Şerefnameyê* de sembola padîşah an mîrekî bi vî awayî hatiye destnîşankirin. An padîşah û mîrek, bi vî awayî di nêrîn û dîdeya edîbekî de xwedî rol û maneyê ye: Ev yek di *Şerefnameyê* de wiha destnîşan dibe:

“Ev padîşahê ku gumbeta kadêza asîmanê hêşîn, bi hemî dûrî û bilindahiya xwe ve, bi hemî rêk û terzî ve, kêmtirîn xeml û xişrê serdarê wî ye. Fermanrewayê seywana çaran ku navê wî roj û bi bexşîna tîşk û tîrêjên heft reng, nexşîna bê dawî û binî ye û heta tu bixwazî di rêza birêztirînê dergevanan û pasewanan de xurt e... Pena û pêsîrê wî ciyê rizgariyê ye û ji qeyseran re ciyê daxwaz û hêviyan e... Karê Sultan ramûsana şîpanê û serdarên deriyên wî ne. Sunî mezheban diparêze û ji gumrebûn û gunehan dilê wî dibîze. Çi tiştî bêje, kesek ji çarçevaya wan dernakeve. Di rast û çep de zordar û tawanbaran radîpêçe...”¹²¹

¹¹⁹ Derbarê van xizmet û çalakiyên mîrekiyên kurdan de, di *Şerefnameyê* de gelek nimûne hene. Mizgeft, medrese, meclîs û cihên ilmdar û zanayan, di bin hikumdariyekê de eyan dibe. Medreseya Dawudiyê, Îhlasiye, Xatîbiye, Şemsiye, Şukriye, Hacibekiye û navê gelek avahiyên nîşana desthilatiyê hene. Nemaze jî Dawudiyê di vî warî de girîng e û gelek zana dersên ilm û zanîne lê dihatin dayîn. Bo zanîne eke berfirehtir, bnr. *Şerefhanê Bedlîsî*, h.b, r. 214-224-306

¹²⁰ Naim, Atabağsoy, *Kasik Dönem Osmanlı Şiirinde Patronaj ve Şairin Üretim Süreci İlişkisine Bir Bakış*, Kovara Monograf, j. 1, e-kovar (<http://www.monografjournal.com/sayi1.html>) (20.03.2014)

¹²¹ Şerefhanê Bedlîsî, *Şerefname*, r. 86-87

Di nezera edîb û dengbêjan de mîr wekî vê pasaja li jor cih digire. Ev yek jî têkiliyeke organîk di navbera mîr û edîban de peyda dike. Ev têkilî, hikmê patron li ser edîban ferz dike û edîb bi qasî pesn û qedirgirtina patron xwedî qedr û giramiyê dibin. Balkêş e ku, beriya berbelavbûna çapxaneyê û îmkanên nivîsê, çî şansê edîb û hunermandan tunebû ku, berhem û helbestên xwe belav bikin û bi vî awayî debara xwe pê bikin. Helbest û berhemên edîban jî ji sedema nezanîna xwendin û nivîsandinê belavî nav gel nedibûn. Lewma jî mecbûr bûn ku berhemên xwe pêşkêşî patronekî bikin da ku pûtepêdana berhemên wan û debara jiyana wan pê dirust bibe. Her wisa ew patron ne mecbûr bû ku bi tenê padîşah û siltanek be. Kesên ku xwediyê hêzeke aborî û civakî bibûya jî, ji bo edîb û hozanekî wekî patronekî dihat qebûl kirin. Di vir de faktora ku berhemdariyê esas digre, bi tena serê xwe ne meseleya telîfê ye. Her wisa, huner û afirîneriya hunermend, edebiyat û berhemdariya şair jî di afirandina bizavên kulturî de sedemên sereke ne. Lê ji Serdema Navîn heta dîtin û belavbûna çapxaneyê patronan qedr û payeya berhemeke edebî diyar dikir û bi tena serê xwe, eger edîbek bibûya misahibê padîşah an siltanekî, ev yek bi xwe îltîfata payêpêdana herî mezin bû.¹²² Helbet, ew sîstema ku edîb û hozanan mecbûrî xwe dike ku bi berhem û helbestên xwe debara xwe bike û di nav sîstema îdarî de cih bigre, beramberî sîstemekê tê. Ev sîstem jî wekî patrîmonyalîzm bi nav dibe. Sîstemên patrîmonyal; nîşaneyê hegemonyayeke ku rehên wê xwe digehîne kevneşopiyên. Di vê sîstemê de ew amûrên îdareyê di destê padîşah an siltanekî de ye û rêvebirin bi hikmê wan çêdibe. Desthilatiya padîşah, bandora xwe li ser çalakiyên kulturî jî dike û edîb û hozan, berhemdariya xwe bi îltîfata padîşah piştras dike.

Dema ku mirov li sîstema mîrektiyên kurdan dinihêre, sîstemeke patrîmonyal wekî di lîteraturê de çêbûyî ji bo wan ne mimkûn e. Ji ber ku mîrektiyên kurdan, xwedî hêzeke mezin nînbûn û hikmê wan bi tenê di nav sînorê cihê ku îdareya wan lê xurt bû, derbas dibû. Di vir de divê mirov aşkera bike û ji ber vê cudahiya îdarî şerhên wê jî diyar bike. Şerhên hîmayekirina edîb û hozanên di bin hikmê mîrektiyên kurdan de jî, li gor dewletên ku bi sîstema mutleq û monarşîk dihatin îdarekirin, nîn e. Mîrektiyên kurdan, her çend li deverên xwe xwedî însiyatîfên mezin bin jî, wekî Max Weber diyar dike, di serdema navîn de li rojhilat û rojava, dewletên monarşîk, bi awayekî patrîmonyal hatibûn îdarekirin. Desthilatî, milk û tebaa bi awayekî mutleq aîdî binemaliya hikumdar bû. Bi tenê ew kesên ku hêjayî litf û înayeta padîşah bin, ew kes bi şeref û sinifên dewlemend pêk tînin. Reqabeta di nav

¹²² Halil İnalçık, *Klasik Edebiyat Menşei, İrani Gelenek, Saray İşret Meclisleri ve Musâhib Şairler*, Türk Edebiyatı Tarihi, Cild 1. amd. Talat Sait Halman, Weş. T.C Kültür ve Turizm Bakanlığı, İstanbul, 2006, r. 275

xanedanan, bi tenê bo seray û qesr û qonaxan na, daxwaza hîmayekirina edîban û di karûbarê ilmî de jî xwe nîşan dike.¹²³

Sîstema patronajîya kurdan, ne wekî sîstema împaratoriya osmaniyan û nemaze jî edebiyata tirkî, ne jî wekî sîstema şehînşahiya safewiyan û edebiyata farisî çêbûye. Gelek sedemên dîrokî û civakî di çêbûna sîstema patronajîya kurdan de xwedî tesir bûne. Muqtedîrên kurdan, li ser esasekî otonom, pêwendiyên xwe bi dewleta osmaniyan û hikumetên din re ava kirine. Jixwe gelek mîrekiyên kurdan jî, di dirêjahiyê dîrokê de, bi hevdu re şer kirine û sîstemeke merkezî ava nebûye û îmkanên avabûna sîstemeke patrîmonyal ne mimkûn e. Şert û mercên dîrokî, kulturî û sosyolojîk egera vê yekê ye ku, desthilatiya kurdan, wekî mutleq û monarsîk nîn e û bandora wan a li ser çalakîyên ilmî, edebî û hunerî jî wekî sîstema patrîmonyal dirust nebûye. Mirov dikare bibêje ku patronajîya edebiyata kurdan, hîmayekirina edîb û dengbêjan jî bi qasî hêza mîrekiyên kurdan ên siyasî encam daye. Ev têkilî bi awayekî sirûştî derketiye holê. Her çend şairên wekî Ehmedê Xanî, bo tunebûna vê sîstemê, çênebûna sîstemeke telifê gelek bi gilî gazin bin jî¹²⁴ di seray û qonaxên mîrekiyên kurdan de, edîb û zana û ilmdar hatine parastin û berhemên xwe ne bi zimanê kurdî, bi zimanên erebî û farisî nivîsîne. Lê dema ku mirov li vê yekê dinihêre, diyar e ku sîstemeke hîmayekirinê, ya rêk û pêk di nav sîstema patronajîya kurdan de derneketiye holê. Çimkî mîr û desthilatdarên kurdan, xwedî hêzeke mutleq nînbûn, îdareya hemû xaka Kurdistanê di dest wan de jî nînbû û hikmê siltanên osmaniyan, bi awayekî nerasterast li ser wan bû. Her wiha Kurdistan jixwe di nav gelek îdareya mîrekiyan parçe bibû. Her deverê di bin rêveberiya mîrekiya kurdan de bû û ev yek bibû egera çênebûna/qelsbûna sîstema patronajîya edîbên kurdan. Ji bo vê yekê kêşe û tunebûna telifê di helbest û qesîdeyên kurdî de xwe nîşan dikiir.

“Rabit ji me jî *cîhanpenahek*

Peyda bibitin me *padişahek*

Şîrê *hunera* me bête danîn

Qedrê qelema me bête zanîn

¹²³ Ji Max Weber vgz. Halil İnalçık, *Şair ve Patron*, Weş. Doğu Batı, Ankara, 2010, r. 10

¹²⁴ Ayhan Tek, di gotara xwe ya bi navê *Li Dor Behsa Patronajê Mem û Zîna Ehmedê Xanî* de, meseleya telifê di nivîsandina Mem û Zînê de wekî faktoreke girîng dinirxîne. Her wisa lêkolîner, bi dane û nimûneyên xurt wekî faktoreke domînant nivîsandina berhemê di peywenda patronajê de rave dike. bnr. Ayhan Tek, *Li Dor Behsa Patronajê, Mem û Zîna Ehmedê Xanî*, Kovara Mukaddime, j. 3, r.54

Derdê me bibînitin 'elacê
'Îlmê me bibînitin *rewacê*

Ger dê hebûwa me *serferazek*
Sa'hibkeremek *suxennewazek*

Neqdê me dibûye *sikkemeskûk*
Ned'ma wehe bê *rewac* û *meşkûk*

Herçendi ku xalis û temîz in
Neqdeyni bi sikkeyê 'ezîz in

Ger dê hebuwa me *padîşahek*
Layiq bidiya Xudê *kulahek*

Te'yîn bibûwa ji bo wî *textek*
Zahir vedibû ji bo me *bextek*

'Hasil bibuwa ji bo wî *tacek*
Elbette dibû me jî *rewacek*" ¹²⁵

Di vê pasaja *Mem û Zîn* a Ehmedê Xanî de, meseleya telîfê, tunebûna/qelsbûna sîstema patronajê, bi awayekî aşkera, nîşan dibe. Di vir de payenedana berhemên edîban, nemaze jî ya Xanî di helbestê de bûye egera gilî û gazinan. Lewma jî li gor wî, eger "cîhanpenahek" hebûya û padîshahekî hamîtiya wî bikira, dê "qedrê qelem" a edîbên wekî wî, bihata zanîn û "şîrê hunerê" jî bihata danîn. Anku mirov dikare bibêje ku, wekî li jor jî hatî diyarkirin, paye û girîngiya berhemên edîban, bi pesnê hamiyan aşkera dibe. Qedrê qelemê û şîrê hunerê, bi hebûna cîhanpenahekî mimkun e. Diyar e ku xwedîderneketina edîban, li gor dema xwe jî ji aliyê edîban ve wekî arîşeyeke mezin dihate nirxandin. Di van beytên Xanî de jî diyar e ku ev tişt di nav edîbên kurdan de bi awayekî zelal xuya ye. Di îfadeyên wekî "Derdê me bibînitin 'elacê" û "ilmê me bibînitin rewacê" de bi awayekî balkêş û zelal, hîmayenekirin wekî *derdekî* tê terîfkirin û dermanê wî derdî û rewaca berhemdariya edebî jî

¹²⁵ Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, amd. Huseyn Şemrexî, Weş. Nûbiharê, İstanbul, 2010, r. 36-37

xwe li ser hebûna patronajê aşkera dike. Eger patronajîya şairên kurdan bihata kirin, li gor Xanî ilmê wan, berhemdariya wan a kulturî, edebî û hunerî dê her zêdetir û hêjatir bûya. Dê gelek girîngî û qiymet bihata dayîn û ilm û berhemdariya wan di rewacê de bûye.

Di wir de hinde îfadeyên Xanî, nîşaneyên daxwaza sîstema patronajê xurttir dikin. Ev tişt xwe dispêrin daxwazên madî û wekî di nav formulasyona sîstema patronajê de jî heye li ser esasekî aborî durist dibe. *Neqd**, *Sikkemeskûk***, *kulah*****, ev tişt tamamî jî nîşaneyên hamîtiyê û daxwaza telîf û alîkariya ji mîrekiyan tê xwestin e. Derbarê berhema *Mem û Zîn* a Xanî û tîkiliya patronaj/telîfê de lêkolîner Ayhan Tek van tiştan dibêje:

“Li vir tişt girîng û balkêş ew e ku Ehmedê Xanî piştî şertên wê patronajê vegotî û daxwaza sîstema patronaja kirî, ku padişah dê bi vê sîstemê “şah eseran” bi mohra xwe “derb kirî”, rewac û bazarekê pêkbîne, ancax paşî dê li ser meseleyên “millî” yên kurdan dê bibe xwedî-hukm. Ye’nî li gor Xanî, eger ji kurdan siltanekî bazara rewacê û sîstema patronajê pêkînaba dê hingî şertên jiyana kurdan guherîban û dê Rûm û Ecem li ser kurdan nerabiban. Eger ne, mesele li vir ne patronaj ba, Xanî dê pêşiyê xweziya padişehî kiriba ku ew ji destê Rûm û Eceman, xilas kiriba paşî qedr û nirxa ‘ilm û zanîne dê danaba. Lê li gor Ehmedê Xanî rêya xilasiya milletê kurd yê li “çar-kenaran” çawa di destê wî padişahî de ye her wisa rewac û bazara şairan jî di eynî destî de ye. Ye’nî Xanî di rêzkirinê de sîstema patronajê derdixe pêş.”¹²⁶

Lêkolînên derbarê mîrekiyan de çendî zêde dibin, berhemdariya edebî û hunerî ya ku di bin hîmayeya wan de çêbûye jî derdikeve meydanê. Di dema Mîrekiya Bedlîsê de edîbên wekî Şikriyê Bedlîsî (m.1523) û Harisê Bedlîsî (m.1775), di dema Mîrekiya Dêrzîne de Mîr Ye’qûbê Zirkî (m.1579) di dema Mîrekiya Ezîzan de Melayê Cizîrî (1567-1640), Mela Remezanê Cizîrî (?) Şêx Xalidê Yekem, (m.1805) Basilyos Şemûn II (?) Şêx Ehmedê Feqîr (?), di dema Mîrekiya Miksê Feqiyê Teyran, Elî Teremaxî, Weda’î, Mela Yûnisê Erqetînî, di dema Mîrekiya Colemêrgê de, Mîr Îmameddînê Hekkarî, Melayê Bateyî, Feqe Ebdulqadir, Pertew Begê Hekkarî, Feqe Reşîdê Hekkarî, Di dema Mîrekiya Bazîdê de Ehmedê Xanî, Îsmailê Bazîdî, Miradxanê Bazîdî, Mela Mehmûdê Bazîdî, di dema Mîrekiya Hîzanê de Axaokê Bêdarî, Selîmê Silêman, di dema Mîrekiya Herîr de Eliyê Herîrî, di dema mîrekiya Xelatê de Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî, di dema Mîrekiya Sêrtê de Mela Xelîlê Sêrtî û Şêx Ehmedê Feqîr û di dema Mîrekiya Amêdiyê/Behdînan de jî edîbên bi navê Xalid Axayê Zêbarî, Mela Mensûrê Girgaşî, Bekir Begê Erizî, Seyfîyê Şoşî, M. Teyar Paşayê Amêdiyê,

¹²⁶ Ayhan Tek, h.b, r. 54

* Dirav an pereyê hazîrê di dest de

** Pere an diravê ji zêr û zîv û bronzê tê çêkirin

*** Kumê serê padişahan an tacê serê wan

Şêx Nûredînê Birîfkanî, Macin, Mîna Sadiq û Mela Remezanê Ebbasî, di serdema mîrektiyan de edîbên herî bi nav û deng in.¹²⁷ Helbet serdema mîrektiyan teqabûlî 500 salan dike û mirov nikare bi çarçoveyeke sabît wê qonaxê fehm bike û hîmayekirina edîban bi tenê li ser esasekî rave bike. Ya dîtir, ji ber ku arşîv û salnameyên mîrektiyan di dest me de nîn e lewma em nizanin ka têkiliyeke çawa di navbera îdareya mîrektiyan û têkiliya mîran û edîban de heye. Tiştê ku îro em ji rabirdûyê fehm dikin îstîqrara siyasî encamên xwe li ser geşedana edebî jî kiriye. Di dema şerê di navbera mîrektiyan û Akkoyunî û êrîşên safewiyan de berhemên edebî yên kurdî hindî em pê dizanin nehatiye dayin¹²⁸. Lê wextê ku mîrektiyên kurdan di warê siyasî de bi hêz dibin, edebiyata kurdî ya klasîk jî di warê berhemdariyê de, di asteke pêşketî û kamil de dibe. Serdema zêrîn a edebiyata kurdî ya klasîk teqabûlî serdema mîrektiyan a bi hêz tê¹²⁹. Lewre mirov dikare bibêje ku şert û mercên siyasî, encamên xwe li ser pêşketina bizavên edebî û kulturî jî nîşan dide. Di *Şerefnameyê* de jî di derbarê têkiliyên mîran û edîban de hin agahiyên esas hene. Bo nimûne bapîrê Şerefhanê Bedlîsê yê mîrê Mîrektiya Bedlîsê, ji bilî hîmayekirina edîban a di serayan de, dema ku seferên leşkerî jî pêk dianîn, digel wî edîb hebûn. Dema Mîr Şeref ji bo şerekî diçe Ercîsê teqrîben 500 zana û edîb digel wî daxilî şer dibin.¹³⁰

2.2. Mîr Wekî Hamiyekî

Di nav civaka kurdan de, desthilatiya mîrektiyên kurdan bûye sebeb bo pêşxistina berhemên edebî, hunerî, ilmî û dînî. Desthilatiya siyasî, wekî encam pêşkeftinên hunerî jî peyda dike. Lewma jî mirov dikare bibêje ku, edebiyat û bizavên hunerî pêdivî bi hîmayekirinê dike da ku ji xwe re *bazarekê* dirust bike. Dirustkirina bazarekê, li gor taybetmendiyên serdeman li ser dînamîkên cuda çêdibe. Her wisa, beriya ku îmkanên çapkirinê û nivîsê belav nebibû û karîgeriya çapxaneyê wekî nosyoneke kulturî, kedkarên edeb û hunerê dermale nedikirin, pêdivî bi mîr û patronekî hebû. Mîr, çî bi îmkanên siyasî çî jî bi îmkanên aborî, xwedî pozîsyoneke hamî/patron bûn. Lê di qesr û qonaxên mîrektiyan de, ji bilî dengbêj, hozan û sazendeyan ên ku nikaribûn binivîsîn û bixwînin, anku xwendewar nin in, herî zêde qedr û qiymeta edîb û şairên xwedî dîwan dihate girtin. Jixwe ev adet, di tradîsyonên milletên cîran ên wekî tirk û ereb de jî xuya dibe. Îcrakarên hunera devkî, bi qasî edîb û şairên xwendewar, nedibûn nailê pûtepedana patronan. Lê di hin çavkanî berhemên

¹²⁷ Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata kurdî ya Klasîk*, Weş. Nûbihar, İstanbul, 2014, r. 187-189

¹²⁸ Adak, di pirtûka xwe de ji bilî van agahiyan, edîbê yekem ê serayê yê serdema mîrektiyan wekî Şikriyê Bedlîsî nîşan dike û sedema vê jî dispêre bi hêzbûna sistema mîrektiyan. Adak, h.b., r. 192

¹²⁹ Adak, h.b., r. 183

¹³⁰ Bedlîsê, b.n., 447

dengbêjiyê de em dibînin ku têkiliyeke patron û dengbêjan a ku hîmayeya wan dike bi awayekî zelal aşkera dibe. Di hin stran û belgeyan de, dengbêj di qesr û qonaxên mîran de, dengbêjiya wan dikin û digel wan daxilî nav kar û barê îdareyê jî dibin. Ev çavkaniyên ku behs li ser e, nemaze yê sed sala XIXan e û beriya wê sed salê em rastî agahiyeke dîrekt nabin ku têkiliya dengbêj û mîrekî ji berhemeke devkî aşkera bikin. Di beşa vê xebatê de têkiliyên bi wî rengî dê bêtin gengeşekirin.

Di qesr û qonaxên mîrekiyên kurdan de, patronajeke bi rêk û pêk çênebûye, lê dîsa jî li gelek caran, hinde mîrekiyan di qesrên xwe de hîmayekirina hozan û dengbêjan kirine. Em di hin berheman de rastî navê hin dengbêjan tên ku di qesran de hatine parastin, lê berhemên wan ên ku ji wê demê hatine qeydkirin, ne berdest in. Dengbêj Çingo yek ji wan e ku li Bazîdê di qesra Îshaq Paşa de dengbêjê Îshaq Paşa bûye. Kurê Çingo, Şerîfê Çingo jî dengbêjê Behlûl Paşa bûye¹³¹ lê em nizanin ka têkiliyeke çawa, li gor çî esasî di navbera patron û dengbêj de heye. Lewma jî em nikarin ji stranan sûd wergirin û analîza performansa dengbêj ya bi mîr re binirxînin. Di vir de agahiyên ku têkiliyeke dîrekt di navbera mîr û dengbêjan de datîne, nemaze û yekser xwe dispêre çavkaniyên devkî.

Di dawiya sed sala XIXan de em rastî hin belgeyan tên ku têkiliya mîr û dengbêjan nîşan dide. Yek ji wan mîran jî Îbrahîm Paşayê Milî ye. Gelek kes wî wekî “Kralê Kurdistanê yê Bêtac” qebûl dikin.¹³² Wî konfederasyona milî ya ku ji rêxistina eşîr û giregiran pêk hatiye li aliyê Wêranşara ku îro di sînore bajarê Rihayê de ye ava kiriye û ew xwedî biryargehekê bû. Îbrahîm Paşayê Milî, îdîa dikir ku, malbata wî hemû serekê eşîra Milî ye. Ecêb û seyr e ku, ji bilî wan deverên ku di bin hikumdariya Îbrahîm Paşa de bûn, deverên wekî Erzingan û Dêrsim jî, gelek hurmetdariya wî dikirin. Îbrahîm Paşayê Milî, xwedî hêzekê mezin bû ku li gelek deveran hikmê wî hebû.

Di seraya Îbrahîm Paşayê Milî de gelek dengbêj hatine hîmayekirin, çalakiyên kulturî û hunerî di bin desthilatiya wî de hatiye dermale kirin. Lê dengbêjekî bi navê Biroyê Şerqî jî hebû ku ew wekî dengbêjê wî tê qebûlkirin. Ji bilî gelek dengbêj û şairan, Biroyê Şerqî, dengbêjê wî ye esil bû. Her çend Îbrahîm Paşayê Milî Mislîman be jî dengbêjê wî Biroyê Şerqî êzîdî bû û ev xal tiştêkî pirr girîng e.¹³³ Dr. Xelîl Cindî, di rojnameya *Rewşenbirî Niwê*, beşa *Kelepûrî Netewî* jimara 75an, sala 1979an de li ser Biroyê Şerqî gotarekî dinivîse û wî wekî *dengbêjê çira û mûma dîwanxaneyê Îbrahîm Paşayê Milî* destnîşan dike. Şerqî navê eşîreke Êzîdîyan e. Li gor Xelîl Cindî, ji ber ku deng û awazê Biroyê Şerqî pirr xweş bû,

¹³¹ Mehmet Gültekin, *Zargotina Kurdên Serhedê*, Weş. Aveste, İstanbul, 2013, r. 20

¹³² Bruinessen, b.n, r.289,

¹³³ Christine Allison, *Badînan'da Eski ve Yeni Sözlü Gelenekler*, ed. Philip Kreyenbroek, Christine Allison, *Kürt Kimliği ve Kültürü*, wer. Ümit Aydoğmuş, Weş. Avesta, İstanbul, 2008, r. 63

lewre ew bibû dengbêjê Îbrahîm Paşa. Biroyê Şerqî li gor dengbêjekî ku wî dinase û bi navê Pîr Guroyê Şingalî 70 sal emir kiriye. Di sala 1934an am jî 1935an de çûye ser dilovaniya Xweda. Li gor wî hesabî, Biroyê Şerqî teqrîben, 1864 an jî 1865an de ji dayik bûye. Pîr Guroyê Şingalî, derbarê wî û dengbêjiya wî ya dîwanxaneyê di wê gotarê de tiştên gelek balkêş dibêje.¹³⁴

Biroyê Şerqî ji ber ku stranbêjê dîwanxaneyê Îbrahîm Paşe bû, gelek serpêhatiyên wî di nav tradîsyona dengbêjiyê de honandiye, bi terz û şêweya dengbêjiya xwe ew serpêhatiyên Îbrahîm Paşa di forma kilama epîk de hikayet kiriye. Di vir de tiştêkî balkêş heye ku divê mirov diyar bike, dengbêj hem li dîwanxaneyan digel cimaeta li derdora mîr stran û destan û çîrok gotine, hem jî car caran ji mîran re rûsipîtî kirine û di geşt û gera wan de jî li gel mîr bûne. Di vir de divê bête aşkerakirin ku dengbêj wekî hemsohbet û destebirayê mîr e û ev yek wekî *musahib* tê binavkirin. Westê ku mîrek ji bo edîb û dengbêjekî welînîmet an nanda be, dengbêj û edîb her dixwazin ku derd û kulê mîr guhdar bikin, jê re hemsir bin, bi wî re beşdarî şer û seferan bibin û wekî hevalê wî bibin.¹³⁵ Ev yek dibe nîşana payebilindiya dengbêjekî û bandora xwe li ser naveroka stranan jî dike û cureyê epîkê pêk tîne. Motîvasyona afirandina stranên epîkî, li ser vê dînamîka patron û dengbêj çêdibe. Ev têkilî her çend helbest û stranê wekî *meta* formule bike jî, di vir de divê mirov bizavên kulturî bi tenê wekî eşyayê patronan nenirxîne. Ji ber ku di afirandina berhemên hunerî de berhemdariya îcrakar jî neyê piştguhkirin. Her wisa, Biroyê Şerqî jî li dor vê behsê, her tim digel Îbrahîm Paşa bûye, di qesra wî de her tim hunera xwe afirandiye û rûdanên derdora wî qewimîne, honandiye. Şer û seferên wî kiriye stran û têkiliya wî û dewleta osmaniyan di stranên xwe de kiriye babet. Ev yek di gotara Xelîl Cindî de jî hatiye piştrastkirin û ji aliyê Biro ve ji Pîr Guroyê Şingalî re hatiye neqlkirin.

Di gotara Cindî de destnîşan dibe ku, Îbrahîm Paşayê Milî, şeş devehên bi rûn barkirî û sed û pêncî siwar hazir dike û ji Şamê ji bo serdana Siltan Evdilhemîd û berê xwe da Tirkîyê. Biro dizanî ku Îbrahîm Paşa ji keçeka bi navê “Pero” ku ji heman eşîra Milî bû, hez dike. Ev yek ji aliyê Biro ve dibe stran û balkêş e ku, têkiliyeke musahibî di navbera Îbrahîm Paşa û Biro de derdikeve meydanê. Têkiliyên di navbera eşîra Milî jî ji aliyê Biro ve baş tê zanîn û ew jî ji aliyê wî ve tê honandin. Her wisa Eşîra Milî jî ji du bendan pêk dihat, Miliyê Edwanî

¹³⁴ Xelîl Cindî ev gotara xwe ya derbarê Biroyê Şerqî de bi şêwezare soranî nivîsiye û li rojnameya bi navê Rewşenbîrî Niwê, beşê Kelepûra Netewî, Jimara 75an di Tîrmeha sala 1979an de nivîsiye. Lê ev nivîs ji aliyê malpera Komela Kaniya Sipî ve bo kurmançî hatiye wergerandin. (<http://www.kaniya-sipi.de/kurdish/gotar1.htm>) (30.04.2012)

¹³⁵ Halil İnalçık, *Klasik Edebiyat Menşei, İrani Gelenek, Saray İşret Meclisleri ve Musâhib Şairler*, Türk Edebiyatı Tarihi, Cild 1. amd. Talat Sait Halman, Weş. T.C Kültür ve Turizm Bakanlığı, İstanbul, 2006, r. 275

û Miliyê Kibîr. Îbrahîm Paşa ji benda Miliyê Edwanî bû “Pero” jî ji benda Miliyê Kibîr bû. Di vê seferê de, Biro têkiliya di navbera Îbrahîm Paşa û Pero, di rê de wiha xiste stran:¹³⁶

Peroya Dila

“Eman eman eman Begê mino,
Belê bila li min û bejna zirav dêmê gûlî hilnehatiba.
Stêra qere ber mangê sibê, stêra ser e,
De Xodê zane Pêrû hilatin, mêzîna* Xoda hember e,
Sîng û berê xelkê delal nebûne textê Ebdilhemîd
Dewletê Alî ye, meclîsê efsê e.
Begê mino ez bi derd im.”¹³⁷

Tiştêkî seyr nîn e lê, stranbêjekî ku di derbarê evînî û hezkirina hamiyê xwe de stran honandibe di vê nimûneyê de aşkera bûye. Her çend di navbera wan de pêwendiyê hegemonîk hebe jî, dengbêj bi mîrê xwe ve bi awayekî rehet geriyaye û gelek mîran jî bi her awayî qedirgiraniya stranbêjên xwe girtine. Di dirêjahiya ger û gešta Îbrahîm Paşayê Milî ya ku sefera Şamê de, Biroyê Şerqî her li gel wî bûye û derbarê serencama wê seferê de stran afirandiye û jê re dengbêjî kiriye.¹³⁸ Di wê strana din de ya bi navê “Edwanîm” de gelek taybetmendiyan patronajê diyar dibin. Beriya her tiştî, di hinde analojiyên Biro de rastî taybetmendiyan têkiliyan mîr û dengbêj tên. Em di formulasyona patronajê de dizanin ku, pesn, sipasî, hemd û sena, ji motîvasyona welînîmîyeyê derdikevin û analojiyên derbarê patron de yên ku li ser esasê epîkê dirustbûyî, nîşana hîmayekirinekê bi xwe ne. Hîmayekirina dengbêjekî, pesndayîna bi awayekî siruştî derdixe meydanê û dengbêj bo şikirandina vê babetê, divê pesn û taswîrên mîr bike da ku pêwendiya hîmayekirinê her berdewam bike.

Edwanîm

“Bejna Edwanê min zirav e, dar ji dara gêrazê,
Dewê şîn dike li Şama şîrîn, nehêlê Salihîya ez kemgazê,
Xwedê ava neke mala çalex û bêbextê gundê me

¹³⁶ Xelîl Cindî, h.b.

¹³⁷ Xelîl Cindî, h.b.

* Mezîna: Pêrû terazû: navê hindek stêran e, rengê wan li ezman wekî terazû diyar dibe.

¹³⁸ Xelîl Cindî, h.b.

Serê sibeya xêrê nebînîm lo lo melûlo.
De çawa sê roja berê Edwanê min dana
Kinarê qubletê, erê destê Edwanê min qutkir
Hersê deqêt sor î sermawî, boxazê, melûlo lo melûlo lo
De rêka Şama şîrîn mehela Salihî qûnax dû ro.¹³⁹

Pêwendiya mîr û dengbêj, li gor awayê hîmayekirinê, dibe sedema bêrûmetiyekê jî. Dema ku dengbêj li cem mîr an patronekî, li benda parastina wî dibe, di navbera wan de pêwendiyekê ku dengbêj jê aciz bibe jî rû dide. Ev yek têkiliyêke bi navê *patron* û *klient* derdixe holê. Li gor vê çarçoveyê, wextê ku dengbêjek bixwaze were hîmayekirin, di serî de xwe divê bispêre hamiyekî. Ji ber ku çî îmkanên îcrakarê hunerê tune ku bazara berhemên xwe pê bike, divê xwe nêzikî kesekî maldar û dewlemend bike. Ev yek di lîteratura vê babetê de xwe dispêre beriya şoreşa sanayiyê. Bi taybetî, ev têkiliya çalakiya hunerî di nav wan cimaetên ku beriya şoreşa sanayiyê de derketiye holê. Di nav wan cimaetan de, ew axa û derebegên ku xwedî ax û erd in, têkiliyên xwe û kesên ji xwe hejar û feqîrtir û gundiyan li ser vê esasê dirust dikin. Terma kliyentalîzmê, bi taybetî jî di lîteratura sosyolojiyê de, xisûsî jî di nav milletên pêşketî de, zêdetir jî, di pêwendiyên şexsî de ku dibin egera rêxistina faaliyetên siyasî û her wiha ev yek nasnameyêke hevpar di navbera wan de ava dike. Ji bilî patronaja edebî, patronaja lîteratura sosyolojiyê jî, ji aliyê antropog, zanyarên civakî li ser stûneke dijî unsûrên feodalîzmê jî tê avakirin. Bo nimûne ew pêwendiya patron û kliyentê di seheyên wekî burokrasî, hîzîpperestiya siyasî, karûbarên bazirganiyê an jî di sendîkalîzmê de tê tehlîlîkirin.¹⁴⁰ Dema ku patron ji kliyent re amûr û amrazên aboriyê tesîs dike, kliyent jî, ji bilî xelatên şexsî, ked, xizmetguzariya şexsî, dilsozî, û car caran jî xizmetkariya leşkerî û piştgiriya siyasî dide patronê xwe. Her ji ber wê, kliyent di pozîsyoneke ku tam û tam, xizmetkariyêke dualî û bê mubadele de cî nagre. Patron her û her di pozîsyoneke mesuliyetê de ye. Egera vê yekê û hev kêşeya vê babetê, li ser mesûliyeta hamî/patron e ku, divê ew wekî meşandina sîstema patronajê, parastina şair/kliyent bi awayekî pêk bîne, hizur û aramiya kliyentê xwe bi awayekî dirust bike.¹⁴¹

Wekî li jor jî hat diyarkirin, hîmayekirina mîrekiyên kurdan a dengbêjan, di lîteratura patronajê de bi gelek kêşeyên metodolojîk ve tije ye. Ji bo wê yekê jî, patronaja dengbêjan, di nav xwendineke dîrokî û siyasî de, divê şerhên wê werin îzahkirin. Çimkî, patronaja edebî û

¹³⁹ Xelîl Cindî, h.b.

¹⁴⁰ Kudret Emiroğlu, Suavi Aydın, *Antropoloji Sözlüğü*, (Kliyentalizm-himayecilik kayırmacılık) Weş. Bilim ve Sanat, Ankara, 2003 r. 479

¹⁴¹ Kudret Emiroğlu, Suavi Aydın, h.b, r. 479-480

hunerî, bi her awayî ve girêdayî hêzeke mutlaq û monarşik e. Dema ku siltan an padîşahek xwedî înisiyatîfên bi vî rengî bin, di bin hamîtiya wî de jî reng û temayên edebî û hunerî derdikevin meydanê. Lê mîrektiyên kurdan, ne xwedî înisiyatîf û hêzeke bi wî rengî bûn. Hêzeke patrîmonyal ne di destê wan de bû û lewma jî di afirandine berhemên edebî û hunerî de înisiyatîf bi tenê di destê wan de nînbû. Her ji ber wê jî, di berhemdariya kulturî û edebî de xwedî rol û mîsyoneke mezin nînbûn. Bo nimûne împaratoriyên wekî osmaniyan roma û safewî, ji bilî deverên ku hikumraniya wan împaratoran lê hebû, ji dever û welatên din jî, gelek şair, hozan, resam dihatin û diketin bin hîmayekirina siltan an padîşahan. Em rastî çî belge û daneyan nehatine ku ka ji welatekî dût, çî şair an hunermend û hozan ji aliyê mîrektiyên kurdan ve hatine hîmayekirin. Di destê me çî belge nîn e ku em pêwendiyê patronajê ya ku li ser esasên dewletên patrîmonyal hatine avakirin, tetbîqî xwendinên kurdî jî bikin. Ji bo wê jî, sîstema patronajîya kurdan gelek qels bû û di nav sînoreke herêmî de mabû. Lê patronajîya ku ji serdestiya dewleta osmaniyan derketibû holê, bi gelek îmkânên finans kapîtalê û pêwendiyên navdewletî ve gehîştibû dereceyê mezin. Têkiliyên dewleta osmaniyan bi dewlet û împaratoriyên din ve hebûn, lewma jî vê yekê bandora xwe li ser çalakiyên edebî û kulturî jî dikir. Siltanên osmanî, bi taybetî ji Asyaya Navîn û Azerbaycanê bo ku mûnşî, şair û aliman bîne peyîtaxta osmaniyan alîkariya gelek şair û hunermendan kirine. Fatîh Siltan Mehmed û Beyazîdê II. şair û mutasavîfê Îranî, Mele Camiyê ku zemanê xwe de xwedî qedrekî mezin bû, gelekî dixwest bîne Stenbolê.¹⁴²

Dengbêjê ku li gel mîran û di seray û qonaxên wan de bûya, xwedî şan û şerefeke mezin bû. Ew dengbêj ji aliyê dengbêjên din û xelkê ve wekî *dengbêjê mîran û hakim*an dihatin zanîn. Ev yek bo statuya wan ast û dereceyê pirr mezin bû. Ev tradîsyon di gelek nimûneyên hunera cîhanê de jî bi heman awayî dewam kiriye. Her wiha eger alim û zanayek, şair û edîbek, an jî hozan û hunermendek, li cihekî bi berhemendî û jêhatiya xwe ve, xwe îspat bikira jî, şan û şerefa xwe di înayeta hikumdarên dewlemend û mezinan de didît. Patronaj her wiha, ne bi tenê li ser dînamîkeke yekalî dimeşe. Ew ji bilî wê xwe dispêre motîvasiyoneke dualî jî. Wextê ku şair û hozanek di serayekê de bûya, ew seray û padîşah nav û nîşaneke mezin bû. Her wisa, dema ku şairek ji aliyê patronakî ve di serayê de bihata hewandin, ew bo şair jî nîşana şan û şerefeke mezin bû.¹⁴³

Di vir de di nimûneya civaka kurdan û mîrektiyên de, tiştê girîng ew e ku, têkçûna mîrektiyên, rastî serdema peydabûna bîr û boçûnên modern ên wekî netewetî tê. Her wisa, hewldana merkezîbûna dewleta osmaniyan, bû sedema xirabbûna mîrektiyên kurdan.

¹⁴² İnalçık, h.b., r. 11

¹⁴³ Halil İnalçık, h.b., r. 13

Serhildana Bedirxaniyan t êkçûna îdareya wan, hêza osmaniyan zêdetir kir û avakirina eyaleta Kurdistanê, îdareya Kurdistanê zêdetir girêdayî merkeza osmanî kir. Ji bo vê yekê di rojnameya *Takvim-i Vakayî* de tebligatêke fermî t ê weşandin¹⁴⁴ û ew yek ji bo fehmkirina bûyerên wê demê û karakterê t êkçûna mîrektiyan nimûneyeke balkêş e. Li gel vê yekê, ew berhemên ku pêwendiya mîr û civakê nîşan didin bi gelek form û temayên netewî ve tije ne. Di nav kelepîra dengbêjiyê de gelek stran hene ku li ser mîr, di peywenda netewî de hatine honandin. Ev stran niha nayê zanîn ku ji aliyê kî ve hatiye gotin lê îhtimal heye ku, di serî de ji aliyê dengbêjekî ve hatiye gotin. Ew di nav kelepîra dengbêjiyê de wekî berhemên anonîm/gelêrî t êne qebûlkirin û kesê ku ew afirandine, nayên zanîn. Ji ber ku ew serdema ku rastî t êkçûna mîrektiyan t ê, geşedan û kawdana çêbûna nasnameya netewî ya kurdan bû, gelek stranên derbarê mîr û began, bi temayên siyasî û netewî ve hatine gotin.

Ecêb e ku, di stranên dengbêjiyê de, yê derbarê mîran de, temayên netewî û kurdewarî zêde nîn in. Gelek mîr û beg di stranên de bi qehremanî û mîrxasiya xwe ve bûne babeta stranên, lê formên kurdewarî zêde di stranên de nîn in. Helbet dînamîkên ku em îro di çarçoveya netewê de fehm dikin, wê demê li ser esasên cuda rû didan. Pêwendiyên eşîrkî, t êkiliyên navxwe, temayên stranên zêdetir diyar dikin. Di gelek stranên de navê devera Kurdistanê, wek *welatê Serhedê*, *welatê Cizîra Botan*, *warê Dêrsim* derbas dibe. Lê di destana *Kela Dimdimê* de, lehengê destanê wekî Xanê Kurdan derbas dibe. Wekî din stranên derbarê Evdirahman Paşayê Baban de jî, hinde stran hene ku li ser wî hatine gotin. Di strana Evdirehman Paşayê Baban de analojiyên wekî *Kralê Kurdistanê* bi cî girtine.¹⁴⁵

Serdema t êkçûna mîrektiyên kurdan, rastî geşedana hewl û t êkoşîna avakirina nasnameya kurdan jî t ê. Bi hilweşîna sîstema mîrektiyan, di nav girêgirên kurdan de, li Kurdistanê hinde organîzasyonên îdarî peyda bûn. Ew îdareyên li Kurdistanê, bi awayekî kronolojîk şêxtî û axatî bi xwe ye. Şêxtî, bi maneya xwe ya dînî ve li ser kurdan, bandoreke pirr mezin vedane. Ew li gor mîrektiyan, ne xwedî erd û ax in lê, tesira wan li ser kurdan her ku çû zêdetir bû. Anku, mirov dikare bibêje ku çêbûna sîstema şêxtiyê, li ser esaseke terîtoryal xurt nebûye.¹⁴⁶ Ew rêxistin zêdetir li ser t êgehiştineke mîstîk ava bûye û temayên îslamîk

¹⁴⁴ Osmanlı Kaynaklarında Kürtler Çalışma Grubu, *20. YY'ın Başlarında Kürt Milliyetçi Söylemine Bir Örnek, Emir Bedirxan, Lütfî (Ahmed Ramiz)*, Weş. BGST, İstanbul, 2007, r. 113

¹⁴⁵ A. Hassanpour, b.n, r. 129

¹⁴⁶ Xebata Martin van Bruinessen a bi navê *Ağa, Şeyh, Devlet*, derbarê guherîna civaka kurdan de bi referansên xurt ve tije ye. T êkçûna mîrektiyan di nav civaka kurdan de mobilîzasyonêk peyda kiriye. Civaka kurdan piştî t êkçûna mîrektiyan zêdetir girîft bû û t êkiliyên şêx û axayên kurdan, bi dewletê re li ser esasên berjewendî û dijberiya dewletê ava bû. Li gor xebata wî mirov dikare bibêje ku, t êkçûna mîrektiyan û valahiya îdareyê ji bo şêxan bû firsend ku tesira xwe li ser gel xurt bikin. Piştî ku desthilatiya şêxan li ser dînamîkên civakê gur bû, t êkiliyên wan û dewletê jî guherî û di dawiyê de di navbera wan de berberiyek peyda bû. Her wisa ev t êkilî, wekî kronolojîk mirov ji serdestiya mîran ber bi serdestiya şêxan û bi t êkçûna şêxan jî ber bi serdestiya axayan dibe.

têkiliya wan û civakê diyar kiriye. Her çend di warê îdarekirina axê de, desthilatiyeke arîstokrat tunebe jî, şêx di dema çêbûna/çêkirina pênaseya kurdan de xwedî rol û mîsyoneke mezin bûne. Ji ber ku di navbera mîrektiyan de nakokiyên êl, eşîr û têgehên xizmatiyê hebûn, çêbûna yekitiyê di navbera wan de pirr zehmet bû. Lewma jî rola şêxan di wê serdemê de zêdetir derkete holê. Şêx Ubeydullahê Nehrî nimûneyeke girîng e di vir de. Wî di dema xwe de ji bo çêkirina nasnameya kurdan a netewî gelek hewl daye û têkilî digel dewletên wekî îngilîz re daniye û name bo qasidên wan şandiye.¹⁴⁷ Şêxtî her çend saziyek, an dem û dezgeheke esasî nebe jî, wekî encam di kawdana çêbûna fikrên netewî de xwedî tesir bûne. Di dema xwe de, desthilatiya rêveberiya Kurdistanê kirine û ji bo çalakîyên ilmî û edebî û hunerî, wekî hamiyekî mirov dikare qebûl bike. Ji ber wê yekê jî, di stran û berhemên dengbêjiyê de, gelek cih girtine. Seyr e ku ew di nezera dengbêjan de, wekî “mîr” hatine honandin. Anku, ji bo dengbêjekî şêx wekî mîrekî hatine qebûlkirin û di stranên derbarê wan de hatine gotin de jî, ew wekî mîr hatine teswîrkirin. Her ji ber wê jî, daxwaza avakirina nasnameya kurdan, bi dîskorsên dînî û Kurdayetî ve ji aliyê şêxan ve hatiye formulekirin. Ev xal di berhemên dengbêjiyê de bi awayekî aşkera, diyar dibe. Wekî li jor jî hate diyarkirin, şêx hem bi rola xwe ya dînî, hem bi wezîfeya xwe ya civakî, piştî têkçûna mîrektiyan roleke îdarî kirine. Di gelek serhildan û berxwedanên qewimîne, ji aliyê şêxan ve hatiye organîze kirin û ji ber wê jî gelek şêx mirine an hatine kuştin.

Piştî ku otorîte û desthilatiya mîrnişîniyan têk çû û hêza wan winda bû, di navbera lîderên eşîretan û şêxan de têkoşîn û daxwaza bidestxistina otorîteyê destpê kir. Di vê têkoşînê de di dawiya sedsala XIXan de Nehriyan û malbata wî ku ji binemala Şêx Evdilqadirê Geylanî dihat, serkeftî bû. Di wê demê de li devera Kurdistanê û nemaze jî li devera Behdînan û Hekaryayê, serdestî û desthilatiya şêxan destpê kir. Terîqeta Nexşîbendiyê, ji ya Qediriyê bêhtir di nav kurdan belav bû û malbata Nehrî jî xwe li ser terîqeta Nexşîbendiyê hesab kirin. Bi piştevanî û rêxistina Nehriyan terîqeta Nexşîbendî li Kurdistanê di nav kurdan de her bêhtir deng veda û guherî otorîteyêke siyasî bû. Gelek alîgirên Şêx Ubeydullah Nehrî peyda bûn û her wiha di sala 1880an de bi rêveberî û serokatiya Şêx Ubeydullah Nehrî li Kurdistanê doz û têkoşîna bo Kurdistana serbixwe peyda bû. Lê ev yek ji aliyê împaratoriya osmaniyan ve hate têkbirin.¹⁴⁸ Diyar e ku desthilatiya şêxan, li Kurdistanê, di warê netewî û daxwaza bidestxistina mafê kurdan, di peywendaya nasnameyê de ji mîrnişîniyan bêhtir deng vedaye. Ev

Anku ji qadeke makro, ber bi qadeke mîkro ve desthilatiya civaka kurdan her têk çû. Bo agahiyên berfirehtir bnr. Martin van Bruinessen, Ağa, Şeyh, Devlet, Weş. İletişim, İstanbul, 2004, r. 271-303-375

¹⁴⁷ Dawid, McDowall, *Modern Kürt Tarihi*, wer. Neşenur Domaniç, Weş. Doruk, İstanbul, 2004, r. 88-89

¹⁴⁸ http://www.bgst.org/muzik/egitim/hakkari/hak_tarihi.asp (Dîroka Hekaryayê-Hakkari Tarîhî 10.05.2012)

* Ev agahî û zanînen di vê peywendê de, bi belge û zanînen nivîskî nayên piştraskirin. Lê Mehmet Gültekin'ê ku bi xwe jî li ser zargotina kurdî dixebite, van agahiyan bi zanînen û hevdiyanan qewî dike.

yek bo têgehiştina guherîna desthilatiya kurdan, di çarçoveya dîrokî de wekî xaleke werçerxê ye. Lê di vir de ew demên ku rastî vê qonaxê tên, bo kurdan xwedî tecrubeyên pîrr sistematîk û organîze nehatine. Û ew dem bi xwe rastî têkçûna împaratoriya osmanî, geşedanên siyasî li Rojhita Navîn, Ewropa, Tirkîye û Kurdistanê tê û ji ber wê yekê jî, demeke pîrr tevlihev e. Lewma jî, otorîteya li Kurdistanê ku ji aliyê şêxan ve hatiye bidestxistin, di pratîkê de rastî pêdiviyên kurdariyê nehatine. Di peywenda çalakiyên kulturî de, hunerî, edebî û faaliyetên ilmî, wekî dema mîrektiyan nîn e. Pêwendiya dengbêj û şêxan jî li gor vê esasê çê bûye û pêwendiyê qels heye di navbera wan de. Jixwe ew demên ku şêxtî wek otorîte di nav kurdan de desthilat bûn, rastî têkçûna epîkê jî tê. Ev yek di stranekê de wiha diyar dibe: *Celaliya, Şêx Qiyasedîn, birayê dilşewitî/ malxirabo, derbek lêxistine bejna Şêx Zahar/ delaliyê malê, birîndar e ji êvar da, yeqîn bêfayde ye.*¹⁴⁹ Piştî ku şert û mercên siyasî li Kurdistanê guherîn, ev yek netîceya xwe di musikê de jî destnîşan kir. Ji wan girîngtir jî, êdî di wê serdemê de hêdî hêdî xwendewarî belav dibû, radyo, televîzyon û enstrumanên teknolojiyê reng û temayên kultura devkî têk dibir. Her wiha ev dem bo pêvajoya geşedan û kawdana kultura kurdan a devkî û berhemdariyên ku li ser wê behsa peyda dibûn jî wenda an qels kir.

Wekî mîran, şêxan jî parastina dengbêjan li gel xwe kirine. Bandora wan çendîn di nav gel de zêde bûye ku, ew temayên kilam û stranên dengbêjan de bi cî girtine. Şêx Fexriyê ku beşdarî serhildana Şêx Seîd bibû, hîmayeya dengbêjekî dikir. Dengbêj Sidiqo ku di demên 1920ê de jiyabû, ji aliyê Şêx Fexrî ve hatiye parastin. Li vir diyar e ku, di dema desthilatiya Şêxan li Kurdistanê, her çend sîstema patronajê têkçûbûye jî, dîsa şêxan jî wek kesên muktedîr, parastin û hîmayeya dengbêj û hozanan kiriye û gelek rûdanên ku li dor wan qewimîne xistiye stran.¹⁵⁰

Di çî malûmat û çavkaniyên kurdî yên ji aliyê kesên biyanî ve di derbarê kurdan de hatiye nivîsîn de, em rastî çî agahiyan nayên ku ew cihên ku şêx lê serdest û bi iqtîdar in, parastina dengbêjan hatiye kirin an na. Di nav kurdan de, bi dîtin û baweriya îslamê, li hinde deveran dengbêj nehatina guhdar kirin jî. Ew kesên ku xwediyê vê nêrîne bûne, stranên dengbêjiyê wekî stranên ne îslamîk qebûl kirine. Lê di medreseyan de qesîde û îlahiyên bi temayên îslamî hatine gotin.

Ev strana li jêr ku li ser Şêx Seîd hatiye gotin, mirov derbarê afirandina berhemên bo şêx hatiye nivîsîn de agahdar dike. Di vir de patronajeke rasterast tune, lê dîsa jî em fehm

¹⁴⁹ Mehmet Gültekin, b. n, r. 320

¹⁵⁰ Orhan Zuaxpayij, *Şêx Said Hareketinden Bir Portre, "Farqînli Şêx Faxri Bokarki'nin Yaşam Öyküsü"* Kovara Bîr: (<http://www.kovarabir.com/tag/sex-fexri/>) (02.04.2013)

dikin ku ew kesên ku serkêşiya civakekê dikin, çawa di hunera civakî de tên îfade kirin. Di nav kelepîra dengbêjiyê de gelek versiyonên vê strana bi navê “Mîrê Min” hene. Ji ber ku ew berhemeke anonîm e û bi îmkanên nivîsê neqlî nav dengbêj û civakê nabe, di afirandina wê de ya ji nû de, gelek unsurên wê diguherin. Lê dîsa jî çarçoveya vê stranê ya ku di peywenda patronajê de diyar bûye, xwe diparêze. Ev nimûneya dengbêjiyê, mirov nizane ka ji aliyê kî ve hatiye honandin û afirînerê stranê kî ye. Jixwe em dizanin, stranên anonîm, piştî ku hin taybetmendiyên hefizeya kolektîf dihewînin, dibin malê civakekê û belavî nav civakê dibin.

Mîrê Min

“Mîrê min, mîrê min, mîrê min, mîrê min, mîrê min...

Heyla dayê çavê xwe digerînim nizanim kanê Şêxê min

Mîro de rabe bi Çiyayê Bîngola şewitî diketim

Ji kula dilê min û te ra bi mij e lo bi dûman e

Le belkî agirê kulê têkeve mala Misto Kemal e

Çawa rakirî fermana serê Kurda

Birîna serê şêxan û melan e

Hela rabin binêrin meclîsa Enqerê lo lo li hev civiyan e

Ji bo xeniqandina Şêx Seîd Efendî bavê Şêx 'Elî Riza

Temamê mebûsan lo qerar dane

Hela rabe binêre li tîfingê destê lo cendirman e

Lawo mêze bikin li sîtemê milê lo polêsan e

Şêx Seîd Efendî birin Diyarbekir lo lo li ber bendan e

Ez çûme Diyarbekira rengîn, min bala xwe dayê

Min dî tamamê sofî û mirîdan lo li hev civiyan e

Xorta piştî xwe dane dîwara, dibarînin hêsirê belek çavan e

Min gotî, keko ez nizanim çi bû çi qewimî

Ji min ra digotin hey mala te xerabe, tu nizanî

Dozdeh heb mîletvikîlyê Tirka, li Bilîsê lo li hev civiyan e

Le rakirine fermana serê kurda, birîna serê Şêxan e

Şêx Seîd Efendî anîn e Diyarbekir lo li ber bendan e

Dema bend avêtin qiriqa Şêx Seîd Efendî

Ew ê gavê mi'd zanîbû teze xwelî li nava çavê lo me hemiyan e

* * * * *

Mîro de rabe, bi Çiyayê Bîngola şewitî diketim lo lo ha bi ce ye
Agirê kulê têkeve mala Misto Kemal
Çawa rakirî fermana sere şêx û melên me ye
Hela rabe eskerê Misto Kemal derketî ji çiyayê Bîngolê
Tê ji Palandokan da, dayê ferqe bi firqe ye
Kesekî tune cewabê bide kirê Celaliyan
Li pey Silêmanê Ehmed dayê bavê Ferzende ye
Jê ra bibêje mala te xerabe, Şêx Seîd Efendî
Birin Diyarbekir, li ber benda
Bend avêtin qiriqa Şêx Seîd Efendî
Şer'a Dînê Nebî Mihemed Pêxember evî tiştî qebûl nake
Lawo di nava me da bê pirr gunê ye be
Mîrê min, mîrê min, mîrê min, mîrê min, mîrê min mîrê min...
Heylê dayê çavê xwe digerînim nizamim kanê Şêxê min”¹⁵¹

Nemaze, stranên epîk û destanên derbarê giregiran (mîr-axa-paşa) de ji aliyê dengbêjan ve hatine honandin, bi tenê ji aliyê dengbêjê wî mîr û axayî ve nehatiye gotin. Piştî ku ew stran belav dibin (ev jî yek karakter û taybetmendiya çêbûna berhemên folklorîk û anonîm in) û ji aliyê gelek kes û dengbêjan ve tê qebûl kirin. Strana ku bo Nurullah Begê mîrekiya Hekaryayê yê dawî hatiye gotin, yek ji vê behsê ye. Mirov nizane gelo kî ew stran gotiye an honandiye. Lê bo behsa mîrekî jî xaleke girîng e.

Di sedsala XIXan de, piştî têkçûna mîrekiya Cizîra Botan, li Kurdistanê hin mîrektî hebûn ku li devera xwe muqtedîr bûn. Li herêma Behdînan, mîrekiya Hekaryayê wê demê mirov dikare bibêje ku yek ji mîrekiya dawî bû. Pêwendiyên mîrekiyên kurd wê demê li herêma Behdînan, bi nastûriyan re jî gelek bûn ew di bin îdareya mîrekiya Hekariyê de bûn.¹⁵² Lê mîrekiya wê demê têkiliyên xwe bi eşîr û giregirên kurdan re bêhtir geş kir û daxwaz kir ku ew beg û eşîrên kurdan ên belawela bûne, bike yek û her wisa Kurdistanê serbixwe ava bike. Piştî ku asûrî li Kurdistanê bi hêz bûn û pêwendiya wan bi dewletên biyanî re pêşketin, Bedîrxan Beg ji hêza asûriyan tirsîya û bi tehrîq û ajîtasyona dewleta osmaniyan bû sebaba qirkirina Asûriyan. Tirsî Bedîrxan Beg ew bû ku, bi destek û piştgiriya Rûsan

¹⁵¹ Dengbêj Maruf, “Mîrê Min”, Deşîfrekirin: Zeki Gürür

¹⁵² Celilê Celil, XIX. *Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler*, wer. Mehmet Demir, Weş. Özge, Ankara 1992, r.136.

dewleteke Xirîstiyân dê li deverên ku di bin hikumraniya wî de, bê avakirin. Egera qirkirina asuriyan li ser vê esasê pêk hat. Di sala 1843ê de li Çelêya navçeya Hekaryayê û li devera Tiyarê, di sala 1845ê de li gundê Dêzê yê û di sala 1846ê de jî Asuriyên Tuxûbê bi hinceta jenosîda Asuriyan dewleta osmaniyan hikumraniya mîrnişîniya Botanê tîk bir. Piştî tîkçûnê wekî mîrê dawî yê mîrekiya Botan Nurullah Beg hebû.¹⁵³ Ew hevpeymaneke muhim a Bedirxan Beg bû. Ew jî wekî Bedîrxan Beg gelek bi hêz bû. Bi erîşên xwe yên li ser du heb eşîrên asûriyên li devera Hekaryayê jî navdar û meşhûr bû. Straneke ku li ser wî hatiye honandin, bo têgehiştina pêwendiya mîr û berhemên folklorîk û nîmuneyeke girîng e. Dema ku mirov li stranê dinihêre, gelek taybetmendiyên balkêş hene ku, atmosfera wê demê yê ku di çarçoveya afirandina epîkê de wekî *ringe ringa dehol* a cih girtî nîşan dide.

Nurullah Beg

“Çolemêrgo Çolemêrg Mîrê min ha mîrê min
Çolemêrgo Çolemêrg Mîrê min Nurullah Beg

Çolemêrge eywane Mîrê min ha Mîrê min
Çolemêrge eywane Mîrê min Nurullah Beg

Ser da suk û dukan e Mîrê min ha Mîrê min
Ser da suk û dukan e Mîrê min Nurullah Beg

Cihê Mîr û began e Mîrê min ha Mîrê min
Cihê Mîr û began e Mîrê min Nurullah Beg

Mîr hate serê solan Mîrê min ha Mîrê min
Mîr hate serê solan Mîrê min Nurullah Beg

Ringe ringa dehol a Mîrê min ha Mîrê min
Ringe ringa dehol a Mîrê min Nurullah Beg

De çine kevne tola Mîrê min ha Mîrê min
De çine kevne tola Mîrê min Nurullah Beg

¹⁵³ http://www.bgst.org/muzik/egitim/hakkari/hak_tarihi.asp (Dîroka Hekaryayê-Hakkari Tarîhî 10.05.2012)

Mîrê min ha Mîrê min Mîrê min ha Mîrê min
Mîrê min ha Mîrê min Mîrê min Nurulah Beg”¹⁵⁴

Ji bilî vê nimûneya ku li jor hate diyarkirin, gelek nimûneyên derbarê mîran de jî hene. Lê mirov nizane ka gelo ew di peywenda patronajê de têkiliya mîr û dengbêjan destnîşan dike an na. Çimku ev stranên ku behs li ser mîr û giregiran e, diyar e ku di serî de ji aliyê dengbêj/hozanekî hatiye gotin û her ku çûye belav bûye. Jixwe ev taybetmendiyeke berhemên folklorîk e. Ev nimûne di gelek stranên de bi awayekî tevlihev derdikevin pêşiya me. Bo nimûne gelek stranên ku ji aliyê dengbêjekî ve hatiye gotin, di nav berhemên edebiyata klasîk de jî ji aliyê şairan ve hatiye gotin. Bo vê yekê gelek stranên dengbêjiyê di edebiyata kurdî ya klasîk de, gelek klasîkên kurdî jî di berhemên folklor û edebiyata gelêrî ya kurdî de xuya dibin. Dîsa gelek stranên ku diyar in dengbêjê binavûdeng yê Evdalê Zeynikê ji aliyê gelek dengbêjên dî ve hatiye gotin û îro jî di nav dengbêjan de wekî anonîm tê qebûlkirin. Her wiha ew stranên di rabirdûyê hatine afirandin û taybetmendiya hefîzeyê civakî nîşan didin, li gor şert û mercên rojane/aktuel, dîsa jinûve têne şîrovekirin û gotin.

Di vê strana li jêr ê ku behsa mîrekî li devera Sêwasê tê kirin de jî em rastî vê taybetmendiya berhemên gelêrî tînin. Lê em nizanin ku gelo ew stran ji aliyê kî ve hatiye afirandin û îcrakarê wê ne diyar e. Ew stran, ji aliyê hunermendekî ku bi terzeke modern û bi enstrûman muzîkê dike, ji ve tî afirandin. Erol Berxwedanê ku vê stranê dibêje, reh û karakterê vê stranê dispêre dengbêjiyê û kultura devkî.¹⁵⁵ Her wiha di vê stranê de gelek formên epîkî hene. Diyar e ku ev stran li ser esaseke hestên destanî hatiye honandin. Ji aliyê fiksiyonê ve, pêwendiya dengbêj û mîr bi awayekî zelal aşkire dike. Lê ev stran îro di nav hunermendên ku vê strana anonîm wekî terzeke modern îcra dikin û ji bilî wê, ji aliyê dengbêjên ku hê jî ne xwendewar in û bi terzê devkî muzîka tradîsyonel îcra dikin jî tî gotin. Di vê stranê de jî, form û temayeke wisan heye ku, mirov dibêje qey, dengbêj di stranê de bi mîr re dipeyive û her wiha, serpereştîya wî dike. *De rabe rabe mîro rabe/Xewa sibê pîrr xerab e/Xewa sibê pîrr giran e/.*

¹⁵⁴ Ev deq ji Selîm Oramar hatiye wergirtin. Di nivîsa xwe ya bi navê Bir Zamanlar Çolemêrg (Zemanekî Colemêrg) hatiye weşandin. (<http://www.yuksekovahaber.com/yazdir/yazi/yazi/bir-zamanlar-colemêrg-490.htm>) (12.05.2012)

* Ev agahî yek û yek ji Erol Berxwedan hatiye wergirtin.

¹⁵⁵ Ev agahî bi xwe ji aliyê Erol Berxwedan ve hatiye gotin, di çi çavkaniyê de mirov rastî belge û agahiyên ku vê piştras bike, nayê. Lewma jî di vê lêkolînê de yek ji arîşeya vê xebatê ew e ku, berhemên gelêrî bi daneyan belge bike.

Mîro

“Hespê mîrê min qir û hêşîn
Teres dilîze li ser lingê paşîn

Birînê mîrê min pîrr giran e
De dilê min jî ji wî re diêşe

De mîro mîro mîrê mîran,
Karê te çûne Sêwasê li nav mihaciran

De rabe rabe mîro rabe,
Xewa sibê pîrr xerab e
Xewa sibê pîrr giran e

Hespê mîrê min hespekî boz e
De rê ve nere rê bi toz e

Birînê mîrê min pîrr xedar e
Ez jî ji wî re kûr dinalim

De mîro mîro mîrê mîran
Karê te çûna Sêwasê li nav mihaciran

De rabe rabe mîro rabe,
Xewa sibê pîrr xerab e
Xewa sibê pîrr giran e.”¹⁵⁶

Di nav sîstema patronajîya kurdî de, pêwendîya dengbêj û beg/mîr û hîmayekirina dengbêj bêhtir di nimûneya Evdalê Zeynikê û hamiyê wî yê Sirmelî Memed Paşa de diyar dibe. Derbarê Sirmelî Mehmet Paşa de, agahiyên heyî nemaze yên şîfahî ne û mirov nikare wan bi çavkanî û delîlên tarîxî ve piştras bike. Di kitêba Aras a bi navê *Şairê Kurda yê Efsanevî Evdalê Zeynikê* de Aras li gorî destxeta Selahattin Sarayhanoglu, Sirmelî ji binemala

¹⁵⁶ Erol Berxwedan, Mîro, Deşîfrekirin: Zeki Gürür

Hecî Ehmed Paşa ye. Ew neviçirkê mîrektiya Beyazidê, wekî kurê Îshaq Paşa tê nasandin.¹⁵⁷ Helbet di dema desthilatiya xwe de, gelek têkiliyên wî digel dewleta osmaniyan çêbûye û di karûbarê îdarî yê derve de ew her di bin mesûliyeta dewleta osmaniyan de bûye. Di xebata Celîlê Celîl de em dibînin ku, ji aliyê begê Xozanê Silêman Beg ve, ji wezaretê karên derve yê Rûsyayê re belgeyek¹⁵⁸ tê şandin û em di wir de dibînin ku ji ber şandina fermana *Firka-i İslahiye*, ji bo têkbirina mîrektiya Xozanê ji aliyê osmaniyan ve tê wezîfedarkirin. Di arşîvên osmaniyan de jî em dibînin ku Sirmelî ji aliyê osmaniyan ve wekî şakiyekî ku li hemberî îdareya osmaniyan tevgerî tê qebûlkin.¹⁵⁹ Helbet çarçoveya vê xebatê ne zelalkirina aliyê îdarî yê Sirmelî ye, her wisa bi tenê tiştê pêwîst ew e ku, têkiliya Sirmelî û dengbêjan û nemaze jî Evdalê Zeynikê di peywenda patronajê de bête ravekirin.

Sirmelî Memed Paşa li Serhedê, li devera Zêdkanê (Eleşkirt) li Xamûr û Dutaxê xwedî hêz û şiyaneke bû. Malbata wî bi eslê xwe ji Bayîzdê (Bazîd) ye. Ew ji ber şerê Îran û împaratoriya osmaniyan tene Zêdkanê û wekî li jor jî hate diyarkirin, ji binemala Hecî Ehmed Paşa û her wisa Mîr Mihemed Pîrbelayî ye. Ew li devera xwe xwedî îdareyeke meheli bûne û her wiha di îdareya navxweyî de bi awayekî xweser jiya ne. Serdema wî (sedsala XIXan.) beramberî têkçûna mîrnişîniyên kurdan tê û mirov dikare bibêje ku, ew jî yek ji mîrên dawîn ên kurdan bû. Beriya wî, li Kurdistanê bêhtir hikumranî û desthilatiya kurdan hebû. Dema ku mirov li şert û mercên Kurdistanê dinihêre, bi dewra wî re êdî hikumraniya dewleta osmaniyan û merkezîbûna dewleta osmaniyan li Kurdistanê qewî dibe. Wê demê ji aliyê rewşenbîrên kurdan ve êdî hereketên netewî û hewldaneke bo çêkirina avahiyên netewî destpê dikin û desthilatiya mîrekiyên kurdan jî êdî, werçerxî hereketên milî tê. Em di çî malûmatên dîrokî de nabînin ku Sirmelî Memed Paşa, di avakirina fikrê û boçûnên netewî yê Kurdewar de daxwaz û hewldaneke kurdewariyê kiribe. Lê wekî adetî, ew jî li Kurdistanê, rêvebirek bû. Li berovajî wê, em dibînin ku di bilindkirina çalakiyên kulturî û nemaze jî kultura dengbêjiyê de roleke wî yê mezin heye. Lewma jî mimkun e ku mirov bibêje, wê di bilindbûn û pêşketina dengbêj Evdalê Zeynikê de bi patronajîya xwe, dermaleya dengbêjan û bizavên kulturî kiriye.

Sirmelî Memed Paşa, di dîwana xwe de di gel karûbarê îdarî, pûtepêdana bizavên kulturî jî kiriye û em dibînin ku di meclîsa wî de parastina hin dengbêjan hatiye kirin. Di hin kilaman de em dibînin ku di dîwana Sirmelî de lec di navbera dengbêjan de pêk tê. Ev tiştê ku behs li ser e, di navbera dengbêj Gulê û Evdalê Zeynikê de ye. Di dîwana Sirmelî de dengbêjeka jin a bi navê Gulê dengbêjiya Sirmelî kiriye. Dengbêj Gulê, li gor çavkaniyên

¹⁵⁷ Ahmet, Aras, *Şairê Kurda yê Efsanevî Evdalê Zeynikê*, Weş. Deng, İstanbul, 1996, r.46

¹⁵⁸ Celîlê, *Celîl, Kürt Halk Tarihinden 13 İlginç Yaprak*, wer. Hasan Kaya, İstanbul, 2007, r. 72

¹⁵⁹ BOA. Y..PRK.ASK. 154/6 Dîrok: 02/R/1317(H), 1899

devkî, analîzên stranan û di hin xebatan de wekî *fileh* tê zanîn.¹⁶⁰ Lê em nizanin ka ew kengî û di navbera kîjan salan de jiya ye. Evdalê Zeynikê ji êla Meman e, di navbera salên 1800-1913an de jiya ye. Leca ku di navbera wan de ji aliyê dengbêjan ve hin hatiye domandin û ev pasaj nimûneyek di navbera Evdal û Gulê de aşkera dike:

Gulê dibêje:

Evdal Mehrûmo, çavê min ê reş in, reşbela ne,
Minê rojê sê cara bi kilê Suphanê kilda ne
Gellek dengbêjê mîna te ji bo min jinê xwe berda ne,
Wey can Evdal, wey can Evdal
Heyla kirîvê Evdal ez heyirî te mam

Evdal dibêje:

Heyla Gulê ez hatim Xamûrê, lê ha li hember e
Minê bala xwe dayê, Gulê yeke bejnzirav e, gerdencer e,
Minê sond xwariye bi Încîla Îsa, bi Qurana pêxember e
Bi serê sibê ra Gulê wê boxçê Hilde bi min ra were¹⁶¹

Li gor agahiyên Aras û çavkaniyên devkî, piştî leca di navbera Evdal û Gulê de, ku Evdal, Gulê têk dibe, û piştî dibe dengbêjê dîwana Sirmelî Memed Paşa. Helbet li gor agahiyên Aras, Evdal ji ber ku xwe wekî “merivekî serbixwe û destûrdayî me û ez nikarim ji binê barê te derkevim” dibîne û naxwaze bibe dengbêjê dîwana Sirmelî, lê di dawiyê de bi israra wî dibe dengbêjê meclîsa wî.¹⁶² Sirmelî jê daxwaz dike ku ew bibe rûspiyê wî, jê re musahibiyê bike û derbarê binemala wan û îdareyê de wî agahdar bike. Di vir de em dizanin ku di edebiyata klasîk an a nivîskî de jî, di hunera devkî de jî, îcrakarê hunerê an edîb, ji ber ku patron nanda û welînîmetê wî ye, ew şewirmendiya patron, rûspîti û her wisa palpiştîyê dike bo îdareyê. Di serdema navîn de, li nav civakên patrîmonyal ji bo dengbêj an hozan îltîfata herî mezin îltîfata patron e û ew yek di avakirina bingeha têkiliyên civakî de jî

¹⁶⁰ Dicle Yıldız Katar, *Kürt Sözlü Kültüründe Kadın Dengbêjler: Ayşe Şan ve Meryem Xan*, t. ç., Zankoya Yakın Doğu Enstitüsü Zanînen Civakî, r. 60

¹⁶¹ Ahmet Aras, b.n, r.45

¹⁶² Ahmet Aras, h.b, r.51

taybetmendiyeke girîng e.¹⁶³ Evdal jî di meclîsa Sirmelî de, serpereştiya Sirmelî kiriye, fikrên wî di nezera Sirmelî de xwedî qedr û pûteyê bûne. Di vir de tişteki bo tegehîştina sîstema patronajê yê pirr seyr û muhim heye. Sirmelî Memed Paşa wextê ku teşrîf û beşdarî şerê di navbera osmanî û Turkmenan dibe¹⁶⁴, Evdal jî bi wî re ye. Her çend dîroka vî şerî zêde zelal nebe jî, teqrîben wekî 1865an tê qebûl kirin. Anku Sirmelî Memed Paşa, wextê ku Turkmen li hemberî dewleta osmanî raperînekî dirust dikin, ew jî wekî alîgirekî împaratoriya osmaniyan ji bo şikestina wê raperîne ber bi Xozanê (Kozan, îro navçeyê bajarê Edeneyê ye) ve diçe. Di wê sefera leşkerî de Evdalê Zeynikê jî li gel Sirmelî Memed Paşa bûye. Helbet di paşxaneyê vî şerî de faktorên îdarî û aborî yên dewleta osmaniyan hebû, lê di vir de tiştê muhim ew e ku, Sirmelî di şerekî de Evdal jî bi xwe re biriye seferê û patronaja wî di stranan de xuya dibe. Beriya ku ew bi rêkevin, Evdal vê stranê distirê:

Heyla Wayê

Ezê li diharê Kela Elaşgirê dikevim ha li beyara
 Hela mêzekin li leşkerê qerenîzamiyê û li refê siwara
 Çarsed xortê eşîretê berê xwe daye xerîbiyê
 Rebê alemê, Mîrê Mîra sihûda wana nişxûlîne
 Li pêş neyara¹⁶⁵

Di vir de wezîfeya Evdal wekî kesekî ji aliyê patron ve tê hîmayekirin, di îcrakirina hunerê de çêkirina atmosfereke epîk e. Wekî Evdal, dengbêjên din ên ji aliyê patronekî ve tî hîmayekirin jî heman wezîfe bi cih anîn e û di sefer û şerên wan de di gel patronê xwe bûne. Li gor hin çavkaniyan Sirmelî di vî şerî de ji aliyê marekî ve tê jehrandin û hin çavkanî jî mirina wî dispêrin nexweşiyê: “Piştî vî şerî leşkerên Sirmelî Memet Paşa li Xozana Edenê, bi nexweşiya halê (kolera) dikevin û bi pîranî dişikên. Evdal jî di nav de 40-50 mîrên ji ber 400 leşkerên kurd mayî ji paşa vediqetin û vedigerin Kurdistanê, xwe digihînin zar û zêçên xwe.”¹⁶⁶

Li ser vê behsê Evdalê Zeynikê strana bi navê Xozandaxê dixwîne û ew stran di nav dengbêjan de belav dibe û bi navê *Xozan*, *Xozandaxê*, *Şerê Xozanê* û *Xozan û Memed Paşa*

¹⁶³ Halil İnalçık, *Klasik Edebiyat Menşei, İrani Gelenek, Saray İşret Meclisleri ve Musâhib Şairler*, Türk Edebiyatı Tarihi, Cild 1. amd. Talat Sait Halman, Weş. T.C Kültür ve Turizm Bakanlığı, İstanbul, 2006, r. 275

¹⁶⁴ Ev şer sefereke dewleta osmaniyan a li ser tirkmenên avşar û mîrekiya Xozanê ye. Di vir de Sirmelî daxwaza dewleta osmaniyan bi cih tîne û beşdarî seferê dibe, lê bi tirkmen û Mîrê Xozanê Silêman Beg re şer nake. Bnr: Celîlê Celîl, b.n, r. 72-80

¹⁶⁵ Ji ber ku di dema Evdalê Zeynikê de çî îmkanên qeydkirinê tunebûn, ev stranên ku wekî aîdî wî tînen zanîn, ji dengbêjên derdora wî hatine wergirtin. Bo nimûne ev stran jî ji dengbêjê Heyder Berke hatiye wergirtin û Heyder Berke jî neviyê Evdal bi xwe ye. bnr Ahmet Aras, h.b, r. 84

¹⁶⁶ Mamoste Maruf, *Recûya Evdalê Zeynikê*, Kovara Zend, Bihar 2012 r. 15

belav dibe û di zarê dengbêjan de dibe straneke gelêrî. Di wê stranê de hinde tişt hene ku rûdanên dîrokî, bi awayekî aşkera xuya dikin. Ev stran ji aliyê dengbêjan ve wekî şerê Xozandaxê tê hikayekirin.

Xozandaxê

“Êlê dayê li Xozanê, lo Xozanê,

Êlê dayê xwedê xirav bike

Lo deşta vê zozanê.

De dilê min yo, yo, dilê min yo, yo.

Êlê dayê heft cahilê tunsiz,

Cinyazê xwe dane ser barxanê

Ax dilê min yo, yo, de dilê min yo yo

Êlê dayê Xozandaxê lo li bêrîka

Emê rojê ranazên derdê germ germistanê

Şevê xewa me nayê, destê van wayika.

Dilê min yo, yo, dilê min yo, yo.¹⁶⁷

Ji vê yekê diyar e ku, dema dengbêj li gel hamiyê xwe beşdarî şerekî dibin, rol û misyoneke wan heye. Ev yek pirr seyr e di dîroka sîstema patronajîya kurdî û pêwendîya dengbêj û mîran de. Îhtîmal heye ku misyoneke hozanan a terapîkirina leşkeran jî hebû. Ji bilî wê dibe ku hozan û aşîq pêwendîya navend û derûdorê jî pêk dianî. Daxwaz û talebên giregir û muqtedîran digehand millet û xelkê. (*Berdevkê Mîran û Hakiman bûm.*¹⁶⁸) Ji bilî hunerê, di vê yekê de jî xuya ye ku îcrakarên hunerê, ji bo patronekî tenê huner, wêje û muzîkê îcra nakin. Her wisa ew di çêkirina têkiliyên civakî û avakirina desthilatîyê de jî xwedî wezîfe ne.

Evdalê Zeynikê hindî em pê dizanin, nimûneya têkçûna hunera qesr û serayan jî temsîl dike. Piştî Evdal em dizanin ku, îdareyên mîrektiyên kurdan têk çûn û hîmayekirina dengbêjan jî derbasî sefheyêke dîtir bû. Lewre jî mirov dikare bibêje ku, ew dengbêjê dawî yê serayên mîr e. Piştî mirina wî hem ev parastin têk diçe û hem jî mirov dikare îdia bike ku,

¹⁶⁷ Heciyê Cindî-Emînê Evdal, *Folklor Kurmanca Xozandax*, Weş.. Avesta, İstanbul, 2008, r. 479

¹⁶⁸ Ev îfade ji bo têkiliya patronajê ya di gel dengbêjekî îfadeyeke girîng e. Di stranên ku em wekî aîdî Evdal dizanin û di gelek ên din de jî heman îfade hene. Di vir de tiştek heye ku hêjayî gotinê ye, di kultura dengbêjiyê de hin qalib hene ku, ji derveyî konteksta metnê ji aliyê dengbêjên din ve jî tên bikaranîn. Lê di vir de tiştekî sabît heye ku, mirov dikare bibêje, çi mîr, çi axa, ew dengbêjê ku ji aliyê patronekî ve dihat hîmayekirin, xwe wekî berdevkê wî didît û ev yek wisa di nav stranên dengbêjiyê de wekî qalibêke hunerî cihê xwe girt. Bo zanîn eke berfirehtir, bnr. Ehmed Cengîz Çamlîbel, *Evdalê Zeynikê, Hîmdarê Mekteba Stranên Serhedê*, Weş.. Deng, İstanbul, 2005 û Heciyê Cindî, *Kilamên Cimeta Kurda*, Weş.. Limûş, Yerêvan, 2008, r. 19

dengbêjiya klasîk êdî kete îstîqameteke têkçûnê. Ev yek di dîroka dengbêjiya kurdan de xaleke girîng e. Gelek sedemên vê yekê hene ku vê behsê li ser esasekî determînîst rave dikin. Di beşên pêş de sedemên vê yekê di peywenda cudabûna kultura nivîskî û kultura devkî de hatin gengeşekirin.

Strana Evdalê Zeynikê ya bi navê *Temo* bo vê xebatê û bo têgehiştina têkçûna sîstema patronajîya kurdî nimûneyeke girîng e. Ew stran ji zarê dengbêj, têkçûna patronajê rave dike. Lewma jî mirov dibîne ku di dirustkirina hunerê de aliyê hîmayeyê roleke mezin dilîze. Piştî ku Sirmelî Memed Paşa di sefera Xozanê de wefat dike, Evdal jî bê xwedî dimîne û jiyana wî di nav xizaniyê de dibuhure. Ew atmosfera epîk a ku di stranên Evdal de hatine honandin, di vir de têk diçe. Hunera ku xwe li ser hîmê patronekî çê dikir, di vir de tûşî belengaziyeke hunerî tê. Ev taybetmendî di stranên dengbêjiyê de piştî têkçûna patronan, tesira xwe li ser cureyên stranan jî dike. Lewma jî mirov dikare bibêje ku, têkçûna patronajê, bûye sebaba têkçûna/xerabbûna epîkê jî. Ev yek di stranê de wiha krîstalîze dibe: “*Evdal go Temo lawo, bexê, ez bavê te me/ Dengbêjê Sirmelî Memed Paşa ez bi xwe me/ Dilê min bûye kela derdan û kullan, pir bi xem e/ Ji mirina Memed Paşa vir da ez şerpeze me/ Wey kaliyê, wey koriyê/ Xwedê xerab bike kalaniyê/ Welle Temo lawo mirin çêtir e ji feqîriyê*”.¹⁶⁹

Temo

“Ez Evdalê Zeynê me
Dengbêjê Sirmelî Memed Paşa me
Gula welatê serhedê
Bavê Temo siwarê Belo me

Ez Evdalê Zeynê me
Şairê dinê, şalûrê erdê me
Bilbilê ber baskê rojê me

Destê min qelem e
Zarê min kitêb e
Singê min
Mishefa mela ne

¹⁶⁹ Ev stran aîdî Evdal e lê ji dengbê Kazoyê Garisya hatiye wergirtin. Bnr. Ahmet Aras, h.b, r. 125

Ez Evdalê Zeynê
Kewê Gozel im
Şahê dengbêja
Şiarê rû dinê me

Şam, Heleb, Diyarbekir
Her çar qirnayê
Dinyayê ez geriyame
Heta îro min tu kesî ra
Bele nekiriye

Ez Evdalê Zeynê me
Siwarê di kêfê me
Qaçaxê di dinê me
Kûlîlka vê ortê me
...

Ez Evdalê Zeynê bûm
Wextekî xortekî çarde salî bûm
Siwarê canîkê sê salî bûm
Li dîwana hakim û mîran
Bega û beglera bûm

Te kaliyê, te koriyê
Temo lawo! Mirin çêtir e
Ji halê feqîriyê

Li dinyayê koranî ne tu çek e
Xaliqê alemê
Milê bavê te kiriye
Belkî tu milê yekî din neke

Ez Evdal bûm

Gula Zor Sirmelî Memed paşa bûm

Berdevkê qîza di bûka bûm

Berdevkê ber devê

Mîran û Hakiman bûm.”¹⁷⁰

...

“Ez ê Evdal im, Evdalê Zeynikê bûm

Bavê Temo, siwarê Nîjdî bûm

Dengbêjê oda Sirmelî Memed Paşa teyrê dewletê bûm

Dilê gelek qîz û bûkên xelkê di min de hebûn

Berdevkê mîr û hakimî, çawîşê xortan bûm

Roja îro kor bûme çavê min nabînin

Mame li ber hêt û dîwarên xelkê

Bûme pêkenokê qîz û bûkên Zîlan û Heyderan

Li min wayê, li min wayê”¹⁷¹

Di van stranên û ji agahiyên ji neviyên Evdal de em dibînin ku wî, li seraya Sirmelî Memed Paşa dengbêjiya Sirmelî kiriye. Evdal bi xwe jî ev yek di stranên xwe vegotîye û em dibînin ku pêwendîya dengbêj û hamî, ji nimûneya Evdal û Sirmelî aşkera dibe. Ji bilî wê, ji wan stranên diyar dibe ku, piştî ku Sirmelî Memed Paşa di sefera Xozanê de wefat dike, Evdal jî bi tenê, bêhamî û bêxwedî dimîne. Ev yek diyar dike ku piştî têkçûna mîrektiyên dengbêjiya kurdî jî ber bi xizanî û feqîriyê ve diçe. Ev têkçûn her wisa tesira xwe li ser stranên jî dike û cureyên stranên ên wekî epîk tîk diçin û dewsa wê gilî û gazinên qedere, belengazî û feqîriya jiyane û temaya *felekê* di nav stranên de zêde dibin. Ev yek nîşan dike ku folklorê kurdî û temsîlkarên wan ên dengbêj, bi desthilatîyê hunera xwe gihandine dereceyekê. Bêxwedîtî an bêhamîtî bo dengbêjekî bûye sedema kêşeyên civakî û temayên stranbêjiya wan jî guherandine.

Di kultura milletên dinyayê de jî, bo nimûne Homerosê yewnanî û şopgerên wî jî piştî têkçûna patronajê û sedemên dîrokî û civakî bêxwedî dimînin ev yek tesira xwe li ser berhemdariya wan jî dike. Hozan, li wir jî, di bin hikm û femandariya kralan de bûn, bi destek û parastina wan hunera xwe îcra dikirin, hikayetên derbarê rûdanên dîrokî de vedigotin. Li Yewnanîstanê, berê ew serekê eşîrên ku bavûkalê qralan bûn jî beşdarî îcrakirina

¹⁷⁰ Ehmed Cengîz Çamlîbel, b.n, (ev helbest li pişt kitêbê hatiye nivîsîn)

¹⁷¹ Remezan Alan, h.b, (<http://www.kovarabir.com/remezan-alan-bave-helbesta-geleri-u-ferxen-we/>) (07.05.2012)

hozanan dibûn.¹⁷² Ev serencama hozan û dengbêjan, di nimûneya kurdî de jî, her çend cudahiye civakî û dîrokî ji hevdu cuda bin jî, rastî encameke wekhev dibin.

Piştî ku seray û qesr tîk çûn, ew kesên ku wekî berdevkê tebayên arîstokrat bûn jî bi wan re tîk çûn. Ev tîkçûn, di edebiyata kurdî ya klasîk û gelêrî de beramberî tîkçûna serdemekê tê. Bi vê tîkçûnê ve, di edebiyata kurdî ya klasîk û anonîm, kete sefheyeke cuda. Tema û teşeyên edebî jî bi vê veguherînê ve hatin merheleyeke dîtir.

Di gengeşên patronajê de du tişt esas tîk girtin. Ya yekê, dema ku patronek hîmayeya hozan an edîbekî bike, vêga ew berhema hozan û şair, di bin înayeta patron de difetise û berhemên hunerî û kulturî wekî meta û eşyayên hamî tîk qebûlkin. Lewma jî afirandina kultur û hunerê, ji konteksta hunerê dîr dikeve û di bin nîrê desthilatîyê de bêpûte dibe. Ya dîtir jî ew e ku şair an hozan, wextê ku berhemekê diafirîne, her çend motîvasyona afirandina hunerî, xwe bîspere peydakirina patronekî jî, divê mirov faktora naveroka berhemê ji bîr neke û daxwaza peydakirina hamiyekê, divê ji derveyî hunerê bête hilsengandin.¹⁷³ Helbet afirandina berhemên edebî û hunerî, li gor şert û mercên civakî û aborî, di serdemên curbicur de, di qonaxên cuda re derbas bûne. Her wisa îro şair an hozanek, bi îmkânên çapkirin û belavkirinê dikare berhemên xwe bigehîne mirovan û debara xwe pê bike. Lê di serdemên berê û nemaze jî di nav xwendinên berhemên kurdî de ev yek pirr zehmet e. Di nimûneya Evdalê Zeynikê û Sirmelî Memed Paşa de jî mimkûn e ku mirov heman gengeşê bike. Lê divê mirov bizanibe ka di tîkiliya hîmayekirina dengbêj de, faktora esas çî ye? Di vê pêwendiyê de, gelo tiştê ku esas tîk girtin huner e an tiştên dîtir jî hene? Eger patronê Evdal Sirmelî be, gelo wî bi çî awayî hîmayekirina Evdal kiriye? Bo nimûne gelo li hemberî xizmetkariya Evdal a hunerî, Sirmelî wekî destheq çî daye wî? Helbet em dizanin ku şair an hozanek, wextê ku bixwaze were hîmayekirin, berê her tiştî dixwaze di qesr û serayên hamiyên de were hewandin an wekî memûr were qebûlkin.¹⁷⁴ Ev yek bi tenê ji bo qebûlbûna şair a serayê jî ne muhim e, her wisa, wextê ku şairek ji aliyê patronekî ve were hewandin, ev ji bo wî/ê şairî nîşan û îltîfata herî mezin e û di tîkiliyên wî şair û hozanê yên civakî de referanseke muhim e. Lewma jî divê tîkçûna patronajê bi tenê wekî mehrûmbûna nosyonên aborî neyê fehmkin. Her wisa hozanek jî bi pûtepêdana hamiyekê ji xwe re nav û nîşanekê dirust dike û ev nav û nîşan di belavbûna hunera wî de, xaleke girîng e. Lê derbarê nimûneya Evdal û Sirmelî de em bi tenê dizanin ku wextê ku Evdal dibe dengbêj û di meclîsa Sirmelî de

¹⁷² G. Thomson, b.n, r. 246.

¹⁷³ Naim Atabağsoy, *Klasik Dönem Osmanlı Şiirinde Patronaj ve Şairin Üretim Süreci İlişisine Bir Bakış*: (<http://www.monografjournal.com/files/atabagsoy.pdf>)

¹⁷⁴ Tübâ Işınsoy, Durmuş, *Tutsan Elini Ben Fakirin Osmanlı Edebiyatında Hamilik Geleneği*, Weş.. Doğan, İstanbul, 2009, r.23

dengbêjiyê dike, Sirmelî Memed Paşa gundekî bi navê Bêdir dide Evdal.¹⁷⁵ Ji bilî wî em nizanin ku li miqabilî dengbêjiya Evdal ji aliyê Sirmelî ve çi hatiye dayîn. Wekî li jor jî hate diyarkirin, îneyeta Sirmelî jî, ji bo motîvasyona afirandina hunera Evdal, faktoreke girîng e. Em di stranên wî de dibînin ku ew her û her di meclîsa Sirmelî de di gel wî bûye. Lê em nikarin bi çavkaniyan piştras bikin, ka li miqabilî wê wekî destheq çi hatiye dayîn.

2.3. Dengbêjê Axayê Xwe

Civaka kurdan ji sedsala XVIan û piştî şerê Çaldîranê yê di sala 1514an heta sedsala XIXan bi mîrektiyên îdareya xwe dikirin û wekî *hikûmetên kurd* dihatin qebûl kirin. Piştî hewldana merkezîkirina îdareya osmaniyan, li Kurdistanê jî mîrektiyên kurdan yek bi yek ji aliyê osmaniyan ve hatin têkbirin. Di sala 1847an de mîrektiya Botan û mîrê wê Emîr Bedîrxan, ji aliyê osmaniyan ve hat xerabkirin û li Kurdistanê valahiyeke îdarî hate pê. Di sala 1858an de bi îlankirina nîzamnâmeya arazî ve, li Kurdistanê, ew cihên ku ji têkçûna mîrektiyên vala mabûn, di nav gelek serekên eşîrên kurdan de hatin parvekirin. Wekî li jor jî hate ravekirin civaka kurdan, piştî têkçûna sîstema mîrektiyê û kontrolkirina der û deverên mîrateya wan, di nav sîstemeke hejar de man. Piştî têkçûna mîrektiyên kurdan, li Kurdistanê serdestî û otorîteya şêxan dest pê kir. Ev otorîte, bi temayeke dînî û netewî geş bû gehiştê dereceyên mezin. Ji ber ku şêx hebûna xwe, ji derveyî têkiliyên eşîrtî û xizmatiyê ava dikirin, rol û wezîfeyê wan a dînî hebû ku tesîra wan jî li ser mîlet çêdibû. Nasnameya kurdî, daxwaza Kurdistanê azad, ji aliyê şêxan ve hat kirin û têkoşîn ji aliyê wan ve hat dayin. Piştî şêxtiyê jî, axatî wekî hêzeke civakî, li ser kurdan hikmê xwe ferz kir. Her wiha gelek axayan, bi cudahiya pozîsyona siyasî, bûn sebeb ku dewleta osmaniyan li Kurdistanê xurt bibe. Gelek ji wan jî, bi kredi û aletên bi makîne li Kurdistanê alîgiriya dewletê kirine. Ev sîstem wekî kronolojîk, rastî serdema axatiyê tê. Axa bi maneya xwe ya termînolojîk, ew kesên ku xwediyê yek an jî yekî zêdetir gundan in. Bi maneya xwe ya dîn jî serekên eşîrekê an ew kesên îdare û rêveberiya eşîrekê pêk tînin re tê gotin.¹⁷⁶ Piştî ku mîrektiyên kurdan têk çûn, li ser wan ax û erdê wan mîrektiyên gelek axa derketin holê. Axatî bi vî awayî beramberî sîstemeke mîrektiyê nayê lê, dîsa jî hem di warê bandora wan a li ser gel, hem jî bi ew kesên ku di bin hikm û fermana wan de ne, dişibe sîstema mîrektiyê.

Di vê lêkolînê de, axa jî wekî hêzeke siyasî li Kurdistanê di sedsala XIXan de hikmê xwe li ser civakê xurt kirin. Wan jî di odayên xwe de, bi cimayetê re hindêk çalakîyên hunerî pêk dianîn. Gelek axa li gel xwe parastin û himayeya dengbêjan dikirin. Şerê ku di navbera

¹⁷⁵ Ahmet, Aras, h.b, r. 60

¹⁷⁶ A. Hassanpour, b.n, r. 114

wan de qewimiyê, bi dev û zarê dengbêjan dihate teswîrkirin. Dengbêjên axayan ji bilî dengbêjê mîrektiyan, wekî xulam û xizmetkar jî wezîfe dikirin. Gelek ji wan jî, rênçberiya axayan dikirin û ajal û heywanên wan axayan diçêrandin. Nimûneya Filîtê Quto û Karapetê Xaço (1902-2005), ji bo vê yekê nimûneyeke girîng e. Karapetê Xaço, bi gelek salan di dîwana wî de dengbêjiya Filîtê Quto kiriye.¹⁷⁷ Li dîwana wî gelek stranên lehengî û teşbihên Filîtê Quto yên epîk îcra kiriye. Bi gotinê wî ew ji sedema pêkanîna dengbêjiya Filîtê Quto, ji mirinê filitiye.¹⁷⁸

Nimûneya Filîtê Quto wekî pergala patronajê, pêwendiya axa û dengbêj bi awayekî aşkera nîşan dide. Şerên di navbera êla Reşkotan û serekê wê Filîtê Quto û êla Etmankî, Mamê Elê Etmankî ji aliyê Karapet ve hatiye honandin û em têkiliyên di navbera wan eşîran de ji dengbêjiya Karapet fehm dikin. Karapet digel dengbêjiya Filîtê Quto, debara xwe dike û ji aliyê wî û malbata wî ve jî tê hezkirin. Şerê di navbera wan her du eşîran de dibe sedema aloziyekê û gelek kes di wî şerî de tên kuştin. Filîtê Quto jî ji aliyê Etmankiyan ve tê kuştin û ev yek di stranan de wiha xwe nîşan dike:

Filîtê Quto

“Mamê dibê Filîto lawo xeberê te ye

Hêstira sor a pêşiyê hêstira boz a paşiyê barê wê bive xwîna te ye

Kalekî bavê min heye li malê ye her roj serê siba radibe

Simbêlê xwe yê sorê sor sosinî dişo bi sabûnê ji kêfa hinê ye

Çavê kalê bavê min hêja li zewacê ye

Bazinzîva milê min qelenê heft qîza ye heft bûka ye

Heydeynê erdê baca rê ye were bazinzîva milê min bibe

Qelenê dayika xwe Şemê ye

...

Mamê dibê: Filîto lawo banê Qîre bi simaq e

Ezê bikim teyr û tolê çewrê

Li ser cinazê kurê bava ji xwe ra îro bikin waq e waq e

Şemê digot: Filîto lawo ji Delana Paşo heya mîreta Tapiyê

Birêne çend neqeb e tivinga li ser destê Mamê Emê bavê Meyro

Bi kewkeb e lawo bazinzer e

Carê min nedigot xwe nede ser kozika Mamê Emê bavê Meyro

¹⁷⁷ Salihê, Kevirbirî, *Bir Çiğlığın Yüzyılı Karapetê Xaço*, Weş.. Elma, İstanbul, 2005, r. 57-58

¹⁷⁸ Salihê Kevirbirî, h.b., r. 57

Lawo qetil û xwîn e tev kezeb e.”¹⁷⁹

Di vir de tiştêkî bo têkiliya patronajê yê muhim ew e ku dengbêj; şerên di navbera eşîran diqewime de xwe wekî alîgirê wê eşîrê dibînin û atmosfera şer wisa tercume dikin. Helbet ev yek xwe dispêre patronajê û dibe sedema avakirina têkiliyeke organîk. Piştî ku Filîtê Quto tê kuştin Karapet jî bê hamî dimîne û jiyana wî bi zor û zehmet berdewam dike. Wekî di beşên pêş de jî hatibû diyarkirin, dengbêj wextê layiqî pesn û înayeta axa dibe, ew ji bo statûya wî ya civakî jî nav û nîşanek e. Di vir de afirandina hunerê di bin bandora hamî de ava dibe. Lê hêjayî gotinê ye, piştî têkçûna mîrektiyan, li dewsa qesr û qonaxên mîrektiyan odeyên axa yên gundan di warê îcrakirina huner û dengbêjiyê de derdikeve pêş. Ev nimûne, di peywenda patronajê de, veguherîna cîgehên hîmayekirinê jî diyar dike û şilk û awayê patronajê jî aşkera dike. Her wisa mirov dikare bibêje ku, guherîna desthilatiyê, ya ku ji seheyêke makro, ber bi seheyêke mîkro, encamê xwe di sîstema patronajê de nîşan dike. Di roportajekê de Xaço, têkiliya xwe ya dengbêjiyê û ya Filîtê Quto wekî vê yekê nîşan dike. Her çend ew bi xwe dengbêjê Filît be jî, Karapet jî, fehm dike ku, hîmayekirina dengbêjan êdî naye kirin, sîstema patronaja dengbêjiyê jî wekî berê ne karîger e. Lewma jî, ew jî derbarê têkçûna hîmayekirina mîr û dengbêjan de pirr bi gilî gazinc e.

“Lawê min, ma dengbêjiya berê maye. Berê jixwe axa û beg hebûn. Dengbêjan jî ji bo wana digot. Pesnê wan didan û methê wan dikirin. Eger dengbêj li gora dilê axa bigota, axa debara malbata wî dengbêjî bi xwe dikir û ew hîmaye dikirin. Ma tu min dibihîzî? Ku eger axa û beg biçûya kî derê, dengbêjên xwe jî bi xwe re dibirin. Eger li cem axayekî din jî dengbêjek hebûya, ew heta sibehê dev dijenîn û diketin lecê. Dengbêj bo axayê xwe pirr bi kêfbûn, axa û mîran pirr hez ji wan dikir. Dengbêjiya berê bi vî awayî bû. Me bi xwe ji van civîn û rûniştandinê re digot, ‘civakên cimaetî’. Niha her tişt bûye hikmet, radyo.”¹⁸⁰

Di vir de taybetmendiyeke tradîsyona dengbêjiyê ya balkêş jî diyar dibe. Mirov dikare bibêje ku nav û dengê dengbêjan û dereceya dengbêjiyê girêdayî înayeta patron bi xwe ye. Performansa dengbêj, li cem axa aşkera dibû, devjenî û leca di navbera dengbêjan, ji bo wan dengbêjan wekî riya xwe-îfadekirinê an xwe-ispakirinê bû. Kîjan dengbêj di vî devjeniyê (çixandin) de serkeftî bûya, ew dibû dengbêjê binavûdeng. Bi vî awayî, di her rûniştinêna cimaeta de behsa wî dengbêjê binavûdeng dihat kirin. Piştî ew ji bo devjeniyekê her tim dihat dawetkirin. Wekî Karapetê Xaço jî dibêje dengbêj ji bo axa û mîran wekî şûr û mertal bûn. Ew bi navdariya dengbêjên xwe her serbilind bûn. Pirr caran, hinde mîr û axa bi

¹⁷⁹ Salihê Kevirbirî, Filîtê Quto, 20 Kilam & 20 Qewimîn, Weş.. Do, İstanbul, 2009, r.67-68

¹⁸⁰ S. Kevirbirî, Salihê, Kevirbirî, *Bir Çiğlığın Yüzyılı Karapetê Xaço*, Weş.. Elma, İstanbul, 2005, r. 53.

navdariya dengbêjên xwe binavûdeng bûne. Diyar e ku di tradîsyona dengbêjiyê de meşhûrbûna dengbêjan jî xwe dispêre sîstema patronajê. Dengbêjên binavûdeng di ew lec û devjeniya li qesr û qonaxên mîr, an di dîwan û meclîsên axayan de hatine kişfîkirin. Yanî dema ku dengbêjek li qesr û qonaxan de cihê xwe bigre, ew ji bo payebilindiya navdarbûna dengbêjiyê, dereceya herî bilind e. Devjeniya dengbêjê Sirmelî Mehmed Paşa û Evdalê Zeynikê û dengbêjê Taharxan Beg, Şêx Silê, di wî warî de nimûneyeke heman rengî ye û navdarbûna Evdalê Zeynikê, piştî têkbirina Şêx Silê pêk tê. Ev devjeniya Evdalê Zeynikê û Şêx Silê jî, di nav dengbêjan de belav dibe û ew dengbêj (Evdalê Zeynikê) navdar dibe.¹⁸¹ Ji ber ku di beşên pêş ên behsa mîrektiyên de ev hat ravekirin, di vir de hewce nake ku mirov careke dî dubare bike. Lê tiştê muhim ew e ku hem di behsa dengbêjên axayan, hem jî di behsa dengbêjên mîran de ev heman tişt qewimîne.

Wekî li jor jî hatiye diyarkirin, pêwendiya Filîtê Quto û Karapetê Xaço, her çend bi sîstemeke têkçûyî an guherî be jî pêwendiyêke hamî û dengbêj nîşan dike. Filîtê Quto axayê eşîra Reşkotan bû. Li gor Muhammed Emin Zeki Beg, ew ji 5.000 malbatan pêk tên û bi koçberî dijîn. Her wisa ew bi dewlemendiya xwe tên zanîn û cihê wan ê sas jî Bedlîs e, lê ew havînan derbasî deşta Mûşê dibin.¹⁸² Filîtê Quto û binemala Reşkotan li Badereşê, di quntara Kevanê Kêrê (Qêrê) rûdinişt. Eşîra Etmankî jî malên dewleta osmaniyan bi ucret ji Diyarbekirê dibirin aliyê Serhedê. Çaxê karwan tê di nav axa Reşkotan re dibihure, Filîtê Quto bi tena serê xwe riya wan dibirre û ji wan baca rê dixwaze. Lê Mamê Emê Etmankî jî, axayê eşîra xwe bû û mirovekî pirr ji xwe razî bû. Her wiha bi mêrxasî û lehengiya xwe jî li der û dor dihate nasîn. Ev li dor behsa vê xebatê, bo texayula dengbêjî rastî honandina berhemên epîkî tê û di stranan de bi wî awayî diyar dibe. Piştî daxwaza vê bacê, ew pirr aciz dibe û zor li xwe tîne û berikekê davêje Filîtê Quto û wî dîkuje. Piştî kuştina Filîtê Quto, eşîra Reşkotan, li karwanê Etmaniyan tê hev û ji wan çî kesê sax nahêlin.

Li ser vê meseleyê dijminatî di navbera wan her du eşîran de rû dide û her berdewam dike. Di sala 1912-14ê dê wextê ku Rûsyaya Qeyserî, Bakûrê Kurdistanê bidest xist, dewleta osmaniyan ji hemû eşîrên kurdan alîkariyê daxwaz dike. Piştî her eşîrek ji xwe nijdeyekê çêdike û dişîne pêşberî eskerêrûsan. Ewçax, eşîra Etmankî pê dihese û dest ji rûsan berdide û li Reşkotiyên vedigere. Lê Reşkotî riya xwe li wan nabînin û şûnda direvin û vedigerin devera xwe.¹⁸³

¹⁸¹ Mehmet, Gültekin, b.n., r. 26-27

¹⁸² Muhammed Emin, Zeki Beg, b.n., r. 354

¹⁸³ Zeynelabidin Zinar, *Xwençe*, Cild 4, Weş.. Kultura Kurdî, Pencînar, Stockholm, 1990, r. 20

Ev rûdana ku li devera wan her du eşîran û li ser Filîtê Quto diqewime, piştê bi zar û honandina Karapetê Xaço dibe stran. Ev derbarê pêwendiya hamiyekî de nimûneyên edebî û folklorîk bi awayekî zelal destnîşan dike. Ji ber ku em derbarê patronaja berî axayan, zêde haydar nîn in û bo nimûne jî ya serdema pêşiya axatîyê de, çî nimûne di dest me de nîn in. Ya dîtir ji ber ku, ew stranên ku ji aliyê dengbêjan ve ji bo axayan hatine gotin, bi belge û delîlên tarîxî ve nayên xurtkirin, mirov nikare çarçoveya wan a tarîxî nîşan bike. Lê tiştên ku di stranan de hatine vegotin, xuya dike ku her stranek xwedî çîrok û hikayetên derbarê babetên bi vî rengî de ne. Strana Karapetê Xaço ya derbarê vê rûdanê de ya wekî destanekê hatiye taswîrkirin û û taybetmendiyêke epîk nîşan dike, ji bo vê behsê nimûneyêke girîng e.

Şerê Filîtê Quto û Mamê Emê Etmankî

“Min ê bala xwe da yê,
Şewq û şemala xwe daye bejn û bala Filîtê Quto
Koseka seetê, xulpoka xencerê
...
Aax hey loo...
Le dibê, derhal Filîtê Quto, bexê Şemê
Xwe berdaye ji ser banê Qesrewo.
Hespê xwe kişandiye ji tewlêwo
Zînê wî daniye ser piştêwo
Li xwe kiriye destek kincê herbê û cengêwo
Lê tû kiriye darê rimêwo
Berê xwe daye Birreka Qîre
Pozê Kanîgulanê, li Guhara Deva sekinî
Lo la li ser terqa rêwooo.”¹⁸⁴

Di stranên dengbêjiyê de teşeya epîkî di warê naverok û îcrakirinê de li cem hamiyên pêk hatiye. Motîvasyona ku vê yekê pêk tîne jî, dema ku dengbêj behsa lehengî û pesnê hamî dide, ev yek ji bo axa nîşana statûyêke civakî ye ku pê serbilind dibe. Di vê stranê de jî her çend Filîtê Quto hatibe kuştin û stran li ser mirina wî hatibe honandin jî, dîsa yek qaîde û rêbaza pesn û payebilindkirina hamî, bi rêya afirandina cureyê epîkî pêk tê. Her wisa ji bo fehmkirina meseleya patronajê epîk pirr muhim e û çarçoveya dengbêj û hamiyên zelal dike û

¹⁸⁴ Z. Zinar, h.b., r. 20-22

têkiliyeke organîk di navbera wan de nîşan dide. Di serdemên sîstema patronajîya mîr û began de jî, di ya axayan de jî wezîfeya dengbêj a herî girîng jî îcrakirina stranên ku xwe dispartin lehengiyê bû.

Di kelepîra dengbêjiyê de stranên bi vî awayî gelek in. Di naveroka stranan de rexek ji afirandina epîkê jî amûr û amûrên şer in. Dema ku em li kompozîsyona stranan dinihêrin, tiştê ku di nav stranên epîkê de diyar dibe amûrên şer in. Mirov dikare vê yekê wekî serdema dengbêjiyê ya klasîk jî bi nav bike. Stranên cengê yên ne modern, di karaktera stranên dengbêjiyê yên klasîk û nemaze bi dengbêjiya qesr û serayan re eleqeder e. Amûrên cengê yên di taswîrên axa û mîran de, di warê tradîsyona dengbêjiyê û karakterê kultura devkî de jî, mirov ber bi atmosfereke lehengiyê ve kaş dike. Îhtimal heye ku, tiştê ku vê motîvasyonê pêk tîne û analojî û fiksiyonên dengbêjiyê ji xweşhaliya patron pêk tê. Di straneke dengbêj Derwêşê Misircî, ya bi navê *Şerê Smaîl Axa û Şahê Îranê* de ev fiksiyona epîkî di çarçoveya amûrên şerî de wiha aşkera dibe.

Şerê Smaîl Axa û Şahê Îranê

“Giran e eskerê Şahê Îranê

Bi dengê *teyaran* e

Bi dengê *dalisqan* e

Teqîna *gulîçapiliyan* e

tirkîna lawê bavan e.”¹⁸⁵

Dîsa di straneke dengbêj Şakiro (1936-1996) ya bi navê *Besrayê* de, digel mefhûma axatîyê, mirov dikare nimûneyên stranên epîkî peyda bike. Her çend dengbêjî, li ser tema û cureyên curbicur îcra bibe û mijarên jiyana cimaetê jî di konteksta hefizeya civakî û di çarçoveyeke estetîk de îcra bike jî, dengbêjiya klasîk û her wiha ya di bin hîmayekirina axa û mîrektiyan de îcra dibe, yekser li ser stûneke epîkî ava dibe. Ji ber ku qewîbûna dengbêjiya klasîk, bi honandin û taswîrkirineke epîkî mimkun e. Her wiha mirov dikare dengbêjiya li cem mîr û axayan û ya di nav gel û avamî li ser vê behsê ji hev cuda bike. Stranên evînî, qewlikên folklorîk, babetên cînsî û car û bar erotîk di nav gel de, yên atmosfereke bi tema û teşeyên gernasî û lehengiyê hatiye honandin jî di nav cimaetan anku li qesr û qonaxên axa û mîran hatine îcrakirin. Ew strana Şakiro ya bi navê *Besrayê* jî di vê kontekstê de mirov dikare wekî stranên cimaetê nîşan bike.

¹⁸⁵ Z. Zinar, b.n., r. 18

Besrayê

“Sêyr bike li me û li vê zilmê
Çardexayê qeceran û sêyrbazan û papaxgenî
Derê qonaxan li me bigirin.
Ji herdu malê gulî xwe re bibêjin
Tivingê destê xwe daynin teslîmî çelingê me bin.
Ê de lêxin bavê bavê mino de lêxin
Susteman ji xwe re bînin qundayî
Marteliyan û *çapiliyan* li erdê xin.
Em herin ji berê di paş da qaçaxê romê û firarê dewletê ne.
Bexê mala emer in, biçûk û mezinê me rabûne, ranebûne.
Mirîdê canfedayê mala şêx in bego.”¹⁸⁶

Di vê stranê de jî dîsa mirov şopa patronajê di cureya epîkê û di nimûneyên amûrên şer de peyda dike.

“Heyla mîrê min hey de hûn ê lê xin
Le bavê bavê mino hûn ê lê xin
Rabin kekê mino hûn ê lê xin
Hûn ê destê xwe bavêjin
Qayışê mîratê gawursustema
Qondaxê modalîka çartiliya li erdê xin
Mêra bikujin navê revê pêxin
Mûma bitefnin şemdana vêxin
Xwedayê min pê dizane ji berê paş de
Mezin û biçûkê me rabûne ranebûne
Em ê mahkûm û firarê Roma teres in
Xalisê dîne xwe ne canfidayê mala Şêx in
Axawo hey li min li min sed carî li min
Heyla lo mîro min digo şereka li me çê dibû
Li hewşa Sarayê qalekî giran li me daketiye

¹⁸⁶ Şakiro, “Besrayê”, Deşîfrekirin: Zeki Gürür

Li kaviî Murtumana şewitî vê sibê dayê dîsa li hember e
 Na na wele min ê vê sibê bal û dêhna xwe berdayê
 Ta ji êvarî Xwedê da
 Li ser kozik û meterisê Silêmanê Ehmed
 Keremê Qolaxa bi tevî Xalisê Êsuv Begê
 Xweş tê dengê mîratê *topan* û *mitrelosa*
Cebilxanan û gawursustema
 Ji êvar de mij û duman e vê sibê
 Qelebalix e, dîsa yeqîn şer e”¹⁸⁷

Têkçûna axatiyê jî wekî wendabûna hêza mîr û şêxan, bandoreke neyînî li ser dengbêjan kir. Her çend sîstemeke patronajê ya rêk û pêk di bin hîmayekirina axa, bo dengbêjan tune be jî, piştî têkçûna axayan dengbêj bêxwedî û bê hamî man. Gelek dengbêj ji ber vê yekê di rewşeke belengazî û feqîrî de man û li kuçe û kolanan wefat kirin. Ji ber tunebûna hîmayeyê Ayşe Şan (1938-1996) li bajarê tirk, Îzmîrê, bêxwedî dimîne, wextê ku dimire, 3 rojan cesedê wê di mala wê de dimîne û xebera kesî pê çênabe. Hesenê Cizîrî (1917-1983) jî dîsa wekî Ayşe Şanê li Zaxo, di nav rewşeke xizanî û belengaziyê de bêxwedî dimire û cesedê wî encax 2 roj piştî mirina wî ji aliyê Şaredariya Zaxoyê ve tê defnkirin. Dengbêj Keremê Kor (?-m.1997) ku demekê ji aliyê axa û mezinan Bazîdê ve dihat parastin li ser erebeyeke destan, bi nexweşî û di nav belengaziyê de wefat kir. Dîsa wekî gelek dengbêjan Karapetê Xaço, Egîdê Cimo jî ji ber têkçûna sîstema patronajê û bêxwedîtîyê di nav xizaniyê de wefat dikin.¹⁸⁸ Derbarê vê meseleyê û bêhamîbûna dengbêjan de dengbêj Şakiro wiha bi gilî û gazinc e: “Ez ji kurdan dilşikestî me. Kurd, li dengbêjên xwe xwedî dernakevin. Ka dêhn û bala xwe bide tirkan, Aşiq Weyselekî wan hebû ew çawa xwedî li wî derketin, lê Resoyekî me hebû, hostayê me tevan bû, birçî mir. Ka bêje ez ê çawa bi te re mijul bibim û dilê xwe ji te re vekim?”¹⁸⁹ Piştî ku axa û beg û sîstema wan li Kurdistanê têk çû, ev yek di stranên dengbêjiyê de wekî têkçûna epîkê jî bi xwe re anî. Anku têkçûna sîstema axa û mîrektiyan, bû sedema qelsbûn an xerabbûna stranên epîkî. Ev jî bû sedema têkçûna dengbêjiya klasîk. Helbet têkçûn û xerabbûna dengbêjiyê bi tenê li ser esasên têkçûna otorîteya sîstema axa û mîrektiyê pêk nehatiye. Gelek sedemên cuda jî hene ku xerabbûna

¹⁸⁷ Ayhan, Meretowar, *Dengbêj Huseynê Farê*, Kovara Bîr, 2010

¹⁸⁸ Kadri, Alkoç, Nankörlük: http://www.ozgur-gundem.com/?haberID=14096&haberBaslik=Nank%3%B6rl%C3%BCk&action=haber_detay&module=nuce (12.12.2012)

¹⁸⁹ Salihê, Kevirbirî, “Kewê Ribat û Şahê Dengbêjan: Şakiro, Kovara Gulistan, j.4, İstanbul, 2002, r. 43

epîkê û her wiha têkçûna dengbêjiyê pêk anîne. Wekî di beşên pêş de jî hate gengeşekirin, îmkanên çapxaneyê û geşedana amûrên teknolojiyê, tesira xwe li ser çalakiyên kulturî jî kir û xwendin û nivîsandina kultura devkî têk bir.

2.4. Cîgehên Hîmayekirinê

Di beşa vê xebatê de cihên ku dengbêj lê dihatin xwedîkirin digel paşxaneya wan dê were gengeşekirin. Ew cihên ku çalakiyên edebî û hunerî lê dihatin îcrakirin, nîşaneya arîstokrasiyê bûn û lewma jî tîkiliyeke hîmayeyê bi awayekî sirûştî lê diyar dibû. Ji bilî karûbarên îdarî û şer û pevçûnan, patronan di meclîs û dîwanan de bi edîb û hozanan re, çalakiyên wekî şevbuherkan pêk dianîn. Ev tradîsyon di serdema navîn heta şahînşahiya safewîyan û di dewleta osmaniyan de jî bûye tradîsyonek. Di van civînan de patron digel xizmetkariyên edebî, caîzeyan belavî edîb û hozanan dikir û ev tradîsyon wekî meclîsên îşret dihat binavkirin.¹⁹⁰ Wekî dengbêjan, di her karûbarê hunerî de, kesên hunermend di van cihên hîmayekirinê de, nâilî pesn û înayeta patron dihat. Di behsa vê xebatê de jî li ser cihên hîmayekirinê yê ku em di hin çavkaniyên tarîxî û di stranan de rastî wan tênê, dê were rawestîn. Wekî li jor jî hate diyarkirin, cîgehên hîmayekirinê berî her tiştî, xwe dispêre hebûna arîstokrasiyê kultureke bilind. Lewma jî kareketerê desthilatîyê rengê xwe di van cihan de jî nîşan dide. Her wisa têkçûn û guherîna desthilatîyê, van cihan jî bi xwe re diguherîne. Dengbêj, di dema kevînar de ku mirov dikare wekî pre-modern bi nav bike, li qesr û qonaxan jî aliyê mîran ve dihatin parastin. Wekî di beşên pêş de jî hate behskirin, di *Şerefnameyê*, bo nimûne ya meclîsa Mîrê Botan de jî hin teswîrên hozanan di serayan de hatiye kirin, di hin tabloyan de hebûna hozanan di meclîsan de hatiye xêzkirin.¹⁹¹ Digel vê yekê, piştî tîkçûna mîrektîyan, ev cihên hîmayekirinê jî veguherî û dengbêj jî aliyê axayan ve li malên wan giregiran tên hîmayekirin.

Di kultura kurdan de, di serdema edebiyata klasîk de, her şair daxwaz dikir ku xwe bigehîne serayên mîr û began. Edîbên kurdan, dizanin ku bi hîmayekirina mîr û began, dê edebiyatê û bizavên hunerî geş bikin. Ji bo wê jî, mîr û beg wekî patronekî di wan meclîsan de digel wan radibû û rûdinişt. Lewma jî ew wekî patron, di nezera edîb û hozanan de wekî cihanpenah dihat qebûlkirin. Yanê ew kesên ku wekî Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî (1570-1640), Feqiyê Teyran (1590-1660) û gelek edîbên di serdema klasîk de jiyayî her daxwaz

¹⁹⁰ Halil İnalçık, *Klasik Edebiyat Menşei, İrani Gelenek, Saray İşret Meclisleri ve Musâhib Şairler*, Türk Edebiyatı Tarihi, Cild 1. amd. Talat Sait Halman, Weş. T.C Kültür ve Turizm Bakanlığı, İstanbul, 2006, r. 269

¹⁹¹ Ebdurreqîp Yûsif, *Hunerê Tabloyên Şerefnameyê*, Weş. Avesta, İstanbul, 2007, 2. 81

dikirin ku ji aliyê mîr û began ve bêne hîmayekirin. Seyyahê tirk ê mezin Evliya Çelebî (?-m.1678) di derdora sala 1660ê, dema ku bo serdana bajarê Amêdiye diçe wir, dibîne ku edîbên gelek hêja û bi zaravê kurmançî dinivîsîn hene. Her wiha ew edîb ji aliyê Mîr û began ve dihatin parastin û li qesr û qonaxên wan de mîran de dihatin hîmayekirin.¹⁹²

Di afirandina çalakiyên hunerî de, hebûna sinifeke dewlemend, hem karakterê xwe li berhemên afirandî dide, hem jî ji bo populerbûna/pêşketina wê faktoreke esas e. Her wisa mirov dikare şopên wê sinifê û têkiliya ku bi hunermandan re hatiye avakirin, di berhemên afirandî de bibîne. Cîgehên sinifên bilind û arîstokrasiyê, ji bo hunermand û edîban nîşana payedariyê û cihê popularîteya hunera wan e. Di wêjeya rojhilat û rojava de, ew cihên ku hikmê arîstokrasiyê lê ferz bû, li gor rengê yê xwe serdestiyê, çalakiyên hunerê welidandin. Ev cîgeh, ji bo şair, hozan, dengbêj û zinaetkarekî, her bûne cihên xwe ispatkirinê û ji bo wan bûne wargehên nîşandina meziyetên xwe. Dema ku mirov li edebiyata kurdî ya klasîk û hunera gel dinihêre ew cih ji bo edîb û dengbêjan nîşaneyê payebilindiyê ye. Di beşên din de jî hate gengeşekirin, di vir de bo behsa kurdî tiştekî girîng heye ku divê mirov wê destnîşan bike. Çimkî, di serayên mîr û begên kurdan da edîbên klasîk û dengbêj wisa bi awayekî aşkera nehatiye cudakirin. Helbet gelek sedemên vê hene, lê ji ber ku mîrekîyên kurdan xwedî hêzeke mutlaq nînbûn, ew her kultur jî du di nav hevdu de bûn. Her çend kultura dengbêjiyê wekî kultura gel bihata fehmkirin jî, li cem mîran û di qesrên wan de dengbêj jî hebûn. Her ji ber wê jî, dengbêjî wekî kultureke avamî nehatiye qebûlkirin û pûte û girîngî her hatiye dayin. Di dema osmanî de, edebiyata gelêrî an, aşiq û hozanên tirk, di nezera padîşahên osmanî de wekî edîbên serayê qedr û pûte nedigirt. Her çend yên ku qebûlî serayan dibûn, hebûn jî, ew kutlu wekî kultureke avamî dihat qebûlkirin. Jixwe di edebiyata tirkî ya klasîk de, edîbên xwedî dîwan, di nav hevdu de jî wextê ku tinazên xwe bi şairên din dikirin, ew wekî *Karacaoağlan Türküsi* anku *Strana Karacaoxlan* bi nav dikirin.¹⁹³ Lê hindî ku em li çavkaniyên tarîxî û stranên kultura dengbêjiyê dinihêrin, cudahiyeke bi vî rengî peyda nabe.

2.4.1. Qesr û Qonax

Di nav cîgehên muqtedîrên kurdan de, qesr û qonax, ji dema xwe heta niha avahiyên bi ihtîşam bûne û her dem bûne nîşaneyê otorîte û desthilatîyê. Ew avahî hem li rojhilat, hem jî li rojava bûne sembola desthilatîyê. Di navbera van her du kulturên ji hev cuda û avahiyên wekî qesr û qonaxan de hindek cudahiyeke esas hene. Li rojava, ev cîgeh ji aliyê mirovan ve

¹⁹² Bruinessen, b.n, amd. A. Valî, *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, r. 65-66

¹⁹³ Remezhan Alan, b.n, (<http://www.kovarabir.com/remezhan-alan-bave-helbesta-geleri-u-ferxen-we/>) (07.05.2012)

wekî takên serfiraziyê, kêl û kevirên li erdê çikiyayî hatine fehmkirin. Lirojhilat jî ev avahî navendên îbadet û perwerdehiya klasîk, kulliyê û serayên mîr û padîşahan bûn.¹⁹⁴ Her wiha qesr û qonax, di dema xwe de xwedî gelek fonksiyonên rêvebirinê bûn. Ew der jî îdarekirinê heta kar û barên jiyana cimaetê, çalakiyên kultur û hunerê û her wiha wargeha nîşaneyê kultureke arîstokrat e. Lewma jî ew kultura ku li hawirdora qesr û qonaxan rû daye jî reng karekterekî arîstokrat di nav xwe de dihewîne. Bi taybetî ew kultura ku ji qesr û qonaxan welidiye, xwe dispêre taybetmendiyeke siyasî û di naveroka wê de jî rengêkî desthilatîyê heye. Ji ber ku bi quweta mirovan tê çêkirin û di çêkirina wan de hêzeke aborî xwedî faktor e, qesr û qonax her tim nîşaneyê desthilatîyê, dewlemendiye û pêşketina bajarî hatine qebûlkirin. Her wisa kesên xwediyê qesr û qonaxan bûne, di wan avahiyan de îdareya mirovan jî pêk anîne û mirov dikare wan deran wekî wezaretên îro jî bihesibîne. Di çalakiyên hunerî de jî cîgehên hîmayekirinê qesr û qonax in û ew kultura ku li derdora wê hatiye pê jî, nimûneyên patronajê bi xwe ne.

Qesr û qonaxên mîr û begên kurdan, li gor sînor û desthilatîya mîrektiyan hatine avakirin. Lewma jî mirov dikare şopên desthilatîya wan di qesr û qonaxan de peyda bike. Ji bilî aliyê wan ê siyasî, di warê mîmarî de jî ew xwedî taybetmendiyan cuda ne. Di hindurê wan de hewş hene û ew hewş qismên wan bi hevdu ve girê dide. Di her odeya ku hewşa wê heye de, mêvanên mîr li ode, aşxane, kîler, hemam, firne û axir hene ku, hemû xwedî taybetiyên cur bi cur in.¹⁹⁵ Qesr û qonaxên mîrektiyan kurdan, li gor taybetmendiyan kultur û cografyayê û der û deveran cuda, cudahiyan mîmarî di nav xwe de dihewîne. Bo nimûne qesra paşayê kurdan Îshaq Paşa ku 5 kîlometre derveyî bajarê Bazîdê ye yek ji wan e. Ew bi komplekseke serayî ava bûye, di nav de mizgeft ta qubbe û mînareyê bi îhtîşama xwe heta îro hatiye. Dema ku mirov li taybetmendiyan wê diniherê, reng û karakterê desthilatîyê her tim diyar dibe. Avahiya qesrê, ji 116 odeyan, tirbe û birc û hewş û dîwan û hareman pêk tê. Di avakirina wê de gelek taybetmendiyan kultura rojhilata navîn jî xuya dibin. Ew bi çavekî ecemî xwedî taybetiyên Qafqas, fars, Suriye û Anatoliyê dixuye. Lê bi çavekî hostayî ew gelek dekorasyon û plansaziya xisûsiyetên şaristana Huriyan nîşan dide.¹⁹⁶

Qesr û qonaxên mîr û begên kurdan, di dema xwe de wekî navendên kultur û hunerê hatine şixulandin. Di dîwanên mîran de edîb û hozan hatine hewandin û civînên îdarî hatine pê. Îro li gelek der û deverên Kurdistanê, hîn jî mîrateya wan hene ku mirov ecêbmayî dimîne. Gelek ji wan qesran, li ciheke bilind ava bûne û di fonksiyona keleşan de jî hatiye şixulandin.

¹⁹⁴ Hilal Kazan, *XV ve XVI. Asırlarda Osmanlı Sarayının Sanatı Himayesi*, t.ç., Zankoya Marmara, Enstituya Zanîstên Civakî, îlahiyat) r. 4

¹⁹⁵ H. Kazan, h.b, r. 6

¹⁹⁶ Izady, b.n., r. 454

Bi rastî jî ev qesrên ku wekî keleşan hatine avakirin, îro jî li gelek deverên Kurdistanê û nemaze jî li Şirnexê hene. Qesra Evdirehman Axa, di sedsala XIXan de ava bûye û bi tevahî 360 odeyên wê hene. Qesra Axayê Sor, ji 100 odeyan pêk tê. Hindek qesrên ku di sedsala XXan de ava bûne û nemaze ya Qesra Usiv axa û Silêman Axa 200 ode, Qesra Osman Axa 60-70 odeyên xwe hene.¹⁹⁷ Zêdebûna odeyan van qesr û qonaxan, nîşaneyên desthilatiya mîr û hikumdariyê bi xwe ye. Dema ku edîb û dengbêjek ji aliyê mîr an axa ve tê vexwendin, ev yek ji bo dengbêj û edîb nîşaneyên serfiraziya zinaetkariya wî ya herî mezin tê qebûl kirin. Di stranan de jî ev tişt xwe kifş dike. *Ez Evdalê Zeynê bûm/ wextekî çardeh salî bûm/ Siwarê canikê sê salî bûm/ Li dîwana mîran û hekîman/ Began û beglaran bûm.* Di vê stranê de jî diyar e ku dema dengbêj li dîwanên mîr û began werin hewandin, ew xala pesn û senayê wan e. Di stranan de teşbîhên mîran û hikayetkirina rûdanên di derdora mîr de qewimîne, bi temaya analojîyên qesr û qonaxan ve tije ye. Dema ku mirov li kompozîsyona stranan dinihêre, ew cîgeh jî, di rexên hîmayekirina dengbêjan de cihêkî teybet digire. “*Heylo Mîro, weylo Mîro, mal derketiye bê tivdîro/ Şaşxane cêva qapûtê Mîrê minda nayê bîro/ Heylo Mîro, Evdila begê min sekinye dev serayê/ Mîrata şaşxanê cêvêda bîrê nayê/ Xwedê xiravke qayîşe tenge ûsûle girane/ Milê mîrê min, wayê, kêf hilnayê.*”¹⁹⁸ “*Dor qesirê Evdo mermer bere/ Şîrê Evdo dibêm cehwere/ Xûn rijya gerdana zere/ Qesirê Evdo nava deştê/ Herçî hato şîr li piştê/ Fermana Evdo gehîştê.*”¹⁹⁹ Di seray û qesrên wan giregirên de, meclîs an dîwanxaneyek hebû ku dengbêjan stranên xwe li wir distran, edîb û alim û zanayan, ilm hunera xwe li wir pêşkêş dikir.

Dema ku mirov li xebatên ku derbarê kurdan de hatiye nivîsîn dinihêre, civaka kurdan û kultura wan her tim di nav çarçoveyêke pastoral û her wisa devkî/oral tê îzahkirin. Lewma jî civaka kurdan wekî civakeke ji nivîs û xwendinê mehrûm, ji tradîsyonên edebî û hunerî yê nivîskî bêpar tê teswîrkirin.²⁰⁰ Dema ku mirov li qesr û qonaxên mîrekiyên kurdan dinihêre, nîşaneyên kultureke pêşketî jî jê peyda dibin. Wekî di beşên pêş de jî hate destnîşankirin, bi taybetî destnîşankirina kultura kurdan a devkî, bi navkirineke akademîk ev wekî “dogma” ye û dogmayeke zanistî ye. Miletê kurd nemaze wekî cimaeteke devkî tê qebûl kirin. Selîm Temo

¹⁹⁷ Mehmet Rezan Ekinci, *Şirnak'ın İdarî Taksimatı ve İdarî Alanda Meydana Gelen Değişmeler 1845-1918* Uluslar arası Şirnak ve Çevresi Sempozyumu, 14-16 Gulan 2010 r. 494, Jêrenot, 50

¹⁹⁸ Heciyê, Cindî, *Klamên Cimeta Kurda*, Weş.. Lîmûş, Yerêvan, 2008, r.190

¹⁹⁹ Heciyê, Cindî, h.b, r. 68

²⁰⁰ Xebat û kitêbên ku derbarê kurdan de hatiye nivîsîn yê destpêkê hemû bi vî rengî hatine nivîsîn. Kitêbên oryantalîstan, lêkolînên qasidên dewletên biyanî di çêkirina vê fikr û çarçoveyê de bûne sedemên esas. Ji ber ku lêkolerên kurdan cara pêşîn, derbarê tarîx û kultura kurdan de berê xwe dane wan çavkaniyan, ev nêrîn îro jî di nav derdora lêkolerên kurdan de hê jî pirr populer e. Helbet di vê behsê de gelek faktorên cuda hene, wekî di beşên pêş de jî hate gengeşekirin, karîgeriya çapxaneyê, belavbûna îmkanên nivîsê, nosyoneke sedsala XXan e û her ji ber wê jî, bi tenê civaka kurdan devkî û ji nivîsê mehrûm nemaye.

di pêşgotina antolojiya xwe ya bi navê *Kürt Şiir Antolojisi* de vê yekê li ser van esasan îzah dike.

“Dema ku mirov behsê tîne ser kurdan û aliyê wan ê nivîskî, ev nîşaneyên rêxistineke siyasî û civakî û kultureke pêşkeftî ye. Her ji ber vê yekê jî, ev yek car û bar rexnekirineke derbarê vê sehayê û rastiyên vê sehayê ji me re jî ferz dike. Nemaze, helbesta dîwanê, bi xwe hunereke qesr û qonaxî ye. Ev yek jî mirov bi awayekî tebîî dixê li pey nimûneyên bi vî rengî yên wekî *hunera qesrî*. Her wiha dema ku mirov li şairên kurdan yên serdema klasîk dinihêre, hema gelekê ji wan, di bin patronaja mîr, beg, derebeg, paşa, siltan, xan û desthilatdaran de jiyane û li gel wan di qesr û qonaxan de nivîsîne û jiyane. Ev qesr û qonax yên ereb, fars û tirk nebin, gelo yên kî ne? Li vir diyar e ku, ew parametre û dîdeya ku kurdan wekî cimaetê paganîk nîşan dide, li vir difetise. Egil, Amêdiyê, Banê, Bazîd (Doğbeyazıt) Bîtlîs, Cizîr, Çemîşgezêk, Diyarbekir, Erûh, Hekarya, Heskêf, Hazo (Sason) Hîzan, Kîlîs, Kermanshah, Mehebad, Miks, Musul, Palû Silvan, Sinê, Silêmaniye, Şemzînan û Şîrvan, navendên mîrnişîniyên kurd bûn. Qesr û qonaxên kurd jî Annazîd, Baban, Botan, Bradost, Buveyh, Erdelan, Gor, Hasanveyh, Hemdanî, Kajar, Mervanî, Sanekanî Hewraman, Soran, Şeddadî û Xaldiyan e. Ev der bibûn qesr û qonaxên edebiyata kurdî ya klasîk. Dîsa navendên dînî yên wekî, tekya, dergah û medrese, bûne cîgehên edeb û ilmê.”²⁰¹

Seray hem cihê mîr û began, hem jî cihê îdarekirinê mîrekiyên kurdan bûn. Li wir karûbarê îdareya mîrekiyan ên li gel dewletên din, mîrekiyên cuda dihatin kirin. Bi tenê ne li mîrekiyên kurdan de, her wisa di seray û qesrên rojava û rojhilat jî, ew der wekî navendên kulturî û hunerî bûn. Li Îranê û qesr û qonaxên şahînsahiya persan ew der cihên kêf û seyranê bûn jî.²⁰² Ji bilî wê li wan cîgehên edebiyat û kar û barên ilmî jî dihatin îcrakirin. Her ji ber wê, di dîrokê de kamilbûna çalakîyên edebî, xwe dispêre pêşketin û bilinbûna îhtîşama ku di peywenda qesr û qonaxan de çêbûyî. Di sîstema patronajê de, seray roleke wekî navendî dilîze. Ew kesên ku dawetî serayê dibûn, di hiyerarşîya îdarekirina hikumdariyê de cihê ew kesên ku hozan û dengbêj jî hebû. Her wiha li Îranê, di dema serdema navîn de di hiyerarşîya burokratîk de piştî sultan, namzetên xanedaniyê û leşkerên li gel sultan dihatin. Piştî wan jî hoqebaz û qirdik û muzîsyen dihatin. Di nav ew kesên ku li der û dora sultanê Îranê cih digirtin, yek ji wan şairên ku li temburê dixistin hebûn. Ew zêdetir wekî kultureke musîqeyê bûn.²⁰³ Wekî Julie Scot Meisami behs kirî, ji aliyê ew kesên ku desthilatdar bûne, gelek pûte dane wan kesan. Di qesr û qonaxên mîrên kurdan de jî dengbêj xwedî îmtiyazên gelek mezin bûn. Di wir de ji rêzbûna rûniştinê heta ku rêzbûna hiyerarşiyê, dengbêj jî di nav giregirên serayê de cih girtine.

²⁰¹ Selim Temo, *Kürt Şiir Antolojisi*, Weş.. Agora, İstanbul, 2007, r. Iii-Iiii

²⁰² Julie Scot Meisami, *Medieval Persian Court Poetry*, Weş.. Princeton, r. 3

²⁰³ J.S. Meisami, h.b, r, 4

Pêywendiya sîstema patronajê û kultura ku li derûdora serayê derketiye, di dema Serdema Navîn de bi xwe re kultureke qesrî ava kiribû. Ev tişt jî, tradîsyoneke musîqeya kurdî ya di dema klasîk de peyda kir. Li gor seyahên Serdema Navîn, li qesr û qonaxên feodalên kurdan de musîqeyeke kurdî ya pêşketî û zarîf hebûye.²⁰⁴ Diyar e ku li wan deran, pêşketina sîstema patronajê û kemilandina himayekirinê li ser esasên naveroka stran û gotin û her wisa musîqeyê ava bûye. Çimkî di serayan de teşeyê gotinê, naveroka gotinê hem ji bo motîvasyona ew kesên ku li serayan kom dibûn, hem jî di nav atmosfereke epîkê de zêde bi qedirgiran dibe. Li van qesran ev tişt zêde xwe li ser esasên destanê ava dikin. Di wir de stranên lehengiyê ku mirov wekî epîk bi nav bike, ciheke pirr mezin werdigre. Çimkî atmosfera serayê û sîstema hîmayekirinê di nav atmosfereke wiha de encax dikemile. Dema ku hozanek, berhemên xwe li ser payedarkirina patronekî dike, ew dibe sebep bo hîmayekirina wî/ê.

Di serayên mîrekiyên kurdan de bi tenê musîqeyeke lehengiyê na, her wiha musîqeyeke dînî jî hatiye îcrakirin. Wekî Nureddîn El Salihî diyar kiriye. Di sedsala XIIIan de bi avakirina dergahên derwêşiyê, musîqeyeke dînî û hunerî peyda bûye. Di geşedana musîqeya dengbêjiyê de ku ji xwe re cihek di nav sînoren serayê de dîtiye, rola van dergahan jî pirr girîng e. Her ji ber wê, di geşedana cureyên musîqeyê yê din de jî rola serayê gelek heye. Çimkî li serayan ew kesên ku hem musîqeyên dînî hem jî yê cuda îcra dikirin zêde qedirgiran bûn. Bandora wan li ser hemû medeniyeta Îslamê jî çêbûye. El Musulî yek ji wan kesan e. Ev malbata ji aliyê malbatî ve jî pirr qedirgiran bû di warê hunerî de jî pirr dihat parastin. Ew ji aliyê Harun Reşîd ve hatiye parastin û hîmayekirin. Piştê jî konservatuara xwe ava kiriye.²⁰⁵

Di qesr û qonaxan de ew musîqeya ku têtê îcrakirin, gelek caran Mîr û Began jî di bin bandora xwe de dihêlê. Aşiq Hemo²⁰⁶ dengbêjê Cembeliyê Mîrê Heqariyan e. Em ji agahiyên teksta Kurdolog Roger Lescot (1914-1975) fehm dikin ku destana *Binewşa Narîn û Cembeliyê Mîrê Hekariyan* li qesra mîr û li mêvaxaneyê wî ji aliyê mêvanan ve pirr dihat guhdarkirin. Ew destan ji ber înayeta patron anku Cembeliyê Mîrê Hekarî ve bi temayeke nexşendina fezîletên Mîr ve hatiye honandin. Aşiq Hemo li gel mîr, li seraya wî, ji wî re destan û manzûmên dirêj îcra kirine. Li wir karakterên vê destanê Mîr û Binewş e lê nemaze li ser

²⁰⁴ Kendal Nezan, Kürt Müziği amd. Mehmet Bayrak, *Kürt Müziği, Dansları ve Şarkıları* Cild1, Weş.. Özge, Ankara, 2002, r. 57

²⁰⁵ Nureddin Al-Salihî, Kürt Müziği Tarihi Üzerine Bazı Belirlemeler. amd. Mehmet Bayrak, *Kürt Müziği, Dansları ve Şarkıları*, Cild 1Weş. Özge, Ankara, 2002, r. 141

²⁰⁶ Derbarê jiyana Aşiq Hemo de ji Kurdologê frensî Roger Lescot (1914-1975) çi agahî nîn in. Ev agahiyên derbarê wî de jî dengbêjê Berazan Mişoyê Awan neqlî Lescot dike. Her wisa di tekstê de təkiliya Cembeli û Aşiq Hemo, wekî *musahibekî* xuya dibe û Aşiq di qesra wî de jê re dengbêjiyê dike û li gor wê tekstê jê re jinekê jî dibîne. Bo agahiyên berfirehtir bnr. Kovara Hêvî, j. 2. 1984, r. 39

dengbêj rawestiye. Em di destanê de fehm dikin mîr Di dirêjahiyê destanê de ew tiştên ku tên serê mîr, wî jî dike dengbêj û li çol û bestan dixîne.²⁰⁷ Îhtîmal heye ku destanên ku ji aliyê dengbêjan ve li serayan dihate gotin, guhdêrên destanê ber bi atmosfereke lîrîkê dikêşa û çalakiya ku li qesran pêk dihat, ji ber vê esasa coşê zêde dihat hezkirin. Di nav wan guhdêran de li gor hiyerarşiya serayê kesê herî payebilind, mîr bûn. Lewma jî temayên stranan her wisa ji bo mîr dihatin honandin û gava ku mîr di wan stranan de ew tiştên ku bi wî re eleqeder guhdar dikir, zêdetir ji wan hozan û dengbêjan hez dike. Ew xal, ne bi tenê ji bo sîstema patronaja dengbêjiyê, her wiha ji bo edebiyata nivîsî û dîwanê jî heman rengî ye.

Wekî di gelek kulturên milletên cîran de jî heye, di qesr û qonaxên giregiran de seray gelek caran şansê xwe îspatkirinê jî dide şair, hozan, dengbêj û zinaetkaran. Wekî Halîl Înalçik di kitêba xwe ya *Şair û Patron* de diyar kiriye, di xas bexçeyên serayê de an li qesr û qonaxan de, di xelwetxaneyan, meclîsên îşretê (araq) yê tradîsyonel de şair, mutrib, xanende, li ber hikumdarên dewra xwe, şans û derfeta xwe îspatkirinê li wir didîtin. Li wir qadeke pêşbirkê dihate hazirkirin.²⁰⁸

Sîstema patronajê bandoreke pirr mezin li ser standartbûna hindêk têgehên edebî, folklorîk û zimanî dike. Çimkî bi wê sîstemê seray dibin model û wekî navendekê, hemû şair û hozan û musîqejen dixwazin ku li wir bêne qebûl kirin. Eger mîr ji aliyê hozanan ve bibe xwediyê pesn û ecibandîne, ew şair û dengbêj daxwaz dikin ku li gor terza wî bibêjin û binivîsin. Yanî înayeta patron, tesira xwe li ser çêbûna teşebûsên edebî û hunerî jî dike. dema ku mirov li helbestên dengbêjan û dîwanên şairên klasîk dinihêre, zewq û meyla patronan naveroka hunerê jî diyar dike. Li serayên Erdelanê ku hikmê mîrekiyên kurdan lê hebû, gelek şair û hozan dihatin hîmayekirin. Şair li wan serayan, bi dilgermî dihatin pêşwazîkirin, prensên mîrekiyê parastina wan dikir û ji bo ku ew berhemên xwe biafirînin, ew hîmaye dikirin. Ji ber vê parastina patronan, bi zarawê Goranî gelek berhem hatin nivîsîn. Mele Perîşanê ku di sedsala XVan de jiyaye û Mele Abdurrehîm Mewlewî yê k udi sedsala XIXan de jiyaye ji bo parastina edîbên li qesr û qonaxên mîran nimûneyên sereke ne. (...) Ebdurahman Paşayê Baban, di sala 1789an de, dema ku li şûna Îbrahîm Paşa derdikeve ser textê mîrekiyê, xanedaniya Babanê li quntara rojavayê çiyayê Zagrosê gelek xurt dibe. Prens Ebdurahman piştî ku ji bo ziyaretê diçe xanedaniya Erdelanê dibîne, di seraya reqîbê xwe yê Emanulah Xan de bi xatirayên wî yê xweş ve vedigere û seraya xwe ya li Silêmaniyê jî bi wî terzî ava dike û dixê navenda kultur û huner û edebiyatê. Di qesrê de gelek hunermend û edîb

²⁰⁷ M. Zahir Kayran, *Kürt Folklorunda Dengbêjlik Geleneği*, amd. Mehmet Bayrak, *Kürt Müziği Dansları ve Şarkıları*, Cilt 1, Weş. Özge, Ankara, r. 512

²⁰⁸ İnalçık, b. n, r. 25

ji aliyê wî ve tên parastin û tradîsyonek ava dibe. Ew der dibe cîgeha himayekirinê û patronaj li wir tê afirandin. Wî ji şair û ozanan xwest ku, bila berhemên edebî û hunerî bi goranî neyê nivîsin û ew teşwîqî nivîsîna bi soranî û zarê Silemaniyê kir. Piştî gotina wî, zarê Silêmaniyê geş bû û wekî bi navê soranî gehişt merheleyeke nivîsê.²⁰⁹

Sîstema patronajê, tesira xwe li ser grubên dînî û mezhebî yên cuda de kiriye. Dema ku li cihekî desthilatî hebe, bi vê yekê aşkire ye ku sîstema patronajê di her kar û barên kulturî û edebî peyda dibe. Ev yek ji bo təkiliya desthilatî û hunerê nimûneyeke esas e. Desthilatî wekî di gelek nimûneyan de hate aşkerakirin, di nav kurdên êzîdî de jî bi heman awayî derketiye holê. Dema ku mirov li hin dengbêjên ne misilman dinihêre, mirov dibîne ku ew ji aliyê mîr û begên kurdan ve hatine parastin. Karapetê Xaço û Filîtê Quto ji bo vê behsê nimûneyeke demeke nêzîk e. Dengbêjê Îbrahîm Paşayê Milî jî, ji aliyê wî ve di qesr û qonaxa wî de hatiye qebûlîkirin û di seferên wî de jê re musahibî kiriye. Ji bilî Biroyê Şerqî di meclîs û dîwana wî de gelek dengbêjên êzîdî jî stran û berhemên xwe îcra kirine. Her çend Îbrahîm Paşayê Milî bi xwe misilman be jî, di konfederasyona eşîra Milî de çend eşîrên milî jî hebûne. Li behsa patronajê jî, dengbêjê wî yê qesr û serayê dengbêjê bi navê Biroyê Şerqî bû.²¹⁰

Tradîsyona dengbêjiyê, ji bilî kultura kurdî ya nivîskî, li cihên avamî û di nav gel de rûdaye û geş bûye. Lêbelê edebiyata kurdî li bajar û li medrese û mizgeftên gundan -ku mirov dikare jê re bibêje cîgehê ilm û zanîn e- derketiye holê û li seray û qesr û qonaxên ew kesên xwedî erd û arîstokrat, geş bûye û gehiştîye dereceyên payebilind. Li mala wan (dîwanxane-dîwan) çalakîyên edebî û hunerî hatine îcrakirin.²¹¹

Wekî cîgehekî qesr û qonax; di stranên dengbêjiyê de jî teswîr û analogiyên hêja diyar dibin. Di devjenî û leckirineke dengbêj Evdalê Zeynikê û Sirmelî Mehmed Paşe û dengbêjê Taharxan Beg Şêx Silê de zerafet û şatafata xweşik û bedewbûna qesr û seraya Sirmelî Paşa di van risteyên Şêx Silê derdikeve holê:

“Evdal, Qesra Sirmelî Mehmed Paşa bi kevirê zer e

Şalûl dixwîne bilbil li hember e

Heta sê şev û sê rojan ewê ku bireve

Wê serê wî tê de here lo lo lo”²¹²

²⁰⁹ Joyce Blau, Yazılı Kürt Edebiyatı, amd. Philip Kreyenbroek Christine Allison, *Kürt Kimliği ve Kültürü*, wer. Ümit Aydoğmuş Weş. Avesta, İstanbul, 2008 r. 41-42

²¹⁰ Christine Allison, Badînan’da Eski ve Yeni Sözlü Gelenekler, amd Philip Kreyenbroek, Christine Allison, *Kürt Kimliği ve Kültürü*, wer Ümit Aydoğmuş Weş. Avesta, İstanbul, 2008, r. 63

²¹¹ Amir Hasanpour, Kürt Medya Kültürünün Yaratılması, Ed. Philip Kreyenbroek, Christine Allison, *Kürt Kimliği ve Kültürü*, wer Ümit Aydoğmuş, Weş. Avesta, İstanbul, 2008, r. 83

²¹² Salihê Kevirbirî, *Bir Çiğlığın Yüzyılı, Karapetê Xaço*, Weş. Elma, İstanbul, 2005, r.65

2.4.2. Odeyên giregirên gundan

Di beşên pêş de tēkiliya desthilatî û mekanê di çarçoveya nimûneyên qesr û qonaxan de hatibû gengeşekirin. Hêz û sînore desthilatiyê rengê xwe li cîgehên muqtedîran jî dide û di navbera mekan û desthilatiyê de tēkiliyeke esas derdixe. Dema ku mirov li sîstema civaka kurdan dinihêre, mirov dibîne ku, guherîna sîstema civakî û desthilatiya kurdan, cihên hîmayekirinê jî bi xwe re guherandiye. Her wisa desthilatiya mîrekiyên kurdan çî qas qels bûye, cîgehên hîmayekirinê jî ew qas qels bûye. Seray û qonaxên mîrekiyan, piştî tēkçûna mîran, ji holê rabûn. Wekî di beşên pêş de jî hatibû gengeşekirin, wekî kronolojîk, piştî tēkçûna mîrekiyan, şêx û axayan tesira xwe li ser civaka kurdan kir. Odeyên giregiran jî, her wisa rastî dema axatiyê tê û li gor karakterê xwe yê desthilatiyê, di nav dînamîkên xwe de sîstemeke patronajê derxistiye holê. Odeyên girêgir û muneverên kurdan jî, di îcrakirina hunera dengbêjiyê de, di peywenda patronajê de cihekî muhim e. Beriya van odeyan girêgiran, divê ferqa van odeyan û ferqa qesr û serayan were aşkerakirin. Odeyên giregirên, ji bo guherîna sîstema patronajê nimûneyeke girîng e. Çimkî, piştî ku Mîr û begên kurdan tēkçûn, hegemonyaya wan ji holê hat rakirin, desthilatiye kurdan jî bi avakirina dewleta tirk, hêdî hêdî xerab bû. Piştî ku hegemonyaya mîrekiyên kurdan li deverên Kurdistanê kêmbûn anku hildiweşin, şatafat û îhtîşamiye seray û qesran tēk diçin û mekanên patronajê jî pê re biçûk dibin. Odeyên giregirên, yên wek axa û şêx jî, di vê sîstemê de hatine dereceyê nizm. Li odeyên wan giregiran, dîwan û dîwanxaneyên ew kesên mezin hebûn lê, ew wekî serayê mezin û payebilind nebûn. Di wan deran jî îcrakarên hunerê yên wekî dengbêj hatine hîmayekirin. Hîmayekirina dengbêjan di vê nimûneyê de, ne wekî sîstema mîrekiyan, her wisa wekî sîstema eşretê û ji aliyê axayan ve hatiye pê. Li wir jî dengbêj, bo pesndan û mîrxasiya serokên eşîran û şerên di navbera wan de hikayet kirine û di bin temaya epîkê de ji aliyê wan ve hatine parastin. Bi van cîgehên hîmayekirinê ve, rewşa Kurdistanê ya desthilatiya mîran ji sehayêke makro/fireh, ber bi sehayêke mîkro/teng ve hatiye guhertin. Ev xal ji bo fehmkirina şeweya patronajê ya sîstema mîrekiyan û civaka kurdan balkêş e. Çimkî, bi van geşedanên, desthilatiya kurdan kengî ku tēk diçe, cureyê epîkê jî di nav stranên dengbêjiyê de xerab dibe. Xerabûna epîkê her xwe dispêre tēkçûna mîrekiyên kurdan û guherîna civakê ya ku ji aliyê dewleta tirk ve hatiye pêkanîn. Bi tēkçûna desthilatiyê û nemaze jî serayan, kultur û edebiyata kurdî jî rastî hinde guherînên esas tê. Êdî wekî berê, qesr û qonax û seray nîn in ku hem dengbêj û hem jî şair, lê bêne parastin. Bi van odeyan, mirov

dikare bibêje ku bi tenê dengbêj lê payebilind bûne. Ji ber ku ev ode ne wekî seray û qesran karakterê desthilatiyeke xurt nîşan didin, şairên ku xwedî dîwan bûne, li wan deran nehatine hîmayekirin.

Guherîna têkiliyên hîmayekirinê, bi cîgehên patronajê ve re eleqeder e. Ev nimûneya odeyên girêgirên bo vê yekê nimûneyeke pîrr balkêş e jî. Dema ku li qesr û serayên mîr û derebegên kurdan de çalakî û faaliyetên kulturî û edebî rû didan, li gundan jî di van odeyan de dengbêj *bi refê wan giregiran* re difiriyan. Lê di warê stranên dengbêjan de, li gundan û di odeyên giregiran de atmosfereke fantastîk jî peyda bûye. Li wan deran, ji bilî stranên lehengî û mîrxasiyê, wekî tematîk hêmanên folklorîk jî li wan odeyan hatine îcrakirin. Dirêjahiya şevên zivistanê, di afirandina berhemana de motîvasyoneke folklorîk daye îcrakarê hunerî û dengbêj ji aliyê gundiyan ve jî hatine guhdarkirin. Ji ber ku di dema mîrektiyên kurdan de şairên klasîk ji aliyê hamiyan ve zêde dihate parastin û kultura dengbêjiyê wekî kultureke avamî dihate qebûlkirin, mirov dikare bibêje ku cîgehên ku dengbêj herî zêde hatine parastin dîwanxaneyên giregirên gundan in. Ew cih di navbera dengbêj û ew kesên ku guhdariya wî/ê dikirin, di şevên zivistanê de wekî cîgeheke performansê bû. Li wan dîwanxaneyan, dengbêj bi hevdu re diketin lecê ew der ji bo pêşewaziyê cîgehên girîng bûne.²¹³

Wekî xaleke sosyolojîk, cîgehên bi vî rengî mirovên der û dor nêztirî hevdu dikin. Ew der her çend malên giregiran be û bi sistemeke hiyerarşîk xwedî karakterekî be jî, gundiyan jî li wan deran, li gel axayan guhdariya dengbêjan dikir. Ew der cihên berfireh in ku gelek kes dikarin tê de bi cih bibin û gelek caran jî li wan odeyan, hinde dengbêj bi hevdu re ketine lecê. Anku dengbêjên hinde axa û paşayan li wan deran bi dengbêjên axa û paşayên din re, car caran jî bi dengbêjên axa û paşayan di nav hevdu de bi hevdu re avêtine ber hevdu. Ji bo vê yekê nimûneya dengbêjê Sirmelî Memed Paşa Evdalê Zeynikê û dengbêja wî ya filleh Gulê nimûneyeke balkêş e.

Evdalê Zeynikê:

“Ez şahê dengbêja, Evdalê Zeynikê me
Li Serhedê qesasê serê şair û dengbêjê xelkê me
Ez ku biqîrim, dengê minê ji vir here erdê Ecem e
Ez ji rêya dûr hatime Gulê ez îro mêvanê te me.”

Gulê:

²¹³ Dicle Yıldız Katar, b.n., r. 54

“Evdal tu bi xêr hatî ji wir heta vira
 Bejna min dişxule mînanî mûm û çira
 Tu were emê bi hevra bistrên mînanî xûşk û bira
 Hey can Evdal, wey can evdal
 Heyla kirîbê Evdal ez heyirî te mam.”²¹⁴

Çalakiyên li wan odeyên giregiran, hem xwedî karekerekî teatral û hem jî edebî ye. Dengbêj her çend ew zinaetkarên gerok bin jî, dema ji cihekî diçin cihekî dîtir, li mal û xaniyên giregiran têne hîmayekirin. Navê wê çî bibe bila be, li gundekî an mezrayekî li odeyekê an li qesrekê, giregirê wê cîgehê çî dibe bila bibe, kî çûbûye hec, kî qur’an xwendibe, kî dewlemend bûye û kî wek axayekî hatibûye naskirin, kî beg bûye, ew der cîgehê hîmaye û mêvankirinê bûye.²¹⁵ Dema ku dengbêjê giregirekî li dîwan û meclîsan stranên xwe îcra dikir, ew giregir, axa û mîr bi wan pîrr şanaz dibûn. Ji bo wê jî daxwaz dikirin ku dengbêjê wan bi dengbêjên êl û eşîrên din re lecê bikin û biçixin. Her çend dijminahî di navbera êl û eşîran de hebe jî, dengbêj wekî kesên qutsî ji aliyê alîgirên dijminan ve wekî dijmin nehatiye qebûlkirin,²¹⁶ û nasnameya wan a hunerî, ji aliyê giregirên eşîrên din ve jî hatiye qedirgirtin.

Wekî lêkolîner Şerefxan Cizirî diyar kiriye, hinde dengbêjên ku ne niştecih in û koçer in, kon û çadirên xwe li nêzî der û deverên serokê êl û eşîran daniye. Dengbêj Reşîto, yek ji wan dengbêjan e ku ji bo debar û îdareya mala xwe, li nêzî devera Masertê, kon û çadirê xwe daniye. Dema ku firsend dîtiye, çûye li odeyên girêgirên gundê Masertê, çîrok û stranên xwe yên dengbêjiyê îcra kiriye. Her wisa bi alîkariya patronaja axayan, debara mala xwe kiriye. Piştî ku stranên xwe li wan odeyên giregiran gotiye, ji aliyê dewlemendên gund ve layiqî hindek “xelatan” bûye û ji bilî wî, malbata wî jî ji aliyê wan dewmendan ve hatiye parastin.²¹⁷

Li van odeyên giregirên gundan, dengbêjan, destan, stranên lehengiyê, stranên evînê, çîrokên gelêrî, îlahî û mesnewî jî îcra kirine. Zêdetirîn dengbêjan, bê enstruman ev huner îcra kirine. Ji bilî wê, di wan cîgehên hîmayekirinê de, di warê cinsiyeta civakî de hegemonyayeke mêran heye. Yekser mêr li wan deran kom dibin û guhdariya şevbihêrkên dengbêjan dikin. *Şevbihêrk* di behsa odeyên giregirên gundan de, yek û yek mantiq û têgihiştina wan şevên ku li wan odeyan îcra bûne aşkire dike. Di wan şevbihêrkan de, wek me li jor gotî, yekser atmosfereke mêranî ava bûye. Lê li devera Serhedê -ku ev tradîsyona dengbêjiyê bi awayekî

²¹⁴ Ahmet Aras, *Şairê Kurda yê Efsanevî*, Weş. Deng, İstanbul, 1996, r.43

²¹⁵ Muhsin Kızılkaya, *Kayıp Diwan*, Weş. İletişim, İstanbul, 2000, r.15

²¹⁶ Mehmed Uzun, *Dengbêjlerim*, Weş. İthaki, İstanbul, 2008, r. 28-30

²¹⁷ Şerefxan Cizirî, *Kultur û Edebiyata Devkî*, Weş. Nûdem, Sweden, 1999, r. 31

biserûber dewam kiriye- ji bo behsa dengbêj Şakiro ku ev taybetmendî bi heman awayî nebûye. Dema ku li wan odeyan, di nav cimaetê de jinan li pişt deriyan guhdariya dengbêjan dikirin, dengbêj Şakiro ji ber wê yekê stranên xwe negotîne. Lê kengî ku jin, bûk û qîz dîtine, bêhtir motîveyî stranê bûye. Bi dîtina jin û bûkan ve dengbêj Şakiro, stranên xwe bi awayekî rêk û pêk û bi xweşavazî îcra kiriye.²¹⁸

Cîgehên kombûnê, li gor şert û mercên cografîk ji hev cuda ne. Li cihên germ û sar, taybetmendiya civînê û pêşewaziya mêvankirinê jî diguhure. Fredrik Barth'ê ku li ser eşîrên Başûrê Kurdistanê xebitî bû, derbarê vê meseleyê de tiştên gelek muhim dibêje. Barth, karakterê pêşawazî û hîmayekirinê bi cudahiya sinifî/çînî ve îzah dike û gelek jî bi argumentên xurt ve diçe serî. Ew, paşxaneyê pêşewaziya mêvanperweriyê û çalakiyên hunerî û edebî dispêrê statûya sinifî. Li gor Barth, *cîgehên servekirî* û *cîgehên sergirtî* li gor şert û mercên sinifî îzahatên cuda derdixine holê. Barth, bi biwêj û gotineke Amerîkî, ji cîgehên mirovên asilzade û statûyên giregiran re dibêje *smokefilled room* (odeya tijedû). Di van odeyan de arîstokrat tînan pêşwazîkirin. Berovajî wê, ji bo kesên ku ne arîstokrat in û serweriya komeke mezin nakin û mirov dikare wan di warê sinifî de, di bin arîstokratan de hesab bike jî wekî *rooftop society* (cimaetên serbanî) bi nav bike²¹⁹ Ev herdu grûbên ji hevdu cuda û înfîrmel, bo têgehiştina ew cîgehên hîmayekirinên jî tiştên balkêş derdixin holê. Awayê van odeyan ji bo axa, giregir an muneweran, faktoreke îtîbar û prestîjê ye.

2.4.3. Radyoyên ku Bo Dengbêjan Cihên Bêhnvedanê

Di vê xebatê de, yek ji rexê tîkiliya patronaj û dengbêjan, radyo ne. Radyo di qonaxa kultura kurdî û kevneşopîya dengbêjiyê de rastî dema modern tê û ji aliyê karakterê hîmayekirinê ve, ji geşedanên siyasî mutesir bûye. Wextê ku mîrekiyên kurdan di sedsala XIXan de tîk diçin, hunermend û edîbên kurdî jî, ji dezgeheke parastin û hîmayekirinê mehrûm dimînim. Bi avabûna Cîmhuriyeta Tîrkiyeyê ve kultur û hunera kurdî jî bi awayekî sîstametîk rastî polîtîkayên bişavtinê tînan û zimanê kurdî tê qedexekirin²²⁰. Dengbêjên ku ji aliyê mîr û beg û axeyan ve dihatin parastin, piştî tîkçûna wan bêxwedî man. Piştî dema modern, yek ji cihê hîmayekirina dengbêjan radyo ne. Dema ku mirov li radyoyên ku huner û

²¹⁸ Yusuf Uygur, *Kültürel Bellek ve Dengbêjlik, Doğu Anadolu'daki "Dengbêjlik" Geleneğinde Bellek Üretimi*, t. ç., Zanîngeha Mîmar Sînan, Enstîtûya Zanîstên Cîvakî 2009 r. 31

²¹⁹ Fredrik Barth, *Kürdistan'da Toplumsal Örgütlenmenin İlkeleri*, wer, Serap Rûken Şengül- Hişyar Özsoy, Weş. Avesta, Îstanbul, 2001, r. 136-138

²²⁰ Ziman û kultura kurdî ji dewletan ve bû sedema polîtîkayên kulturkujî û zimankujiyê yê curbicur. Lê Bakurê Kurdistanê, ji aliyê van polîtîkayan rastî zext û zordariyên mêzintir hat. Derbarê wan polîtîkayan de bnr. Amir Hasanpour, b.n. r. 187-253

kultura kurdî lê hatiye îcra kirin dinihêre, mirov dibîne ku, vekirina radyoyan xwe dispêre geşedanên siyasî yên di navbera Rusya, Îran, Iraq, Ermenîstan, Tirkîyeyê.

Di destpêka sedsala XXan de, ew dewletên ku di warê teknoloji û endustriyê de pêş ketibûn, di siyaseta xwe ya navdewletî de, amûrên teknolojiyê jî bikaranîn. Cara yekem di sala 1923an de li Înglîstanê weşana radyoyê ji bo pêkanîna propagandayê tê bikaranîn²²¹ û ev yek ji aliyê dewletên wekî Alman, Rusya û paşê jî dewletên Rojhilata Navîn tîr tecrubekirin. Helbet patronaja ku li radyoyan hatiye pêkanîn, di aliyê îcrakirina hunerê û parastina kulturê ve encamên cuda derxistine holê. Siyaseta di navbera dewleta Amerîka û Rûsyayê di avakirina radyoyan de bûye faktora herî sereke. Dema ku mirov di destpêka sedsala XXan li wan radyoyan dinihêre, di encamê de hem propagandaya wan dewletan hatiye kirin û hem jî ev yek ji kultur û hunera kurdî re bûye firsendekê ku lê biafirîne. Radyoyên wekî *Levant*, *Şarkü'l Edna*, *Bexda*, *Tehran*, *Senendaj*, *Kirmanşah*, *Meşhed* û *Reza'iyeh*, *Qahîre*, *Radyoya Kurdistanê Sor*, *Tîflîs* û *Radyoya Rewanê* di encama hevkeşeya siyaseta dewletan de hatine vekirin û di wan radyoyan de her wisa bernameyên hunerî û kulturî jî hatine weşandin.²²²

Radyo di dîroka kultura kurdî û nemaze jî kultura dengbêjiyê de serdemeke modern e. Lewma jî dema ku mirov behsa wan dike, divê mirov di çarçoveya kultura nivîskî û elektronîk de encamên wan ên li ser dengbêjiyê binirxîne. Ali Ağcakuluyê ku teza xwe li ser radyoya Rewanê nivîsiye, di lêkolîna xwe de destnîşan kiriye ku di sedsala XXan de gelek radyo li gorî siyasatên dewleta Rusya û Amerîkayê ji bo propagandayê hatine ava kirin û kurdan jî di wan radyoyan de çalakiyên xwe yê hunerî û kulturî îcra kirine. Ji ber ku ev lêkolîn bi tenê li ser dengbêjiyê disekine û dengbêjî jî kultureke kurmancî ye, dê zêdetir nimûneyên radyoyên weşanên ku zimanê wan kurmancî ne were vekolandin. Lewma jî radyoya Rewanê di vê behsê de nimûneya sereke ye. Dema ku mirov li radyoya Rewanê dinihêre, li wir nêzî 1800 stranên dengbêjiyê ji aliyê lêkolîneran ve tê qeydkirin û di nav arşîva radyoyê de cihê xwe digire.²²³ Xebatkarên radyoyê di navbera gelek dengbêjan de (car caran ji bîstan zêdetir dengbêj) pêşbirkan dirust dikin û yê/a serketî di radyoyê de hîmaye dikin.

Wekî li jor jî hate diyarkirin, bi guherîna şert û mercên civakî û siyasî û konjonktura sedsala XXan, radyo di îcrakirina kultura dengbêjiyê de cihekî taybet digire. Patronaja ku ji aliyê giregir û mîr û begên kurdan ên di demên mîrektiyan û axayan de hatibû kirin, bi avakirina radyoyan ve derbasî qonaxê nû û modern bû. Patronaja li radyoyan hatibû kirin, li ser esasên polîtîk hatin kirin. Nemaze li radyoyên wekî Urmiye, Kirmanşah, Bexda û Rewanê,

²²¹ Osman Özsoy, *Propaganda ve Kamuoyu Oluşturma*, Weş. Alfa, İstanbul, 1998, r. 345

²²² Ali Ağcakulu, *Ortadoğu'da Kürtçe Radyo Yayınları: Erivan Radyosu Örneği (1955-1990)* Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Marmara, Ensîtuya Lêkolînen Rojhilata Navîn, 2012, r.50-55

²²³ Hevpeyvîna digel Tîmûrê Xelîl, Ali Ağcakulu, h.b., r.147

dengbêjan stranên xwe tê de gotine û ew kes ji aliyê rêvebirên radyoyê ve hatine parastin. Beriya Radyoya Rewanê li Kurdistana Sor (1923-1929) di sala 1924an de radyoya Kurdistana Sor tê avakirin û dengbêj cara pêşîn li wir stranên xwe îcra dikin.²²⁴ Radyoya Rewanê di sala 1955ê de hatiye ava kirin û di radyoyê de ji bilî programên nûçeyan, weşanên lîstikên şanoyê, berhemên edebî û programên musîkê yê dengbêjiyê tên kirin.²²⁵

Patronaja ku li radyoyan hatiye pê, li gorî siyaseta dewletan cihereg bûye. Lewma jî li radyoyan, kesên ku hatine hîmayekirin, bi tenê ne dengbêj bûne û ji bilî dengbêjan nivîskar û şair û lêkolîner jî hatine parastin. Ji ber vê yekê jî, radyoyan di dîroka kultura kurdî de wezîfeyeke wekî dezgehekê dîtiye. Lewma jî di nav radyoyên ku dengbêj û hunermendên kurdan lê stran gotinê de cihê Radyoya Rewanê cihekî cudatir werdigre. Ev cudahî, ji bo şikl û awayê patronajê jî, hin guhertinên esas nîşanî me dike. Radyoyên li rojhilatê Kurdistanê wekî Urmiye û Kirmanşahê hatine ava kirin bi hamîtiya xanedana pehlewîyan û her wiha li gorî îdeolojiya wan hatiye damezirandin, Radyoya Bexdayê li ser pesndana rejîma BAASê hatiye damezirandin.²²⁶ Mirov dikare bibêje ku patronaja ku di radyoyan de hatiye kirin, ji bo berjewendiyên rejîm û dewletan hatiye avakirin, lê ji bo afirandina kultur û hunera kurdî di encamê de roleke pozîtîf lîstiyê. Di vir de divê mirov diyar bike ku dengbêjî bi serê xwe kultureke muxalîf nîn e. Îro, her çend dengbêj wekî kesên muxalîf werin binavkirin jî, di rastiye de tiştekî wisa di nimûneyên radyoyan de nîn e. Îro di hindek kanalên ku ji aliyê dewletên ve hatine vekirin û lewma jî ji aliyê hin rewşenbîr û siyasatmedaran ve tên rexnekirin, bo nimûne TRT 6 û Dunya TV di hin bernameyên xwe de hunera dengbêjiyê û dengbêjan dixê mêvan. Dema ku mirov dînamîka ku patronaj û berhemên hunerî dinihêre, xuya ye ku muxalîfiya dengbêjan yekser li ser esasên hîmayekirinê aşkera dibin. Ev yek ne bi tenê ji bo îro, her wisa di beriya demên modern de jî heman rengî bû. Sîstema patronajê ku xwe disperte mîr û axeyên kurdan, di dema modern de ji sedemên siyasî polîtîze bû û di nav gengeşeên netewî û avakirina nasnameyê de reng û forma xwe guhert.

Di radyoyan de ew dewletên ku radyo ava kirin, û rewşenbîrên kurd ên ku di bin tesira fikrên modern de mabûn, dengbêjî wekî amûreke siyasî dîtin û lewre jî hîmaye û parastina wê kulturê kirin. Radyoya Rewanê di nav radyoyên din de cihekî wê yê cuda heye. Ew her çend di bin tesira Sovyet û Ermenîstanê de bimîne jî, taybetmendiyên hunera dengbêjiyê zêde di nav sîstema Sovyetê de nehat helandin û xwe parast. Avakirina radyoyê, ji bilî dînamîkên siyasî, wekî mafê kolektîf dihate nirxandin û serokkomarê Ermenîstanê Sver Tomasyon, di

²²⁴ Ali Ağcakulu, h.b, r. 53

²²⁵ Ji Xelîlê Çaçan neql, Ali Ağcakulu, h.b, r. 57

²²⁶ Salihê Kevirbirî, h.b, r. 25

sala 1954an de bi mezinên kurdan re li Rewanê civînekê çêdike. Piştî vê civînê kurd gelek mafan bidest dixin û yek ji wan jî Radyoya Yêrêvanê vedibe.²²⁷

“Dewra berê, dewra berê,
Belengaz bû, Lenîn rabû em xilas bûn
Navê Lenîn şêrin şa bû.
Ilmê Marksîst bilind bû”²²⁸

Di vê pasaja strana dengbêj Susika Simo (1925-1977) de ku yekem car, wê wekî dengbêjeka jin li radyoyê stran gotibû, îdeolojiya Sovyetan bandora xwe li ser temayên stranan dike, aşkera dibe. Dengbêjên ku di radyoyê de xebitîbûn, di wê demê, li gorî îdeolojiya sosyalîzmê stranên xwe digotin û Karl Marks (1818-1883) û Vladimir Lenîn (1870-1924) ê ku teorîsyen û lîderên Sovyetê bûn, di stranan de layiqî pesn û senayên dengbêjan dibûn.

Dustin Griffin, di xebata xwe ya bi navê *Literary Patronage in England 1650-1800* de têkiliya patron û hunermendan, wekî têkiliyeye dualî nîşan dide û li dijî xwendinên patronajê yên ku karîgeriya patron derdixe pêş rexne dike. Li gor wî, sîstema patronajê, hem kêrî patron tê û hem jî şair, hozan û dengbêj ji wê sîstemê sûd werdigirin. Eger mirov bi wî çavî lê binihêre, li gor Griffin, patronaj, sîstemeke aborî ye ku têkiliyên di navbera hozan û patron aşkera dike. Sultan û hikumdar, çawa ku bi pesn û payeyên hozan û şairan ve bi nav û deng dibin, şair û hozan jî her wisa bi patronaja wan kesan ve navdar dibin. Ev her du tişt jî, li gor sîstemeke ekonomîk tê formulêkirin. Her wisa divê ew têkiliya di navbera wan de çêbûyî, li gor mantiqa berjewendperestiyê jî neyê fehmkirin. Li gorî wî, hem di navbera civakên ku bi rê û rêbazên kevneşopî îdare dibin, hem civakên ku bi rênçberî û ajalvaniyê xwe debara xwe dikin û hem jî di nav têkiliyên burokrasiyê yên modern û polîtîk de, ev “xelat” tiştêkî pirr asayî ye û mirovan bêhtir nêzî hevdu dike.²²⁹

Ji ber ku di radyoya Rewanê de kurdên êzidî û ermenî ji sedema polîtîkayên dewleta Tirkîyeyê, nêzî hevdu bibûn, di radyoyê de jî bi alîkariya ermenan, bername û çarçoveya radyoyê dihate aşkera kirin. Her wisa dema ku mirov li temaya stranan dinihêre, hin şexsiyetên ermenan ên bi lehengiya xwe derketine pêş, ji aliyê dengbêjan ve hatine honandin. Di vir de helbet nêzikiya êzidî û ermanan, ji bo avabûna van têkiliyan xaleke girîng e. Lê

²²⁷ Ayhan Erkmen, *Radyoya Yêrêvanê: Ji Bo Bîranîna Daner, Kekdar û Dengbêjê Wê*, Le Monde Diplomatique, j. 18, Gulan 2011

²²⁸ <http://www.kurdishmagazin.com/km/dengbejler-kurt-kulturunu-korudu.html> (12.12.2012)

²²⁹ Dustin Griffin, *Literary Patronage in England*, Weş. Cambridge, England, 1996, r. 45-55

serdestiya Ermanan a di radyoyê de jî, tesira xwe li ser temaya stranan dikir û ev yek ji aliyê dengêjan ve dibû sedema afirandina berhemên epîk û ew karakter di stranên radyoyê de gelek bûn. Ew fermanî û lehengê ermenî Andranik Ozanyan (1865-1927) ku di şerê cîhanê yê yekem de, li hemberî leşker û artêşa osmanî şer kiribû, ji aliyê dengbêjên radyoya Rewanê ve hatibû gotin. Ji bilî vê nimûneyê di radyoyê de stranên ku dostaniya kurdên êzidî û ermenan destnîşan dikirin gelek bûn.²³⁰

Cangîr Axa û Andranîk Paşa

“Lo lo bavo şer e şer giran e,
Şer giran e Cangîr axa kela mêran e.
Dîsa mêrê hewar û gaziyan e.
De lêxin Kekê Fetla de tu lêxin
Eskerê Roma Reş giran e,
De berdinê kela Wan’ê derxin.
...
Andranîk Paşa xaçmîranê xwe hilda
Paşiya mawuzerê xwe tev girê da
De go simbêl berda, ez bextê we da me
De rabin cewabekî bidin Cangîr Axa.”²³¹

Ev stran ji aliyê Şibliyê Çaçan ve ku gelekî li Radyoya Yêrêvanê xebitîbû hatiye gotin. Diyar e ku, hîmayekirin, car caran hemû temaya stranê jî diyar dike. Di dema Sovyetê de li Ermenîstanê, tiştêkî balkêş heye ku, sîstema sosyalîst, ji dengbêj û xebatkarên radyoyê xwestine ku stranên derbarê axa, mîr û feodalên kurdan de hatine gotin, di radyoyê de nebêjin. Çimkî, heta wê demê ku lîteratura dengbêjiyê ya ku li ser mîr û axayan hatibû avakirin, ji aliyê sîstema Sovyetan ve hatiye qedexe kirin û ew lîteratura derbarê wan de, têk çûye. Li dewsa wê daxwaz kiriye ku dengbêj propagandaya rejîme Sovyetê bikin.²³² Hinde dengbêj ev sansur û daxwazên rêvebirên radyoyê qebûl nekirine û di radyoyê de stranên xwe negotîne. Amir Hasanpour bo van salên ku radyo ava bûnê peyva “ceng”ê bi kar tîne û radyoyê di

²³⁰ Derbarê tîkiliyên liderên ermen û êzdiyan, nemaze Andranîk Paşa û Cangîr Axa de, bernameyeke radyoyê ya Gurcistanê de agahiyên berfireh, di bernameya bi navê *Ronkahî* de hene. Bnr.

<http://www.youtube.com/watch?v=W8tR3WodjIM&list=PL3C618E009FDAFDIC> (14. 03.2012)

²³¹ Şibliyê Çaçan, *Cangîr Axa û Andranîk Paşa*, Deşifrekirin: Zeki Gürür

²³² Hevpeyvîna digel Tîmûrê Xelîl, Ali Ağcakulu, b.n, r. 68

propagandaya Sovyetê de wekî amûreke muhim qebûl dike.²³³ Her wisa yek ji xebatkarên Radyoya Rewanê Wezîrê Eşo, ji bo çarçove, bername û mîsyona radyoyê van tiştan dibêje:

“Di destpêkê de zimanê axaftina kurdî li radyoya Rewanê 15 deqîqe bûn. Piştra ew wext hate dirêjkirin û bi dawiya salên 50an de gihîşte saet û nîvekê. Ev yeka bi biryara partiya komunîst ya Sovyetê qewimî. Bi vê fikrê, partiyê dixwest ku, bi riya propagandayê hem kurdên li Sovyetê, hem jî yên li Kurdistanê bike dostê sosyalîzmê û Sovyetê. Lê dewleta Sovyetê, destûr nedida ku, xebatkarên radyoyê di radyoyê de, li dijî problemên hindurîn, yên welatên serdestên kurdan bipeyivin. Yanî dewletê nedihîşt ku di radyoyê de behsa Kurdistaneke azad û serbixwe bibe. Lê carna Sovyetê, ji bo fêda xwe û ji bo reqabeta bi hin dewletên din re, wan dixwestin ku di radyoyê de behsa kurdan û welatên wan bête kirin. Heta di ser de ji wê piştgiriya têkoşîna kurdan a ji bo azadiyê dikir. Di destpêka salên 60an de dewleta Sovyetê eşkere piştgiriya têkoşîna kurdên Iraqê kir, ji ber ku navbera wê û Iraqê xerab bûbû.”²³⁴

Di radyoyê de hîmayekirina dengbêjan, parastina lêkolîner û şairan, xwe disparte propagandaya Sovyetê. Radyoya Rewanê, di serî de bi tenê 15 deqîqeyan weşana xwe dikir û piştî ku Mistefa Barzanî, sekreterê partiya komunîst Kruşçev (1894-1971) ziyaret dike û daxwazê jê dike dema weşanê dibe yek û nîv saet.²³⁵ Radyoya Rewanê, şûbeyeke Radyoya Dengê Rûsan bû ku bi 124 zar û zimanan weşan dikir û weşana radyoyê bi axaftina *Yêrêvan xeber dide, guhdarên ezîz, niha bibihîzin deng û behsên teze* dest pê dikir. Radyoya Rewanê, ji bo gelek dengbêjan bû firsend ku stranên xwe lê îcra bikin. Gelek dengbêj bi saya radyoyê li her aliyê Kurdistanê hatin guhdar kirin û zanîn. Ji wê radyoyê dengbêjên wekî Şibliyê Çaçan, Werda Şemo, Asa Evdîle, Xana Zazê, Beqiya Qadir, Susika Simo, Eyşe Şan, Fatma Îsa, Meryem Xan, Aslîqa Qadir, Zadîna Şakir, Karapetê Xaço, Şeroyê Biro, Efoyê Esed, Ahmê Çolo, Egîdo Cimo, Aramê Tîgran, M. Arifê Cizîrî, Seyadê Şamê, Hemîdê Mecîd, Feyzoyê Rizo û gelek dengbêjên din, dengê xwe bi riya radyoyê gihandin kurdan û bandoreke gelek mezin jî li ser kultura kurdî kirin.²³⁶

Her çend di nav hevkeşeyên siyaseta dewletan de wekî amûreke propagandayê hatine bi kar anîn jî, Radyoya Urmiye û ya Bexdayê jî di kultura kurdan û hunera dengbêjiyê de encamên gelek girîng derxistine holê. Li Bexdayê di sala 1939ê de, repertuareke mezin û gelek stranên dengbêjan ji aliyê rêvebirên radyoyê ve hat arşivkirin. Dengbêjên ku di wir de stran digotin, ji aliyê radyoyê ve dihatin parastin û ev yek ji bo wan dengbêjan wekî şanaziye dihate qebûl kirin. Meryem Xan (1904-1949) piştî ku dibihîze şîrketên îngilîz li Radyoya Bexdayê hîmayeya dengbêjan dike, dengê wan qeyd dike, ew jî serî li radyoyê dide û tê qebûl

²³³ Amir Hasanpour, b.n. r. 411-442

²³⁴ Wezîrê Eşo, *Radyoya Yerîvanê*, Kovara Nûdem, j. 16, 1995, r., 46

²³⁵ Hasanpour, h.b., r.428

²³⁶ A. Erkmen, h.b., Gulan 2011

kirin.²³⁷ Wekî hemû radyoyan li radyoya Bexdayê jî tesira rejîma BAAS'ê li ser huner û musîqeya kurdî hebû. Şîareke weşanê hebû û dengbêjên lê stran digotin û bernameyên ku dihatin kirin, divê zirar neda rejîmê û “li dijî biratiya kurd û ereban” bername nehatiba kirin. Di nav stranbêjên wê radyoyê de Mihemed Arif Cizrawî (1912-1986), Mihemed Şêxo (1948-1989), Meryem Xan (1904-1949) Eyşa Şan (1938-1996), Tehsîn Taha (1941-1995), Hesên Cizrawî (1917-1983), Îsa Berwarî û Kawîs Axa (1889-1936) dengbêjên herî bi navûdeng bûn.²³⁸ Rêvebiriya Radyoya Bexda û yê Rewanê bi destûra Moskovayê, stranên dengbêjan ji hevdu re dişandin. Danûstendineke musikî di navbera wan de çêdibû, dengbêjên wekî Kawîs Axa, Ayşe Şan û Mihemed Arif Cizrawî yê Radyoya Bexdayê di Radyoya Rewanê de jî dihatin gotin.²³⁹

Çawa ku piştî têkçûna mîrektiyên dengbêjên serayê, ji sistemeke hîmayeyê mehrûm man piştî ku radyo hatin girtin jî ev dengbêjên ku di radyoyan de stranên xwe digotin jî di nav kêşeyên jiyana û xizaniyê de man û çî kesî nikaribû debara xwe bike. Gelek ji wan jî ji xizaniyê û tunebûnê di kuçeyan û kolikên xwe de wefat kirin. Dengbêj Meryem Xan jî, gelek xizmetkarî bo radyoya Bexdayê kir lê, piştî ku ew dimire, hemû stran û berhemên wê, nehatin parastin û plakên wê di arşîvên radyoyê de rizîyan.²⁴⁰

Wekî di beşên pêşî de hat diyarkirin û wekî Dustin Griffin gotiye, sistema patronajê, sistemeke dualî ye û li ser esasên berjewendiyên her du aliyan tê avakirin. Lewma jî heta dereceyekê sistemeke ekonomîk e. Her çend patron bi deng û hunera şair û hozanan, hegemonyaya xwe qewî bike jî, şair û dengbêj jî, bi îmkân û firsendên patronan, hunera xwe, dengê xwe belav dikin. Ev yek di nimûneya radyoyan de jî bi heman awayî qewimiye. Di geşedana vekirina Radyoya Rewanê de, berjewendiyên sistema Sovyetê, bi dengê rewşenbîr û dengbêjan qewî bûye. Her çend sistema Kevnesovyetê li dijî fikr û îdeolojiya kurdewariyê be jî, bo berjewendiyê xwe her alîkarî daye vê yekê. Dîsa di meqaleya xwe de Wezîrê Eşo, ji bo encamên vekirina radyoya Yêrêvanê, van tiştan dibêje:

“Bi saya radyoyê, pir stranên kurdî xasma yê folklorî, ji wendabûnê xelas bûn, çimkî niha stranbêj û sazbandên kurd yê hosta û zane, hema hema nemane. Bi xêra radyoyê îro deng û seda van stranbêjên hêja ji gelê me ra wek milkê kultura wî ya zengîn û bilind maye. Şeroyê Biro, Efoyê Esed, Reşîdê Baso, Mamê Kurdo, Hsîq Nazûk, Memoyê Silo, Şibliyê Çaçan, Egîdê Têcir, Sehîdê Şamedîn, Karapetê Xaço, Aramê Tîgran, Xemo û ên din... Lê çiqas stranên kurdî ên xweş û şîrîn bi bilûr meiya û zurna Taharê Emer, Xelîlê Evdile bûne milkê

²³⁷ Dicle Yıldız Katar, b.n., r. 75

²³⁸ Berhevkar, Nevzat Çelebi, Vedat Yıldırım, Aytekin G. Atas, *Geleneksel Kürt Müziğine Genel bir Bakış*, (http://www.bgst.org/muzik/yazilar/geleneksel_kurt_muzigi.asp) (05.04. 2012)

²³⁹ Hevpeyvîn digel Tîmûrê Xelîl, Ali Ağcakulu, h.b., r. 91

²⁴⁰ D.Yıldız Katar, b.n., r. 80

gelê mey ê heta hetayî. Xasma salên dawî me pir stran û leylanên kurdî ji welatên derva bi cure kasêtan stendin û fonda me bi dengê Mehemed Arif Cizrawî, Hesên Arif Cizrawî, Şivan Perwer, stran û leylanên koma Berxwedan dewlemend bû. Çovek sînorê bihîstina weşanê kurdî ji Yerîvanê pir fire ye; hemû cumhuriyetên Yekitiya Kevnesovyetê welatên rojhilata nêzîk û navîn, dikevin navbera wî sînorî me zanîbû ku dengê me digihîje hemû kurdan û vê yekê em şa û ruhdar dikirin.”²⁴¹

Ev pasaja ku ji Wezîrê Eşo hatiye wergirtin, bo têgehiştina wê meseleya patronajê ku bi tenê li ser berjewendiyên aliyekî pêk nayê, bo nimûneyên gelek babetên cuda jî muhim e. Yekîtiya Kevnesovyetê bi vekirina Radyoya Rewanê ve xwestiye ku millet û gelên cîran, bibin dost û alîgirê rejîma Sovyetê. Lê wekî encam, ev meram pêk nehatibe jî, li radyoyê gelek dengbêj hatine hewandin, gelek rewşenbîr, wêjenas û muteberên kurdan, bi saya radyoyê debara xwe kirine. Zimanê kurdî, kultura kurdî, kelepîra kurdî, bi radyoyê belavî gelek der û deverên cur bi cur bû. Bernameyên radyoyê, programên mûsîqeyê ji paytextê Ermanîstanê belavî her aliyê Kurdistanê bûn.

2.4.4. Dezgeheke Dengbêjan: Mala Dengbêjan

Wekî di beşa yekem de jî hat gengeşekirin, hunera dengbêjiyê, ji aliyê lêkolîneran ve wekî bingeha kultura kurdî hatiye qebûlkirin û ev nêrîn îro jî bi hewldanên avakirina nasnameya kurdî ve hindê encamê kulturî derxistine meydanê. Lewma jî avakirina Mala Dengbêjan, bi referansên arkaîk, wekî *parastina kultura qedîm*²⁴² pêk hat û bi prosesa nasnameya kurdî re eleqedar e. Di vê beşê de jî, avakirina Mala Dengbêjan, dê di warê patronajê de were vekolandin û ew faktorên ku di vekirina van dezgehên de karîger bûne, dê were gengeşekirin. Dîsa di avakirin û rêvebirina van dezgehên de rexê aborî, analîza performansê dengbêjan, veguherîna wê kulturê ya berew dezgehên dê were nirxandin. Her wisa dê çalakiyêke aîdî Mala Dengbêjan di peywendaya patronajê de û veguherîna kultura dengbêjiyê were hilsengandin û cudahî û wekhevîyên wan dê were kifşkirin.

Mala dengbêjan wekî projeyêke kulturî, bi hevkarîya saziyên kurdî û dezgehên fermî yên dewleta Tirkîyeyê, di bin banê Navenda Kultura Firat-Dicle'yê de hate vekirin.²⁴³ Cara yekemîn di sala 2007an de bi finansêkirina Şaredariya Diyarbekirê, ji aliyê Odeya Mîmaran a Diyarbekirê ve bi restorekirina xaniyekî tarîxî û kevir tê vekirin.²⁴⁴ Mala Dengbêjan di serî de

²⁴¹ Eşo, h.b, r. 47

²⁴² Tradîsyona dengbêjiyê, di rûpela fermî ya Şaredariya Diyarbekirê de jî wekî kultureke qedîm tê nirxandin û aliyê wê yê arkakîk tê destnîşan kirin. http://turizm.diyarbakir.bel.tr/tr/s/Dengb%C3%AAjler_Evi (22:04.2012)

²⁴³ Clémence Scalbert Yücel, *The Invention of a Tradition: Diyarbakir's Dengbêj Project*. Kovara European Journal of Turkish Studies, j. 10, 2009 (<http://ejts.revues.org/4055>) (22.07.2012)

²⁴⁴ *Antolojiya Dengbêjan/Dengbêj Antolojisi/ The Antologie of Dengbêj*, Tirkîyede Kültürel Hakların Desteklenmesi Kültürel Girişimler Hibe Programı (CISGS) Dengbêj ve Dengbêjlik Projesi, Ed. Davut Özalp, r. 9

li Diyarbekirê tê vekirin û piştê li her bajarên bakurê Kurdistanê belav dibe. Niha li gelek bajar û navçeyan, di bin banê navendên kulturê û komelayên curbicur de tê îdarekirin. Li wan bajaran cihên ku ji bo Mala Dengbêjan hatiye tesîs kirin, nemaze xaniyên tarîxî û qedîm in, lewre jî di vekirina wan malan de referanseke arkaîk, diyar dibe. Xaniyê ku ji bo Mala Dengbêjan a Diyarbekirê hatiye tesîs kirin, xaniyekî 100 salî ye, du odeyên wî yên mezin û hewşeke wî yê berfireh heye. Bi tenê ne li Diyarbekirê, her wisa li bajarên din jî, cihên qedîm û qesr û qonaxên mîrasa mîr û axayan, ji aliyê Şaredariyan ve tê kirin û wekî Mala Dengbêjan tê bikaranîn.²⁴⁵ Bernameyên Mala Dengbêjan, *Dîwana Dengbêjan* e û ew dîwan ji bo nîşandana performansa dengbêjan û pêşkêşkirina hunera dengbêjiyê çalakiyê sereke ye.

Wekî radyoyan yek ji cîgehê hîmayekirinê ya modern Mala Dengbêjan e. Her çend di vekirina Mala Dengbêjan de tesira dezgehên curbicur û yên fermî hebin jî, çarçoveya Mala Dengbêjan a kulturî û civakî ji aliyê şaredariyan ve tê kifşkirin û referansên siyasî di rêvebirina wan dezgehên de xwedî tesir e. Mala dengbêjan bi taybetî piştî salên 2000an, di destpêkê de ji bo “parastin û pêşvebirina zimanê kurdî” ketiye rojeva rewşenbîrên kurdan, dezgeh û şaredariyan. Bingeha vekirina wan dezgehên xwe dispêre qanûna parastina ziman û kulturê “herêmî”. Di rêvebirina karûbarê Mala Dengbêjan de, gelek çavkanî hene ku fînansekirina wan pêk tînin. Dewlemendên kurdan, budçeyên şaredariyan, alîkariya gel û hîbeyên Yekîtiya Ewropayê ji bo îdarekirina Mala Dengbêjan, çavkaniyên sereke ne. Hejmara dengbêjan a di Mala Dengbêjan de, ji hev cuda ye, li şax Mala Dengbêjan a Diyarbekirê bi taybetî 30 dengbêj hene û jê pê ve di her roj 10-15 dengbêj ji bo serdana wê têne wir û hunera xwe li wir îcra dikin. Lê di festîval û hinde seyranan de car caran hejmara wan dengbêjan digehê 30 û jê zêdetir dibe.²⁴⁶ Ji bilî wê hin şaxên Mala Dengbêjan, ji ber ku hunera dengbêjiyê wekî bingeha kultura kurdî dinirxînin û veguherîna vê kulturê wekî têkçûna kultura kurdî dibînin, ji bo ku ev kultura dengbêjiyê wenda nebe, bangewaziyê bo dengbêjan dikin.²⁴⁷

Bi projeya Mala Dengbêjan, parastineke modernî di kultura kurdî de û di çarçoveya patronajê de derdikeve holê. Bi van projeyan hem sîstema patronajê, hem jî kultura dengbêjiyê vediguhere û reng û temayeke modern û heta dereceyekê jî siyasî lê bar dibe. Dengbêjên ku bi awayekî di Mala Dengbêjan de stranên dibêjin, wekî hefizeya civaka kurdan têne qebûlkirin û mirov dikare bibêke ku, bi avakirina Mala Dengbêjan ve, hefizeya kolektîf a

²⁴⁵ Li Cizîrê, Qesra Mehmed Axa, qesreke 200 salî ye, ew ji aliyê Şaredariya Cizîrê ve, ji neviyên Mehmed Axa bi 240 hezar TL tê kirin. Qesra ku niha wekî Mala Dengbêjan tê bi kar anîn, 1165 metrekar ye 2 qatî ye û cihekî qedîm e: <http://www.yuksekovahaber.com/haber/cizrede-dengbj-evi-acilacak-41763.htm> (23.07.2012)

²⁴⁶ http://turizm.diyarbakir.bel.tr/tr/s/Dengb%C3%AAjler_Evi (22.04.2012)

²⁴⁷ <http://www.yuksekovaguncel.com/kultur-sanat/dengbjler-evinden-genclere-cagri-h31043.html> (03.05.2012)

kultura kurdî xwe nûjen dike û xalên hevpar ên di avakirina nasnameya kurdî de her belav dike. Her wisa ji ber ku referansên arkakîk di vê proseyê de zêde tîk bikaranîn, dengbêjiya klasîk a ku me di beşên pêş de wekî dengbêjên qesr û serayan bi nav kiribû jî xwe nûjen dike.²⁴⁸

Ji ber ku di serî de maneyeke arkaîk li projeya Mala Dengbêjan tê barkirin, hinde dezgehên Tirkiyeyê, yê wê wekî Wezareta Kulturî (Rewşenbîrî) bi awayekî aşkera alîkarî û piştgiriya wan dezgehan kiriye.²⁴⁹ Ev di dîroka kultur û dîroka kurdî û pêwendiya wê ya bi rejîma Tirkiyê de tiştêkî nû ye. Diyar e ku, bandora prosesa Yekîtiya Ewropa'yê li ser vê yekê gelekî çêbûye û ew tişt xwe dispêre wê yekê. Ji bilî faktera YE (Yekîtiya Ewropa)'yê dem û dezgehên kurdî di geşedana prosesa vê programê, maneya vê kulturê berfirehtir kirine. Bi vê projeyê her çend fermî nebe jî, dewleta tirk bi awayekî nîv fermî dezgeheke nêzî hereketa kurdan a siyasî jî qebûl kiriye. Her wisa, hin bername û *Dîwana Dengbêjan*, di TV'yên kurdî de tîk weşandin û hin çalakîyên dezgehê jî di bin banê Navendên Kulturî de tîk pêşkêş kirin.

Bi avakirina Mala Dengbêjan ve kultureke kurdî, ji bêyî îmkânên dewletbûnê, gehîştîye merheleyeke dezgehbûnê û mîrasa kultura kurdî, bi motîvasyonê parastina kulturê bûye dezgehek. Ji ber ku qedexekirina kultur û zimanê kurdî wekî qedexekirina nasnameya kurdî pêk hatiye, hewldanên bi vî teşebîsê cuda derxistine holê. Bi vekirina Mala Dengbêjan, polîtîkayên dewleta tirk a kulturkuji û zimankujîyê ji qonaxekê derbasî qonaxekê dîtir bûye tundiya wan polîtîkayan di dema nêzîk de hêdî hêdî sist bûye. Bi tenê ne avakirina Mala Dengbêjan, her wisa vekirina hin kanalên kurdî yê wê wekî TRT6, Dunya Tv jî ev siyaseta dewleta tirk xwe diyar dike. Lewma jî dema ku mirov di bingeha van projeyan dinihêre, mirov dibîne ku, dewlet sehaya kultur û hunerê vedike û bi vekirina van sehayan daxwazên siyasî difetîsîne. Di van nimûneyan de jî xuya ye ku, daxwaza mafên kurdan a civakî ji konteksta wê ya kolektîfî tê derxistin û wekî daxwazeke şexsî tê pêşkêşkirin.²⁵⁰

Ji ber ku saziyên ku kultur û hunera dengbêjiyê diparêzin û diafirînin, pirr kêmtir in, ew kesên ku wekî dengbêj tîk binavkirin, di nav zehmetiyên jiyanî de dijîn û daxilbûna wan a Mala Dengbêjan jî li ser vê esasê ava dibe. Feqîrî; kêşeya wan dengbêjan a herî mezin e. Li wir dengbêj hem tîk hîmayekirin û hem jî tîk perwerdekirin.²⁵¹ Ew faktorên ku dengbêjan

²⁴⁸ Di vekirina Mala Dengbêjan a şaxa Agiriyê de referansên Evdalê Zeynikê tê bi kar anîn û ji ber ku Evdalê Zeynikê ji Agiriyê ye, Agirî wekî çavkaniya dengbêjiyê tê pêşkêş kirin: <http://agrihalk.com/agrida-bir-ilk-mala-dengbeja-acildi/> (07. 10.2013)

²⁴⁹ Clémence Scalbert, Yücel, h.b, (<http://ejts.revues.org/4055>)

²⁵⁰ Harun, Ercan, *Şeş û Yek: Kürt Meselesi, Gülen Cemaati ve Bir Karşı Propaganda Girişimi Olarak "Tek Türkiye" Dizisi*, Kovara Toplum ve Kuram, j. 2, 2009, r. 109-130

²⁵¹ Clémence Scalbert Yücel, h.b.

daxilî nav banê Mala Dengbêjan dike an jî mirov dikare bibêje fonksiyona wan çalakiyan, li ser esasekî parastina kulturê hatiye danîn. Anku, hereketa kurd û rewşenbîrên kurdan di warê kurdîfikasyonê de ew dengbêjên beşdarî hinde çalakiyên Mala Dengbêjan dibin û ew dengbêjên yekser li wê derê wekî “memûrekî” kar dikin, qanî kirine ku, dengbêjî hem kultura kurdî ya qedîmî ye û hem jî, aliyê kultura kurdî ya romantîk temsîl dike. Her wiha, bajarîbûn û terka gundan, zêdebûna îmkanên teknolojiyê, yên wekî televîzyon û amûrên wê yên cuda, formên musîqeyên kurdî yên cudatir meyla bo dengbêjiyê pirr kêr kir.²⁵²

Mala dengbêjan îro jî, hin çalakiyên dengbêjiyê yên wekî “şevbihêrk”ê didomîne û di avahiyên de ew çalakî dîsa jî tîr berdewamkirin. Wekî demên beriya modernîzmê ku li qesr û qonaxên giregirên kurdan de ew çalakî pêk dihatin, ew kultur îro jî di Mala Dengbêjan de tê berdewamkirin, lê bi hin teşe û temayên veguherî ve. Li Mala Dengbêjan, çalakiyên curbicur tîr îcra kirin û bi piştî vekirina wan, komên dengbêjan hatin avakirin û ew kom di gelek çalakiyên hunerî, kulturî û civakî de hunera xwe îcra dikin, di seyran û festîvalan de jî ew kultur tê afirandin. Bo nimûne, Şaredariya Batmanê bi navê Mala Dengbêjan ya Karapetê Xaço maleke dengbêjan a nû ava kir û li wir hinde kokteyl jî hatin dayîn. Şaredariya Batmanê, di Hefteya Seqetan (Engelliler Haftası) de li Mala dengbêjan bi beşdariya gelek dem û dezgehên kurdî, dezgeh û komên polîtîk ew çalakî lidarxist.²⁵³ Di bin banê Mala Dengbêjan de ji bilî dîwana dengbêjan, CD’yên bernameyên dengbêjan tîr qeydkirin, antolojiyên stranên wan tîr hazir kirin û konser tîr organîzekirin.²⁵⁴

Di Mala Dengbêjan de ji bilî dengbêjên mîr, dengbêjên jin jî di îcrakirina vê kulturê de xwedî wezîfeyekê ne. Dema ku mirov li hunera dengbêjiyê ya klasîk dinihêre, şert û mercên civaka kurdan, ji bo performansa dengbêjên jin hin astengiyên esas derxistine holê û di nav civakê de dengbêjên jin nikaribûne hunera xwe îcra bikin.²⁵⁵ Bi avakirina Mala Dengbêjan ve ev taybetmendîya civakî û hunerî tê guherandin û gelek dengbêjên jin jî di van saziyan de stranên xwe yên dengbêjiyê dibêjin û hunera xwe îcra dikin. Mala Dengbêjan a ku di bin banê Navenda Kultura Mezopotamyayê ya Wanê de hatibû vekirin, bi dengbêjên jin ve çalakiyên kulturî pêk tîne û her wisa di rojên wekî 8ê Adarê yên wekî Roja Cîhanî ya Jinan de

²⁵² Clémence Scalbert Yücel, h.b.

²⁵³ <http://www.pirsushaber.com/batman-belediyesi-engellilere-kokteyl-verdi-373368n.html> (16.05.2012)

²⁵⁴ Bnr. *Antolojiya Dengbêjan/Dengbêj Antolojisi/ The Antologie of Dengbêj*, Tûrkiyede Kûltûrel Haklarm Desteklenmesi Kûltûrel Girişimler Hibe Programı (CISGS) Dengbêj ve Dengbêjlik Projesi, Ed. Davut Özalp

²⁵⁵ Ayşe Şan û Meryem Xan a dengbêj, ji ber astengiyên civaka kurd a ku karakterê wê patriarkal e, nikaribûne di nav cîmaetê de hunera xwe îcra bikin û tûşî gelek kêşeyên civakî bûne. Derbarê wan arîşeyan de teza Dicle Yıldız Katar, nimûneyên balkêş nîşan dide. Bnr. Dicle Yıldız Katar, b.n.

bizavên hunerî pêk tînin. Bi vekirina Mala Dengbêjan ve rola jinê ya civakî jî vediguhere û di afirandina hunera dengbêjiyê de jin jî xwedî mîsyon dibin.²⁵⁶

Patronaja ku îro li Mala dengbêjan ku mirov bi hin taybetmendiyan xwe ve modernîze dibe, ji kultura dengbêjiyê ya demên pre-modern cudatir e. Ev cudahî, hem di warê patron/hamî, hem di warê dengbêjan û hem jî di warê temayên dengbêjiyê de guheriyê û geştiye qonaxeke dîtir. Helbet gelek faktor bûne sedema vê yekê, lê dema ku mirov sedemên wê dinihêre, diyar e ku di çêbûn û belavbûna kulturekê de dînamîka desthilatiyê xaleke girîng e. Her wiha di guherîna vê kulturê de, nosyona kulturî jî xwe li gor şert û mercên zemên ên dînamîk ji nû ve ava dîke. Bi pêşveçûna îmkânên teknolojiyê û karîgeriya nivîs û çapxaneyê ev proses di sedsala dawî de babetên huner û kulturê bi leztir guherand.

Dîwaneke dengbêjan a ku di bin banê Mala Dengbêjan hatibû li dar xistin, ji bo têgehiştina vê projeyê û veguherîna kulturê hin taybetmendiyan esas nîşanî me dide. Di vê tabloya li jêr de, berawirdkirina dîwaneke dengbêjan a modern û şevbihêrkeke klasîk, li dor materyal û çavkaniyan berdest hatiye kirin û cudahiyan wan hatiye destnîşankirin.

²⁵⁶ <http://www.tigrishaber.com/dengbej-kadinlar-kurt-tarihini-okuyor-4655h.htm> (05.03.2013)

Berawirdkirineke Dîwana Dengbêjan û Şevbihurkên Klasîk

	Dîwana Dengbêjan a Klasîk	Dîwana Dengbêjan a Modern
Cih	Dîwanxane, Qesr, Qonax, Ode	Salon
Patron	Mîr, Axa, Beg, Şêx	Bazirgan, Siyasetmedar
Beşdarî	Vexwendin, Dawet	Bilêt
Hejmara dengbêjan	Derbarê hejmara dengbêjên qesran de çî agahiyên esas tune di dest me de, lê li gor hin çavkaniyan û tabloyên Şerefnameyê, di qesr û qonaxan yek û ji yekî zêdetir dengbêj cih girtine.	Di çalakiyên curbicur de hejmara dengbêjan zêde dibe. Hin festîvalan de hejmara wan dibe 45 jî. ²⁵⁷ Lê di vê bernamêyê de 7 dengbêj beşdarî dîwanê bûn.
Enstruman	Hindî em dizanin û di çavkaniyan de jî xuya dibe, bikaranîna enstrumanan, li gor cografya û cudahiya kulturê diguhure. Di tabloyên Şerefnameyê de bilûr û tembûr hatiye resm kirin. Dengbêjên ku enstruman bi kar neanîn e jî hene.	Amûrên modern ên wekî mîkrofon, kamera, projeksiyon, org û yên wekî tembûr, bilûr, fiq û zirne jî hatiye bikaranîn.
Tema	Hindî em ji belgeyan dizanin û di tezê de jî hate gengeşe kirin, di şevbihêrk û meclîsên mîr û axayan de cureyên stranên cuda jî hatine gotin, lê stranên epîk, mêrxasî an jî stranên rûniştinê di van cimaetan de hatine gotin.	Di dîwana dengbêjan de cureyên stranên cuda tên gotin. Stranên <i>dilan</i> , <i>epîk</i> , <i>govend</i> , <i>têkel</i> û stranên <i>siwarî</i> (strana Îsmailê Min)

Ev tabloya li jor li dîwaneke dengbêjan ku 8ê nîsana 2012ê li bajarê Stenbolê li Salon Fîgaro ya Çağlayanê hatiye lidarxistin. Dengbêjên ku beşdarî vê çalakiyê bibûn, di bin banê Mala Dengbêjan de cih digrin û bernamêya vê çalakiyê ji aliyê Mala Dengbêjan ve hat dirustkirin. 7 dengbêj beşdarî vê çalakiyê bûn û performansa wan wekî komeke dengbêjan pêk hat û mirov dikare vê yekê wekî *koro* jî bi nav bike. Di pêkanîna çalakiyê de, referansên arkaîk ji bo hunera dengbêjiyê taybetmendiyê sereke bû. Qedîmbûna hunera dengbêjiyê, motîvasyoneke esas li ser beşdarvanan jî kir. Ji ber ku Mala Dengbêjan di bin banê şaredarî û navendên kulturê de cih digire, di dîwana dengbêjan de peyamên siyasî jî ji aliyê dengbêjan ve hat dayîn. Dengbêjên ku beşdarî wê çalakiyê bûn, ji aliyê navenda kulturê û destheqê

²⁵⁷ <http://www.yuksekovaguncel.com/kultur-sanat/dengbjler-evinden-genclere-cagri-h31043.html> (03.05.2012)

bilêtan hate fînansekirin. Lê ji bilî wê, hin bazirganên dewlemend jî di îcrakirina çalakiyê de alîkarî kirin.

Analîzên vê çalakiya Mala Dengbêjan, ji bo têgehiştina veguherîna hunera dengbêjiyê hin taybetmendiyan esas destnîşan dike. Mirov dikare van veguherînan, wekî guherînen *tematîk* û guherînen *teşeyî* bi nav bike. Di îcrakirina vê çalakiyê de, hunera dengbêjiyê, digel referansên xwe yên *arkaîk*, hin taybetmendiyan *rojane* jî aşkera kir. Her wisa, bi hin axaftinên dengbêjan, karektereke siyasî jî di vê çalakiyê de diyar bû. Hin rûdanên siyasî, pêkutiyên dewleta tirk a li ser siyasetmedarên kurdan jî ji aliyê dengbêjan ve hatin rexnekirin. Referansên Qetlîama Roboskî,²⁵⁸ di seranserê çalakiyê de ji aliyê dengbêjan ve hat kirin û hin stranên ku ji bo wê qetlîamê hatibûn honandin jî hatin xwendin. Ew tabloya li jor diyar dike ku, şêweya patron çî qas biguhere jî, sîstema patronajê bandora xwe li ser tema û teşeyên kulturê dike. Bi tenê ne di vê nimûneyê de, ev yek karakterê afirandina hunerê bi xwe ye.

Wekî di beşa *cîgehên hîmayekirinê* de jî hat destnîşankirin, di îcrakirina hunerê de, cihê ku huner lê tê îcrakirin xaleke girîng e. Ya yekemîn, divê ew cih berfireh bin ku gelek kes bikaribin beşdarî çalakiyê bibin û ya din jî, divê ew mekan taybetmendiyeke kultureke pêşketî nîşan bidin. Çawa ku di dema dengbêjiya klasîk de, cihên ku dengbêjan lê stran digotin, qesr û qonax û odayên axayan bûn, ev çalakiya dîwana dengbêjan a Mala Dengbêjan jî saloneke berfireh ku 300 kes beşdar bibûn û ciheke modern û taybetmendiya kultureke pêşketî nîşan dida. Di îcrakirina hunera dengbêjiyê de, ev taybetmendî, veguherîna cîgehên hîmayekirinê jî destnîşan dike. Salonên ku gelek çalakiyên civakî lê pêk tên, di îcrakirina hunera dengbêjiyê de jî heman wezîfeyê dibîne. Lewra jî mirov dikare bibêje ku, guherîna hunera dengbêjiyê ne bi tenê di warê nosyonên kulturî de, her wisa di warê mekanê de jî xwe aşkera dike.

Di vê çalakiyê de rolên patronan jî li gor dînamîkên civakî û siyasî veguheriyê. Di dengbêjiya klasîk de, kesên ku ji hunermend û edîban re hamîtî dikirin, mîr û axayên ku xwedî pozîsyoneke îdarî bûn û hikmê wan li ser herêma û kategoriyên eşîran bû. Lê berovajî wê, di nimûneya Mala Dengbêjan de pergala patronajê û patron bi xwe jî bi awayekî esas veguherî. Hunera dengbêjiyê hate qonaxeke dezgehî bûnê û hîmayeya wan jî ji aliyê wê saziyê ve tê kirin. Lê ji ber ku saziyên wekî Mala Dengbêjan, di bin hîmayeya saziyeke wekî dewletê de nîn in, di fînansekirina dengbêjan de bazirgan û gel bi xwe jî rolekê werdigrin. Di vê çalakiya dîwana dengbêjan de jî, hin bazirgan, di organîzekirina çalakiyê de cih girtin. Ji bilî

²⁵⁸ Di 29ê Berfanbara 2011an de, li bajarê Şernexê, li navçeya Qilabanê û gundê Roboskî, 34 gundî, ji aliyê balefirên artêşa tirk ve hatin kuştin. Ev qetlîam, di nav civaka kurdan de bû sedema bertekên mezin û di hefizeya civaka kurdan de cihekî mezin girt. Dengbêjên ku di bin banê Mala Dengbêjan de hunera xwe îcra dikin jî, ev rûdana ku di hefizeya civaka kurd de cihekî mezin digire, di vê çalakiyê de ew ji nû ve afirandin.

alîkariya dezgehan, firotina bilêtan jî di rêvebirina çalakiyên bi vî rengî de wezîfeyeke muhim werdigre. Lê divê ev jî were destnîşankirin ku, çalakiyên kulturî yên bi vî rengî bi tenê wezîfeyeke kulturî pêk naynin, her wiha ew di mobîlîzekirina civakî de jî, di înaşkirina hefizeyeke kolektîf de jî bizavên girîng in.

Di vê dîwana dengbêjan de 7 dengbêj wekî koroyekê ev çalakî pêk anîn û di merheleya veguherîna hunera dengbêjiyê de, ev xal, xaleke girîng e. Çimkî di dengbêjiya ku wekî *klasîk* hate bi nav kirin de, afirandike şexsî derdikeve pêş. Anku, dengbêj bi berhemdariya xwe ya şexsî ve layiqî pesn û payeya civak û patronan dibû. Lêwma jî di merkeza afirandina hunerê de wekî şexs dengbêj bi xwe hebû. Lê di vê nimûneya dîwana dengbêjan de dengbêj wekî koro daxilî nav çalakiyê bûn û ev yek destnîşan dike, îro di halê heyî de, dezgehbûna dengbêjiyê, afirandineke kolektîf derdixe pêş.

Wekî di beşên pêş de jî hatibû gengeşekirin, di hunera dengbêjiyê de bikaranîna enstrumanên hunerê, li gor cografya û cudahiya kulturî curbicur in. Li her devereke Kurdistanê dengbêjên ku hunera xwe îcra dikin, enstrumanên cuda bi kar dînin. Gelek dengbêjan, di afirandina hunera dengbêjiyê de çî enstruman bi kar neanîn e. Di dengbêjiya klasîk de, bo nimûne li gorî tabloyên hunerê yên *Şerefnameyê*, di meclîsa mîran de, hozan û sazbandên ku li qesran hunera xwe pêşkêşî patron dikirin, enstrumanên wekî tembûr û bilûr bi kar anîne. Di vê çalakiya Mala Dengbêjan de, dema ku mirov li enstrumanên hatine bikaranîn dinihêre, diyar e ku guherîna kulturê û geşedanên teknolojiyê, tesira xwe li ser enstrumanan jî kiriye. Ji bilî bilûr û tembûrê, org, fîq, zirne jî ji aliyê dengbêjan ve hat bikaranîn. Her wisa, kamera, mîkrofon û projeksiyon jî di pêşkêşkirina hunera dengbêjiyê de, hate bikaranîn. Di vir de diyar e ku her çend ev kultur vî navî li gor tradîsyonê wergirtibe û referansên arkaîk an qedîm werin dayîn jî, guherîna kulturê û pêşketina teknolojiyê jî rengê xwe li vî hunerê dide.

Di navbera temaya dengbêjiya klasîk û ya ku ji aliyê Mala Dengbêjan ve hatiye li dar xistin de, hin cudahî û wekhevîyên esas derdikeve pêş. Di dengbêjiya klasîk de, dengbêj li gor rûdanên li derdora patron diqewime stran an hikayetên xwe dihonin. Têkiliyên di navbera eşîran de rû didin, ji aliyê dengbêjan ve tî afirandin. Lewma jî di afirandina dengbêjiya klasîk de stranên epîkê zêdetir ji aliyê dengbêj ve tî afirandin. Helbet di vir de gelek faktorên cuda hene, lê ji bo ku dengbêj layiqî înayeta patron bibe, divê stranên xwe di nav atmosfereke gernasiyê de biafirîne. Berovajî wê, di vê dîwana dengbêjan de, stranên ji hev cuda û temayên curbicur hatin afirandin. Stranên dilan, lehengî, govendî, siwarî (Îsmailê Min) û yên tîkel di kompozîsyona dîwanê de hatin pêşkêşkirin. Her wisa, ji bilî stranên tarîxî, rûdanên siyasî jî bû mijara çalakiyê. Dengbêj Zahiro, derbarê qetlîama Roboskî de stranek afirand û nimûneya hefizeya kolektîf a ku xwe dispêre tecrubeyên hevpar dirust kir. Dema ku mirov di warê

temayê de cudahî û eynîyeta dengbêjiya klasîk û ya Mala Dengbêjan dinihêre, têkçûna cureya epîkê, bi awayekî zelal aşkera dibe. Di vir de helbet tunebûna hamiyekî wekî mîr/beg/axa jî xaleke girîng e.

Di sîstema patronajê de ji bo îcrakarên hunerê bo nimûne jî ji bo dengbêj tiştêkî girîng heye ku divê were destnîşankirin. Ji ber qelsbûna sîstema hîmayeyê û şert û mercên dengbêj ên jiyane di têkiliyên wan û patronan de car caran dibe sedema bêrûmetiyekê. Dema ku dengbêj, ji bo patron (mîr/partî/axa/dewlemend) stranên dibêjin û beramberî wê daxwazeke maddî dikin, di nezera patron de pirr bêrûmet jî dibin. Piştî têkçûna sîstema patronajê, jiyana gelek dengbêjan di nav xizanî û belengaziyê de derbas bû. Lewma jî ev rewş di afirandina hunera wan de jî xwe nîşan kir. Bo nimûne ev yek di straneke dengbêj Keremê Kor de bi awayekî zelal diyar dibe:

“Ez dibêjim vê kilamê sewa (ji bo) we,
Êdî destê we ser wicdana we.”²⁵⁹

Di vir de dengbêj bi awayekî aşkera tiştêkî daxwaz nake. Lê çavên wî her li destên patron û dewlemendan e. Ev yek ji bo dengbêj dibe egera bêrûmetiyekê jî. Di têkiliya huner û desthilatîyê de hêviyên patronajê gelek caran tesira xwe li ser berhemê bi xwe jî dike. Her çend ev yek di lîteraturê de wekî tiştêkî tabî’î were dîtin jî, ji bo hozan/edîban wekî şermê tê qebûl kirin. Ji ber ku çalakiyên huner û kulturê heta niha di bin hikmê desthilatîyê de dermale bûne, di her cureyê huner û kulturê de dîtina şopên hegemonyayê pêkan e. Li her der û deverê cîhanê, hunermend, hozan, şair û edîb û ressam, di bin kontrola kî an çî de bin, şêweya hîmayekirinê jî car û bar bi vî awayî encam derxistine.

“Di heman dewra li Ewropayê, gelek nimûneyên ku vê yekê îspat dikin jî hene. Bo nimûne, ew hêjayên hunerê ku wekî *Michelango, Raphael, Titian, Da Vinci, Holbein, Shakespeare, Mozart, Bach*, yek û yek û bi awayekî aşkire girêdayî kral bûn, ew her û her ji bo serayê jî xebîtî û ketin bin xizmeta wan kesên ku di siyaseta wê demê xwedî hêz û şiyane bûn. An jî wan bi hîmayekirina hindê malbatên dewlemend ên wê demê, hunera xwe îcra kirin. Li Floransaya dema ronensansê, patronajîya hunerê, bi destê wan kesên arîstokrat hatiye kirin. Ew kesên esilzade bi tenê patronajîya hunerê nekirine, her wiha bi awayekî aktîf di nav çalakî û fealiyetên kulturî yê bajarî de jî bûne.

²⁵⁹ Ev pasaj, di stranên dengbêj Keremê Kor ê ku di qeydeke straneke wî de derbas dibe. Dengbêj Keremê Kor, bi eslê xwe ji Çaldîrana navçeya Wanê ye. Ew ji Çaldîranê tê Bazîdê û li Bazîdê jî giregir û dewlemend û hin malbatên esilzade re dengbêjiyê dike. Ji ber ku jiyana wî di nav zehmetkêşiyê de derbas dibe, di dawîya stran û hikayetên xwe de van risteyan dibêje.

Malbatên wek *Strozzi, Corbinelli, Rossi, Medici, Davanzati* û *Alessandri*, malbatên wê demê yên ku patronajîya hunerê kirine.”²⁶⁰

Bi damezrandina Mala Dengbêjan, patronajîya dengbêjiyê, ku heta salên 2000an, ji vê pergalê mehrûm mabûn jî veguherî. Êdî wekî berê, binemal û malbatên esilzade, yên ku hamîtiya dengbêjan dikirin bi desthilatiya civaka kurdan neman. Lewma jî sîstema hîmayeyê hem têk çû hem jî di nimûneya Mala Dengbêjan de veguherî. Her wisa bi polîtîzebûne hamî û patronajê, dengbêj jî divê xwe polîtîze bike. Mala Dengbêjan, di gel îmkanên xwe yên kêma dîsa jî patronajîya hin dengbêjan dike. Pêşwazîkirina dengbêjan, xizmetguzariya debara wan a rojane, di hinde çalakî û mîhrîcanan, destheqê mesrefa wan a rê û mazûvaniyê ji aliyê Mala Dengbêjan ve tê kirin. Ev, di merheleya patronajîya dengbêjiyê de tiştekî ne bi dilê dengbêjan be jî, dîsa bo îhtiyacên wan ên esasî kêrhatîye. Her çend parastina dengbêjan li wê derê bête kirin jî, Mala dengbêjan di hunera dengbêjiyê de rastî qonaxeke modern tê. Bi vê serdemê ve, bi awayekî gelemperî, hemû teşe, tema û pêwendiyên hamî û dengbêj, struktura civakî jî bi vê serdemê ve veguherî.

²⁶⁰ Tûbâ Işinsı Durmuş, b.n., r. 21-22

ENCAM

Di vê xebatê de bi gelemperî kultura kurdî ya devkî, nemaze jî tradîsyona dengbêjiyê di çarçoveya *kultura devkî*, *dîroka devkî* û têgehên wekî *hefîzeyê* hatin gengeşekirin. Ji ber ku dengbêjiyê di nav xwe de dihewîne, me pêwîstî pê dît ku vê lîteraturê binihêrin da ku cihê kultura dengbêjiyê de jî di nav de aşkera bibe. Kultura kurdî û bi taybetî jî tradîsyona dengbêjiyê ji aliyê xebatkar û lêkolîneran ve, wekî bingeha kultura kurdî ya resen tê hilsengandin, lewma jî maneyeke mîto-romantîk lê tê barkirin û ew kultur di avakirina nasnameya kurdî de wekî tradîsyoneke sereke tê nixandin. Piştî sedsala XXan, bi hewldanên avakirina nasnameya kurdî ve, ji ber ku dengbêjî wekî bingeha kultura kurdî ya resen hatiye qebûlkirin, gelek taybetmendiyên vê kulturê hatine îcatkirin. Di vê xebatê de jî, dengbêjî wekî zincîreke kultura kurdî ya resen hatiye qebûlkirin, lêbelê wekî ku tê îddiakirin, dengbêjî; wekî kultur û tradîsyonên dî, di warê tema û teşeyê de hin formên hevpar dihewîne. Her çend di navbera kulturên de pêwendiyêke bi vî rengî hebe jî, her kultur di warê esasî de xwedî rengêkî taybet e. Her wisa, ev xebat di *çêbûn*, *neqlbûn* û *guhêrîna* vê kulturê de faktorên ku tesir li ser van pêşveçûnan kirine, hatiye pêkolekirin. Di vê pêvajoyê de rola desthilatîyê, encamên pêşveçûna kultura nivîskî û ya elektronîk jî hatiye destnîşankirin.

Di vê xebatê de dengbêjî bi awayekî xisûsî, hem di warê zimanî, hem jî di warê kompozîsyona tematîk de wekî hunereke kurmancîk hatiye nixandin. Ji ber ku ev kultur di nav kurmancan de çalak e û taybetmendiyên xwe di nav vê koma kurdan de hatiye afirandin, me pêwîstî pê dît ku vê yekê destnîşan bikin. Di vê xebatê de jî ev yek li ser van esasan hatiye gengeşekirin. Her çend di kategoriyên zimanî, mezhebî û yên dîtir de kultura kurdî, ji reng û dengên cuda pêk bînin jî, elzemiya zahirkirina vê yekê, bo vê xebatê û xebatên bi vî rengî wekî muhim hate dîtin. Her ji ber wê jî, di vê xebatê de rexne û krîtîkên vê hunerê, li ser van esasan hate ravekirin.

Di vê xebatê de peyva “dengbêj” û her wiha hunera dengbêjiyê, ji bilî taybetmendiyên xwe yên esasî ve, bi tenê ne di konteksta “deng” de, her wisa di çarçoveyêke “xebergotin”, “behsgotin”, “dengûbehsbêj” de jî hate gengeşekirin. Di vir de jî baş hatiye diyarkirin ku, wekî vê kulturê û xebatên ku li ser vê kulturê hatine kirin, ev xebat jî wekî destpêkê ye û îdiayên wê jî, di geşedana van xebatan de dê her were rexne û gengeşekirin.

Ev xebat her çend di peywenda, tradîsyona dengbêjiyê de, li ser xwendineke hîmayekirinê raweste jî, ji bo ku sînor û çarçoveyên wê zêdetir werin zahirkirin, bi gelemperî li ser nimûneyên edebiyata kurdî ya klasîk û ûnsurên kultura kurdî ya cihêreng jî hate sekinandin. Kultura gel û kultura arîstokrat/esilzade, kulturên ji hev cuda ne û muhatabên wê jî, li gor vê cudahiye ji hev vediqetin. Di vê xebatê de hate aşkerakirin ku, kultura dengbêjiyê

her çend kultureke gel/avamî be jî, dengbêj, di qesr û qonaxên sinifên esilzade de, xwedî qedr û payebilind hatine dîtin. Ev yek di hinde nimûneyan de bi awayekî zelal hate nîşandan. Dengbêjên ku di qesr û qonaxên patronan de bi awayekî sistematîk nebe jî hatine hîmayekirin, digel nimûneyan hate destnîşankirin. Ne bi tenê di warê afirandina berhemên hunerî de, her wisa têkiliya patronan û edîb/hozanan a *musahibiyê* jî ji bo paşxaneya patronajê hate gengeşekirin.

Di edebiyat û kultura kurdî ya dengbêjiyê de sistemeke patronajê ya rêkûpêk nîn e. Helbet gelek sedemên vê yekê hene, lê ji ber ku îro di dest me de arşîv û salnameyên mîrekiyên kurdan tune ne, lewma jî em pê nizanin ka jiyana wê demê, têkiliyên mîrekiyan û saziyên îdarî yên din bi çi awayî pêşve çûne. Lê wekî di *Şerefnameyê* de jî hatiye destnîşankirin, di qesr û qonaxên mîrekiyan edîb û hozan hatine parastin, gelek ozan, edîb û zana, digel mîran beşdarî şeran jî bûne. Lewma jî kengî hêza mîrekiyan qewî bûye, edebiyata kurdî jî ew çend pêşketî û kamil bûye. Her çend gelek edîb, dengbêj û hozan ji aliyê giregir, mîr, axa û şêxan ve hatibe parastin jî, wekî sistematîk û bi nîzamî, pergaleke hîmayeyê di edebiyata kurdî de qels e. Di vê xebatê sedemên çenebûna vê sistemê, taybetmendiyan struktural ên bûne sedema van tiştan hatiye pêkolekirin. Lewma jî mirov dikare van tiştan bi vî awayî îzah bike:

- 1- Patronaj, formulasyoneke Max Weber e û li gorî wê formulasyonê, xwe dispêre sistemeke patrî-monyal. Ew sistemên ku xwedî hêzeke mutlaq û monarşîk in, pêwendiyên hîmayekirinê yên edîb, hozan û zanyaran jî li gor wê sistemê rêkûpêk dibe. Mîrekiyên kurdan, di vê çarçoveyê de, ne xwedî hêzeke patrî-monyal bûn, her ji ber vê jî, sistemeke patronajê ya qewî derneketiye holê. Lê, beramberî vê yekê, gelek şair û dengbêj, ji aliyê hamiyên wekî mîr, axa û şêxan hatine parastin, li dîwan, meclîs û qesr û qonaxên wan de hunera xwe îcra kirine, dîwanên xwe xwendine. Her ji ber vê yekê, di edebiyata kurdî û kultura kurdî de sistemeke patronajê heye, lêbelê ev sistem ne biserûber e.
- 2- Helbet gelek faktor hene ku, qelsbûna sistema patroniya kurdî ya edebî û kulturî bi rûdanên dîrokî û egerên curbicur rave dikin. Îro, salname û arşîvên mîrekiyên kurdan di dest me de nîn in. Em nizanin ka sistemeke çawa hebûye di serdema mîrekiyên kurdan de. Îhtîmal zêde ye ku, şer û pevçûnên di navbera mîrekiyên kurdan de jî bûne egera vê yekê. Di vê xebatê û encamên wê de jî aşkera ye ku, desthilatiya siyasî ya qewî û muhkem, sedema pêşketinên çalakiyên edebî, kulturî û ilmî ye jî. Desthilatî, di warê edebî û hunerî de jî iqtîdareke edebî û kulturî pêk tîne. Edebiyata kurdî ya

klasîk, ku serdema xwe ya herî qewî û bilind, di dema desthilatiya mîrekiyên kurdan a herî xurt de pêk aniye.

- 3- Gelek cureyên edebiyata gelêrî yê wekî cönk ku mirov bi belge û rastiyan dîrokî ve berawird bike da ku bigehê netîceyên hunera devkî, di dest me de nîn in. Ji bo vê yekê jî, dîroka kultura kurdî ya devkî, hêja û hewceyî xebatên bi vî rengî ne. Di vê xebatê de jî, sedemên vê yekê bo têgehiştina ûnsurên kultura kurdî her tim çavekî gumanbar hatiye ravekirin.

Di vê xebatê de jî hatiye diyarkirin ku, kultura dengbêjiyê xwe bi awayekî aşkera û mezin, dispêre sîstemeke desthilatiyê û serdestiyê. Ew cihên ku ev kultur lê îcra dibin jî, li gor vê rastiye diguhure û di dirêjahiya dîrokê de guheriye. Di dema mîrekiyên kurdan de ev cih, cîgehên bi şatafat û îhtîşam, anku qesr û qonax bûne. Bi têkçûna mîrekiyên kurdan ve, axa di nav kurdan de bûne serdest û desthilatiya ku di dema mîrekiyan de peyda bibû, bi vê serdemê û prosesê ve têk çû. Li cihê qesr û qonaxên bi îhtîşam, êdî li gundan meclîs û odayên axayan bûne cihên îcrakirina vê kulturê. Bi têkçûna axatiyê û destpêkirina hewl û daxwazên kurdewariyê, yê siyasî, modern û îdeolojîk ve jî ev cîgeh guherîne û bûne radyo û mala dengbêjan.

Di vê xebatê de bi têkçûna mîrekiyên kurdan re, kultura dengbêjiyê jî, ji aliyê psîkolojîk, îqtîsadî û konjonktura kulturî ve veguherî. Ev yek di xerabbûna epîkê de hatiye rave kirin. Bi xerabbûna epîkê ve, dengbêjiya klasîk jî bi dawî bû. Ew kultur bi vê serencamê, veguherî û dewrî ûnsurên kulturî yê curbicur bû. Şano, edebiyat, musîqeya modern û di warên kulturî yê cuda de, tema û teşeyên dengbêjiyê xwe destnîşan kirin.

Hîmayekirin an patronaj, di nimûneya edebiyata kurdî de jî, bi tenê sîstemeke îqtîsadî nîn e. Ew bo dengbêj/şair, ûnsureke psîkolojîk, bilindkirina hunerê ye jî. Di qesr û qonaxan de, an li gel mîr û giregiran îcrakirina vê hunerê, bo dengbêjan firsendeke xwe îfadekirinê bû jî. Çimkî gelek dengbêjên kurdan, wextê ku di qesr û qonaxan de stran digotin, dengbêjê reqîb jî hebûn ku, ew bi hevdu re diketin lecê.

Veguherîne sîstema civaka kurdan, encamên xwe li ser berhemdariyên hunerî û edebî jî dike. Di vê xebatê de bi awayekî kronolojîk, ji serdema mîrekiyan heta îro, ew şexs, dezgeh, partî û dezgehên ku hikmê wan li ser civake heye hate gengeşekirin. Têkiliya wan a ku bi karûbarên edebî û hunerî re derdikeve pêş, di çarçoveya mekanê de jî hatiye gengeşekirin. Mekanên ku li gorî desthilatiyê veguherî, di vê xebatê de hate tehlîl kirin û tezahura wan a di berhemên dengbêjiyê de jî hate destnîşankirin.

ÇAVKANÎ

Abel, Oliver, *Lévi-Strauss'un Antropolojik Yapısalcılığına Yaklaşım. Lévi-Strauss, Irk ve Tarih*, wer. Işık Abel, weş. Metis, İstanbul, 1985

Adak, Abdurrahman, *Destpêka Edebiyata kurdî ya Klasîk*, weş. Nûbihar, İstanbul, 2014

Akdağ, Mustafa, *Osmanlı Tarihinde Âyanlık Düzeni Devri 1730-1839*, Kovara Tarih Araştırmaları, C.VIII, Ankara, 1975

Alan, Remezan, *Bavê Helbesta Gelêrî û Ferxên Wê*, Kovara Bîr, Hejmar 1, İstanbul, 2005

Alan, Remezan, *Folklor û Roman*, weş. Peywend, İstanbul, 2013

Alakom, Rohat, *Arîstokratên kurd: Torin*, weş. Apeg Förlag, Stockholm, 2004

Alev Alatlı, *Batiya Yön Veren Metinler, (Aydınlanma/ Burjuvazi Yüzyılı/Bilim Çağının Zaferi 1650-1800)* Cild 3, weş. İlke Eğitim ve Sağlık Vakfı, Nevşehir, 2011

Allison, Christine, *Yezidi Sözlü Kültürü*, wer. Fahriye Adsay, weş. Avesta, İstanbul, 2007

Anderson, Benedict, *Hayali Cemaatler, Milliyetçiliğin Kökenleri ve Yayılması*, wer. İskender Savaşır, weş. Metis, İstanbul 2009

Antolojiya Dengbêjan/Dengbêj Antolojisi/ The Antologie of Dengbêj, Türkiyede Kültürel Hakların Desteklenmesi Kültürel Girişimler Hibe Programı (CISGS) Dengbêj ve Dengbêjlik Projesi, Ed. Davut Özalp, r. 9

Aras, Ahmet, *Şairê Kurda yê Efsanevî*, weş. Deng, İstanbul, 1996

Aras, Ahmet, *Kilama kurdî û Dengbêjiya Serhedê*, Kovara Bîr, Hejmar 7, İstanbul, 2010

Artun, Erman, *Aşık Şiiri Geleneginde Dil, Üslup, Motif ve Metin Merkezli Anlama-Açıklama Üzerine Düşünceler*, Sempozyuma Güneydoğu Avrupa'da Osmanlı ve Osmanlı

Sonrası Türk Uygarlığının Öteki Uygarlıklarla Halk Kültürü Yönünden Etkileşimi
Sempozyumu, Gagavuzyeri, Moldova, 2007
([http://turkoloji.cu.edu.tr/HALK%20EDEBIYATI/erman_artun_asik_siiri_gelenegi_m
etin_merkezli_yaklasim.pdf](http://turkoloji.cu.edu.tr/HALK%20EDEBIYATI/erman_artun_asik_siiri_gelenegi_m
etin_merkezli_yaklasim.pdf)) (29.06.2014)

Assmann, Jan, *Kültürel Bellek*, wer. Ayşe Tekin, weş. Ayrıntı, İstanbul, 2001

Atabağsoy, Naim, *Klasik Dönem Osmanlı Şiirinde Patronaj ve Şairin Üretim Süreci
İlişkisine Bir Bakış*, Kovara Monograf, hejmar, 1, e-kovar
(<http://www.monografjournal.com/sayi1.html>) (20.03.2014)

Auge, Marc- Colleyn, Jean, Paul, *Antropoloji* wer. İsmail Yerguz, weş. Dost, Ankara, 2005

Bakhtin, Mikhail, *Karnaval dan Romana*, wer. Cem Soydemir, weş. Ayrıntı, İstanbul, 2001

Barth, Fredrik, *Kürdistan'da Toplumsal Örgütlenmenin İlkeleri*, wer. Serap Rûken Şengül-
Hişyar Özsoy, Weş. Avesta, İstanbul, 2001

Bayrak Mehmet, *Kürt Müziği, Dansları ve Şarkıları*, Cilt 1, weş. Özge, Ankara, 2002

Bazîdî, Mela Mehmûdê, *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, amadekar,
Ziya Avcı, weş. Lîs, Diyarbakır, 2010

Bedlîsî, Şerefhan, *Şerefname*, wer. Ziya Avcı, weş. Avesta, İstanbul, 2007

Benjamin, Walter *Son Bakışta Aşk*, wer. Nurdan Gürbilek, weş. Metis, İstanbul, 1995

Bilgin, Nuri, *Kimlik İnşası*, weş. Aşina, İzmir, 2007

Bingöl, Osman Doğu, *Günümüz Kent Yaşamında, Sözlü Kültürün Yeni Sanatsal İfade Aracı
Olarak Kullanımı*, Zanîngeha Yıldız Teknikê, Enstîtuya Zanîstên Civakî (Sosyal
Bilimler) Teza masterê ya çapnebûyî, İstanbul, 2006

Boratav, Pertev Naili, *Âşık Edebiyatı*, Kovara Türk Dili ve Edebiyatı Jimara Taybet a Türk Halk Edebiyatı, C.19, j.207, 1 Kanun, Ankara, 1968

Boratav, Pertev Naili, Halk Edebiyatı Dersleri, weş. Tarih Vakfı, İstanbul, 2000

BOA. Y..PRK.ASK. 154/6 Dîrok: 02/R/1317(H), 1899

Bruinessen, Martin van, *Ağa, Şeyh, Devlet*, wer. Banu Yalkut, weş. İletişim, İstanbul, 2004

Burkay, Kemal, *Geçmişten Bugüne Kürtler ve Kürdistan*, weş. Deng, İstanbul, 2008

Counce, Stephen, *Sözlü Tarih ve Yerel Tarihçi*, wer. Alper Yalçınkaya, Bilmez Bülent Can, weş. Tarih Vakfı Yurt, İstanbul, 2011

Cemil Paşa, Ekrem, *Dîroka Kurdistan Bi Kurtebirî*, weş. Enstituya kurdî ya Brukselê, Bruxelles, 1995

Celil, Celilê, XIX. *Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler*, wer. Mehmet Demir, weş. Özge, Ankara 1992,

Celîl, Ordîxanê, *Kürt Kahramanlık Destanı Dimdim*, wer. İbrahim Kale, weş. Avesta İstanbul, 2001

Cindî, Heciyê, Evdal Emînê, *Folkloru Kurmanca*, weş. Avesta, İstanbul, 2008

Cindî, Heciyê, *Kilamên Cimeta Kurda*, weş. Lîmûş, Yerêvan, 2008

Cizirî, Şerefxan, *Kultur û Edebiyata Devkî*, weş. Nûdem, Swêd 1999

Connerton, Paul, *Toplumlar Nasıl Anımsar*, wer. Adam (Alaeddin) Şenel, weş. Ayrıntı, İstanbul, 1999

Çamlıbel, Ehmet Cengîz, *Evdalê Zeynikê, Hîmdarê Mekteba Serhedê*, weş. Deng, İstanbul, 2005

Çelebi, Evliya, *Seyahatname*, Cild 6, weş. YKY, İstanbul, 2010

Dît, Nedim, *Dengbêj Geleneğinin Sonu ve Bu Geleneğin Son Halkası: Reso. Kovara Bîr*,
Hejmar 6

Dupont, Florence, *Edebiyatın Yaratılışı, Yunan Sarhoşluğundan Latin Kitabına*, wer.
Necmettin Sevil, weş. Ayrıntı, İstanbul, 2001

Durmuş, Tûbâ Işınslı, *Tutsan Elini Ben Fakirin, Osmanlı Edebiyatında Hamilik Geleneği*, weş.
Doğan, İstanbul, 2009

Ekinci, Mehmet Rezan, *Şırnak'ın İdarî Taksimatı ve İdarî Alanda Meydana Gelen
Değişmeler 1845-1918* Uluslararası Şırnak ve Çevresi Sempozyumu, 14-16 Gulan
2010 R, 494, Jêrenot, 50

Emiroğlu Kudret- Aydın Suavi, *Antropoloji Sözlüğü* weş. Bilim ve Sanat, Ankara, 2003

Ercan, Harun, *Şeş û Yek: Kürt Meselesi, Gülen Cemaati ve Bir Karşı Propaganda Girişimi
Olarak "Tek Türkiye" Dizisi*, Kovara Toplum ve Kuram, j. 2, 2009

Erhat, Azra, *Mitoloji Sözlüğü*, weş. Remzi, İstanbul, 1996

Erkmen, Ayhan, *Radyoya Yêrêvanê: Ji Bo Bîranîna Daner, Kekdar û Dengbêjê Wê*, Le
Monde Diplomatique, j. 18, Paris, Gulan 2011

Eşo, Wezîrê, *Radyoya Yerîvanê*, Kovara Nûdem, j. 16, İsviçre, 1995,

Foucault, Michel, *Bilginin Arkeolojisi*, wer. Veli Urhan, weş. Birey, İstanbul, 1999

Gernas, Arama, *Ferzende Beg*, Kovara Bîr, j. 8, İstanbul, 2005

Griffin, Dustin, *Literary Patronage in England 1650-1800*, weş. Cambridge, 1996

Görkem, İsmail, *Halk Hikâyeleri Araştırmaları*, weş. Akçağ, Ankara, 2000

Gültekin, Mehmet, *Zargotina Kurdên Serhedê*, weş. Avesta, İstanbul, 2013

Gündoğar, Sinan, *Üç Kürt Ozanının Hikâyesi*, weş. Elma, İstanbul, 2005

Hakan, Sinan, *Müküs Kürt Mirleri Tarihi ve Han Mahmud*, weş. Pêrî, İstanbul, 2002

Halbwasch, Maurice, *Kolektif Bellek ve Zaman*, Kovara Cogito, j. 50, İstanbul, 2007

Halman, Talat Sait, *Türk Edebiyatı Tarihi*, Cild 1, weş. T.C Kültür ve Turizm Bakanlığı, İstanbul, 2006

Hasanpour, Amir, *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil*, wer. İbrahim Bingöl-Cemil Gündoğan, weş. Avesta, İstanbul, 2005

Hobsbawm, J. Eric /Terence Ranger, *Geleneğin İcadı*, wer. Mehmet Murat Şahin, weş. Agora, İstanbul, 2006

Huyssen, Andreas, *Alacakaranlık Anıları*, wer. Kemal Atakay, weş. Metis, İstanbul, 1999

H. Mem, *Mem û Zîn İdeal Memê Alan Destan Masal*, weş. Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, 2005

Izady, Mehrdad R, *Kürtler*, wer. Cemal Atila, weş. Doz, İstanbul, 2004

İnalcık, Halil, *Şair ve Patron*, weş. Doğu Batı, Ankara, 2010

Jwaideh, Wadie, *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi*, wer. İsmail Çekem-Alper Duman, weş. İletişim, İstanbul, 2009

Kahraman, Ahmet, *Kürt İsyancıları, Tedip ve Tenkil*. weş. Evrensel, İstanbul, 2004

- Katar, Dicle Yıldız, *Kürt Sözlü Kültüründe Kadın Dengbêjler: Ayşe Şan ve Meryem Xan, Teza masterê ya çapnebûyî, Zankoya Yakın Doğu Enstîtuya Zanistên Civakî, Beşa Ragihandinê Teza Rojnamegerî ya masterê û çapnebûyî, Lefkoşe, 2011*
- Kazan Hilal, *XV ve XVI. Asırlarda Osmanlı Sarayının Sanatı Himayesi, Zankoya Marmara, Enstituya Zanîstên Civakî, îlahiyat, Teza Doktorayê ya çapnebûyî, İstanbul, 2007*
- Kevirbirî, Salihê, *Kürt Halk Türkülerinden Seçmeler, weş. Evrensel, İstanbul, 2004*
- Kevirbirî, Salihê, *Bir Çılgıñın Yüzyılı, Karapetê Xaço, weş. Elma, İstanbul, 2005*
- Kevirbirî, Salihê, *Kewê Ribat û Şahê Dengbêjan: Şakiro, Kovara Gulistan, j.4, İstanbul, 2002*
- Kılıç, Dünder Ali, *İrisan Beyleri, Abbasi Devleti'nden Hakkari Beyliği'ne, weş. Tarih Düşünce Kitapları, İstanbul, 2006*
- Kızılkaya, Muhsin, *Kayıp Dîwan, weş. İletişim, İstanbul, 2000,*
- Koma Xebatên Kurdolojiyê/Kürdoloji Çalıřmaları Grubu, *Kürt Tarihi Arařtırmaları 1, Osmanlı Kürdistanı- Kurdistana osmanî, weş. BGST, İstanbul, 2011*
- Küçükbayrak, A. Kadir, *Kürdistan Sorunu'nun Tarihsel Arka Planı 1, Kovara Bîr, j. 10, İstanbul, 2012*
- Roger Lescot, *Binevşa Narîn û Cembeliyê Hekkarê, Kovara Hêvî, Hejmar 2 Gulan, Paris, 1984*
- Kreyenbroek, Philip-Allison, Christine, *Kürt Kimliđi ve Kültürü, wer. Ümit Aydođmuş, weş. Avesta, İstanbul, 2008*
- Kurdo, Qanadê, *Tarîxa Edebyeta kurdî, weş. Öz-Ge, Ankara, 1992*
- Marshall, Gordon, *Sosyoloji Sözlüđü, wer. Osman Akınhay, Derya Kömürcü, weş. Bilim ve Sanat, Ankara, 2005*

Maruf Mamoste, *Recûya Evdalê Zeynikê*, Kovara Zend, İstanbul, Bihar 2012

Mc Luhan, Marshall, *Gutenberg Galaksisi*, wer. Gül Çağalı, Güven, weş. YKY, İstanbul, 2001

McDowall, David, *Modern Kürt Tarihi*, wer. Neşenur Domaniç, weş. Doruk, İstanbul, 2004

Meisami, Julie Scot, *Medieval Persian Court Poetry*, weş. Princeton, 1987

Meretowar, Ayhan, *Dengbêj Huseynê Farê*, Kovara Bîr, j.7, 2010

Metin, Celal, *Sözlü Tarih ve Türkiye’de Gelişimi*, Kovara Türk Kültürü Dergisi, j. 469 Ankara, 2001

Neyzi, Leyla, *Ben Kimim? Türkiye’de Sözlü Tarih, Kimlik ve Öznellik*, weş. İletişim, İstanbul, 2007

Nezan, Kendal, Izady, M., Mutlu, E., *Kürt Müziği*, wer. Necdet Hasgül, Mutlu Öztürk, Gökhan Gökçen, Kerem Özdemir, weş. Avesta, İstanbul, 1996

Nikitin, Bazil, *Kürtler Sosyolojik ve Tarihi İnceleme*, wer. Hüseyin Demirhan, Cemal Süreyya, weş. Deng, İstanbul, 2002

Ortaylı, İlber, *Tanzimattan Cumhuriyete Yerel Yönetim Geleneği*, weş. Hil, İstanbul, 1985

Ortaylı, İlber, *Tanzimat Devrinde Osmanlı Mahallî İdareleri*, weş. TTK, Ankara, 2000

Ortaylı, İlber, *Türkiye Teşkilat ve İdare Tarihi*, weş. Cedit, Ankara, 2010

“Osmanlı Kaynaklarında Kürtler” Çalışma Grubu, (Koordınator, Namık Kemal Dinç, Alişan Akpınar) *20. Yüzyıl Başlarında Kürt Milliyetçi Söylemine Bir Örnek, Emir Bedirhan, Lütfî-Ahmet Ramîz*, Weş. BGST, İstanbul, 2007

Özsoy, Osman, *Propaganda ve Kamuoyu Oluşturma*, weş. Alfa, İstanbul, 1998

Parlıtı, Abidin, *Dengbêjler Sözüün Yazgısı*, weş. İthaki, İstanbul, 2006

Propp, Vladimir, *Folklor Teori ve Tarih*, wer. Necdet Hasgöl, Tolga Tanyel, weş. Avesta, İstanbul, 1998

Sanders, Barry, *Öküz'ün A'sı*, wer. Şehnaz Tahir, weş. Metis, İstanbul, 2010

Sarup, Madan, *Post-Yapısalcılık ve Postmodernizm*, wer. A.Baki Güçlü, weş. Ark, Ankara, 1997

Scalbert-Yücel, Clémence, *The Invention of a Tradition: Diyarbakır's Dengbêj Project*.
European Journal of Turkish Studies, j. 10, 2009

Selanik, Cavidan, *Müzik Sanatının Tarihsel Serüveni*, weş. Doruk, Ankara, 1996

Tek, Ayhan, *Li Dor Behsa Patronajê, Mem û Zîna Ehmedî Xanî*, Kovara Mukaddime, j. 3
İstanbul, 2010

Temo, Selim, *Kürt Şiir Antolojisi*, weş. Agora, İstanbul, 2007

Thomson, George, *Eski Yunan Toplumunu Üstüne İncelemeler, Tarihöncesi Ege II*, wer. Celal
Üster, weş. Payel, İstanbul, 1991

Tosh, John, *Tarihin Peşinde*, wer. Özden Arıkan, weş. Tarih Vakfı Yurt, İstanbul, 2011

Uygar, Yusuf, *Kültürel Bellek ve Dengbêjlik, Doğu Anadolu'daki "Dengbêjlik" Geleneğinde
Bellek Üretimi*, Zanîngeha Mîmar Sînan, Enstîtuya Zanistên Civakî Teza masterê, ya
çapnebûyî, İstanbul, 2009

Uzun, Mehmed, *Dengbêjlerim*, weş. İthaki, İstanbul, 2008

Walter J. Ong, *Sözlü ve Yazılı Kültür*, wer. Sema Postacıoğlu Banon, weş. Metis, İstanbul,
2007

Vali, Abbas, *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, wer. Fahriye Adsay-Ümit Aydoğmuş-Sema Kılıç, Weş. Avesta, İstanbul, 2005

V. Minorsky, Th. Bois, D. N. Mac Kenzie, *Kürtler ve Kürdistan*, wer. Kamuran Fıratlı, weş. Doz, İstanbul, 2004

Xanî, Ehmedê, *Mem û Zîn*, Amadekar Huseyn Şemrexî, weş. Nûbihar, İstanbul, 2010

Yağcı, Murat, *Sözlü Kültürden Yazılı Kültüre ve Elektronik Kültüre Geçiş Süreçlerinde Düşünsel ve Toplumsal Değişimler*, Zanîngeha Ankara, Ensûtuya Zanistên Civakî, Etnolojî, Teza masterê ya çapnebûyî, Ankara, 2005

Yıldırım Kadri, Pertev Ramazan, Mustafa Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, weş. Mardin Artuklu Üniversitesi, İstanbul, 2013

Yıldız, Hasan, *Aşiretten Ulusallığa Kürtler- Politik Felsefe Açısından Kürt Toplumunun Kritiği*, weş. Hêviya Gel, Stockholm, 1989

Yusif, Ebdurreqîb, *Hunerê Tabloyên Şerefnameyê*, wer. Ziya Avcı, weş. Avesta, İstanbul, 2007

Zeki Beg, Muhammed Emin, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, wer. Vahdettin İnce, Mehmet Dağ, Reşat Adak, Şükrü Aslan, weş. Nûbihar, İstanbul, 2010

Zinar, Zeynelabidin, *Xwençe*, Cild 4, Pencînar weş. Kultura Kurdî, Stockholm, 1990

Zerzan, John, *Gelecekteki İlkel*, wer. Cemal Atila, weş. Kaos, İstanbul, 2000

ÇAVKANIYÊN ONLINE

Alkoç, Kadri, Nankörlük: http://www.ozgur-gundem.com/?haberID=14096&haberBaslik=Nank%C3%B6rl%C3%BCk&action=haber_detay&module=nuce (12.12.2012)

Cindî, Xelîl, Rojnamey Rewşenbîrî Niwê, Kelepûrî Netewî, Jimara 75'an Tîrmeha sala 1979'ê de nivîsiye. Wergêr, Malpera Komela Kaniya Sipî.(<http://www.kaniya-sipi.de/kurdish/gotar1.htm>) (30.04.2012)

Doğan, Mazlum, *Tirkîfikasyona Xwemalî, Di Zimanê Medyaya Kurdî de Li Bakûrê Kurdistanê*, (Ev nivîsar, li Komxebata Ziman û Perwerdehiyê ya Navnetewî 2010 hate pêşkeşkirin.) (<http://www.zazaki.net/file/tirkifikasyon-.pdf>) (12.05.2012)

Epözdemir, Şakir, *Tarihte Kürtler, Kürdistan ve Osmanlı Dönemi*, (<http://www.kovarabir.com/tag/1514-kurt-osmanli-itifaki/>)

Küçükbayrak, A.Kadir, *Kürdistan Sorunu'nun Tarihsel Arka Planı I*, <http://www.kovarabir.com/a-kadir-kucukbayrak-kurdistan-sorununun-tarihsel-arka-plani-i/> (10.01. 2012)

Nezan Çelebî, *Kürt Müziğinde Dengbêjlik* (<http://www.daplatform.com/news.php?nid=12757&PHPSESSID=cb857d26a3d3003f09eb56001f5272b1>) (05.05.2012)

Nevzat Çelebi, Vedat Yıldırım, Aytekin G. Ataş, *Geleneksel Kürt Müziğine Genel bir Bakış*, (http://www.bgst.org/muzik/yazilar/geleneksel_kurt_muzigi.asp) (05.04. 2012)

Scalbert Yücel, *The İnvention of a Tradition: Diyarbakır's Dengbêj Project* <http://ejts.revues.org/4055> (22.07.2012)

Yüksel, Müfid, *İdris-i Bitlisi ve Eserleri* <http://www.haber10.com/makale/11116/> (13. 05. 2013)

<http://www.kurdishmagazin.com/km/dengbejler-kurt-kulturunu-korudu.html> (12.12.2012)

http://www.bgst.org/muzik/egitim/hakkari/hak_tarihi.asp (Dîroka Hekaryayê-Hakkarî Tarîhî 10.05.2012)

(<http://www.yuksekovahaber.com/yazdir/yazi/yazi/bir-zamanlar-colemeg-490.htm>) (12.05.2012)

http://turizm.diyarbakir.bel.tr/tr/s/Dengb%C3%AAjler_Evi (22.04. 2012)

<http://www.pirsushaber.com/batman-belediyesi-engellilere-kokteyl-verdi-373368n.html>
(16.05.2012)

<http://www.yuksekovahaber.com/haber/cizrede-dengbj-evi-acilacak-41763.htm> (23.07.2012)

<http://www.yuksekovaguncel.com/kultur-sanat/dengbjler-evinden-genclere-cagri-h31043.html>
(03.05.2012)

<http://agrihalk.com/agrida-bir-ilk-mala-dengbeja-acildi/> (07. 10.2013)

<http://www.tigrishaber.com/dengbej-kadinlar-kurt-tarihini-okuyor-4655h.htm> (05.03.2013)

ÇAVKANIYÊN DÎJÎTAL

Dengbêj Şibliyê Çaçan, *Cangîr Axa û Andranîk Paşa*, Deşîfrekirin: Zeki Gürür

Dengbêj Maruf, *Mîrê Min*, Deşîfrekirin: Zeki Gürür

Dengbêj Şakiro, *Besrayê*, Deşîfrekirin: Zeki Gürür

Erol Berxwedan, *Mîro*, Deşîfrekirin: Zeki Gürür

T.C
Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

PATRONAJ BAĞLAMINDA DENGEBÊJLİK

Zeki GÜRÜR

(10711022)

Tez Danışmanı
Yrd. Doç. Dr. Hayrullah ACAR

MARDİN-2014-